
# MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK SERDEMA ŞOREŞA JINÊ YE

**ABDULLAH OCALAN**



Weşanên Akademîya Zanistên Cîvakî ya Abdullah Ocalan

**XEBATA MIN A DESTANÎ**

**NAVEROK**

**Jin An Wê Di Nav Pîroziya Xwedewendan De Be An Jî Wê Qet Nebe!**
**JINA FERZANE A CIVAKA XWEZAYÎ**
**Civakbûyîn Sedema Hebûna Keriyên Mirovane.**
**Klan, Yekîtiya Li Devdora Jin, Jina Dayîk Kombûye ye.**
**Ji çanda dayîka pîroz derbasbûyîna çanda mêrên qurnaz û bi hêz**
**ŞOREŞA DIJBER**
**Êriş Li Ser Pergaşa Civakbûyînê a Dayîka Xwedavend**
**Hevalbendiya Mêrên Bi Hêz, Pîr- Mêrên Xwedî Tecrûbe Û Şaman**
**Kok Berdana Otorîteya Bavikanî**
**Hemû koledarî li ser bingehê pîrekbûnêye**
**Di pergala Zîgûratan de rastiya jin û malbatê**
**Kevneşopiya şaristaniyê jinê wek ``zeviya mêr`` dadgeh dike.**
**Bi talankirina aboriya malê ve destavêtina jinê ya her demî**
**Têgîna ku li ser keda jinê teşe girtiye: deshilatî**
**Qûtbûyîna feraseta analîtîk ji feraseta hêstî**
**Di Civaka Cînsiyet parêz de yekemîn û duyemîn şikênastina çandî**
**Moderniteya Kapîtalîst: Dijminê jinê**
**Netewa Mêtîngeri Ya Herî Kevin Û Ya Herî Nû- Jin**
**Di Rojhilata Navîn de Pirskirêka jin, Xanedanî, Malbat û Nifûs**
**Azadkirina zayenparaziya civakî**
**Çiqas xwezeya jinê di tariyê de bimîne,**
**hemû xwezaya civakê jî wê neronîkirinê de bimîne**
**Di Rojhilata Navîn de Şoreşa Jinê**
**Divê Mirov Çawa Bijî, Çi Bike û ji ku Dest pê Bike?**

## XEBATA MIN A DESTANÎ

### Jin An Wê Di Nav Pîroziya Xwedewendan De Be An Jî Wê Qet Nebe!

Di rojhilata Navîn de sîyemîn xebata min a destanî, ya derbarê azadiya jin de ye. Ev xebata , ku li gorî min, pêwîste li berê xebatên xilasbûna welat û kedê were kirin a herî bi zehmete. Jin çîn, netew û zayenda ku yekemîn û bingehta ku ji aliyên paşvarûtî û koletiyê de hatiye perçiqandin e. Li ber çav ji bo cûdabûna zayend, newekhevî û zordestiyê dikin hecet. Heke ku dîrok baş were lîlolînkirin, wê were fêm kirin ku, ji bo giştî qurbanên yekemîn ên deshilatiya sosyal û siyasalin. Jin çîna yekemîn ku bêneheqî û koletiya li mirovahiyê hat kirin di despêkê de li ser wê hat kirin. piştî ku jin hat kolekirin, bû nesneya malê a gedîkirî(ne ozne), piştre dest bi afirandina civaka çînî û dewletê hatiye kirin. zilamê zalim derewker piştî ku jin xist, bi cesareta ku bi vî girt ve xwes însanên din û zayenda xwe bixwe jî biperçiqîne û teslîm bigire, herwiha sîstemên herî derwger, mîtolojî û ol afirandine. Herwiha ol û mîtolojiyên ku ji bo gelan nêzîkê rastiyê dikin jî hene. Em behsa mîrolojî û olên derewa diafrînin ên ku deshilata û mêtingeriya afirandiye dikin. Dema mirov van ol û mîtolojiya dinêre jin li ser textên xwe yên xwedewendiyê bi hîle û zorbatiyê gav bi gav hatiye xistin, bê mene hatiye hîştin û herî dawiyê hatiye xilaskirin. Ne gengaz bû ku ez wek şervanekî azadiyê vî nebîni. Ez wek zarokekî azadiyê ya vê axa ku ola dayîka xwedewend û bûye warê yekemîn xwedewendên evînî, min ê hewl bida mezinê me yê yekemîn fêm bikirana, lêkolîn bikirana û sedema hebûna wan derbixista holê.

Sedema ku ez li ser pirsgirêka jin de diçim, ji pirsgirêka rûmeta şexsî wêdetire. Yekser dijberê pêwîstiyên erzan ên zayendîtiyê ye. Ji min re hevdîtina zayendan, ne li ser ajoya zayendîtiya lawirî dirûne ango li ser vê dana rûnişkandine, zêdetirîn ew anîna asta dostanî û hevalentiya mezin, ji min re egîdiyeke hîn rastir hat û ez tê gihiştim ku gûmana xwe nêzî jinê nekirin tirsonektî ye. Zilamê desthilatdar tirs çêkiribû. Dibin navê namûsê de ev lîstik dihate lîstin. Dema dibêje "ez hez dikim" jî, di cara duyem de kêr lêdixist. Bêmafbûna wî pir saw (dehşet) dida. Weke cins jin, pelixandibû, zeka, fîzîk û hestên wê tûne kiribû. Jin xistibû nava kûrahiyên ku mirov jê bawer nake. Zilamê herî zêde ji xwe re dibêje 'ez sosyalîst im', heta jina ku ji xwe re dibêje ez sosyalîstim jî nikarîbûn xwe ji bûna fîgûrên erzan ên vê lîstikê rizgar bikin. Ez bi hêza ku tînatiya azadiyê daye min ve li ser pirsgirêkê de çûm. Min bi hejmareke mezin tehlîl, giftûgo, peyvînên kûr pêşxistin û kirin. Ji bo ji xweşikahiya sekneke fîzîkî bibin çirûska zeka, heya ji bo bi dengê zimanê xwe bigihin astekê û tama ku tu madde nadin bidin, ez weke xwediyê wan, weke hûnermendkarekê tevlî hertiştê wan bûm. Mezin bûn, pir bilind mezinbûn, lê nepijyabûn. Jiyana bi lehnet û efendiyên wan ên zilam li rex wan bû. Tecrûbe û pisporbûna wan a li dijî wan û bi wan re dayîna şerê zayendî nebû. Di vê mijarê de lewazbûn. Bi van êşan ve xwe, ji keviyên tehtan avêtin xwarê, xwe di agiran de şewitandin, xwe bi bombeyan perçe kirin. Bi navê egidiyê wan hertişt kir, lê ew tenêbûn. Zilamtiya li hemberê wan, ji bilî nêzîkatiyên çors nedixwastin rêhevaltî û dostaniya wekhev a mezin bînin bîra xwe. Weke gulan diçilmisin û diçûn

Ger xayîn û noker derbikevin jî, ên ku ji dil tevlî van hewldanan dibin divê qet neyên ji bîrkirin. Hele şehîdên, weke ezîz û ezîzeyên herî pîroz ên van axan û gelên me dê her timî werin bibîrxistin. Her yek ji wan di asteya xwedawendên egîd dene. Min partîgerî û yekîneyên ên niha dijîn birêz pêşwazî kir, bûm destek. Min her timî got; divê bibin garantiya jiyaneke azad û bedew. Min bi baweriya ku dê teqez rojekî bigihijin jina bihêz û mêrê paşverû, derewker û zilimkar bînin hîzayê re heta dawiyê hewldanên xwe domand. Mirov tenê bi jina ku milkê wî ye re mezin nabe, nabe mêr. Min ne xwast wisan mezin bibim, ne jî xwast bibim mêrek wisan; heta min bi vî awayîbûnê wek şikandina rûmetê dît.

Ez dizanim ku min jinê xistiye rewşekî tengav de; ez dizanim min wana kiriye parçeyeke ji agir jî. Ez dizanim dinava wan de ên dijminahiyeke mezin dikin û bêmafî dikin jî, hene. Dizanim min wana bi tenê hêlaye. Lê rastiya

herî girîng ku ez dixwazim hun bizanin, divê hun ew qas bihêzbin ku bikarin çarenûsa şer jî, aşitî jî, diyar bikin. Ev nebe jiyan herame. Ev nebe evîn nabe. Ev nebe ti bêrîkirin nayên bûhurandin. Tenêbûn û qutbûn, ji bo ev mezinahî werin bidestxistin û serdest kirin riyên divên werin derbaskirin û deynên divê werin dayînin. Didim xuyakirin ku bi hêvî û baweriyê di welatê xwedawenda dayîk û xwedawendên evînê de bi hêza azadî û wekheviyê re ku bi hezar salane hatiye wendakirin, di xebatek û şereke navend jin de dê bedewî û zeka ji nû de were afirandin, a heyî jî dê bi qandî hevpeymana civakî jiyanî bike, bigihije hêza cewherî. Di rêhevaltiya jin a tijî bi hezkirin û rêzgirtinêye bi qandî îdîayê, ji bo hewldanên xwe mîna karekî evînê heta bêhna xwe ya dawiyê ez dê bidomînim, mîsoger e. gûman nîne ku dê wate bidinê û bi qandî ku pêtivî bibînin, ez rêhevalê jinim û her timî jî, dê wisan bimînim.

Ez bi qasî ku pawerî bi çanda xwedewendiyê bînim bihiştim hêza hizkirin û rêzgirtinê. Çi qas hat xwestin şerê min a ji bo jinê ji çav bixin jî lê min mafê wê dayê. Tu yê him xiyanet ji erkên ji bo jinê bikî û wek pirotesgerekî jiyan bikî, him jî ji bo rêhevaltiya jina soylû tişta ku bikeve li ser milê te, yu yê nekî. Ev tu car nay qebûl kirin. Di serî de PKK, min hewl da ji her kesekî re bidim nîşandan ku aliyê şerê jinê yê ku piçûk were dîtin tuneye. Herî kêm bi qasî wxedewendê zilam ên zorba û derewker, hêza rastiyê û evînê ya dinya ya xwedewenda jî were nas kirin, rêz û hiskirina pêwîste ji jê re were dayîn, min hewl da vê bi ilkeyek mezin heya daviyê bidim nîşandan.

Li van çiyan, min tim hewl da komên jinan ên azad bi îlhameke xwedayî silav bikim û wisa bi wan re ‘manedar’ bibim. Di nûçeyan de gelek caran tê gotin ‘Komeke jinên ji Başûr-Rojhilat ên li romorka traktorê yan jî pişta komyonê barkirî wexta ji bo rêncbertiyê diçûn filan herêmê di qezayê de mirin’; ez wexta van hevokan dibihîsim, hêrsa min a li hemberî mêrê qaşo xwediyê jinê, malbat, hiyarerşî û dewletê bi qasî li hemberî ti bûyerê nîne, radibe. Ez hêrsa xwe ya ji vê rewşê gelek caran tînim ziman. Ma çawa dibe, ji nifşên xwedawendan evqasî piçûk ketin? Ruh û hişê min ev piçûkketin ti carî qebûl nekir û zêhnê min jî ev yek ti carî ranekir. Ji bo min jin wê yan di asta pîrozbûna xwedawendan de be yan jî wê hîç nebe. Tê gotin: ‘Di civakekê de asta jiyana jinan gihiştiyê, pîvana asta jiyana wê civakê ye.’

Min ji bo diya xwe hevoka ‘ji çanda xwedawendên dayik maye’ bi kar anîbû. Weke wan şîşman û qelew bû. Ji ber ku mîna jinên modernîteyê li hev nehatibû çêkirin, min nikarîbû pîrozbûna di wê de bidîta. Tevî ku min di jiyana xwe de êşên gelek mezin kişandine jî ez ti carî bi awayekî ciddî negiriyam. Lê piştî ku min qalibên modernîteyê hilweşandin di serî de diya min û di şexsê wê de dayikên herêmê (Rojhilata Naverast) hemûyan bi dilekî şikestî û çavên şil bi bîr tînim, dinêrim. Diya min ji bîrê bi zehmetî ava derdixist bi satilê dibir û wexta diwestiya û di nîvê rê de datanî min baz dida qurûs dibûm bi hemdê xwe vedixwar. Ez niha li wê maneya qurtên avê, weke yek ji bîranînên xwe yên herî bijartî û xemxwar dinêrim, dibînim. Ez ji her kesî re jî pêşniyaz dikim ku piştî qalibên zêhnê yên modernîteyê hemû hilweşandin dikarin ji nû ve li têkiliyên xwe yên dê-bavê binêrin. Ez dixwazim dîsa bi heman awayî li tevahiya ‘têkiliyên gund’ yên ji neolîtîkê mayî temaşe bikin. Bêguman serketina herî mezin a modernîteyê ew e ku karîbû nêrîna me ya çandî a panzdeh hezar sal e hatiye avakirin, hilweşîne û tine bihesibîne. Mirov fêhm dike ku ti kes ji kes û komên mirovan ên evçend hatin hilweşandin û tine hatine hesibandin, nêrîneke azad, serbilind, dildariya jiyanê û berxwedanê hêvî neke.

Her heywan û nebatê li qûntara çiyayên Kevanê ji bo min objeyeke dildariyê bûn. Mîna ku di wan de maneyeke pîroz hebe min li wan dinêrî. Ez ji bo wan, ew ji bo min hevalek bûn hatibûn afirandin. Min pirr li pey wan baz da. Bi eşq û evîn. Eşqa min hinekî welê bû. Hînê jî di vê mijarê de ya min kirî û ez nikarim xwe efû bikim ew e; çivîkên ku min ew digirtin, bê rehm serê wan hildiqetand. Ji bo ez tehlûkeya mezin a di bin têgihiştina obje-sûbje de bibînim ti vegotinê bi qasî van bûyeran bandor li min nekir. Tercîha min a ji bo ekolojiyê bi dildarî û gunehê min ê zarokatiyê ve yê ez lê mikur hatim, ji nêz ve têkildar e. Ev tehlûkeya ruhî ya mezin ji çanda nêçîrê maye û hunerê ‘zilamê fermandar û mêtingerê bi hêz e.’ Ji bo min karîbûya ev tehlûke ji holê rakira, diviyabû min maskeya şer û îqtîdarê (xwedayên bi maske û bê maske, qralên tazî û li pişperdeyê) ya nêçîrvan derxista, naxwe min nikarîbû qîma xwe bianiya. Em heta zimanê nebat û heywanan fêhm nekin, em ne dikarin xwe fêhm bikin, ne jî em dikarin bibin civakeke ekolojîk. Bîranînên heywan û nebatên pêsîra min ber nedidan, min ê bi vî awayî maneyek bidaya wan.

Divê ez li xwe mikur bêm ku demekê ez jî bi nexweşiya modernîteyê ketim, dê û bav jî di navê de min xwest ez ji her tiştê van erdan birevim. Ez gelek caran li xwe mikur têm ku di jiyanê de yek ji mijara ez zêde pê xapiyam ev bû. Lê ez dizanim, ez ti carî bi tevahî ji çavdêriya Bradway qut nebûm; ez zarokê qûntara wan çiyan, min serê çiyan jî weke textê xweda û xwedawendan, qûntara çiyan jî weke hin goşeyên cenneta wan afirandî dît û timî xwest lê bigerim. Ez hîn zarok bûm navê ‘dînê çiyê’ li min kiribûn. Ez paşê hînbûm ku ev jiyan hînê zêde ya xweda Dionysos e. Li pêş û paşiya wî koma keçikên hunerkar û azad a bi navê Bakha, Dionysos[1] geriyaye. Bi hev re xwarine, vexwarine û kêf kirine. Min ji vê jiyana xwedayî hez kiribû. Fîlozof Nietzsche jî ev xweda tercîhî Zeus kiribû. Ji vê jî wêdetir li bin gelek gotinên xwe ‘şagirtê Dionysos’ nivîsandiye. Wexta ez li gund bûm, herçiqas bi dîn re li hev nedikir jî ji lîstikên

keçikan ên nîşanê û wekî din wêdetir, min hez dikir ez bi wan re bilîzim. Li gorî min a bi awayekî xwezayî diviyabû bibûya jî wisa bû. Ez ti carî razî nebûm ku çanda serdest jinê bigire û piştperde bike. Min qanûna bi navê namûsê ti carî nas nekir. Ez hînê jî ji guftûgokirin, lîstik û parvekirina muqedesatên din hemûyan a azad û bê sînor bi jinê re dibêjim 'erê', lê li ser navê çi dibe bila bibe, sedema wan çi dibe bila bibe, ez ji her girêdan û koletiya bêhna milkiyetê jê bê û li ser hîmê hêzê re, heta dawiyê dibêjim 'na'.

Li deşta hema ji qûntarê çiyê dest pê dikir, ji destpêka biharê heta dawiya payîzê ji bo rakirina bênderê dixebitîn. Ji lewra diçinîn, didêran û dexl radikirin. Her cara ku ev hemû yê li gundikê bavê min tên bîra min, hiseke ku ti roman bi min re çênake, min digire. Ez gelek zêde xeman dixwim; çima min ew rêwiyên xwedê tam fêhm nekirin û bi wan re nebûm heval? Ya rastî bi tevahî têkiliyên min di nava hevaltiyê de bûn. Lê ji rûyê têkiliyên xeternak ên modernîteyê, min nikarîbû şîna bavê xwe jî bigirim, ji lewra ez hînê jî nikarim xwe efû bikim. Bavê min belkî ji bavan evdê xwedê yê herî belengaz bû, belê saf û pak bû. Lê li gorî min bavên cotkar dîsa jî yên herî hêja ne.

Reva ji rastiya civakî, ji texmînan jî wêdetir zehmet e. Bi taybetî, eger mirov bi nijad û kokê, bi civakê ve girêdayî be, ev rastî hê wisa ye. Pêşbirka pêvajoya civakîbûnê bi dayikê re, li derdora heft salî dest pê kir û bi gotina gelêrî heta heftê salî wer diçe. Bi awayekî ilmî û zanistî jî hatiye tespîtkirin ku dayik hêza bingehîn a civakîbûnê ye. Gunehê min bi xwe yê yekemîn ew bû ku min ev mafê dayikî bi guman dît û min pir di temenekî piçûk de biryara civakîbûna xwe da. Li gorî tespîtên dawî yên ilmî, di gerdûna me ya bîst mîlyar salî de civaka mirov bi awayekî taybet afirandiye, minê curet û cesaret bikira bê efendî û dayik bijiyama û ev mijareke bi serê xwe hêjayî lêkolînê ye. Eger min guh bida hişyariyên diya xwe û hewldanên wê yên fetisandinê li ber çav bigirta belkî rê li serhatiyên min ên trajîk venebûna. Lê belê dayika min, semboleke dawî ya bermahiya xwedawendên hezar salan bû ku hem diqediya û hem jî bermahiyeke neçar bû. Ez bi wê zaroktiya xwe hem ji vê sembolê netirsiyam û hem jî min hewceyî bi hezkirina wê nedît ji bo ez xwe azad his bikim. Lê min dizanîbû şertê jiyana min bi parastina namûs û şerefa wê dibe, min ev yek jî ti car ji bîr nekir. Minê şerefa wê biparasta, lê bi awayekî min çawa rast dizanîbû. Piştî ku min ev ders ji xwe re derxist, êdî dayika min ji bo min tinebû. Ew bermahiya xwedawendan li bala min nebû û min hîç meraq nedikir ji bo min çi his dike. Veqetîneke zalimane bû, lê rastiyek bû. Ez nizanim kehanetên wê bûn yan jî nifirên wê bûn, gotinên wê di kêliyên giran ên trajîk de timî bi bîr dihatin. Gotinên wê rastiyên mezin bûn, hozanekî hêja jî nikarîbû tespîtên wer bikirana. Rastiyek wê ya mezin jî ev bû; `Tu bi hevalên xwe pir ewle yî, lê tê tenê bimînî.` Lê rastiya min jî hebû, minê bi hevalên xwe re civakîbûn ava bikira.

Çîroka min a jiyanê bi vî awayî dest pê dike. Eger diya min bixwesta jî jiyaneke wê ya bida min nebû. Ji mêj ve hatibû belavkirin. Ew li qulpek an jî misteke jiyanê digeriya, bi xwe ji dest revandibû, lê ji bo bide min dixwest

Ez gelên li rêzeçiyayên ji Amanosan heta Zagrosan jiyan û hînê dijîn, wan weke rêwiyên pîroz ên xweda û xwedawendên li serê çiyan li textê xwe rûniştî dibînim. Li gorî modernîteyê gelên ez behsa wan dikim paşvemayî ne, lê ji sedî sed ez bawer dikim ku berevajiyê vê rast e. Li gorî baweriya min, pêşketîbûn-paşketîbûn hukmên îdeolojîk in. Ji lewra mirov çiqasî zêhniyeta modernîteya kapîtalîst a paşverû û dijminê mirovatiyê ji hev derxe; mirov pê dadikeve hîmê rastî yê mirovatiyê û pê li azadiya mezin vedigere. Kengî mirov ji cehennema modernîteyê ya ji KARÊ, ÎNDUSTRIYALÎZM û DEWLETA NETEWE pêk tê, rizgar bû her tişt wê baştir were fêhmkirin û wê rê li ber dewlemendiya jiyanê veke.

Bi vê ravekirinê dixwazim vê bibêjim: şêweyê jiyana kapîtalîst li gorî min nîne. Ez nikarim nebêjim ku hin caran dilê xwe nabijînimê. Lê der barê şêweyê vê jiyanê de bi temamî haya min ji min heye ku şensê min ê serketinê tineye. Haya min ji min heye ku ez nikarim bibim ew 'zir mêrekî' berê hatiye qebûlkirin. Mirov dikare bibêje; li gorî sîstemê rewşa ez têde me, rewşeke welê ye, dikarin pê bikenin. Lê ez sîstemê xeternak, xwînrij, zordest û mêtinkar dibînim. Di hebûna van diyardeyan de jiyan bi temamî krêt e, dilê mirov dixelîne û di jiyana min a fîlozofîk de ev parametreyên min ên dijber an jî paradîgma ye. Ez ê xwe qet mezin nîşan nedim. Lê weke mirovekî mafê xweparastinê, hem weke nîşaneya bingehîn a hebûna jiyanê ye, hem jî li hemberî kesên îdîaya wan a jiyana civakî heye, wezîfeya min a bingehîn a exlaqî ye. Ez welatîbûna desthilatdarî sînorê wê destnîşan dikin manedar nabînim, lê eger em ê behsa welatîbûneke divê mirov ciddî bibîne bikin, weke hewcedariya exlaqê ez behsa wî dikim, ez ê li hemberî wê jî xwe wezîfedar bibînim. Pirsgirêk jiyîn an jî nejiyîn nîne, ya girîng divê mirov zanibe rast bijî; her çiqas em nikaribin rast bijîn jî ya gi-rîngtir ew e ku em ji gera li wê negerin, rêwiyên rêya wê bin.

## JINA FERZANE A CIVAKA XWEZAYÎ

### Civakbûyîn Sedema Hebûna Keriyên Mirovane

Şertê hebûna cinsê mirov civat e. Ji cinsê prîmat (famîlya herî nêzîkî mirov) yê beriya xwe veqetiyaye û bi civatê bûye mirov. Ev tespît a herî nêzî rastiyê ye, ji aliyê Ilmê Civakî ve tê qebûlkirin. Ferdê bi tenê û jiyana bi civat, çiqas ji hev bêne kirin bila bêne kirin, bi teorîk îspat a wê zehmet e. Ji ber ku ferdê bi serê xwe nîne. Dibe ku ferdê civaka wî hilweşiyayî hebe, lê hîç nebe ew ferd bi bîranînên civaka xwe ya hilweşiyayî li ser piyan dimîne. Ew bi wan bîranînan jî ji bo kêliyekê dibe civakî. Cinsê mirov, bi temamî hêza xwe bi asta têkiliya xwe ya bi civatê re bi dest dixe. Hejar û

qelsxistina ferd, şêwazê herî hov ê kolekirinê, tenê hiştin, tecrîd û îzolekirinê ye. Keriyên koleyan, gundiyên serf, karkerên li bajaran dîsa jî civat in. Car caran îsyan dikin û hebûna xwe bi bîr dixînin. Li aliyekî din, tenêtî dijwar hîn dike. Di dîrokê de pêvajoya sulûk û înzîwayê ya hemû zana û peyxemberên navdar vê rastiyê nîşan didin.

Meqseda min ji civaka xweza ev e; cins û cureyê mirov piştî ku ji prîmatan qut bû, komên mirovan sîstemek meşandin heta civaka hiyarerşîk. Pêvajoya piştî prîmatan dest pê dike û heta civaka hiyarerşîk dewam dike, civaka xwezayî ye. Ev sîstem a komên mirov e. Bi gelemperî ev komên mirovan ên ji 20-30 kesî wek klan têne bi navkirin û bi sedema alav û amûrên ji keviran bi kar anîne jî wek serdema mirovatiyê ya Paleolotîk û Neolotîk jî tê bi navkirin. Ev komên mirovan di xwezayê de nêçîrê dikin, gîha û pincaran berhev dikin û çi hazir dibînin xwe pê xwedî dikin. Bi gotineke din, debara xwe bi hebûnên amade yên xwezayê dikin. Hinekî mîna cinsên heywanan ên dişibin wan xwe xwedî dikin. Lewra em nikarin behsa pirsgirêkeke civakî bikin. Klana me, wê timî lêkolîn bike; dema bibîne wê yan berhev bike, yan jî nêçîrê bike. Her ku alet û amûran vedibîne, agir keşif dike, berhemên wan zêde dibe û wek cins pêş dikeve û bi lez ji prîmatan dûr dikeve. Rêzik û pîvanên beridandin û tekamulê pêşketinê diyar dike.

Li gorî lêkolînan, li derdora sedûpêncî-dused hezar salan berê cinsê sapîens nêzî zimanê sembolan bûye. Heman lêkolîn nîşan didin ku li şûna zimanê îşaretan cara pêşî dayika zimanên modern, zimanê dengan ê xwe gihandiye dengên sembol jî li gorî texmînan berî pêncî hezar salan li ser heman xeta Rîfê di bakur re li dinyayê belav bûye. Lihevkirina bi zimanê sembolan avantajeke mezin e. Mirov dikare bifikire ku komên baş li hev dikin û tevdigerin serdest bûne. Dibe ku sedema bi lez qirbûna cinsên din girêdayî vê rewşê be. Dem di heman demê de serdema Qeşayê ya Çaremîn e (pleîstosen). Yek ji texmînan dîsa ew e ku di wê demê de cinsê Neanderthal zêdetir e, lê herdu bûyer li hev rast tên û dibe ku dawî li cinsê Neanderthaler tîne. Efendiyê nû yê dinyayê bi tevahiya heybeta xwe li ser dikê ye: Homo Sapiens, Sapiens = mirovê difikire û dipeyive. Em di destpêkê de cihêbûna nijad û ziman nabînin. Lê em dikarin texmîn bikin ku weke komên mezin tevgeriyane, bi plan nêçîr kirine, şikeft weke mal û perestgeh bi kar anîne, jinan pel û pincar berhevkirine û mêr jî di nêçîrê de pispor bûne. Li gorî hin berhemên arkeolojîk îspat dikin ku cinsê dipeyive li ser hîmê me behskirî têra xwe pêş dikeve. Xet û resmên li herêma navbera Franse û Spanyayê, û resmên li şikeftên Colemergê hatine dîtin ji vê demê mane. Herdu herêm jî ji bo koçberiyên ji Efrîkayê li cihekî baş in. Ev qad li cihekî wisa ne, xwe gihandina wan di ser Rojhilat û Rojavayê Derya Spî re mumkîn e.

Qada sereke Mezopotamya Jor e. Civak gelek amûrên hilbe-randinê û vedîtinên nû peyda dike. Bi awayekî mirov dikare bibê-je dema neolîtîkê di dema xwe ya îndustriyê de ye. Di nava vê çandê de jin-dayik derdikeve mertebeya dayik-xwedawendê. Bi îhtî-maleke mezin rola wê ya di avakirina civaka nû de diyarker e. Nîzama dayikê pirr baş mohra xwe li civaka klan dide. Nako-kiya wê bi zilam re hino hino destpê dike. Zimanê sembolan tê bikaranîn. Komên çermreş ên bi navê Semîtîk ji başûr di ser xeta sereke re êdî weke berê bi hêsanî nikarin koçî Asya û Ewrûpayê bikin. Heye ku di pêkhatina çanda Semîtîk de vê sedemê bandoreke girîng kiribe. Komên em dikarin ji wan re çermsor û çermzer bibêjin ji bakur nikarin bi hêsanî derbasî herêmê bibin. Milek texmînî di salên 12000-7000 B.Z. di tengava Beringeyê re derbasî parzemîna Emerîkayê bûye, yên din jî zêdetir li Çîn, Asya Navîn û Rojhilatê Ewrûpayê kom dibin. Koma Hind-Ewrûpî ya çermspî ku li qada navîn e, ji ber şert û mercên bahewa û xwe-dîkirinê bi rola hegemonîk a sereke radibe. Nexasim koma li Ke-vana Bi Bereket komeke hegemon e. Demeke dirêj heta qonaxa şaristaniyê wê vî. sifetê xwe biparêze.

Mirovê civaka xwezayî klanê ku endamê wê ye, herî kêm wek hemû endamên din ên klanê bi pîvana parastin û hebandinê ya “bêyî wê nabe” girêdayî ye. Her endamê klan û qebîleyê ji yê din jiyaneke cihê û payeberz nafikire. Jiyaneke li derveyî klanê jî nafikire. Dikare nêçîrê bike û heta dikare mirovxuriyê bike. Lê ev hemû ji bo klan û qebîleyê tên kirin. Pîvana di nav klanê de “yan hemû yan hîç” e. Agahiyên derbarê civakê de hemû van taybetiyên klanan destnîşan dikin. Hebûn û şexsiyetek in. Hukum û şexsiyeta ferdan li derveyî klanê nayê fikirîn. Girîngiya klanê di bingehê destpêk û bûyîna şêwaza mirov de heye. Civakeke ku tê de çîn, hîyarerşî, mêtingerî û serhevrebûn nîne. Bi mîlyonan sal meşiyaye. Ji vê mirov dikare encameke wiha derbixe; cinsê mirov wek civak têkiliyên xwe demeke dirêj bêyî serdestiyê bi pîvana piştgiriyê rê ve biriye. Xwezayê wek “dayikek” di himbêza wê de mezin bûye, di mejiyê xwe de bi cih dike. Di nav xwe û xwezay ê de tevdebûn pîvaneke bingehîn e.

Klan, Yekîtiya Li Derdora Jin, Jina Dayîk Kombûye ye.

Ev nîzam ku wek dînê totem jî tê nirxandin pîrozbûna destpêkê û sîstema tabûyan ava dike. Klan xwe bi sembola totem pîroz dike. Bi vê rê, cara pêşîn têgîna exlaq jî dikeve jiyana mirov. Pir baş serwext e, eger koma klanê nebe jiyan dewam nake, wê demê hebûnên civakî pîroz in, divê wek nirxên mezin bêne sembolîzekirin û stû ji wan re were xwarkirin. Baweriya dînî jî hêza xwe ji vê çavkaniyê werdigire. Bi vî awayî dîn dibe yekemîn forma têgihîştina

civakî. Ew û exlaq hevdu temam dikin. Ji zanebûn û têgihîştinê ber bi baweriyeke hişk ve diçe. Têgihîştina civakê êdî bi forma dîn dimeşe. Dîn bi vê taybetiya xwe, dibe hafiza bingehîn a civakê, çavkaniya exlaq û kevneşopiyeke bi bingeh. Civaka klanê, bi pratîka xwe çendîn zanebûn û têgihîştinê pêş de dibe vê yekê hemû bi totem yanî bi qabîliyeta xwe ve girê dide. Wek sembol totem û di rastiyê de jî koma mirovan her diçe serketinê bi dest dixîne û pê re pîrozkirina serketinan tê . Pîrozbûna bi hêza civakê pêk hatiye zêdetir xwe eşkere bi sêhr û efsûnkariyê nîşan dide. Asta têgihîştinê dikare xwe bi efsûnkariyê bixe pratîkê. Sihirbazî jî dayika zanistê ye. Jin bi sedema timî li xwezayê temaşe dike, zayînê nas dike, jiyanê dibîne û ev yek wê dike zana û hozana civakê. Ji ber vê rastiyê ye, sihirbaz û efsûnkar bi piranî jin in. Bi sedema xebat û tevgera xwe di civaka xweza de çi diqewime, çi dibe, herî baş jin fêm dike. Ji vê serdemê, li ser hemû berhemên hatine verotin û niqirandin şopên jinan hene. Klan yekîtiyek e, li dora jina dayik pêk tê. Zarokanîna jinê, nertina wê li zarokan û bi sedema nebatan baş berhev dike, ew dikare baş xwedî jî bike. Zarok tenê dayikê nas dike, hînê mêr wek milk li ser jinê xwediyê tesîrekê nîne. Nedihat zanîn jin ji kîjan mêrî ducanî dibe, lê dihat zanîn zarok ji kîjan jinê dibe. Ev mecbûriyeta xwezayî, hêza civakîbûna xwe dispêre jinê jî nîşan dide. Peyvên di vê serdemê de bûne têgîn bi piranî mê ne, û ev jî vê rastiyê îspat dikin. Di vê serdemê de şervanî û serdestiya mêr, paşê bi nêçîra heywanên xurt derdikeve pêş. Mêr bi taybetiyên xwe yên bedenî û fizîkî diçe dûr nêçîrê û neçar dimîne klanê ji xeteran biparêze. Ev rolên mêr ên diyarker nînin, sedemên tepisok mayîna wî jî rave dikin. Di nav klanê de têkiliyên taybet hê pêş neketine. Berhevkirina nebatan û nêçîr a her kesî ye. Zarok ên hemû qebîlê ne. Ne mêr û ne jî jin hê taybet nebûne. Ji ber van taybetiyên bingehîn ji civakê re tê gotin civaka seretayî ya komînî.

Civakbûna ku em jê re dibêjin klan, bê guman ne pêkhateyek sekîniye. Pêşketina cûdabûna celeb,

Civakbûna ku em jê re dibêjin klan, bê guman ne pêkhateyek sekîniye. Pêşketina cûdabûna celeb, pêşketina civaka klan e. Pirskirêka wî ya bingehîn hebûna xwe berdewam kirine. Bi giştî jî pirskirêka civakekî jî (civaka bi hezaran komên civakê(civaka bi hezaran koman)despêkê li ser lingan mayîn, hebûna xwe berdewam kirine. Li hember hênzên ku dixwazin wan ji civakbûnê derbixînin hebûna xwe parastine. Li her derê û her demê ev pirskirêka civakan hene. Ev xwe parastin hîn caran ji bo xwe li hember xeteriyan û rîska bipatêze bi teşeya xwe parastina cewherî hebûna xwe diparêze û xwe di armanca xwe de asê dibe. Hîn caran sîmbiyotîkê kêrhatî, dibin hebûn û navendên ku firsetê dide pêşketinên pêşberî hev. Di wê dem û cih de, pêşketina pozîtîf xiz qezenç dike. Li wir di celep, klan an jî civakê de, di aliyên maddî û manevî de dewlemendî tê jiyan kirin. Heke ku em têgînên sosyolojîk ên demên dawiyê ku wek ``ez û yê din`` bi lefandî vebêjin, têgîna ez wê li hember, têgîna ``yên din`` ku ji bo wî xeterî û rîsk îrade dike, derbasî parastina cewherî dibe. An wê ``yê din`` bin bixe û pêşketina wî berdewam bike, an jî wê bi pêre di rewşa dengeyê de bimîne. Wê hebûna xwe biparêze lê, pêşketinê wê hêdî bibe, an jî wê bi binkeftinê re rûb rû bimîne, li gorî asta binkeftinê hebûna wî bi kismî an jî temamî wê xilas bibe. Wê demê wek hebûnek ji xwe derketiye wê bimîne. Wê bibe nesneya hebûnek din. An jî wê were asîmîlekirin û wek yekî din jiyana xwe berdewam bike. Kategoriyên ku jê re dibêjin şewş an jî ji rêderketî wê pêk werin.

Bêtir somût, têkoşîna civakê ya ji bo hebûna xwe biparêze wê hê di astên sivik de ji aliyekî de ji bo ku nebe nêçîra lawirên dirinde, ji aliyê din de jî ji bo ku xwe li hember şertên xwezayê, cihên zadê wî kêm û ji nexweşiya piparêzin her tim wê di nav têkoşînekî de bin. Xetefî ji bo hebûnê gef e, şertên kêrhatî jî di milê erenî de pêş dixîne. Ev serûvena ku kismê wî yê zêde li Efrîkûqa, ev nêzîkê milyon saleke jî li Avrûpa û Asyayê derbasbûye, gelê xwe yê bingehîn bi sînor be jî ronî kiriye, yên naşibin hev, hê şêwazê axaftinê yê zimanê işareta pêşnexistiye, ev civaka ku hê hijmara wî negihîştiye sedî, bi giranî ji ber taybetmendiyên biyolojîk lê zêdetir ji ber pratîka wê ya civakî li devdora dayîkê kom dibe ê pêk tê. Avahiya zimanê yekemîn bi şêwazê jinê ji vî rast derdixîne. Pêwîste karekterê civakê ya dayîkî nedîtî ve ney. Dayîkê wek şef an jî wek otorîteyekî dîtin zêdetir, bi ceribandinên xwe yê jiyanî, xwedîkirina zarokan, wek hêzek xwezayî ya ``îdarî`` dîtin girîng e. Di cihên yekemîn dişibin avahiya de seknawê ya navend û balkêşandina wê zêdetir dibe.

Têgîna bavtiyê gelekî paşê weke têkiliyeke civakî derdikeve holê, lê civak di qonaxên dûrûdirêj de vê têgînê nas nake. Saziya mîrasê, piştî pêşketina nîzama milkiyetê girêdayî sîstema bavik-tiyê pêş dikeve. Aîdiyeta zarokan û xalên wan, ango birayê dayikê ji wan têgînan e ku zû derketine holê. Berhevkirina pel û pinca-ran û bi sînor be jî nêçîrvanî ji şêweyên tedarik û debara maddî ne. Endambûna klanê ji bo misogerkirina jiyanê gelekî girîng e. Bi îhtîmaleke mezin kesek li derveyî civaka klan bihata hiştin an jî bi tenê bimana wê di dawiyê de bimira. Ya rast ew e ku mirov klanê weke sîsik an jî kakilekî tekûz ê civakê bibîne. Şêweyê herî resen ê civakê ye.

Di perga-la dayikê ya komin a destpêkê de hîmê çanda ekonomiyê tê da-nîn. Qût û zadê bi pincar berhevkirinê û nêçîrê têne bidestxistin yekser têne bikaranîn û ji çerm û rehikên wan sûd tê wergirtin. Bi giranî jin-dayik otorîteya plansaziyê ya klanê ye. Bi awayekî mirov dikare jêre bibêje hegemona dayik a pêşî ye. Nakokî û têkiliya dayika civaka klanê di nava şert û mercên xwezayê de ji kesên bibin sedema rîskê xwe diparêze, ji kesên derfetê kêrhatin û

xwedîkirinê didin sûd werdigire. Di van şert û mercan de nas-nameya klanê ji bo kesan man û nemane. Têgîna zilam-pîrektiyê çênebûye. Diya dizê tê naskirin, lê partner, ango mêrê pêre têkel dibe, bi qasî neyê naskirin pirnisî û bintûte ye. Civaka mirov heta niha ji sedî 98.5 jiyana xwe bi vî awayî dewam kiriye. Şêweyê herî demdirêj ê civakê ye. Ji ber ku di vê dem û dewranê de kevir têne verotin û niqirandin, û weke amûran têne bi karanîn, ji vê dewranê re dema verotina kevir (the Paleolithic Age) jî tê gotin. Ji aliyê sosyolojîk ve jêre 'pergala komin a detstpêkê' tê gotin. Zimanê îşaretan tê bi karanîn. Li keviyên gol û çeman, li şikeft û holikên li ser qazoxan hatine çêkirin dihewin. Tê texmînkirin ku bi qasî du mîlyon salan bi tenê li Efrîkayê, ji mîlyonek salê û vir ve jî li parzemîna Asya û Ewrûpayê bi vî awa-yî jiyane. Têgîna welat, sînor û milk hînê çênebûye. Aîdiyet li gorî klanê ye. Ji ber ku klan jî sembol e, bi objeyek an jî totemekê nayê temsîlkirin. Herçiqas di nava xwe de hin qonaxan bibihure û asta wan a pêşketinê kêm zêde hebe jî mirovatî bi vî şêweyê pergalê gav diavêje dawiya dema qeşayê ya çaremîn.

Wek encam em dikarin bibêjin; forma klanê û awayê wê; zemînê pêşketina têgînên bawerî û zanebûna bingehîn in, di heman demê de bîr û hafiza seretayî û derketina civakê ye. Di klan û qebîleyê de civakeke têkûz a xwe spartiye hêza jinê û hawîrdora xwezayî heye. Mirovatî hebûna xwe bêyî mêtingerî û zordestiyê, bi piştgiriya hevdu dimeşîne. Bi gotineke din mirovatî ji van nirxên bingehîn pêk tê. Ev tecrubeyên civakî yên bi mîlyonan sal ajotine ji dest neçûne, jixwe fikirandineke berovajî tewş û beradayî ye. Di xwezayê de weke ku ti tişt wenda nabe, di şêwazê hebûna civakê de ev rastî hêza xwe hê zêdetir dewam dike.

Civakbûyîna Ku Bi Dayîka Xwedavend Re Hatiye Pîrozkirin

Nêzî bîst hezar sal berê di dema çaremîn a qeşayê de bi helîna qeşayan re di sîstema Toros-Zagrosan de bi şêweyên xwe yên herî muteşem civakên mezolîtîk (ji niha ve nêzî 15000-12000 dema navberê ya berê) û neolîtîk (ji 12000 hezar salî heta îro) ji civaka klan gelekî pêşketîtir bûn. Amûrên di destên wan de û nîzamên wan cihûwaran pêşketîtir bûn. Jixwe şoreşa pêşî ya gund û cotkariyê di vê pêvajoyê de pêk hatibû. Sîstema Toros-Zagrosê tevî ku sereke ye, li gelek mekanên Afro-Asyayê komên mirovan dest bi pêkhatinên bi heman rengî yên civakî dikin (Li gorî şîroveya min, ev pêşketin bi belavbûna civaka neolîtîk a Toros-Zagrosan pêk hatiye). Di dîroka xwezaya civakî de serdemeke muhteşem e, ev dem. Ji pêkhatina şêweyên zimanên sembolîk ên sereke yên heta niha têne bi karanîn heta bi şoreşa gund (bi zanîn tov danîn û çinîna wan, kedîkirina heywanan), ji pêkhatina gundan heta bi koka bazirganiyê, ji malbata dayikê heta bi rêxistiniya qebîle û eşîrê gelek pêşketin li vê qonaxa dîrokî rast tên. Di dîrokê de ev dem weke Serdema Nû ya Kevir tê binavirin û ev jî îşaret bi amûrên kevir ên pêşketî dike. Gavavêtina mejiyê mirov jî muhteşem e. Bi tevahî alav û amûrên mohra xwe heta li îro dixin bingehê wan hema hema hatine vedîtin. Duyemîn dema dirêj a dîrokê ye. Ji sedî du yê mayî yekê wê yê vê demê ye. Civak dîsa jî bi awayekî bingehîn exlaqî û polîtîk e. Hê dewlet û huqûq li naverastê tinene. Desthilatdarî nayê naskirin. Dayik pîroz tê dîtin, forma xwedawenda jin tê bilindkirin. Gav hatiye avêtin dema qebr û perestgehên pîroz. Ewqasî dîrokî dijiyan bi miriyên xwe re li heman mekanî di nav hev de diman. Bermahiyên dîrokî vê rastiyê mîna bixin çavên me radiwestin. Em bi yên hov re ne, bi mirovên rastî û heqîqî re rûbirû ne.

Di civaka neolîtîk de di devdorê jina diyîk de pirgaleke komunal hatiye avakirin. Ev pergala civakî ku dikarin jêre bîjin sosyalîzma hov jî, bi hezaran sal hatiye jiyan kirin. Mirovahiyê esas mayegirtina xwe di vê pergalê de girtiye û her tim xwestiye wek cendetek ku xeyalên xwe yên wekhevî û azadiyê xwedî kiriye bi lêv bike.

Di civaka neolotîk de ew qas giraniya jinê heye, mêr wek ku hatiye heşibandin. Çawa ku wek îro jin di civakê de wek hêza esasî hatiye winda kirin. Jin vê hêza xwe di xwedîkirina nebatan de, gedîkirina lawiran de, avakirina malan, di hêrandinê de, di anîna zarokan de û mezinkirina wan de digire. Ev bi hêzbêna awerte ewqas di avabêna fikrîde xwe daye nîşandan ku, heya îro jî di hêmanên ziman de, di mîtolojiyan de zêdebêna xwedewanda, rêzgirtina ji dayîkê re ji wê demê tê. Despêkê di zimanê Sûmeran de jî qerekterê jin hebê. Yekemîn damezrênerên bajaran xwedewendin. Hêkelên yekemîn hemê jinin. Di nav ê têgînan de yê jin zêdetirin. Navê Avrûpa û Asya jî di mîtolojiya Grekan de navê jinan e.

Civaka nû bi giranî xwe dispêre jiyana gund, têkiliyên klanê jî werdigerin têkiliyên etnîk. Şêweyên nû yên pêkhatinên maddî, eger çarçoveyên xwe yên manedartir nebin wê nemeşin û heta dest pê nekin. Ziman û zêhniyeta veguherînê bi nasnameya civaka klan a berê bi 'totemê' dewam dikir, sembola civaka neolîtîk 'xwedawend-dayik' e. Fîgurên toteman kêm dibin, fîgurên xwedawend-dayikê zêde dibin, naverastê tijî dikin. Jina dayik a rola wê mezin dibe temsîl dike. Ji aliyê dînî ve, ev qonaxeke li pêş e, bi xwe re dewlemendiyeke mezin a têgînê tîne. Di ziman de daçekên 'mêbûnê' derdikevin pêş. Di daçekên zimanê sembol de jin rewşa xwe ya sereke demeke dirêj diparêze. Em îro jî vê taybetmendiyê di gelek zimanan de dibînin. Bi xwedawend-dayikê re civak bi pîrozbûneke zêde dikemile. Civaka nû tê maneya têgîn û binavkirinên nû. Pêvajoya em jêre şoreşa zêhniyetê dibêjin, ji ber ku afirîneriyê dixwaze, divê em wê di nava sosyolojiya azadiyê de bigirin dest û li ser rawest in. Dîroknasên di karê xwe de hoste hemfikir in ku pêvajoya behsa wê tê kirin, têrûtijî pêk hatiye, qewimiye. Tê maneya; bi hezaran diyarde, bi hezaran nav û şoreşên zêhnî. Ji şoreşa zêhnî ya li Ewrûpayê berfirehtir, şoreşeke mezin a resen û hewldaneke

afirîner mewzûbehs e. Yek ji tespîtên dîrokî ye ku piraniya vedîtin û bi tevahî têgînên îro em bikar tînin di wê demê de hatine afirandin.

Yek ji dabaşeke girîng ku zanistê tespît kiriye; pêşketinên pişt re dibin ên beriya xwe jî di hundurê xwe de dihewîn in. Rast nîne ku tê gotin; dijber hevdu tine dikin û bi vî awayî pêş dikevin. Li gorî rêzika diyalektîkê tez û antî-tez di sentezê de hebûna xwe di nav dewlemendiyeke mezintir de dewam dikin. Hemû tekamul û beridandin vê rêzikê piştrast dikin.

Pêşketinên nirxên Klan, di sentezên nû de jî berdewam dike. Heya roja me ya îro jî heke ku têgînên wek wekhevî ê azadî, wek têgînên bingehênên, vî deyndarên jiyana klanin. Hê ku wekhevî û azadî wek têgîn nehatibûn bi navkirin, di jiyana klan de veşartîbû, dema ku wekhevî û azadî hatin winda kirin, ev têgînên kû di mejiyên civakê de hebûn, her ku çû xwe wek îlkeyên binghîn pozber kir. Çi qas civak li ber hiyerarşiyê û saziya dewletê ve çû, wekhevî û azadî wê van saziyan bişopîne. Di esas de ya ku dişopîne civaka klan e.

Di cihêbûna çanda neolîtîk weke çanda maddî û îdeolojîk de pirsgirêk ê nebe, lê zêdetir di pêvajoya xetimînê û li hemberî pêşketina civaka şaristaniyê de tinebûna hêza wê ya xweparastinê bi pirsgirêkan re rûbirû dibe. Lê berê pêşî hewce dibînim ku ez têgîna ‘pirsgirêkan’ a timî min di sernavên mijaran de jî bi kar aniye rave bikim. Ev têgîn li gorî maneya min bi kar aniye weha ye; çanda maddî û îdeolojîk ji aliyê civak û ferd ve êdî nabe dewam bike ango rewşeke kaotîk îfade dike. Kengî civaka nû bi awayekî manedar rengê xwe yê nû girt, ev yek nîşan dide ji rewşa bi pirsgirêk derketiye. Çanda îdeolojîk weke min gelek caran şîrove kiriye, avahî, sazî, şane û erkên wan, maneyên wan û rewşa wan a zêhnî îfade dike. Çanda maddî jî fenomen, diyarde, sazî, avahî, şane û têgînên ez hewl didim wan rave bikim, ango aliyê din ê maneyê ku beşê mirov bi destan dikare bipelîne îfade dike. Eger em bixwazin bi gerdûntiyê re bikin yek, hewl dide dualîteya diyalektîk a enerjî-maddeyê di rastiya civakî de bibîne û şîrove bike.

Di ronahiya van têgînan de, xûsûsên ku civakê ji aliyên îdeolojîk û çanda aborî de bixe xeteriyê, ber bi pevçûnê ve bibe, bi giranî taybetî di dema avabênê de pêk tê. Ehlaqê civakî destur nade vê. Malê taybet a ku di civakbûnê de qelîşteka vedike, firseta pêşketinê nabîne. Bi vî ve girêdayî, mijarek din a hevbeşbûna kar di navbera zayenda de hê mil û têkîliya zorê nas nake. Herwiha hilberîna karê hevbeş zad jî hê nebûye mikê taybet. Di van hemû mijaran de di navbera komên ku hê ji aliyên hijmar û hecîm de mezin nebûne de îdeolojî û çanda aborî ya hevbeş heye. Ji ber milkê tayber û zor wê vî pêkhateyê xirabike, wek gefek mezin tû dîtin û quralê yekemîn a ehlaqê jiyana hevbeş û pişgiriya hev kirin îlkeya ku komê li ser lingan digireye. Avahiya civaka neolîtîk a hundirin ji ber vê îlkeya xwe pir zexim tê xûyakirin. Çavkaniya wê ya ku bi hezaran salan jiyan kir jî ev rastiya wê ye.

Dema têkîliya civak û xwezayê bi civaka şaristaniyê re miqayese were kirin, em berdin berzbûna di navbera wan de, ji bo herdu civakan jî ahenga îlkeya ekolojîk bi şêwazekî bihêz berdewam dike. Nêzîkatiya zîhniyetê ya ji xwezayê re bi pîrozbûn û xwedatiyê ve dagirtiye. Xweza wek xwe zindî tê dîtin. Ji ber ku av, hewa, agir, her cûre nebatê û zadên lawiran dide wan bi xwedê re wekhev tê dîtin, ya herî rast dibe wek perçeya xweda ya herî bi hêz. Pir zêde tê xûyakirin ku sedema têgînên xweda û xwedatiyê yên herî bi hêz tên dîtin ji ber vê rastiyê ye. Jiyana kolektîf a di devdorê dayîkê û pîrozbûna girêdayî wî û wateya metafîzîka xwedatiyê em dikarin di vir de fêm bikin. zayandina dayîkê wek xwezayê, xwedî kirina wê, rihma wê, cihên wê yê mezin di jiyanê de perçeya sereke ya çanda maddî û maneviye. Em berdin zilamtiya mêr, hêja siya wî jî li ser kolektivîzma civakê tuneye. Nabe jî. Şêwazê jiyana civakê destûr nade vî. Herwiha zayenda zilam a serdest, mêrtiya wî, xwedibûna wî ya milk û wek wasfên xwedî dewlet bi giştî qerekterê civakî ne û pişt re pêş ketine. Dema ku civak tê gotin, ev tê meneya jin- dayîk, zarok û xwîşk û bira. Heke ku endamê mêrtiyê zilam be, zilam kêrhatibûna xwe bi merîfeta derveyî mêrtiya xwe, mînak, di nêçîrvanekî baş, di xwedîkirina nebat û lawiran de pêk bîne wê wek endam were pejirandin. Maf û hêstek wek bavê zarokan, mêrê jina xwe hêja wek diyardeyek civakî pêş neketiye. Em ji bîr nekin; bavtî, heta dayîktî boyîtê wê yên psîkolojîk em nebêjin qet nîne jî, lê di esas de têgîn, diyarde û ferasetên sosyolojîkin.

Di vê mijarê de mirov dikare li ser hîmê sedemên derve û hundir şîroveyan bike. Kengî zilam qelsiya xwe bihurand û bû nêçîrvanekî baş û bi kesên di xizmeta xwe de gihişt statuyeke baş, heye ku ji bo nîzama dapîrtiyê bûbe tehlûk e. Dibe ku gihandina nebat û heywanan jî rê li ber vê hêzê vekiribe. Bi giranî çavdêriyên me nîşan didin ku civaka neolîtîk ji ber sedemên derve hatiye helandin. Bêguman ev sedem, civaka dewleta pîroz a rahiban e. Çîrokên civaka şareza ya pêşî li Nîl û Mezopotamya Jêr bi giranî vê yekê piştrast dikin. Çawa ku me bi belgeyan jî got, bi çanda pêşketî ya civaka neolîtîk û tejaneya erdên bi bereket avdaniya bi teknîkeke baş, rê li ber berhemê zêde yê ji bo vê civakê hewce vekiriye. Civaka nû ya li dora berhemê zêde yê mezin bajar ava kirine, xwe bi şêweyê dewletê bi rêxistin kiriye, bi giranî bi hêza zilam xwe gihandiye pozîsyoneke gelekî cuda. Bajarbûyîna zêde bi xwe re metabûnê tîne. Ew jî bi xwe re bazirganiyê tîne. Ew jî bi şiklê koloniyan diçizire demar û rayên civaka neolîtîk û metabûna her diçe zêde dibe, nirxê guhertinê û milkiyeta belav dibe ji hevdeketina civaka neolîtîk bi lez dike. Di civaka neolîtîk de nirxê bikaranîna objeyan tê qebûlkirin. Li şûna guhertinê jî diyarîkirin heye. Di warê ji hevdeketina civaka neolîtîk de mînakên koloniyên Ûrûk, Ûr û Asûrê vê rastiyê eşkere ispat dikin.

Komên mirovan di nava zêhnê xwe de timî li objeyên maddî yên pêdiviya wan pê heye geriyane û xwestine baştir bikin; xwarin, bicihbûn, zêdebûn û parastin timî fikarên wan ên bin-gehîn bûn. Berê çi didîtin û peyda dikirin qîma xwe pê dianîn. Bi-cihbûna di şikeftan de, xwe baştir parastina li keviyên gol û da-ristanan û qedirgirtina dayika dizê jî ji ber van pêdiviyan bû. Her diçe nêçîrvanî jî dikeve dewrê. Hem xweparastin û hem jî xwe xwedîkirina bi goşt çanda nêçîrvaniyê xurt dike. Lê belê ji dest-pêka civakbûnê ve di navbera berhevkirina pincaran a jinê û nê-çîrvaniya bi giranî bi destê zilam de tengezariyek û pêşketina be-ridînên çandî yên cihê têne dîtin. Li herdu aliyan jî bûyerên yekalî ango pêşketin û paşketin hene; yek ji wan her diçe dibe 'mêrê weke şêran', ya din jî gav bi gav dikeve nav çanda 'jina weke dewaran'. Têgihiştinên cihê yên li ekonomiyê cara pêşî bi vî rengî hîmê xwe datînin. Di serdema neolîtîkê de çanda jinê derdikeve asta herî jor. Piştî dema dawî ya qeşayî ango ji 15 he-zar sal B.Z. ve, nexasim li qûntara çiyayên Toros-Zagrosan gelek cureyên nebat û heywanan, dihêle ku mirov bi hûnandina jiya-neke mîna cennetê rabin. Ji wê demê heta roja me ya îro çemê mezin ê civakbûnê diherike bi dîroka nivîskî û şaristaniyê cihê-waztir bû û mohra xwe li globalbûnê xist. Rewşa kom û malikên zimanan jî berhemên vê demê ne.

Di vê dîroka mirovahiyê de tişta ku herî girîng ji kapîtalîzmê re were gotin, çanda nêçîrvantiyê her ku çûye mêr kiriye hegoman. Bi qasî ku hatiye tespîtkirin, BZ. 10.000 an de çanda neolîtîk a ku mayînde bûye, giraniya xwe jin e. Di pêvjoya komkirinê de ji şikefta derketin û derbasî niv çadirabêyîn(nêzîkê şikefta), çandina toximê nabatan her ku wê biçe rê li ber çandin û şoreşa gund veke.

Roja me ya îro bi kolanên arkeolojîk ve ev çand di hemû Mezopotamya jorîn de, bi taybetî di kevaneyên hundirin ên sîstema Zagros- Toros de (Bradostiyan, Garzan, Amanos û etegên hundirîn ên Torosa navîn, Newala Çorîn, çanda Çemê Halan) pêşketiye. Pir kêmbe jî berhemê zêde hatine kom kirin.

Çanda qurbankirinê jî mirov dikare ji vê demê bide dest-pêkirinê. Hatina aborî ya mirovan her diçe zêde dibe. Ji ber vê yekê, weke hurmeta wan a ji nasnameya wan re şêweyê qurban-kirinê ji têgîna xwedayan re çêdibe. Bi vî awayî mirov dikare me-selê fêhm bike û bibîne. Ji ber ku bereket malavahî û spasdariyê hewce dike. Têkiliyeke xwe ya xurt bi şoreşa cotkariyê re heye. Li gorî şêweyê koma mirovan ê beridîne, xwestine xwe bi nasname bikin, xwe mezin bikin, xwestine dua bikin, îbadetê bikin û bi pêşketina cîhana zêhnî hebûnên xwe pêşkêş kirine. Berhemên arkeolojîk vê fikrê bi awayekî balkêş piştrast dikin. Hînê bi awayekî berçavtir têgîna dayika xwedawend û dayika pîroz jî weke belgeyan li pêşberî me radiwest in. Pirrbûna fîgurên jinan jî vê rastiyê têra xwe piştrast dikin.

Aborî wek têgîn nebe jî, wek cehwer dibe ku cara yekem bi vê şêwazê komkirinê ve were girêdan. Wek ku tê zanîn peyva eko-nomos di Yewnanî de tê meneya malbat û zagona xaneyê. Di devdora jinê avakirina malbatên çandinî yên naştî, di serî de pir kêm be jî xurekên ku dereng xira dibin veşartin, bi tevî derfeta embarkirinê ve abarî derdikeve. Lê ev ji bo ticcaran û sêkê ne kombêyîne, ji bo malbatê ye. Ez bawerim ya însanî û aboriya rast ev e. Berhevkirin bi çanda xelat danînê ya belavbêyî ve, ji xeteriya wek perçeyek ku çev were berdanê derdikeve. ``mal tîmah tîne`` ez bawerim ji vê demê de maye. Çanda yadîgariyê şêwazekî aboriyê a girîng e. Bi pêşketina însanan re jî pir baş li hev dike. ,

Ji çanda dayîka pîroz derbasbûyîna çanda mêrên qurnaz û bi hêz

Herema neolîtîkê ya bingehîn, tejaneya Dîcle- Firat a Navîn û jorîn li ser vî bingehî tevlî şaristaniyê bûye. Yên din ên ku gihîjtine asta neolîtîkê û yûn ku negihîştinû hemû civakên Klan, pir zêde bi êrişên komên ku li şaristaniyê hatin, bi dagirkirin, mêtînê, asîmîlasyonê ve û bi şêwazên ji holê rakirinê re rûb rû mane.

Hêza afirîner a civaka komîn dayik, li dijî vê hevgirtina sê alî têkoşîneke mezin dide. Hemû bermahiyên dîrokî nîşan didin ku ev qonax pir dijwar derbas bûye. Civaka Neolotîk ya – BZ di salên 10.000 û 4000 de – bi serdema malbat-dayikê gihîşt asta herî berz, bi hevgirtina sê alî ya Rahîb-Şef-Rûsipî ku serdema bavikanî îfade dike, li dawiyê tê hîştin. Di mîtolojiya Sumer de Înanna-Enkî, Mardûk-Tîamat vê serdema beriya dîrokê sembolîze dikin. Şîroveyeke pir asayî vê rastiyê zelal dike. Înanna dayikeke xurt a beriya dîrokê sembolîze dike, bi israr behsa 104 amûrên şaristaniyê, têgîn û rêzikên "me" xwe dike. Tîne ziman ku xweda Enkî (yekemîn bavikê muceredkirî) nirxên xweser ên xwedawendan afirandine dizîne. Beşê herî bi heyecan ê destanê ev e; Înanna ji bajarê xwe Ûrûkê diçe bajarê Enkî Erûdayê û bi hezar zehmetî "me"yên xwe direvîne. Ev têkoşîneke mezin nîşan dide. Di destana Babîlan de jî xwelihevrakişandina Mardûk-Tîamat zêdetir têkoşîna li ser otorîteyê îfade dike. Destguhertina bêrehim a dayikanî bi bavikanî, bi zimanekî mîtolojîk tê îfadekirin. Versiyona duyemîn û sêyemîn a van destanan, em di şaristaniya Misriyan de Îsîs-Osîrîs, di Grekan de Zeûs-Hera, û di Hîtît û Ûrartûyan de heman versiyonan dibînin.

Ji çanda dayika pîroz derbasbûna çanda bavan, dihêle ku mejiyê bûyeran dihûne, zirxê pîroztiyê jî li xwe bike. Mirov dikare texmîn bike ku sîstema bavikan bi vî awayî şax û rehên xwe berdane erdê û xwe girtiye. Em derketina bi heybet a zêhni-yeta bavikan li tejaneya Dîcle-Firatê bi belgeyên dîrokî jî îspat dikin. Li derdora salên 5500-4000î B.Z. li Mezopotamya Jêr der-ketiye û li tevahiya Mezopotamyayê belav bûye û em dibînin ku weke çandeke sereke

bûye xwedî rol. Berî ku em behsa vê çandê bikin, em Berî Zayînê li Mezopotamya Jêr li keviyên deştan û li qûntarên çiyan civakeke dayikan a xwe dispêre bereketa behre-man dibînin ku di tevahiya qonaxên mezolîtîk û neolîtîk de xwedî roleke sereke ye, û em vê yekê nexasim ji agahiyên arkeolojîk fêhm dikin. Em di çanda nivîskî de jî li gelek îşaretên di vî warî de rast tên. Hêmanên ziman û dîn ên xwe dispêrin dayikê gelekî pêşketine.

Li gorî çavdêriyên me li tevahiya herêmên mirov lê jiyane bûyerên bi vî rengî qewimîne. Piştre li her qadê û di her qonaxa jortir de bi êrîşên civaka şareza civaka neolîtîk a em dikarin wê weke şaneya kok a civakê bihesibînin û komên mirovan ên ji berê mane, dikevin pêvajoya ji hevdeketinê û weke bermahiyekê heta roja me ya îro hebûna xwe dewam dikin. Li gorî fikra min a şexsî, civaka beriya şaristaniyê ti carî tine nabe û nayê tinekirin. Ne ku ev civak gelekî bi hêz in, ji ber ku weke şaneyên kok hebûna civakê bêyî wan mumkîn nîne. Civaka şareza bi tenê bi civaka beriya xwe dikare hebe. Ev xusûs tiştekî wisa ye ku çawa bêyî karker kapîtalîzm nabe, ev rastî jî welê ye. Civaka şareza hebûna xwe bi civakên nîv-şareza yan jî şareza nebûyî weke diyalektîk mumkîn dike. Dibe ku hin caran hin îmha û tinekirin qewimîbin, lê bi temamî pêk nayên, ji ber ku ev bi xwezaya civakbûnê re li hev nake.

Tevî vê yekê, divê mirov çanda îdeolojîk a civaka neolîtîk a di tevahiya dîrokê de li ser piyan maye piçûk nebîne. Huqûqê dayikê, hevdugirtina civakî, xuşk û biratî, hezkirina civakî ya ji berjewendiyan dûr, rêz û hurmet, fikra qenc ango exlaq, alîkariya bêberdêl, rêz û hurmeta ji kesên civakparêz û hilberînerên nirxên rastî, dilsoziya bi cewherê têgînên pîroztî û xwedatiya xira nebûyî, hurmeta ji cîrên re, hesreta bi jiyana azad û wekhev gelek nirxên bê serûbinî sedemên bingehîn ên vê civakê ne, û di heman demê de heta jiyana civakî dewam bike wê qîmeta xwe jî her hebin. Şaristanî ji ber ku bi nirxên weke zext, mêtingerî, desteserkirin, talan, destavêtin, komkujî, bêwijdanî, bê exlaqî, qirkirin, helandin û hê bi gelek hêmanên çanda manewî û maddî yên bê kêr barkiriye, hebûna wan a di civakê de demborî ye. Ev zêdetir rengên civaka bi pirsgirêk û nexweşokî ne.

Prototîpa demokrasiyê, mirov dikare di hîyarerşiya kêrhatî ya civaka xwezayî de bibîne. Di vê komê de ku xwe naspêre hilanîn û mulkiyetê, ji bo ewlekarî û rêveberiya hevbeş jin-dayik û pîremêrê-xwedîtecrûbe, hêmanên bingehîn in, hewceyî bi wan heye û bi kêr hatine. Endamên komê bi awayekî xweza ji wan re bi hurmet in. Lê eger ev rewş were bi karanîn, li ser rêz û hurmeta tê nîşandan otorîte, bi kêrhatin bibe berjewendî, amûrê zorê yê hewceyî pê nîne, wê derkeve holê. Amûrê zorê xwe bi rêbazên hilberandina kolektîf û ewlekariya hevpar vedişêre, ev yek di cewherê hemû sîstemên zordar û mêtinger de heye. Sazî û avahiya herî bêyom a hatiye vedîtin ev e. Ev vedîtineke welê ye; paşê pêre hemû awayên koletiyê, formên dînî û mîtolojiyên xeternak, talan û qirkirinên sîstematîk, şewitandin û hilweşandinê, tên.

ŞOREŞA DIJBER

Li Hember Pergaşa Dayîka Xwedavend a `Civakbûyînê` Pergala Mêrên Deshilat Ê Ewan

Dîrok, dide nîşandan ku BZ. 4.000 an şûnve bazirganî belavbûye. Di Mezopotamya yê de yekemîn dewleta bajêr girêdayî şaristaniya li devdorê bajarê Ûrûkê pêşdikeve (BZ. 4.000-3.000). Em ji Elama di başûr rojavayê Îranê, Mezopotamya ya jorîn heya Elezîz a îro û Malatya yê koloniyên bazirganiyê dibînin. Yekemîn deriyê mêtîngeriyê bi vî awayî vedibe. Ji berê wî jî di dema BZ. 5.0000-4.000 de em dibin şahidê kolonotiya El Ûbeyt (yekemîn çanda berê dewletê ya baviksalariyê). Bazirganî û kolonî di nav hevdû de ne. Li beramberî berhemên hûnandin û dîzîka, tiştên bi giranî maden û onî dihatin neqiakirin. Bi tevî ticar ve sûk jî teşe digirt. Navendên berê yên ku tê de diyarî û qurban dihatin danîn hêdî hêdî dizvirin sûkê. Em dikarin ji ticarên ku di navbera berhemên heremên cûda de gihiştiye bihayên hov re bêjin kapîtalîstê hov. Ji ber heya wê demê tu kesî bi diyarkirina biha ve negîhîstiye ev qas komkirina mal. Lê ticar vi bi dest dixe.

Em dewletên koledar bi awayên wan ên herî saf di civaka Sumer û Misir de dibînin. Forma dewleta koledar a Sumer û Misir, di pêşketina zêhniyeta civakî, şêwazên sazîbûna aborî û sosyal de guhertinên bingehîn kirine. Cîhana zêhniyeta civaka xwezayî, xwe dispêre têgihîştina xwezeyeke zindî û ruhber. Her hebûna di xwezayê de xwedî ruh tê qebûlkirin. Ruh wek sedemên zindîbûnê dihatin zanîn. Di têgihîştina dînên totemîk de hê têgihîştina xwedayekî ji der ve hukum bike pêş neketiye. Bi nazenînî hewl tê dayîn, ji bo bi ruhên di xwezayê de yanî bi hêzên wê re li hev were kirin. Ji ber ku rewşeke berovajî maneya wê mirin e. Wexta têgihîştin ev bû, hewceyî bi lihevkirineke awarte heye. Li gorî pîvana bingehîn a ekolojiyê, em bi jiyanê re rûbirû ne. Ji bo jiyana civakî bi hêzên xwezayê re neyê dijberî hevdu, hewldaneke girîng heye. Wexta exlaq û dînê xwe pêş de dibin, prensîba bingehîn a lihevkirina bi xwezayê û hawîdorê re li ber çav digirin. Ev prensîba jiyanê, ew çend di mejî û zêhnan de bi cih dibe, wek kevneşopiyeke exlaq û dîn li ser seran tê girtin. Ya esas, ev prensîbeke herikînê ya jiyana xwezayî ye, di nav civaka mirov de bi cih bûye. Ti hebûn nikare hawîrdora xwe li ber çav negire. Ji rêderketinên demkin, bi herikînê re bi şert

û mercên der ve û hundur ên nû re tevî pêvajoyê dibin. Naxwe bi tevahî li derveyî sîstemê dimînin, hebûna xwe wenda dikin. Girîngiya prensîba ekolojiyê di civaka mirov de ji vê taybetiya bingehîn a xwezayê tê.

Li hemberî zilamê bi hêz qurbana pêşî jin e. Ji ber têkiliya xwe ya bi jiyanê re mejiyê jinê yê hisî hînê pêşketîtir e. Bi kedeke bi êşê strayî, weke diya zarokan, berpirsiyara sereke ya jiyanê ye. Bi qasî ku haya wê ji jiyanê heye dizane wê çawa dewam bike. Pel û pincaran berhev dike. Ev berhevkariya wê hem encameke mejiyê wê yê hisî ye, hem jî ji ber ku ji xwezayê hîn bûye. Dane-heva civakî demeke dirêj li dora jin-dayikê pêk hatiye û em ji aga-hiyên antropolojiyê jî dizanin ku jin-dayikê bi şiklekî, ji dewle-mendî û nirxan re rola navendê bi cih aniye. Mirov dikare texmîn bike ku dayika nirxên zêde ye. Ji lewra mirov dikare fêhm bike ku zilamê bi hêz ê bi rola nêçîrvaniyê radibe çima çav berdaye vê daneheva civakî ya jin-dayikê. Diyar e ku wexta serdest bibe wê gelek avantajan bi dest bixe. Gelek tişt hene ku dilê xwe dibijîne wan û çavbirçiyê wan e. Rewşa jinê ya weke objeyeke cinsî, bavtiya zarokan û hin tiştên din rê dide zilamê bi hêz ji bo li ser danehevên maddî û çanda manewî bi xwedî gotin be. Hêza bi nêçîrvaniyê digihîjê, firsend û keysê dide wî hiyarerşiya civakî çêke û serdest bibe. Em di van bûyer û diyardeyan de cara pêşî dikarin bibînin ku mejiyê analîtîk di bunyeya civakê de bi arman-ceke xirab û bi awayekî sîstematîk hatiye bikaranîn.

Li hemberî zilamê bi hêz qurbana pêşî jin e. Ji ber têkiliya xwe ya bi jiyanê re mejiyê jinê yê hisî hînê pêşketîtir e. Bi kedeke bi êşê strayî, weke diya zarokan, berpirsiyara sereke ya jiyanê ye. Bi qasî ku haya wê ji jiyanê heye dizane wê çawa dewam bike. Pel û pincaran berhev dike. Ev berhevkariya wê hem encameke mejiyê wê yê hisî ye, hem jî ji ber ku ji xwezayê hîn bûye. Dane-heva civakî demeke dirêj li dora jin-dayikê pêk hatiye û em ji aga-hiyên antropolojiyê jî dizanin ku jin-dayikê bi şiklekî, ji dewle-mendî û nirxan re rola navendê bi cih aniye. Mirov dikare texmîn bike ku dayika nirxên zêde ye. Ji lewra mirov dikare fêhm bike ku zilamê bi hêz ê bi rola nêçîrvaniyê radibe çima çav berdaye vê daneheva civakî ya jin-dayikê. Diyar e ku wexta serdest bibe wê gelek avantajan bi dest bixe. Gelek tişt hene ku dilê xwe dibijîne wan û çavbirçiyê wan e. Rewşa jinê ya weke objeyeke cinsî, bavtiya zarokan û hin tiştên din rê dide zilamê bi hêz ji bo li ser danehevên maddî û çanda manewî bi xwedî gotin be. Hêza bi nêçîrvaniyê digihîjê, firsend û keysê dide wî hiyarerşiya civakî çêke û serdest bibe. Em di van bûyer û diyardeyan de cara pêşî dikarin bibînin ku mejiyê analîtîk di bunyeya civakê de bi arman-ceke xirab û bi awayekî sîstematîk hatiye bikaranîn.

Pirsgirêka civakî cara pêşî bi awayekî ciddî di nava komên bavikan de yên li dora zilamê bi hêz civiyabûn derket holê. Ev destpêka koletiya jinê ye, û ji zarokan destpê kir zemînê koletiya mêr jî amade kir. Koleyên jin û mêr di serî de çiqas bibin xwediyê tecrubeya danehev a nirx û berhemê zêde, ewçend jî êdî têne kontrolkirin û serdestiya li ser wan zêde dibe. Desthilatdarî û otorîte her diçe girîng dibe. Weke beşekî xwedî îmtiyaz zilamê bi hêz + pîremêrê bi ezmûn + hevkariya şaman kulmozeke desthi-latdariyê ava dike ku kes nikare xwe li ber bigire. Di nava vê kul-mozê de mejiyê bûyeran dihûne, ji bo serdestiya zêhnî bi awaye-kî awarte vegotina mîtolojiyan pêş dixîne. Ev dinya mîtolojîk a em wê ji dîroka civaka Sumeran nas dikin, mêr dike mîna xwedê û wî weke yê erd û ezman afirandiye mezin dike. Xwedawendiya jinê û pîrozbûna wê heta mirov bêje piçûk tê xistin û weke xwediyê hêza mutleq a serwer mêr bi her kesî didin qebûlkirin û bi tevneke mezin a mîtolojîk a destanan têkiliya yê hukim dike û ya hukim lê tê kirin, yê diafirîne û ya tê afirandin, tê çêkirin. Ev dinya mîtolojîk a bi pirraniya civakê didin qebûlkirin, weke vego-tineke bingehîn bi nirx dibe û dibe dînî. Em êdî bi vî şêwazê zêh-niyetê yê di warê hûnandin û sazîbûnê de sînor nas nake rûbirû ne.

Ûrûk çandeke mirovatiyê ya ji rêzê nîne. Destpêka mûcîze-yeke nû ye. Dengê Xwedawenda Ûrûkê Înannayê hînê jî çavkani-ya tevahî destan, helbest û stranan e. Ev deng, dengê vê çanda muhteşem û bi heybet e. Dengê wê jinê ye ku zilamê krêt hînê ew ne lewitandî ye. Çanda Ûrûkê li cografya xwe kulîlk vekirin. Li pey hev bajar zêde bûn. Kêmberek ji bajaran çêbû. Zilamê bihêz û xasûk vê carê çavkaniya danehevan di derfetên bajaran de dît ku her diçû zêde dibûn. Bi awayekî berevajî çandek herikî û çû heta qûntarên çiyan. Bajar cografya neolîtîk dadiqurtîne û ev destpê-ka vê pêvajoyê ye. Dengê Înannayê her diçe kêm dibe û ev dengê jinê ye ku her diçe bê tesîr dibe. Dengê zilamê bihêz û xasûk her diçe gurr derdikeve. Di zimanê Sumerî de daçekên pêş bi karek-tera jinê ne, ango mê ne. Ev xusûs di pêkhatina ziman de rola jinê nîşan dide.

Ev pergala têkiliyên hiyarerşîk a derketiye holê, nîzama otorîter a sazî, zordestî û mêtingeriya pêşî ye. Ev nîzam, bi mejiyê mîtolojîk ê rehên wê digihîjin sîstema baviktiyê û qalibên zêhni-yeta çavkaniya xwe sîstema baviktiyê ne, bi temamî tê rewakirin. Di qonaxên curbecur de em vê pêşketinê li cem gelek komên mirovan dibînin. Her çiqas di warê şêwe, kêm û zêdebûnê de wekhev nebin jî. Mejiyê zordestî û mêtingeriyê ferz dike nabe ku hisî be. Heta ku negihîje asta analîtîk û bi dafik û xasûkiyên ji çanda nêçîrvaniyê re nebe yek, nabe zêhniyeteke rê li ber pirsgi-rêkên civakî vedike. Ev zêhniyet ji bo fonksiyona xwe ya bingehîn veşêre, neçar e ku efsaneyên sexte û qelp biafirîne

Hemin mirov dikare bibêje, mejiyê bûyeran dihûne û mejiyê hisî di nav hev de xwedî rêûresmên gelekî erênî ne, û sazîbûna xwe afirandine. Eger mirov bi tevahî cîhana zêhniyetê weke ya desthilatdariyên hiyarerşîk bibîne, rast nîne. Ji ber vê yekê ye ku bi qasî şerên eşkere, em şerên fikrê û qalibên zêhniyetê yên bê eman, di van pêvajoyan de gelekî dibînin. Gelek bûyer û diyar-deyên em ji wan re şerê îdeolojîk dibêjin, gelek şêweyên dînî, fel-sefî, etîk û hunerî yê derdikevin pêşiya me, em bi vî awayî dikarin dakevin reh û rîşên wan. Şerên em pirrî caran li cem dînan û di mîtolojiyan de dibînin, di cewherê xwe de têkoşînên polîtîk û aborî ne. Şerên desthilatdariyên siyasî û ekonomîk, heta serdema zêhniyeta kapîtalîst, timî xwe di kirasê dînî û mîtolojîk de nîşan didan. Dewlet avahiyên hiyerarşiyê yên bi sazî û mayînde bûne, temsîl dike. Temsîla ferdî ya avahiyên desthilatdariyê ya veguhe-rî sazîbûnê, têkiliya xwe bi civaka çînî re ya ku bi bajarvaniyê pêş ketiye, heye ku em di dîrokê de jêre şaristanî dibêjin.

Bi avabûna civaka dewletparêz a koledar re, ji vê pirensîbê qutbûn û ji rêderketineke ciddî bû. Têkiliyeke xurt a pirsgirêka hawîrdor û ekolojîk bi pêkhatina vê civakê û destpêka şaristaniyê re heye. Şaristaniya civaka çînî, civakek e, bi xwezayê re li hev nake. Sedema bingehîn a vê rastiyê ew e ku civaka nû, bi paradîgma û cîhana zêhnî ya koledar a bi dij-şoreşekê re eleqer e. Di civaka xweza de hemû endamên komê di tevahiya jiyanê de bi awayekî organîk cih digirin. Her kes ji dil û durust parçeyekî civakê ye. His û baweriyên wan hevpar in. Têgînên xapandin û derewê hîç pêş neketine. Weke ku bi xwezayê re bi zimanê zarokan bipeyivin. Li gorî qanûnên civakê yên kirine dîn û exlaq, hukumkirina li xwezayê û xirab bi karanîn, gunehekî herî mezin –tabû- û xirabî ye. Di civaka dewletparêz a koledar de ev têgihîştina bingehîn a exlaqî û dînî hatiye beropaşkirin. Ji bo meşrûiyeta civakî bi qasî zorê hewceyî bi derewê jî tê dîtin. Ji ber ku sîstema koledariyê bi tenê bi zorê nayê meşandin. Eger hûn civakê bi baweriyên xurt û bingehîn ve girê nedin, hûn nikarin sîstemê rê ve bibin.

Êriş Li Ser Pergaşa Civakbûyînê a Dayîka Xwedavend

Hevalbendiya Mêrên Bi Hêz, Pîr- Mêrên Xwedî Tecrûbe Û Şaman

Me di beşa derbasbûyî de hewl da ku bidin diyar kirin ji bo çi û li gor kîjan pênaseyî ji civaka hov re dikarin bêjin ``civaka xwezayî``. Rêxistinkirina civakê ya bi şêwazê klan di dem û cih de belavbûyîn, her ku çû cûrbe cûrbûyîn û hacim qezençkirin, ji ber pêwîstiya xwezaya wê ye. Di nav civaka ku li devdora dayîkê kombûye û nasnameya xwe ragedar dike de nerehetbûyîna zilam ji daneyên di dest me de hatiye pêdandin. Zarokên li devdora jinê kom dibin û zilamên ku ji ber alikariya jinê dikin bêtir li gel jinê rêzdarin, di nav yên din de rê li ber hesûdî û hêrsê vedike. Ya herî girîng jina dayîk pergala gedîkirinê pêş dixîne. Xwerin, kinc û amûrên din ji vê pergala kedî de kom dikin. Bi çavderiyê xwe ve tê rewşa jina efsûnkar û ev jî ji wê re alimtiyê dide qezenç kirin. Çiqasî bi vî pergala gedîkirî re zarok û hevaltiya mêr girê bide, ew qas dibe jina bi hêz. Çanda jinê ya ku pêşî lê nay girtin her diçe pêş dikeve. Daneyên di dest de pergala xwedewendê ya olî, hêmanên mê yên di ziman de, teraş bûn nîşaneye hêza jinê ya bilind dibeye. Kismekî mezin yên zilam xwezayî dûrê vê pergalêye. Yên ku dayîk kêrhatî û bi giranî mêrên pîr derveyî vê pergalê ne.

Di destpêkê de ev nakokiya piçûk her ku diçe mezin dibe. Bi pêşketina nêçîrê, hêza mêr a şer derdikeve pêş û bi vê re zanebûna mêr jî zêde dibe. Pîr û yextiyarên li der ve jî têne hîştin li ser vî hîmî, ber bi îdeolojiyeke serwer a mêran ve diçin. Bi taybetî dînê “şamanîzm” vê rastiyê bi awayekî balkêş nîşanî me dide. Şaman zêdetir protîpa rahîbên mêr temsîl dikin. Li dijî jinan bi awayekî sîstematîk tevdigerin û dixwazin nîzama malê pêş bixînin. Dema jin xwediyê nîzama malbatî û kedîkirinê ye, mêr nîvkovî li bin holikan dihewe. Bi şamanîzmê mêr dikare nîzamekî dijber ê malbatê ava bike. Pîremêrên bi ezmûn ên li der ve hatine hîştin û şaman li hev dikin. Ev hevgirtina her du aliyan pêşketineke girîng e. Hin xortan jî digirin nava xwe û bi serweriya îdolojîk hukum li wan dikin. Bi vî awayî di nav komê de rewşa xwe bi hêz dikin. Bi hêzbûna mêr her ku diçe bi qîmet dibe. Hem nêçîrê dike, hem jî klanê li dijî xeterên ji der ve werin diparêze. Di vî karî de taybetiyên eskerî kuştin û birîndarkirin hene. Ev destpêka çanda şer e. Dema behsa man û nemanê tê kirin, neçare her kes bi otorîte û hîyarerşiyê ve girêdayî be.

Zilamê xurt ew mêr e ku bi nêçîrvaniyê gihiştiye hêza xwe û dixwaze ji çembera jin-dayikê rizgar bibe. Hêza wî ya fizîkî û bi awayekî serketî bikaranîna wî ya teknîkê şensê wî zêde dike. Bi ciwanên ku dixwazin ji van xisletên wî sûdê bigirin bi wan re yekîtiyekê datîne û bi vê yekê re serketî dibin. Belkî jî di dîrokê de eskerên xulam ên pêşî bi vî awayî çêbûn. Zilamê nêçîrvan di dîrokê de eşkere ji jinê zêdetir serdest bûye. Hevgirtina bi kalemerên qebîleyê re, bavpîrtiyê li hemberî dapîrtiyê xurtir dike.

Xeleka dawî ya bi wan re hevgirtinê dike, yên derman didin civakê û xwediyên mûcîzeyan Şaman in. Fonsiyonên hevpar ên rahib û sêhrbaz li cemê henin. Perwerdekar e; belkî jî di civakê de pisporê pêşî ye. Hinekî bi qeşmerî be jî pisporiya şaman di nava civatê de bi sazî dibe. Şaman zêdetir mêr e. Di avakirina xanedaniyê de bi hevgirtina bi van hêzan re nîzama dapîrtiyê derbeke mezin dixwe. Em di metnên Sumeran de şopên têkoşîneke mezin di navbera wan de dibînin. Mêr di bin vî nîzamî de hem xwediyê zarokan e, bav e; hem dixwaze bibe xwediyê gelek zarokan (ji

bo hêzê bi taybet jî zarokên kur), hem jî xwe dispêre van û danehevên jin-dayikê hemûyan desteser dike. Pergala milkiyetê pêş dikeve. Li kêleka milkiyeta kollektîf a dewleta rahib, milkiyeta taybet a xanedaniyê jî çêdibe. Bavtiya ji zarokan re ji vî alî ve jî hewce dike. Ango ji bo mîrate ji zarokan re (bêtir jî mêr) bimîne mafê bavtiyê şert e.Zilamê xurt ê bi nêçîrê bûye xwediyê hêzê li dora xwe komekê bi rêxistin dike û piştî ku li vê hêza xwe hayil dibe û dide qebûlkirin, berê xwe dide nîzama malbatî ya jin-dayikê û hêdî hêdî digire bin kontrola xwe. Ev pêvajo heta damezrandina yekemîn dewletên sîte dewam dike. Em ravekirina herî şahane ya vê mijarê di dema dewlet bajarên Sumeran de dibînin. Nivîsên li ser kevalan, vê rastiyê bi awayekî balkêş û zimanekî helbestwarî tînin ziman. Destana xwedawenda bajarê Ûrûkê Înanna ku pêvajoya dewlet bajarên Sumer da destpêkirin, pir balkêş e. Ev destan pêvajoya bîranîneke pir dijwar tîne ziman. Di destanê de çanda dayikanî û bavikanî, vê pêvajoyê hê di weznekê de ne. Xwedawenda Ûrûkê Înanna diçe qesra xweda Enkî û ji wê derê 104 “me” yên xwe bi rêbazên cuda bi dest dixe û direvîne Ûrûkê. Ev beşa destanê roleke kilît ji bo îzah û ravekirinê dilîze. Mebest ji “me”yan vedîtinên bingehîn ên şaristaniyê ne. Înanna bi israr tîne ziman ku vedîtin ên xwedawend-dayikê ne û di van vedîtinan de ti rola xweda Enkî tine, bi zordarî û qurnaziyan jê dizîne. Hemû hewldana Înanna ew e, vê çanda xwedawend-dayikê ji nû ve bi dest bixe.

Li gorî texmînan ev destan BZ di salên 3000 de hatiye gotin. Di vê serdemê de hê hêza jin-dayikê bi hêza çanda bavikanî re di weznekê de ye. Ji vir û pêve, ev çand, ewqas li bêrehmiyekê rast tê, paşê xwe li navenda şaristaniya wê demê (New Yorka îro) Nîppûrê li kerxaneyek bi navê “mûsaqatîn” dît. Rahîbên Sumeran ji xwe re di zîgûratê de harem çêkirin û ji bo gel jî kerxane ava kirin. Bi destana Enûma Enîş ya BZ di salên 2000 de hatiye nivîsandin, em hîn dibin ku xwedawend Dîamat êdî pîrebokeke xeternak e û jina divê were parçe parçekirin temsîl dike. Gotinên dijwar û bêrehim ên di destanê de mehkûmiyetê îfade dikin. Pêvajoya pişt re, dînên yek xwedayî û sîstema civaka bûrjûwayê tê. Sîstema civaka bûrjûwaziyê jinê bi xemil û xêz dike, dixe qefesê û derî li ser digire. Di sîstemên civakî û dîrokî de li ser statuya jinê ewqas bombardûmaneke propagandayê ya îdeolojîk tê kirin êdî mejiyê jinê bi xwe jî ji vê yekê re dibêje çarenûs û bi cihanîna pêdiviyan jî wek hewcebûneke vê qederê dibîne. Dînên yek xwedayî vê yekê wek fermana xwedê dibînin. Felsefeya Yewnan jinê wek sedemê qelsiyê nîşan dide. Wek barekî bêkêr, wek zeviya mêr ku tê ajotin û hêjayî her cure helwestên piçûkxistinê tê dîtin.

## Kok Berdana Otorîteya Bavikanî

Di serdemên civakê yên beriya şaristaniyê de bi zora cara pêşî ji aliyê ‘zilamê xurt’ ve hat birêxistinkirin ne tenê heywan pê ketin dafik û xefikê, keda hisî ya jinê ku mirov dikare weke nûra çavan jî bi nav bike û daneheva malbat û klanê ye, heman rêxistiniyê çav berdayê, destavêtê û xist dafikê. Cara pêşî ye zor evçend ciddî tê birêxistinkirin. Bi vê zorê, jin, zarokên wê û xizmên wê yên din; bi tevahî danehevên wan ên maddî û manewî hatin desteserkirin; ev talana pêşî ya mal û aboriyê bû. Li ser vî hîmî, proto-rahib şaman, şêxê xwedî tecrûbe û ezmûn destê xwe didin rêxistiniya zorê ya zilamê xurt û bi vî awayî di dîrokê de rêveberiya pîroz a hiyerarşîk a bavikanî cara pêşî pêkhat û em qonaxên vê bi heman rengî di tevahiya pêvajoyên dîrokê de dibînin. Eşkere ye ku ev hiyerarşî di jiyana ekonomîk û civakî de heta qonaxa çînîbûn, bajarbûn û dewletbûnê bi roleke diyarker rabû.

Kesê herî bi qabîliyet, gotin û otorîteya wî jî payeberz dibe. Li dijî çanda jin-dayikê, serweriya çandeke din, dest pê dike, pêş dikeve. Ev pêşketina hiyarerşî û otorîtê beriya civaka bi çîn, di dîrokê de destpêka qonax û werçerxeke girîng e. Naverok û rengê xwe ji çanda jin-dayikê cuda ye. Di çanda jin-dayikê de bi piranî berhevkirina gîhayan û paşê zîraet, xebateke hewceyî bi şer nabîne. Lê nêçîr ku bi piranî bi destê mêran hatiye kirin, çandeke otorîter û dijwar a şer e.

Di civaka bavikanî de otorîterî û hiyarerşî esas e. Têgîna hîyarerşîk dema bi otorîteya pîroz a şaman re dibe yek, mînaka pêşîn a têgihîştina rêveberiya otorîter xwe watedar dike. Ev saziya otorîteyê wê li ser civakê mezin bibe û piştî ku çînîyatî di nav civakê de pêş dikeve, êdî dibe otorîteya dewletê. Otorîteya hiyarerşîk zêdetir şexsî ye, hê nebûye sazî, lewra bi qasî sazîbûna dewletê di nav civakê de xwediyê serdestiyê nîne. Meşa bi vê otorîteyê re nîv bi nîv li gorî dilxwaziyê ye. Girêdan û dilsozî bi berjewendiyên civakê têne destnîşankirin. Lê vê pêvajoya ku dest pê kiriye wê dewletê bizê û biwelide. Civaka Komînî ya Seretayî wê demeke dirêj li dijî vê pêvajoyê li ber xwe bide. Yên berhem di destê xwe de digirin û hiltînin, eger bi endamên komê re par ve bikin, rêz û hurmet, girêdan û dilsozî ji otorîteya wan re tê nîşandan. Berhem hilanîn wek gunehekî mezin tê dîtin. Kesê herî baş ew kes e ku berhemên xwe parve dike. Di civata qebîleyan de hê jî têgihîştina “comerdî-camêrtî” ji vê kevneşopiya xurt a dîrokê tê. Cejin û roşan wek merasîmên roja parvekirina van berhemên zêde dest pê kirine. Kom, ji destpêkê ve, hilanîna berheman wek xeterek li dijî xwe dibîne û dijderketina li vê yekê, wek têgihîştineke hîmî ya dînî û exlaqî dipejirîne. Pir zehmet nîne, mirov şopên vê kevneşopiyê bi awayekî xurt di hemû doktrînên dînî û exlaqî de bibîne. Eger hîyarerşî bikêr be û bi camêriya xwe tiştekî bide, ji aliyê civakê ve hatiye erêkirin. Hiyarerşiyeke bi vî rengî jî roleke erênî û bi kêr

lîstiye. Hiyarerşiya jin-dayikê ya bi vî rengî hê jî di nav hemû civakan de cihê rêzê û otorîteyê dibîne. Ev yek di heman demê de bingehê dîrokî yê têgîna "dayikê" ye. Ji ber ku dayik di şert û mercên herî zehmet de dizê û xwedî dike. Di vî warî de jî xwediyê rola sereke ye. Bêguman, hiyarerşî, otorîte û çanda li ser vî hîmî pêk bê, wê girêdan û dilsoziyeke mezin bibîne. Têgîna "dayikê" ji ber vê yekê, heta îro wek bingehê hebûna civakê bi hêz hatiye û wekî din îzaha vê rastiyê nîne. Weke ku yeqîn tê kirin, hurmet û rêza ji dayikê re bi sedema taybetiya wê ya zayînê nîne. Hewce ye dayik, wek rastiya civakî ya herî girîng û têgîna "dayika xwedawend" were fêmkirin. Deriyên wê li rastiya dewletê girtî ne û hemû taybetiyên ku rê nadin dewletê di himbêza xwe de dihewîne.

Di çarçoveya vê nirxandinê de wê rast be ku em civaka xwezayî, wek teza destpêka hebûna mirov bi nav bikin. Mirovatiyê bi vê tezê hebûna xwe daye destpêkirin, beriya wê jiyaneke heywanî ye. Piştî wê jî li ser hîmê dijberiyê, civaka hiyarerşîk û dewletê pêş ketiye. Jixwe karekterê antî-tez ê vê serdemê, ji paşvexistin û tepisandina civaka xwezayî tê. Wek tez civaka xwezayî; sîstemeke civakî ye, di hemû warên jiyana mirov de xwediyê roleke sereke ye, û heta dawiya serdema neolotîk (li derdora 4000 BZ) bi tesîr rol lîstiye. Bi awayekî tepisokî heta îro di hemû çaviyên civakê de hebûna xwe dewam dike. Têgînên bingehîn ên civakî jî bi xwe re tîne. Malbat, qebîle, dayik, biratî, azadî, wekhevî, hevaltî, camêrî, piştgirî, cejin, lewendî, qûtsiyet û hwd. gelek rastî û têgîn ji vê sîstema civakî mane. Li dijî vê yekê, civaka dewlet û hîyarerşîk a herî zêde ev sîstem paş xistiye, taybetiyên xwe yên zordest jî ji vê digire. Rewşa xwe ya antî-tez ji vê taybetiyê digire. Ev her du sîstemên civakî di zikhev de dimeşin, ev li gorî qanûnên bingehîn ên diyalektîkê li cih in.

Civaka xwezayî neçar nebû ber bi civaka dewlet û hîyarerşîk ve pêş bikeve, ev qanûneke rast nîne. Dibe ku meylek bi vî rengî hebe. Jixwe meyl mecbûr nîne heta dawiyê û bêrawestan biçe. Di beşê pêş de ezê car caran rave bikim ku tespîta Marksîst a wek "hebûna civaka çînî ji bo pêşketinê mecbûrî bû" li ser navê bindest û mêtingehan, yek ji şaşiyên mezin e. Bi vê tespîtê, sosyalîzm pêşin radestî serdestiya çînî tê kirin. Ji ber vê şaşiyê, marksîzm di dîroka xwe ya 150 salî de bû yedekê kapîtalîzmê. Eger dewlet, çîn û zor ji bo pêşketina civakan wek qonaxên mecbûrî bêne dîtin, wê demê berxwedana civaka xwezayî ya digihîje îro piçûk tê dîtin û heta tine tê hesibandin. Bi destê xwe dîrokê mîna xelatekê dide destê serdestan. Eger hebûna çînan wek çarenûs were qebûlkirin, bêyî hay jê hebe, dikare we bike destikê îdeologên çînên serdest. Ji vî alî ve, li ser navê bindest û mêtingehan roleke xeter dilîze. Dîrok weke ku di bin dagirkerî û êrîşên îdeolojîk û polîtîk ên bi vî awayî de hatiye hîştin.

Ya rastîn, hiyarerşiya civaka bavikanî, di şerê xwe de ku bi hêza dayikanî re kir, hêzeke mezin bi dest xist û pir eşkere mirov dikare vê yekê di civakên etnîste de jî bibîne. Piştî vê têkçûnê di forma jinê ya civakî de şikestinên mezin xuya dikin. Jina ku berê dikarîbû hilbijêre, êdî wek mal ew dihat hilbijartin. Ji wê jina mêr li dora xwe bi rêxistin dikir û ji bo otorîteya xwe ji dest dernexîne demeke dirêj li ber xwe da, jineke îradeya xwe wenda kirî, fîgurek û nasnameya jinê ya li hemberî daxwazên mêr razîbûyî zêdetir tiştek nemaye. Mînakeke din a nîşan dide ku ev pêvajo wisa hêsan derbas nebûye ev e; namzetên mêr ên qral ku bi xwedawend-dayikê re dizewicîn, di salvgera zewaca wan a pîroz de bi merasîmeke pîroz dihatin qurbankirin. Em di gelek civakan de li bîranîna van merasîman rast tên û ev semboleke nîşan dide, ji bo otorîteya xwe wenda neke, jinê çawa demeke dirêj li ber xwe daye. Merasîmên qurbankirinê bi awayekî sembolîze nîşan didin ku zilamê otorîteyê bidest dixe, çawa tê astengkirin.

Civaka hiyarerşîk di destpêkê de her çend roleke erênî lîst jî, her biçe wê yan belav bibe, yan jî bibe dewlet. Di navbera dewletê û civaka komîn a seretayî de qonaxeke derbasbûnê ye. Lê hêza xwe ji civakîbûna xwe werdigire. Ev şêwazê otorîteyê, bi sedema demeke dirêj û vekirî meşiyaye, bi taybetî di nav komên etnîk de derketiye asta herî jor. Ya esas, stû li jin, ciwan, etnîsîte û endamên din tewandî, civaka hiyarerşîk-bavikanî ye. Ya girîng jî şêwazê rêvebirina vê otorîteyê ye. Otorîte ne bi qanûnan bi exlaq tê rêvebirin. Exlaq ew hêza rêzikan e, ya ku divê civak guh bidiyê. Ev hêz bi darê zorê nayê meşandin, ji bo hebûna civakê dewam bike her kes bi dilê xwe tevlî dibe. Cudahiya wê ji dîn, di şûna pîrozbûnê de bi pêdivî û hewcebûnên dunyevî dimeşe. Bêguman dîn jî dunyevî ye, lê aliyê têgînan ên bi efsûn û herî kevinbûna wan, perdeyeke pîrozbûnê bi wan de dike. Hînê mucered e, û bi merasîman dimeşe. Karûbarê rojane û rêzikên hewceyî bi wan hene, exlaq e. Tevî ku di zikhev de ne, exlaq timî karê dunyayê sererast dike û rêve dibe. Dîn jî hewl dide bersivan ji têgihîştina bawerî û dunyayên din re bibîne. Dîn teoriya civaka seretayî ye, exlaq jî dibe pratîka wê.

Ji bo rêvebirina civakê, ev her du sazî heta qonaxa dewletbûnê qîm dikin. Em dikarin ji vê serdemê re bibêjin, serdema civak bi tore, kevneşopî û baweriyan hat rêvebirin. Di civakê de hê jî ya herî xurt ne şexsî, taybetiya komîntiyê ye. Ji bo girêdana bi komîntiyê ve, divê kes herî zêde li gorî rêzêkên komînê yên exlaqî û dînî bimeşe. Eger li gorî wê nemeşe û guh nede, ev di civakê de tê maneya alozî û arîşeyê. Ev jî ji hevbelavbûn û îmha ye. Ji lewra dîn û exlaq di vê serdemê de bawerî û kiryarên xurt in. Kesê guh nede dîn û exlaq, ew xirabiya herî mezin bi civaka heyî dike. Zehmet e civak xwe li vê yekê rabigire, neçar e bi cezayê herî giran bersivê bide. Yan diavêje derveyî civakê, yan jî digire perwerdeyeke hişk. Ya girîng ew e ku taybetiya xwe ya komîn wenda neke. Di dînan de hê jî tê dîtin, bi

cihneanîna hin rêzik û îbadetan gunehekî mezin e û ev hêza komîntiyê nîşan dide. Têkiliyên komîniyê taybetiya xwedayetiyê destnîşan dikin.

Ev pêvajoya bi nakok qonaxa bigihîjê, wek saziya otorîte û zora mayînde, dewlet e. Derketina dewletê di dîroka civakan de duyemîn qonaxa mezin e. Di hilberandin, jiyana civakî, îqtîdar û zêhniyetê de guhertinên bingehîn dike. Ji ber ku şerê bê nîzam ê qebîle û eşîran, mulkiyet û berhemên hilanî binpê dike, wek tedbîr saziya otorîteyê ya xwe dispêre hêzê tê avakirin. Ji şaman rahîb, ji rûsipî qral, ji şef jî fermandar derketiye. Di her sê rastiyan de jî kes demî, lê sazî herdem in. Bi cihbûna li ser axê ku ji gundan derbas bûye, gihîştiye qonaxa bajarbûnê. Di destpêka civaka gundan de jiyana komîn serdest e. Gund bingehê jiyana civaka Neolotîk e. BZ di navbera salên 11.000-3000 de ji bo şoreşa di warê zeviyan de cihekî pîroz e. Ji bo demeke dirêj bihevrebûna civaka komîn û civaka hiyarerşiyê jî temsîl dike. Axatî û begtî hê tineye. Malbat-dayik hê jî mîna peykerekî şerefê ye. Ji ber ku nirxên derbarê malbatê de hemû berhemên mejiyê wê ne. Bi heywanên ku kedî kirine û bi nebatên ku danine, jiyaneke mûcîzewarî ya bêhemta pêşkêş dike. Di vê serdemê de bi hezaran vedîtin û îcad, berhemên jin-dayikê ne. “Serdema vedîtinên jinê ye” ku ew mûcîdeke serdemê ye, navê wê nediyar e. Komên hiyarerşîk ên bi hêz dibin û qurnaz in, çav ber didin van vedîtin û berhemên dewlemend, desteser dikin û ji bo rewşa xwe mayînde bikin, dewletê ava dikin. Ji vê serdema gundîtiyê ya li ser hezaran tilên li qûntara Zagros-Torosê, li deştên ava Dîcle, Firat, Nîl û Pencabê av didin bajar hatin avakirin û pêre rê li ber nîzama dewletê (polîs) vebû.

Şoreşa zêhniyetê ya bi gund destpêkir û bi bajêr kûr bû, pêşî xwe di çanda baweriyê ya dînî de nîşan da. Nîzama xwedayan, bi israr hewl dide, xwe bi temamî ji nîzama mirov û xwezayê veqetîne. Sifet û rengên nû li xwedayan têne kirin ku wek temendirêjiya wan, jiyana wan a li ezmanan, carnan xwe vedikişînin binê erdê; mirovan nagirin nav xwe; kêfa wan bixwaze mirovan ceza dikin. Ev taybetî li cem xwedayên mîtolojîk ên Sumeran hê pir cureyên xwe çêdibin. Ji xwedayên ku bajaran diparêzin heta yên çem, çandinî, derya, çiya, ezman û xwedayên binerdê, panteoneke – kadroyên xweda – dewlemend pêk tê. Ev nîzama têgînan bi hêzên xwezayî re di zikhev de têne kirin û hêza çînî ya ku mezin dibe, îfade dike. Ev forma dînî û nîv-mîtolojîk ku armanca wê pîrozkirin û mayîndekirina wan hêzên ku rûyê zemîn di nav xwe de parve kirine, ji bo nîzama nû ya hatiye avakirin rewa bibe, girîng e. Formên bingehîn ên exlaqî û baweriyê yên civaka komîn hildiweşin û yên nû di şûnê de hê xurtir û mayînde têne avakirin. Ev cudabûn, herî zêde di dema derbasbûna ji nîzama dînî ya xwedawendiyê ber bi nîzama dînî ya xwedatiyê ve xwe nîşan dide. Girîngiya Înanna-Enkî, Mardûk-Tîamat jî di vir de radizê.

Hiyarerşî û çînayetî karîbûn pêş bikevin. Lê ev pêşketin ji mecbûriyetê nebû, bi destê hêzên ku dewlet û hîyarerşî ava kirîn, bi xapandin û zordariya wan hat kirin. Li dijî wan, hêzên bingehîn ên civaka xwezayî her tim li ber xwe dan, her tim hatin berbendkirin û di qad û neqebên herî teng de hatin asêkirin. Hin qad û neqeb bi temamî li wan hatin girtin. Sîstema serdest bi polîtîka û propagandayeke bingehîn karîbûye bide xuyakirin ku hemû civak ji dewlet û hîyarerşiyê pêk tê. Ev lîstika bi navê çarenûs û qederê, navnîşana wê metafizîk e. Hema hema dîn, mezheb, felsefe û ekolên ilmî yên neketibin vê lîstikê nînin. Ev yek jî koka wê diçe hezar salan berê ku îdeolojiya rahîb û qiral-xwedayan bi zora mezin a dewletê, bi propaganda û polîtîkayan li ser mejî û beden hukum kirin. Yê xwestiye ji vê lîstikê re mîtolojî, yê xwestiye felsefe û ew jî nebe jê re gotiye ekola ilmî. Encam; rewşa îro ya îdeolojiyên bûne dewlet û ilmên qaşo bêqusûr. Çiqas li ser para Marksîzmê ya di vî warî de were rawestîn li cih e.

Statuya jinê ya ku bi sîstema hiyarerşîk dest pê kir heta neyê analîzkirin û ji hev neyê derxistin, ne dewlet û ne jî civaka çînî ku xwe dispêrên sîstema hiyarerşiyê, wê werin fêmkirin. Ji lewra mirov nikare ji yek mijarên bingehîn a xwe tê de xapandiye xilas bike. Jin, ne wek cinsekê, wek mirov ji civaka xwezayî tê veqetandin û bi koletiyeke berfireh tê mehkûmkirin. Hemû koletiyên din jî bi koletiya jinê ve girêdayî pêş dikevin. Lewma heta koletiya jinê ji hev neyê derxistin û neyê fêmkirin, wê koletiyên din jî ji hev neyên derxistin û neyên fêmkirin. Heta dawî li koletiya jinê neyê anîn, wê koletiyên din jî bi dawî nebin. Jina zana ya civaka xwezayî çanda xwedawenda dayik bi hezarê salan jiyaye. Nirx û buhaya ku her tim hatiye mezinkirin çanda xwedawenda dayik e. Eger wisa be; çandeke berfireh û demdirêj a civakê çawa hat tepisandin û îro bû bilbileke bi xemil û xêz a qefesê. Mêr dikarin li ser vê bilbilê dîn bibin, lê ew dîl û êsîr e. Heta dawî li vê dîlketina demdirêj û kûr neyê, ti sîstemên civakî nikarin behsa wekhevî û azadiyê bikin. Hukmê ku dibêje; asta jinê ya wekhevî û azadiyê, asta civakê ya di vî warî de destnîşan dike, rast e. Balkêş e, hê dîroka jinê bi rêkûpêk nehatiye nivisîn. Di ti ilmên civakî de cihê jinê rast nehatiye danîn. Yê ku herî dibêje; ez ji jinê re bi hurmet im jî, vê yekê bi qasî ku bi kêra arzû û xwestekên wî were, wek hukmekî qebûl dike. Îro jî jin, ji bilî aliyê xwe yê cinsî wek dosteke mirov ji aliyê ti mêrî ve nehatiye pejirandin. Ji bo peydakirina mêrekî ji vê qonaxê derbasbûyî û yan jî afirandina mêrekî bi vî awayî, gaveke bingehîn e, bi aliyê azadiyê ve hatiye avêtin.

Statuya jinê ya ku bi sîstema hiyarerşîk dest pê kir heta neyê analîzkirin û ji hev neyê derxistin, ne dewlet û ne jî civaka çînî ku xwe dispêrên sîstema hiyarerşiyê, wê werin fêmkirin. Ji lewra mirov nikare ji yek mijarên bingehîn a xwe tê de xapandiye xilas bike. Jin, ne wek cinsekê, wek mirov ji civaka xwezayî tê veqetandin û bi koletiyeke berfireh tê mehkûmkirin. Hemû koletiyên din jî bi koletiya jinê ve girêdayî pêş dikevin. Lewma heta koletiya jinê ji

hev neyê derxistin û neyê fêmkirin, wê koletiyên din jî ji hev neyên derxistin û neyên fêmkirin. Heta dawî li koletiya jinê neyê anîn, wê koletiyên din jî bi dawî nebin. Jina zana ya civaka xwezayî çanda xwedawenda dayik bi hezarê salan jiyaye. Nirx û buhaya ku her tim hatiye mezinkirin çanda xwedawenda dayik e. Eger wisa be; çandeke berfireh û demdirêj a civakê çawa hat tepisandin û îro bû bilbileke bi xemil û xêz a qefesê. Mêr dikarin li ser vê bilbilê dîn bibin, lê ew dîl û êsîr e. Heta dawî li vê dîlketina demdirêj û kûr neyê, ti sîstemên civakî nikarin behsa wekhevî û azadiyê bikin. Hukmê ku dibêje; asta jinê ya wekhevî û azadiyê, asta civakê ya di vî warî de destnîşan dike, rast e. Balkêş e, hê dîroka jinê bi rêkûpêk nehatiye nivisîn. Di ti ilmên civakî de cihê jinê rast nehatiye danîn. Yê ku herî dibêje; ez ji jinê re bi hurmet im jî, vê yekê bi qasî ku bi kêra arzû û xwestekên wî were, wek hukmekî qebûl dike. Îro jî jin, ji bilî aliyê xwe yê cinsî wek dosteke mirov ji aliyê ti mêrî ve nehatiye pejirandin. Ji bo peydakirina mêrekî ji vê qonaxê derbasbûyî û yan jî afirandina mêrekî bi vî awayî, gaveke bingehîn e, bi aliyê azadiyê ve hatiye avêtin.

Modela civaka şaristanî ya Sûmeran herî kêm bi qasî modela neolîtîk di cîhanê de pêşketina şaristaniyê diyarkiriye. Wek têgîn, girêdayî çîna di şaristaniyê de çand cûdatir e. Şaristanî girêdayê çanda çînî û dewletê ye. bajarbûyîn, sazîbûna bazirganî, xwedazanyarî, zanyarî, pêşketina avahiya polîtîk û leşkerî, li şûna exlaqê derketina pêş a hûqûqê, zayendparastiya civakî ya civakî, nîşaneya serwer a civaka nû ya şaristani ye. Di meneyekî de mirov dikare ji komkirina van taybetmendiyan re bêje çanda civaka şaristanî. Herdû têgîn di vê rewşê de dibin hevyek. Di heman wateyê de tên bikaranîn. Belavbûna çanda neolotîk li cîhanê ya ku çavkaniya wê Hîlala zêrîn e pêvajoyek wek wê, wê wek belavbûna mezin a duyemîn bişopîne. Vê carê piştî zaroka ku di axa pîroz a Hîlala Zêrîn de anî û di hêlana  xwe de mezin kir, zaroka xwe ya nû (êdî ne qîze, mêre) wê bi qîzên dinyayê yên gihîşti re bizewicîne û zêde bibe. Şibandin di cih de ye. Em dikarin bêjin belavbûna çanda neolîtîkê  zêdetir bi qîzên dayîka xwedavend di hemû cihên dinyayê de gihiştin û bi sazîbûn. Civaka şaristanî ya ku çanda baviksalariyê îfade dike jî bi belavbûna zarokên xort bi sazî dibe. Neslê mêrên şaridtaniyê wê  zarokên qîz ji bo xwe bike pîrek, (civaka bi giranî jin di nav pergala serdestiya zilam de bihelîne) mêre bîne û heya roja me ya îro hijmara zilaman zêde bike û ev ê her bi hêz bidome.

Hemû koledarî li ser bingehê pîrekbûnêye

Pêwîste taybetmendiyeke ku di civakên şaristaniyê de pêk tê pir bal li ser were kişandin. Em dikarin ji vê rastiyê re bêjin, rewşa civakê ya nêzîkê deshilatdariyê jî.  Di aliyekî de  wek li ser kevneşopiya pîrekirina jinê nûva afirandin. Desthilatî jî civakû wek pîrekirina jinê amade neke ji vî bawer nabe. Pîrekbûyîn , wek koletiya herî kevin, bi hemû çanda dayîkê ve, bi mêrên bihêz re û yên devdora wî re bi têkoşîneke pir berfireh ve, bin ketiye û bi sazîbûna civaka zayendperwer ve bûye sazî. Dibe ku ev mêla desthilatiyê hê şaristanî giştê pêşneketiye di civakê de cîhê xwe girtiye. Ev têkoşînek ew qas bi şîddet û zêdebûye ku, bi encamên xwe ve ji bîran hatiye heşibandin. Jin nizane çi, li ku derê, çawa winda kiriye, nay bîra wê. Jintiyek ku serî daniye wek rewşa xwe ya xwezayî dihesibîne. Ji ber vî jî tu koletî bi qasî ya jinê nehatiye pejirandin û meşru kirin.

Du encamên vê pêkhatinê yên malwêran û xiraker li ser civakê çêbûne: ya yekemîn, civak li koletiyê vekiriye; bi tevahî koletî li ser hîmê pîrekkirinê hatin meşandin. Pîrektî ne tenê weke tê zanîn objeyeke cinsiyetparêz e. Taybetmendiyeke biyolojîk bi bîra mirov naxîne. Pîrektî di cewherê xwe de xisleteke civakî ye. Koletî, stûxwarkirin, daqurtandina heqaretê, girî, hînbûna derewan, bêîddîabûn, xwepêşkêşkirin û her wekî din, bi tevahî tevger û helwestên bi vî awayî yên exlaqê azadiyê red dikin ji pîşeyê pîrektiyê têne hesibandin. Ji vî alî ve zemînek e, civak lê piçûk tê xistin e. Zemînê bingehîn ê koletiyê ye. Bê exlaqî, bi tevahî koletî û yên herî kevin, li ser vî zemînê bi sazî bûye kar dikin. Ha civaka şaristaniyê bi nîşandana vî zemînî ya tevahiya kategoriyên civakê têkildar e. Ji bo sîstem bimeşe hewce dibînin ku civakê bi tevahî bikin pîrek. Desthilatî bi mêrtiyê re hemta û hemcewher e. Naxwe wê wextê pîrekkirina civakê ferz e. Ji ber ku desthilatî prensîba azadî û wekheviyê nas nake. Berevajî nikare hebe. Wekheviya desthilatî û civaka cinsiyetparêz cewherî ye.

Di civaka hiyarerşîk de mijareke din heye divê em bi girîngî li ser rawestin. Ew jî ev e; pîremêrên bi ezmûn û tecrûbe ciwanan bi xwe ve girê didin û li ser wan bi awayekî zordariyê dikin. Di lîteraturê de ji vê rastiyê re dibêjin; jerontokrasî. Tecrûbe mirovê yextiyar û pîr dike xwedî hêz, lê li aliyê din bi pîrbûnê re mirov qels û hejar dibe. Bi van sedeman, pîr mecbûr dimînin ciwanan bixin xizmeta xwe. Ji bo vê yekê bidin kirin jî bi mejiyê ciwanan dilîzin. Hemû tevgera ciwanan dixin bin destê xwe. Civaka bavikanî ji vê rastiyê hêzeke mezin digire. Hêz û bedena wan weke dixwazin bi kar tînin. Ev hewcehîştina ciwanan heta îro jî zêdetir dewam dike. Serdestiya îdeolojî û tecrûbeyê bi hêsanî nayê şikandin. Xwestina ciwanan a azadiyê jî bingehê wê ji vê rastiya dîrokî tê. Ji zanyarên berê heta ilimdarên îro û saziyên wan, agahiyên wek stratejîk û nazik bi nav kirine ji ciwanan vedizîne. Agahiyên didin, zêdetir ji bo tevizandin û hewcehîştina ciwan e. Yan jî dema agahiyê didinê amûran nadinê, wek taktîkekî neguher ê rêveberiyê timî serî lê digerînin. Sîstemên zordarî û polîtîk ên propagandayê, îdeolojî û taktîk ên li ser jinê têne meşandin, hemû ji bo ciwanan jî têne ceribandin. Xwesteka ciwanan a azadiyê, ne ku ji temenê wan tê, ji vê rewşa

zordar a civakê tê. Gotinên mîna; xeşîm, beredayî, serxweş û hwd. ji bo piçûkxistina ciwanan hatine bi kar anîn. Naxwe ti têkiliya wê bi rastiyê re nînin. Dîsa ji bo hêza ciwan berê xwe nede sîstemê û nîzama serdest zirarê nebîne, ciwan bi seksê re tê lebikandin, bi dogmayên çor, jiber û hişk ve tê girêdan. Çawa jintî mijareke fizîkî nîne, rastiyeke civakê ye, ciwantî jî bi heman rengî ye. Yek ji wezîfeyên bingehîn ê ilmên civakî ew e ku divê dakeve çavkaniya van mijaran û rastiyên hatine beropaşkirin û belovajîkirin sererast bike.

Di vê çarçoveyê de divê em li ser mijara zarok û sêlekan jî rawest in. Jixwe sîstemek ku jin û ciwan kirin bin destê xwe, yekser nebe jî wê zarok û gedeyan jî bigire bin kontrola xwe. Pir girîng e ku mirov, helwestên belovajî yên civaka dewletparêz û hiyarerşîk li dijî zarok eşkere bike. Zarok ji ber rewşa dayikê mumkîn nabe li ser hîmên rast perwerdê bibîne, lewra ev yek tevahiya bergî û paşeroja civakî dixe nav derewê û belovajî dike. Ji bo zarokan sîstemeke zordar û derewker a perwerdê tê avakirin. Sîstem, bi pir awayên cihêreng hewl dide ku zarok hê di dergûşê de hewce bike. Gotina; “heft salî çibe, bibe heftê salî jî wê ew be.” (kurmê şîrî heta pîrî) vê rastiyê îfade dike. Himbêza jiyana azad a civaka xweza ji zarokan re timî wek xeyalekê tê hîştin, û destûr nayê dayîn ku zarok ti car van xeyalan bijîn. Yek ji wezîfeyên esîl ew e ku mirov zarokan bi van xeyalên xwezayê bitamijîne.

Pêwîste carek din were destnîşankirin ku serdestiya sîstema bavikanî mecbûriyet nebû. Her wiha derketina vê sîstemê qanûneke xweber a saf jî nîne. Ji ber ku di pêkhatina dewletbûn û dabeşbûna civakê de qonaxa bingehîn teşkîl dike, divê hûrûkûr li ser were rawestîn. Têkiliyên li derdora jin-dayikê saz dibin, ji têkiliyên hêz û otorîteyê wêdetir bi piştgiriyeke organîk pêk tên û ev şêwazê têkiliyê li gorî cewherê civaka xwezayî ne. Ev şêwazê têkiliyan çep û çewt nîne. Rê nade otorîteya dewletê. Ji ber ku têkilî bi awayekî organîk pêk tên, hewceyî bi derew û zordariyê nîne. Ev nuqte eşkere dike ka çima dînê şamanîzmê bi giranî dînê mêran bûye. Civaka bavikanî li wir belav dibe, bi xwe re çînbûna civakê û dewletbûnê tîne. Di dîrokê de yekemîn dewletên sîte BZ di salên 3000 de ava dibin. Mînaka herî berçav sîteya Ûrûk e.

Gilgamêş di cehwerê xwe de destana avabûna sîteya Ûrûkê ye. Dikare were gotin; şoreşa herî mezin a dîrokê, li derdora çanda vê sîteyê pêk hatiye. Hûnandina çîroka Înanna-Enkî, xwelihevrakişandina civaka bavikanî û civaka jin-dayikê bi zimanekî helbestwarî yê nazenîn îfade dike. Serdema qehremaniyê ku mînakên wê di her civakê de têne dîtin, di destana Gilgamêş de mînaka wê ya şahane û yekemîn orjînê berçav e. Em yekemîn şerê bajarî û barbaran li vir dibînin. Jin hê jî dûrî têkçûnê ye. Lê mêrê xurt, bi hebûna xwe ya eskerî hêdî hêdî civakê hînî serdestiya xwe dike. Bi hûnandin û tevna xwe ya îdeolojîk, bi saziyên dînî û yekemîn xanedanî û qesrên xwe, civaka şaristan û medenî şeveqê diavêje. Şaman êdî ber bi rahîbbûn û oldarbûnê ve diçe. Têkiliyên bi pêşiyên pîr û bavpîran re dikevin pêvajoya îttîfaqê. Ji bo serdestiyeke tam hewceyî nêçîrvanên xurt in. Koma herî zêde bi hêz û nêçîrvaniya xwe bawer, hêdî hêdî rengê yekemîn saziya eskerî digire. Di destê van sê beşan de her diçe nirx û qabîliyet kom dibin. Dora jin-dayikê bi qurnazî tê valakirin. Nîzama malbatî ya jin-dayikê her ku diçe dikeve bin kontrolê. Jina berê ku li ser mêr xwedî gotin û bi tesîr bû, hêdî hêdî dikeve bin otorîteya nû.

Yekemîn deshilatiya bi hêz li ser jin avakirin ne rashatineke. Ji berdevk û hêza civaka lebatiye. Heya ew ney derbaskirin baviksalarî bisernakeve. Wî jî wêdetir, derbasî saziya dewletê nabe. Hêza dayika jin derbaskirin, xwedî wateyek sitretejîk e. Daneyên berê yên Sûmeran ûn li dest me de jî dide jîşandan ku pêvajoyek pir dijwar hatiye derbas kirin. Figurên Lîlîth- Hava ên dema yek xwedeyî de jî taybetmendiyên wê demê piri baş dide nîşandan. Lîlîth jina serî danayne temsîl dike, Hava jî jina ku teslîm hatiye girtin dide nîşandan. Herwiha teoriya ku bi parsûyê zilam hatiye çêkirin jî dide nîşandan ku çiqas bi zilam ve hatiye girêdan. Aliyê din şibandinê wek lenet, îftîra, pîrevok, hevala şeytan ku di şexsê Lîlîth de jinêre hatiye gotin, hebûna şerê mezin dide nîşandan. Ev çand, fikir û baweriyên bi hezar salan a vi warî de derdixe holê. Heya kû binketina jinê ya civakî ney çareserkirin, taybetmendiyên bingehîn ên çanda deshilat a zilam ya piştre rast nay fêmkirin. Herwiha avabûna civakî ya zilam tu nikarî bifikirî jî. Heya ku avabûna civakî ya zilam ney fêmkirin saziya dewletê nay çareserkirin. Çanda şer û desthilatiyê ya bi dewletê ve girêdayî rast nay pênasekirin. Sedema ku em li ser vê mijarê pir disekinin, ji ber di emcamên çînên piştre hatin avakirin de kesayetên xweda yên pir xeter û bi wan re ji sînor, mêtîngerî û ewqas kuştinê derxistin holê re zelalbûnek anîne. Heke ku ji leneta mirovahiyê re bi –deshilatiya siyasal, dewlet û bi paradîgmaya pîroz ve were nêrandin wê dijşoreşa herî qirêj a zîhniyeta mirovahiyê were kirin. Ya ku pêk hatiye jî ev e. Ji vê re bandorbûna mecbûrî ya pêşketinê gotin – Marks jî di tê de- dijşoreşa herî xerer e. Heya ku di vî milî de dîrok di eleqa rexnê de derbas nebe, şoreşên ku werin kirin jî wê xwe demek şunde bûyîna dijşoreşê xilas nekin.

Pêşî, civaka xwezayî ya cîhana jinê, dûre ya ciwan û zarokan hat hilweşandin. Li ser civakeke nû ya hîyarerşîk bi zordarî û derewê (mîtolojîk) hat avakirin. Bi vê pêvajoyê re di zikhev de dij-şoreşên bingehîn qewimîn. Xweza hat tarûmarkirin û her ku çû mirov li dijî xwezayê rawestiya. Feraziya, bêyî şer û nêçîrê civak nikare bijî, rast nîne. Cureyên heywanan ên bi goşt debara xwe nakin, ji yên bi goşt debara xwe dikin, hezar caran zêdetir in. Pir hindik cureyên heywanan xwe bi goşt xwedî dikin. Wexta mirov hûrûkûr li xwezayê temaşe bike, ji bo debar û jiyanê, pel, pincar û nebatekî dewlemend heye. Heywan encamê pêşketina nebatan e, yanî heywan ji nebatan e. Ev yek li gorî

rêzetêkiliya diyalektîk e. Ji ber ku heywanê destpêkê heywanekî din nîne ku bixwe, lewra bi nebatan xwe xwedî kiriye. Mirov dikare goştxwarinê wek ji rê derketinê bibîne. Eger hemû heywanan hevdu bixwarana wê wextê ti cureyê heywanan nediman. Jixwe ev, dijberî rêzika tekamul û beridandinê ye. Di meylên bingehîn ên xwezayê de her tim ji rêderketin dibe. Eger em ji rêderketinê bikin hîmê bingehîn, ev ji bo kîjan cure û cinsî dibe bila bibe, wê ew cure û cinsê qir bibe. Em vê rastiyê bi awayekî balkêş di bi hevremayîna hemcinsan de dibînin. Eger her kes bi hemcinsê xwe re bijî yanî têkiliyeke homoseks deyne, wê xweber dawî li koka mirov bê. Ev îzah û ravekirina kurt jî pir baş, ji rêderketina civakî ya li ser hîmê çanda şer û nêçîrvaniyê, li ber çavan radixîne.

Ne tenê ji aliyê maddî ve, çanda kuştinê, ji aliyê manewî ve jî encamên xwe girantir in. Eger komekê, kuştina heywanan û hemcinsê xwe kiribe şêwazekî jiyanê û vê mecbûr bibîne –ji bilî parastina neçar- wê êdî her cure makîne, amûr û saziyên şer wek xebateke bingehîn bimeşîne. Wek saziya bingehîn dewlet, wexta xwe ji şer re amade bike, wê tîr û kevan, bivir û her cure amûrê şer were vedîtin û pêşxistin. Civaka bavikanî ya ku ji civaka dayikanî ya xwezayî derket, di dîrokê de ji rêderketina herî xeter bû û cewherê şêwazê mijokî û kuştinên xeter ên di dîrokê de ye, ku heta roja me ya îro tê. Ev rewş, ne qeder û ne jî mecbûriyet e, tam ji rêderketin e. Dişibe melîkiyeta şer, dîsa dişibe diyalektîka mişk û mar. Ji niha ve, ji teoriyên dewletê re teoriyên “mişk-mar” were gotin, nirxandineke nêzî rastiyê ye. Paşnavê gelek zarokan şêr e, gelek kes xweziya xwe bi şêrbûnê tînin. Ez dipirsim; “ji bo kê bixwe!”

Çanda şer û nêçîrvaniyê, qonaxa dawî ya bigihîjê rêxistinbûneke eskerî ye. Rêxistinbûneke eskerî, çendîn civaka etnîk û xwezayî belav bike, wê pêş de biçe. Rêxistinbûna li dora jin-dayikê, nifş, gen, têkiliyên pêşî yên xizimtiyê pêş de dibe, rêxistinbûna eskerî jî ji mêrên xurt ên ku ji vê têkiliyê qut bûne pêk tê. Eşkere ye, êdî ti şêwaza civakî ya xweza nikare li dijî vê hêzê raweste. Di têkiliyên civakî de êdî zor –ji vê re têkiliya medenî jî tê gotin – heye. Xwediyê hêza zorê diyarker in. Bi vî awayî rê li ber mulkiyeta taybet jî vedibe. Ji lewra tê fêmkirin çima di bingehê mulkiyetê de zor heye. Bi zorê zevtkirin û ji bo xwedîbûna milk xwînrijandin, hisa “ezîtî”yê zêde xurt dike. Bi bandor û hukumkirina ser têkiliyan zor pêş de diçe û tê bi karanîn. Hukumkirin bi xwe re xwedîderketinê tîne. Di naveroka hukumkirinê de xwedîderketin têkiliyeke diyalektîk e. Di hemû nîzamên mulkî de xwedîderketin esas e. Di vê pêvajoyê de êdî komel, jin, zarok, ciwan, qadên nebat lê têne berhevkirin û qadên nêçîr lê têne kirin, mulk têne dîtin. Mêrê bi hêz, bi hemû heybeta xwe gaveke pêşîn diavêje, êdî ji qiral-xwedabûna wî re hindik maye. Şaman-rahîb ji bo amadekirina mîtolojiya vê pêvajoyê li ser kar e. Ya divê were kirin ew e ku ev pêşketina muhteşem bi hostayî di mejiyê mirovê hukum lêkirî de were bi cihkirin. Şerê meşrûiyet û rewabûnê, herî kêm bi qasî zora hişk hewldan û huner dixwaze. Divê di mejiyê mirov de bawerî wisa were bi cihkirin, wek qanûneke mutleq fêm bike. Li gorî hemû agahiyên sosyolojîk, têgîna “xwedayê hukumdar” di vê pêvajoyê de derdikeve. Di baweriya “totem” de ku bi civaka xwezayî re hebû, hukumkirin nebû. Totem wek sembola klan tabû ye, pîroz e. Jiyana klanê çawa be têgînên sembolîzekirinê jî bi heman rengîn e. Bi rêxistinkirina jiyanê û rêzikên wê, girêdaneke xurt heye û bêyî wan jiyan nayê fikirîn. Lewra, totem wek nîşaneya mezin a hebûnê, dest nayê dayîn û pîroz e. Jê re hurmet tê kirin, jê re rêz tê girtin. Totem ji heywan, nebat û eşyayên herî bi kêr tê hilbijartin. Di xwezayê de ka çi can û jiyanê dide klanê, wê jê were bawerkirin û wek sembol bê pejirandin. Bi vî awayî, dînê civaka xwezayî, bi xwezayê re di zikhev de ye. Ne ji bo tirsandinê ye, ji bo bi hêzkirinê ye. Dîn şexsiyet û hêzê dide.

Di civaka nû de totem li dawiyê dimîne û serdema xwedê tê. Xwedayê nû wê totem veşêre û binixumîne. Ewê ji xwedayê nû re li serê çiyan, li binê behran û li ezman cihekî bigerin. Bi vê serdestiya wî tê destîşankirin. Çewa dişibe çîna nû ya efendiyan! Di Tewrat, Încîl û Quranê de navekî xwedê “Reb” e, bi maneya efendî ye. Çîna nû xwe dike xweda û derdikeve ser dika dîrokê. Yek ji navên din ên xwedê ku herî tê zanîn, “El”, “Elohîm” e, bi maneya mezinahî û bilindahiyê ye, bavpîr û şêxê ji nav qebîleyan hiltê mizgîn dike. Bi derketina sîstema bavikanî, derketina xwedayên nû jî di hemû pirtûkên pîroz de bi awayekî balkêş tê ziman. Di Îlyada Homeros de, di Ramayana Hîndiyan de, di Kalavela Fîniyan de ev rastî her wisa ye. Eger civaka nû di mejiyê mirov de rewatiyê nebîne, şensê xwe yê jiyînê pir zehmet e. Rêveberî çi beşê civakê yê rê ve dibe nedabe bawerkirin, nikare demeke dirêj bimeşîne. Rola zorê di rêvebirinê de ji bo kêliyekê ye, lê bawerî mayînde ye. Mînaka dîrokî Sumer ku di vî warî de yekemîn nivîsa resen a bi dest ketiye, hûrlêkolîna wê gelekî balkêşe. Di Sumeran de afirandina xwedê harîqa ye. Bi taybetî hilweşîna dayik-xwedawend û di şûnê de rabûn û serweriya bavik-xweda cewherê hemû destanan e. Destan ji serî heta dawî bi têkoşîna Înanna û Enkî, Mardûk û Dîamat tijîne. Pişt re ev hemû destanên dawerivîne nav pirtûkên pîroz, hûrlêkolîna wan a sosyolojîk agahiyên mezin pêşkêşî me dikin. Bê sedem dîrokê ji serdema Sumeran nadin destpêkirin. Eger mirov, dînan, destanên wêjeyî, huqûq, demokrasî û dewletê li gorî tabletên Sumeran analîz bike, belkî jî dikare rêya sereke ya herî nêzî rastiyê ji bo sosyolojiyê destnîşan bike.

Ev dij-şoreşa zêhniyeta bavikanî, belkî jî di dîrokê de hewldana herî mezin a belovajîkirin û ji rêderxistinê ye. Di mejiyê civak û mirov de wer rehên xwe berdane, em hê jî nikarin bostekê ji bandora wê derkevin. Rahîbên Sumeran hê jî hukum li me dikin. Saziyên dewletê yên vedîtin û xwedayên wek îfadeya meşrûiyetê li hev anîn bi awayekî me

rêve dibin nahêlin em çavên xwe vekin; li ser dîtinên me yên bingehîn û paradîgmayên me hukum dikin. Gotina Albert Einstein a wek “Hêza kevneşopî û hînbûnê, ji parçekirina atomê zehmetir e.” zêdetir wek ji bo van têkiliyan hatiye gotin. Wek vê gotinê îşaret pê kiriye; ma ne hê jî li welatê şaristaniyê, cihê dergûşa dewletê û qesrên pîroz ên rahîbên Sumeran zîgûratan, li navbera Dîcle-Firatê, li Iraqê, ji wexta wan vedîtinan û vir ve, mêtingerî û şerên hîç deng ji wan qut nebû û li ti pîvana mirovatiyê nayên, hê dewam dikin. Ji lewra civaka bavikanî û dewletbûyîn ji bo mirovatiyê ne xêr, berovajî bela herî mezin e. Ev amûrên nû, wê carna mîna gulaka agir û carnan jî mîna gulaka berfê mezin bibin, hawîrdora xwe xira bikin û pîroza pîrozan cîhana me wê bikin êdî lê jiyan nebe. Ehda Qedîm derketina dewletê dişibîne cinawirekî bi navê Levîathan. Aliyekî Pirtûka Pîroz rastiya mezin tespît kiriye. Serîderketina bi Levîathan re timî wek fikareke bingehîn tê destnîşankirin û dibêje; eger ev cinawir neyê kontrolkirin wê “her kesî bixwe.”

Pirraniya sosyolojiyê civaka dayikê weke nîzama komin a destpêkê, serdema berê û nû ya kevir û nîzama hov bi nav kirine. Li gorî min mirov ji vê serdemê re bibêje ‘civaka dayikê ya komin’ manedartir e. Ev qonaxa em behsa wê dikin, qonaxek e ku ji tevahiya dema jiyana civaka mirov ji sedî nodûnehê wê digire. Divê mirov piçûk nebîne. Zehmet nîne ku mirov fêhm bike, ji nava civaka dayikê ya komin berhemê zêde û danehevên din ên çandî derketine û li beramberî vê, zilamê bihêz û xasûk ê li ber serê wê aware aware geriyaye, hin caran bi awayekî serketî nêçîrvanî kiriye û bi van seferên nêçîrvaniyê her çûye bi hêz bûye û cara pêşî çavê xwe berdaye serweriya nîzama civakê. Gelek nîşaneyên antropolojîk û belgeyên arkaeolojîk, ev çavdêrî û danaberhev, vê îhtîmalê bi hêz dikin.

Dîsa me gelek caran anî ziman ku civaka bavik ji şaman + şêxê kal ê bi tecrûbe + zilamê fermandar ê esker pêk hatiye. Ya rast ew e ku mirov di vê pêşketinê de prototîpa şêweyê civaka nû bibîne. Ango mebesta me ji civaka nû ew e ku klan bi hiyerarşî dibe. Hiyerarşiyê bi awayekî mayînde rê li ber çînîbûn û rêxistiniya şêwazê dewletê vekir û ev dabeşbûn vebirrî kir. Civaka dewlet û çîn nas kiriye diyar e ku xisletên wê guherîne. Berhemê zêde êdî weke diyarî nayê dayîn, li bazarê weke malê guhertinê nirxekî metabûnê digire û ev kirîn û firotina li bazarê dînamîzma bingehîn a bihevguhertinê ye. Kengî di civakê de bazar-bajar-bazirganî weke sê hêmanên mayînde ketin dewrê dewletbûn û çînîbûn jî pêş dikevin. Ji ber ku me di nava şertên zeman û mekan de behsa vê pêşketinê kiribû, ez ê dubare nekim. Bi vegotinên cihê gelek sosyolojiyan ev civaka nû weke civaka çînî, civaka bajêr, civaka dewletdar, koledar, feodal û kapîtalîst bi nav kirine û hewldane bi van têgînan bersivê bidin. Çînîtî, bajartî û dewletdarî xisletên eşkere û mayînde ne. Ji lewra ji van pêvajoyan re ‘şaristanî’, ‘medenî’ hatiye gotin. Bi ya min, mirov dikare li gorî naveroka wê gotina ‘civaka şareza’ bi awayekî kurt weke ‘şaristanî’ bi kar bîne.

Lê bala me dikişîne ku wexta em şaristanî dibêjin li gorî etîka civakê em behsa mezinkirin, bilindkirin û pêşketinê nakin, em wê weke serberjêrçûyînê û zordestiyê şîrove dikin. Civaka şareza li gorî nirxên berê yên dayika komin di warê exlaqî de serberjêrçûyînê îfade dike. Di zimanê herî kevin de ku em nas dikin, di Sumerî de ev yek bi awayekî balkêş tê îfadekirin. Gotina amargî hem tê maneya azadiyê û hem tê maneya vegera li dayik û xwezayê. Pêhisîneke rast e ku di navbera dayik, azadî û xwe-zayê de têkiliyeke wekhev a balkêş û rast hatiye danîn. Civaka Sumer a cara pêşî civaka şareza nas dike, bi gotina amargî hes-reta xwe ya ji bo civaka komin a dayikê îfade dike ku hînê ji wan nirx an jî civaka berê ya komin dûr neketiye. Di orjînalîteya Su-merê de mirov vê serûbinbûnê hem dikare bibîne, hem jî balkêş e, û mirov jê hîn dibe.

**Di pergala Zîgûratan de rastiya ji û malbatê**

Helwestên Rahîbên Sumeran dema ber bi avakirina saziyên mîna dewletê ve diçin, ji bo em dewletê fêm bikin, agahiyên herî durust pêşkêş dikin. Berê perestgeha bi navê zîgûratê ava dikin, wê ber bi asîmanan ve bilind dikin, qatê jor ji xweda û qatê jêr jî ji ebdên wî re têne veqetandin. Beşên navberê jî ji nûnerên çîna navîn re vedikin. Xanî û zeviyên li hawîrdorê bi ser perestgehê ve ne. Teknolojiya xwe ya hilberandinê dixin beşekî perestgehê. Hesabên berhemên bi bereket baş têne kirin. Eşkere ye ku ev destpêka avakirina civakeke nû ye. Di vê civaka nû de hin aliyên civaka xwezayî û hin aliyên civaka hiyarerşîk xuya dikin. Hem ji van civakan û hem jî tiştên bi kêra avakirina civaka nû werin bi kar tînin, parçeyên bêkêr û dibin asteng diavêjin. Tam mîna muhendîsên civakeke pîroz dixebitin. Di destpêka avakirinê de her kes razî ye. Mîna cejin û roşan be. Çerxa mezin hatiye danîn. Mîna bi ava Dîcle-Firatê were gerandin, di dîrokê de yekem car herî zêde berhem tê stendin. Ma ji mirovatiyê re ji vê mezintir cejin dibe? Xwedayetiya herî mezin, ev nebe, ma çî ye?

Bingeha zanyariyên wek nivîs, matematîk, astronomî, tip, wêje û herwiha xwedazanî di odeyên qatên navîn ên rahîban de hatiye avêtin. Qata navîn heman demê de taslaxa yekemîn a mektep û zanîgehêye. Qatên xwedeyan prototîpa mabedan, qatên rahîban jî prototîpa jî ya mektebane. Bê guman di vê faaliyetê de hêmana sereke rêvebirina karên civaka bajarên her ku diçin mezin dibi nin. Pêwîste baş were fêmkirin faaliyetên maddî bi serê xwe, wek ku çawa Marks şîrove dike bi kedkarên azad ve tu deman nehatine meşandin. Bi tevî dema kapîtalîzmê ve di tu

civakên çînî de kedkarên azad ên xwediyê milkên taybet tunebûne. Tu mirov heya bi zordarî û meşrûîyetêve nehatibe kolekirin, di milkên yên din de bi azad kar nake.

Rahîp qata herî jor a zîgûrata dide xwadayên ku her diçe hijmara wan kêm dibe û heya deviyê vî qatî veşartî digire. Derveyî xwe(rahîbê sereke) nahêle tu kes derbasî wir bibe. Ev tektîk ji bo pêşketina ola nû girîng e. Ev him rêzgirtina mirovan, meraqa wan, him jî girêdanbûna wan pêş dixîne. Rahîbê sereke li vir her dem bi xweda re hevdîtinê pêk tîne, diaxive û vî jî di nav hemû civakê de belav dike. Yên ku dixwaze axaftinê xweda bibîze, pûwîste guh bide axaftinê rahîbê sereke, ji ber ew berdevkê xweda û erkdarê wî ye. Ev kevneşopî bi heman şêwazê derbasî olên Îbrahîmî jî bûne. Hz. Îsa li çiyayên Sîna- Tûr de bi xweda re axiviye û ``DEH EMÎR`` girtiye. Navê Îsa yên din jî berdevkê xweda ye. Gelek caran wî jî xwestiye bi xweda re biaxive lê Şeytan ev vala derxistiye. Lê herî dawiyê wê serbikeve. Derketina Hz. Mihemed li Mîracê dide nîşandan ku heman kevneşopî bi Îslamê re jî hatiye meşandin. Qata li jor wê di Grek- Roma de bi navê Panteon zêdetir bi debdebe ve were sazkirin. Di olên Îbrahîmê de jî bi navê Havra, Kîlîse û Camî bi debdebekirinên mezin ve were sazkirin. Di civakê de zêdebûna rola çînên ol pir vekiriye. Bingeha zanistên wek matematîk, astronomî, tip, wêje, nivîs û zanista îlahiyatê di odeyên qata navîn yên rahîbande hatin avêtin. Qata navîn heman demê de yekemîn taslaxa mektep û zanîngehêye.

Rahib karên rêveberiyê bi pirranî bi rewakirinê dimeşînin. Di vê de hunera wan a herî mezin, berdevkiya xwedê û zanista di yekdestiya wan de ye. Berdevkiya wan a Xwedê û vedîtinên wan ên zanistî hêzeke mezin a rêveberiyê dide. Em ji bîr nekin ku di kapîtalîzmê de jî ZANIST HÊZ e. Em bi bîr bixin ku hîmê vê zanistê di civaka neolîtîk de, nemaze di dema Til Xelef de (B.Z. 6000-4000) hat danîn. Kêrhatinî û alîkariya xwedawendên jin-dayikê di vê demê de diyarker in. Divê baş were fêhmkirin ku jin-dayik di kedîkirina heywanan, tevahiya nebatan, tevn, kûzik û gîzikan, destar û hêran, mal û malên pîroz de hîndekar û perwerdekara pêşî ye. Xwedawenda dayik Înanna di têkoşîna xwe ya li dijî xweda Enkî de, îdîaya wê ya herî mezin ew e ku bi israr ji Enkî re dibêje; sedûçar vedîtinên (meyên) wê jê dizîne û ew xwediyê van vedîtinan e. Di bin vê israrê de ev rastiya em balê dikişînin ser heye. Ango gelek vedîtin berhemên jin-dayikê ne. Rêveberên mêr ev ji wan dizîn. Em ê bibînin ku qonaxa şaristaniyê hinekî jî li ser vî esasî hatiye avakirin.

Qata zîgûratan a herî jor kirina mala xweda, panteon, kîlîse, camî û zanîngeh pir fêrkere. Ev pêkhateyên dîrokî yên wek xelekên zicîrê bi hev ve girêdayî, tê meneya mejiyê pîroz ên civakê û nadnameya wê. Duyemîn karê rahîp a girîng, mihendistiya civakê kirine. Him civaka nû ava plan dike û ava dike, him jî bixwe bi rêve dibe. Ev erd di qada duyemîn a zîgûratan ku ya rahîbane de pêk tê. Wek wekîlê xweda di berpirsiyariya rahîbê sereke de wê bigihêje çînek pîroz û zêde bibe. Wek rêveberiya pîroz a hiyerarşîk di hemû bajaran de tê ava kirin. Me vala negot, rahîp taslaxa profesoran ên yekemînin. Hilberînên maddî bi zilamên xwe yên qata jor de didin kirin, ew bixwe jî karê xwe yên esasî bi xweda re zanîstî û sererstkirina wê re mijûl dibin. Bingehê matematîk, tip, Wêje, astronomî û herwiha îlahiyatê di odeyên rahîban ên qata navîn de hatin avêtin. Qata navîn heman demê de taslaxa yekemîn a mektep û zanîngehê ne. Qatên rahîban jî mirov nikare piçûk bibîne. Di bingehên zanyariya şaristaniyê de rolê nûvedanên nivîs, astronomî, tip û xwedazanî vebire. Di pêvajoya ku zanyarî destpê kiriye de cihên rahîban serekeye.

Di dîrokê de bi qasî ku tê zanîn ji qralên pêşî yên Sumeran re rahib-qral dihat gotin. Rahib-qral di civaka bajêr de qralên pêşî ne. Her bajar pêşî rahib-qralekî xwe heye. Li ser hîmê zanist û îlahiyatê xwe rewa dikin ku ev jî sedema bingehîn a rêveberiya qraltiya wan e. Ev rewş di heman demê de wê bibe aliyê wan ê qels û lawaz. Piştî demeke diyar wê dema xanedaniyan destpê bike. Di vê de jî serê xanedaniyê bi 'zilamê xurt' re hevdu digirin û eskerên li dora 'zilamê xurt' di vê de xwedî rola bingehîn in. Zor, wê karibe zora 'lîstika rahiban' bibe. Em ê paşê li ser vê mijarê rawestin.

Li qatê herî jêr xebatkar hene. Ji ber ku kesên di vî qatî de cih digirin, bûne hîmê pêşî yê koletî, serftî û karkertiyê divê em wan baş fêhm bikin û li 'xebatkarên qatê yekemîn' baş serwext bibin. Ev ji ku û çawa peyda kirin? Di vê de rola zor û razîkirinê çi ye? Ev ji kîjan komê û di berdêla çi de têne peydakirin, di nava wan de jin hene? Rola jinan û malbatê çi ye? Bersivdana van pirsan wê mijarê gelekî baş zelal û rohnî bike.

Di pêkanîna komên pêşî yên xebatê de, heye ku hêza razîkirinê ya rahib li pêş bû. Mirov dikare bifikire ku di sîstema hilberînê ya pêşî de bi xêra zad û qûtê bi riya avdanê zêdebûyî, kesên dihatin xebitandin ji cihên jê hatin baştir dihatin xwedîkirin. Bi zêdebûna şêniyan û koçberiyê re, kesên di encama pevçûnan de bi qebîleya xwe re li hev nekiribin û cihekî pêde biçin tine be, heye ku perestgeh ji wan re cihekî çare û rizgariyê be. Sedemeke din a muhtemel ew e ku xebata di avakirina perestgehan û suxreyên wê de pîroz bû. Belkî jî vê roleke girîng lîstibe. Di rêûresma Rojhilata Naverast de gelek caran tê dîtin ku her qebîle û malbat di çarçoveyeke bi sînor de zarokên xwe didin xizmeta perestgehê. Angarya[2] perestgehê kategoriyeke giştî ye. Heta payeyeke anorê jî dide. Kesên li perestgehê dixebitin di nava civakê de hînê zêdetir xwedî rûmet û anor in. Bi şiklekî mirov dikare bişibîne keşîşxane

û xelwetên Xiristiyanan. Aliyên wê yên dişibin terîqetan jî hene. Di nav milkê şêx de xebat hem anor e, û hem jî xêr e.

Ji ber zîgûrat mînakên yekemîn û saf ên xebatên kolektîfên balkêşin. Mînak , hinek sosyologên wek Max Weber vî wek ``sosyalîzma Firewn`` dinirxîne. Vekiriye ku yekem mînaka nêritandina komînîzmê ye. Komên zenetkar jî di nav komên xebatkarandanin. Hemû bi hev re dişibin hilberîneke wek febrîqeyê ne. Zêdahiya berhemên zêde tê depokirin. Tê xûyakirin ku li hember xelayê sîstemek baş heye. Ev şêweyê karsaziyê hêza rahîban pir zêde bi hêz dikin. Tu qebîle an jî malbat nikare bigihêje bandêrbûnek wisa. Hêzekî ku hemû qebîleyan û malbatan derbas dike heye. Bi qasî Zîgûratan tu mînak nikarin rewşa civaka nû û dewletê bide nîşandan.

Mekan û cihê vê civaka jor bajar e. Ji vî cihî re ku civaka şareza, sivîl û medenî jî tê gotin, bi qasî bandora xwe ya li ser mejiyê mirov, di şêwazê hilberîna maddî de jî guhertinên mezin ên şoreşgerane dike. Ya rastîn, li gorî civaka xwezayî, bingehekî mezin ji dij-şoreşê re pêk tîne. Zêhniyeta dewlet-bajêr jî hê nehatiye çareserkirin. Sîstematîka mejî, nivîs, gelek pîşe û huner pêş de birine, lê bihayê çi û di berdêla çi de? Gelo şoreşa bajêr bû, yan jî dij-şoreş bû, ev hukum hê jî girîng in, û hêja ye, mirov hûrûkûr li ser bifikire. Divê neyê ji bîrkirin, di serî de dînên mezin ên yek xwedayî, gelek derketin û pêngavên dîrokî, li dijî vê avabûnê hatine pêşxistin. Cendereya nifşê mirov xistinê ji cennetê zêdetir dişibe cehennemê. Ya rastîn, bi mînakên gihîştine heta roja me ya îro, eşkere ye, ji hindikî re cennet û bi giranî ji piraniyê re jiyana cehennemê aniye. Civaka dewlet-bajêr, ji her alî ve, di naveroka xwe de bangawaziyê ji bo hakîmiyet, mulkiyet û zordariyê dike. Hînkirina mirovê civaka xweza ji bo vê jiyanê hêsan nebûye. Ji aliyekî ve, bi xwedayên xeternak hukum li mejiyê mirovên bajêr tê kirin û ji aliyê din ve jî ev sîstem bi pîvaneke jêneger, jinê mîna amûrekî ji rêderxistinê –fahîşetiya destpêkê- pêşkêş dike. Tevî kontrola rojane, ebdiyet bi van saziyan mumkîn û gengaz dibe. Her du sazî jî taybetiyên xwe yên efyonker û tevizandinê hene.

Sifetên mîna fahîşe, fenbaz, çilvir, dejenereker û hwd. bi awayekî bêrehim ji aliyê mêr ve lê hatine kirin. Ti jin wexta di hal û rewşa xwe de be, hewceyî bi fenbazî û fahîşetiyê nabîne. Bedena wê, hebûna wê ya biyolojîk li gorî vê yekê nîne. Afirînerê rastîn ê fenbazî û fahîşetiyê mêr e. Em baş dizanin, di dîrokê de yekemîn kerxaneya tê zanîn, BZ di salên 2500 de li paytexta Sumerê Nûppûrê bi navê “mûsaqatîn” ji aliyê îqtîdara mêran ve hat vekirin. Tevî vê yekê, bêyî ku fedî bike, mîna fahîşetî afirîneriyeke jinê be, timî di rojevê de digire. Berhem û gunehkariya bi xwe afirandiye, dixe stûyê jinê û bi têgihîştineke namûsê ya sexte ti lanet, lêdan û kuştinê ji ser serê jinê kêm nake. Piştî vê tarîfa me li yên berê zêde kir, em wek encam dikarin bibêjin; divê jin beriya her tiştî li dijî êrîşên îdeolojîk ên mêran baş rawest e. Li dijî îdeolojiya serdest a mêran, divê bi îdeolojiya azadiyê ya jinê, femînîzm û çavkaniya wê kapîtalîzmê li dawiyê bihele, xwe bi sîleh bike û têkoşînê bimeşîne. Divê li dijî zêhniyeta îqtîdarparêz a mêrê serwer, zêhniyeta xwezayî ya jina azadîxwaz xurt bike û bizanibe di qada îdeolojîk de bi ser bikeve. Divê neyê ji bîrkirin, teslîmiyeta jintiyê ya kevneşopî fizîkî nîne civakî ye. Ji koletiya pê dane vexwarin tê. Ji lewra divê beriya her tiştî di qada îdeolojîk de his û ramanên teslîmbûyî têk bibe.

Pirsa, ‘di sîstema Zîggûratan de rewşa jinê û malbatê çi bû ?’ girîng e. Dijberiya dînê dayik-xwedawendê bi dînê rahibên Zîggûratan re di metnên Sumeran de gelekî tê dîtin. Dijberî xwe bi gelek awayan nîşan dide. Bi giranî rahîbe perestgehan ava dikin. Hema bêjin her bajarek xwedawendeke xwe ya star û parastinê heye. Mînaka balkêş serhatiya Xwedawenda Ûrûkê Înannayê ye. Ûrûk (herhal navê Iraqa îro ji Ûrûkê tê) di dîrokê de weke dewlet-bajarê pêşî yê Sumeran xwedî cih û maneyekê ye ku ji vî alî ve mînakeke hêjayî lêkolînê ye. Her weha ji ber ku bajarê qral Gilgamêş e jî navdar e. Dibe ku Ûrûk mînaka pêşî ya dewlet-bajar be. Di dîrokê de salên 3800-3000 B.Z. weke dema Ûrûkê cih digire. Ji ber ku damezrîner xwedawend Înanna ye, ev jî kevintiya bajêr û rola jin-dayikê ya hînê sereke ye, nîşan dide. Têkoşîna Ûrûkê li dijî Erîdûyê (bajarê xweda Enkî; belkî jî dewleta yekemîn a rahiban) destanwarî ye. Di şexsê Înanna û Enkî de têkoşîna di navbera mêr û jinê de bi qasî mînakeke berçav e, her wisa aliyê wê yê destanwarî jî nîşan dide. Fîgurê xwedawendê bi demê re kêm dibe. Di dema Babîlê de jin ji sedî sed têkçûyî xuya dike. Jin bi qasî ku kole ye, her wisa êdî bi awayekî fermî orûsipiyeke taybet û giştî ye.

Tê zanîn ku di beşekî Zîggûratê de jinan weke objeyeke eşqê cih girtine. Hem jî keçên malbatên herî baş weke objeyeke eşqê rol girtine û ev yek jî payeyeke anorê ye. Keçikên neqandî û cihêwaz li wir têne qebûlkirin. Di nîzama rahiban de pêşandana jinan muhteşem e. Li Zîggûratan di nîzama qesran de di warê ciwanî û delaliyê de bi her awayî tên perwerdekirin. Di hin warên huner û muzîkê de dibin hoste û pispor. Ji bo ku mêrên herêmên dewrûberê biecibînin, têne nîşandan. Wexta bi hinan ji wan re li hev bikin, dihatin zewicandin. Bi vî awayî hem hatina aborî û hem jî bandora perestgehê gelekî zêde dibe. Jingirtina ji perestgehê bi tenê para mêrên esilzade dikeve. Ji ber ku ev jin li perestgehê hatine perwerdekirin, qebîleyên nû yên diçin nava wan temsîl dikin û bi dewlet-civaka nû ve girê didin. Bi awayekî din, ev jin mîna ajanên gelekî baş ên civak-dewleta nû ya rahiban in. Di serî de Îsraîl hînê jî gelek dewlet vê rêbazê pirr bi tesîr bi kar tînin. Bi vî rengî kollektîfkirina jinê prototîpa hunerê ‘mala giştî’ ye. Jin çiqas piçûk dikeve, jina eşqê û xwedawenda esilzade ya perestgehan, dibe karkereke xirab a xwe dixe bazarê û neçar dibe dikeve ‘mala giştî’ ango kerxaneyê. Civaka Sumeran di vî warî de jî xwedî anor an jî bêanoriya yekemîn e.

**Kevneşopiya şaristaniyê jinê wek ``zeviya mêr`` dadgeh dike**

Weke encam heta serê salên 2000'î B.Z. çêbûn û pêşketina sîstema şaristaniyê bi pirr bi xwîn, mêtinkarî, bi avakirina bajaran û xirakirina wan, bi hevgirtin, kolonî û bi karektera he-gemonîk dibe. Li nava erdên avî, bi nanozikê kole dihatin xebi-tandin, tevî vê cotkariyê li bajarên cîran û herêmên neolîtîkê ba-zirganî û pîşekarî berhemê zêde yê mezin hildiberîne. Ev hilbe-randin, ango sîstema şaristaniyê ya li ser çanda maddî tê ava-kirin, çandeke manewî ya bi heybet ava dike û koma rêveberên xwe dike xweda, koleyên xwe yên dixebitin jî weke ji pisiyê xwedayan hatine çêkirin bi nav dike û wan piçûk dixe. Divê baş were fêhmkirin ku di efsaneyên çêbûnê de jiyana maddî bi vî awayî tê nîşandan û ev yek zelal e. Dayik-xwedawend a afirîner jî ji parsûyên rastê yên mêr tê afirandin. Efsane têra xwe seyr in, û bi awayekî balkêş nîşan didin ku jin-dayik jî vebirrî pêve tê gi-rêdan. Jiyan jî êdî wê bi zimanê van efsaneyan were fêhmkirin û şîrovekirin.

Jiyana maddî ya rastî jî heta roja me ya îro nikarîbû ziman û şîroveya xwe biafirîne, bi tenê hin caran bi 'zimanekî Ezop'[3] di-xwaze behsa hin rastiyên berê bike, lê belê ji ber ku kesek nikare wî zimanî jî fêhm bike, di nava bê zimanî û bê manebûnê de ye. Em ji bîr nekin ku hînê zimanê rastiyê û qabîliyeta vegotinê nehatiye afirandin!

Veguherîna wê ya mîtolojîk di weke xweda bilindbûna Mardûk de xwe nîşan dide. Ennûma Elîş destana herî girîng e ku ji wê demê maye. Mardûk serxweda-yê çandekê ye ku gelekî bi xirabî behsa dayik-xwedawendê dike, çanda mêrê serwer sembolîze dike û wê çandê dike xweda. Di çanda Yewnan de Zeûs, di çanda Romayê de Jupîter, di çanda Hind-Ewrûpayê ya çavkaniya xwe Aryen de Gudea (Gotên Ger-menî û Xweda Got ji heman kokê tên, di kurdî de Xwedê jî ji he-man kokê tê), di çanda ereb de Ellah, li cem Hindiyan Brahman û li cem Çîniyan Tao ji nifşên heman xwedayan in.

Qonaxa şaristaniyên hevpar û çandên dişibin hev, di vê demê de weke sembolên bingehîn herî zêde xwe bi xwedayên nûneriya civakê dikin, nîşan didin. Xweber nîne ku weke nav jî hemû texmînî di salên 2000'î B.Z. de derketine holê. Ev yek ji çanda hevpar û kûr a di bingehê wan de ye. Bi şêweyê kirin sembol (ekonomiya malê ya jin-dayikê êdî ji aliyê mêrê zordar û xasûk ve hatiye desteserkirin), çanda mêrê serwer îlahî dikin. Dayika xwedawend a sereke ya bi Aryanî navê wê Star, bi Sumerî Înanna, bi Hîtîtî Kîbele, bi Semîtîkî Îştar, bi Hindî Kalî ye, her diçe navê wan vedimirin û xwedayên mêr ê navbuhurî mezin dibin. Di salên 2000'î B.Z. de kengî jin di warê civakî de kişandin jêr-zemînê têkçûn û piçûkxistina wê jî di warê çand û ziman de xwe da der. Di çanda maddî û manewî ya şaristaniyê de ji koletiya mêr û qebîleyan pêştir, weke cins koletiya jinê tê. Ya rastî, weke koletiya li jêrzemînê civakê, koletiyeke hûrûkûr li ser jinê hatiye ferzkirin û mehkûmî statuyeke têkçûyî, piçûkxistî, bêhnlêçikandî, lanetlêkirî û mirdarî hatiye kirin. Pîrektî û weke mêr-zilamê li ser wê xwedî erkên bê sînor, li ser vî zemînê çandî mezin û bilind dibe. Statuya jinê ya li cem Ereban û civakên li Rojhilata Naverast zemînê heman çandê parve dikin, ev yek hînê dewam dike û vê vegotina me jî piştrast dike. Bi navê namûsê kuştina jinê ji hêma-nên piçûk ên vê çandê ne.

Xwedawendiya dayiktiyê wê hînê paşê bi xwedayên rahibên Sumeran bikevin nava şerekî mezin. Nemaze xwe li hev rakişandina xwedayê mêr ê xasûk 'Enkî' û fîgura sereke ya xwedawendiyê 'Înannayê' mijara sereke ya destanên Sumeran e. Di binê vî şerî de berjewendiyên cihê hene. Li tejaneya Firat û Dîcleya Jor bi pêşengiya jin-dayikê li dora gundan civakeke gund a neolîtîk a rê nade mêtingeriyê heye, li aliyê din civaka bajêr a cara pêşî ji aliyê rahib ve tê avakirin heye. Di navbera van herdu civakan de şer û pevçûneke berjewendiyên cihê heye. Di dîrokê de cara pêşiye ev çend 'pirsgirêkên civakî' yên ciddî derdikevin holê. Bêguman çavkaniya şerê di navbera rêveberên herdu civakan de pirsgirêkên civakî ne. Weke em di dîrokê de dibînin; têgîn û zimanê vî şerî, ji aliyê şêweyên zêhniyetê yên wê demê ve têne diyarkirin. Ji ber ku şêweyên zêhniyetên îro wê demê tinene. Civak bi xwe, bi nasnameyeke nîv-xwedê tê îfadekirin. Zêhnê mirov hînê ji nasnameyeke muccered gelekî dûr e.

Zêhnê mirov ê wê demê yeqîn dike ku xweza zindî ye. Xweza bi xweda û ruhan tijî ye (Ev yek, li gorî roja me ya îro tiştekî paşketî nîne, li gorî min pêşketî ye, şîroveyeke nêzî rastiyê ye). Destdan û destwerdana wan dikare encamên bi tehlûke bi xwe re bîne. Bi tevahî pîroz in. Divê mirov bi rêz û hurmeteke mezin nêzî wan bibe. Li hemberî wan bê hurmetiyeke herî piçûk dikare rê li felaketê veke. Ji lewra ji bo neqehirin divê ji wan re qurban û boraq bêne dayîn. Ew çend girîng dibe ku pîrozan û xwedayan bi qurbanan razî û xweşhal bikin, qurbankirina, zarok, keç û xortên ciwan demeke dirêj weke rêûresmekê dewam dike. Ev rêûrismeke ku dike grîzok bi bedena mirov bikevin, lê her kes bawer dike ku bi vê civak li ser piyan dimîne. Ev rêûresm di demeke dirêj de ji aliyê rahib û rahîbeyan ve ji rê tê derxistin û tê berevajîkirin. Lê eşkere ye ku cewherê wê ji sedî sed bi pîrozbûn û parastinê re eleqedar e. Her cure têkiliya di navbera komên mirovan de bi têkilî û nakokiyên di navbera van pîroz û xwedayan de tê îfadekirin. Zêhn û ziman bi vî awayî hatiye avakirin. 'Zimanê zanista pozîtîv' a îro tineye. Mirovatî vî zimanê

zanista nû ya pozîtîv (ya rastî 'dîn') di van dused salên dawiyê de nas dike. Em dema hewl didin dîrokê şîrove dikin, divê em vê rastiyê ti carî ji nedîtî ve neyên, piştguh nekin.

Civaka xwezayî bi aliyekî xwe civaka ekolojîk e. Eger hêza civakê ji hundur ve were birrîn, wê têkiliya wê ya bi xwezayê re jî qut bibe û heta ji hundur ve bi awayekî awarte birrîn nebe, pirsgirêka ekolojîk jî nabe. Ya anormal, watedariya di hemû pêvaoyên xwezayî de, bi civaka şaristaniyê re maneya xwe wenda dikin. Mîna ku zarok ji pêsîra dayikê hatibe kirin. Meznahiya mejiyê hisî hêdî hêdî wenda dibe. Mejiyê analîtîk ê tim ji zimanê xweza û wijdan dûr dikeve, bi cîhana xwe ya li hev dihûne, her ku diçe nakokiyên xwe bi hawîrdorê re mezin dike. Tayê jiyanê bi xwezayê re tenik dibe. Şûnê, fikrên mucered û xweda digirin. Xwezaya afirîner cihê xwe ji xwedayê afirîner re dihêle. Xwezaya divê wek şefqeta dayikê were fêmkirin, mora zalim li piştê tê xistin. Êdî ji bo mirov qehremanî ye ku çiqas karibe bi ser xwezaya bê zar û ziman de biçe. Heywan û nebat bi awayekî bê mêzîn hatin îmhakirin; ax, av û hewaya xwezayê hat gemarîkirin; civaka mirov ev yek wek mafekî xwe yê bingehîn hîn bû. Xwezaya hawîrdorê êdî mirî ye, mîna qadeke jiyanê ya dembuhurî tê korkirin. Xweza ya hêviya bêsînor a xwezaya zindî ye, êdî kor e; bêhurmet e; ji lod û gidîşeke maddeyên çor zêdetir tiştek nîne.

Teqeze ku koletî giştî pergala çanda maddiye. Taybetmendiya vê pergalê ya herî bingehîn ketin xistina mirovahiyê ye. Di tu dinya ya zindîkî de ketinek ev qas kûr tuneye. Ev qas kêrhatîbûna ketina wijdanî, bi rewnaqbûna çanda maddî û balkêşandina wê ve nêzîk ve girêdayî ye. Hê jî li hember avahî û bîrdariyê vê çandê neveciqandin û herwiha jê re heyran neman ne gengaz e. Tenê ev qas dibe xwedabûna mirov. Lê xwedabûna mirov heke ku mirov ji xwe re bike hedef ev dizvire felaketekî. Ji bo xwedayan yên mayîn evdin. Qelişandina civakî, herwiha tu nakokiyên di têkoşînê de ev qas bejin nedabûn. Ji bo ketin bêtir were fêmkirin, `kurikirina` di çanda Yewnan a klasîk rast were çareserkirin wê pir hîmkar be. Girêdanbûna wê bi ya jinê re tenê ne bi danîna cînsî ye. Ji ber heman girêdanbûna civakî parve dikin balkêş e.

Yewnanî xwediyê yek ji qonaxên mezin ên şaristaniyê têne hesibandin. Li cem Yewnaniyan bi awayekî fermî ciwanên kur weke 'kurên qûnde' ji mêrekî bi tecrûbe re dihatin pêşkêşkirin. Min demeke dirêj sedema vê yekê ji hev dernexistibû. Fîlozofekî mîna Sokrates jî di vî warî de weha dibêje: 'Ya girîng ew e ku kurik timî were bikaranîn û ji aliyê efendiyê xwe ve were terbiyekirin.' Di vir de mentiq û armanc timî bikaranîna kurikan nîne, zêdetir dixwazin wan bi xisletên pîrektiyê amade bikin. Em hînê bi awayekî zelal û were fêhmkirin bibêjin; şaristaniya Yewnan civakeke bûye pîrek dixwaze. Heta ku ciwanên bi şeref û bi esil hebin ev civak ê çênebe; ji bo ev civak çêbibe divê tevgerên mîna jinan ji dil dawerivînin hinavên xwe û qebûl bikin. Di tevahî civakên şaristaniyan de meylên bi heman rengî hene. Kuriktî (qûnde) di vê civakê de gelekî zêde û belav e. Ketiye rewşeke welê ku her efendî kurikekî xwe heye û ev yek weke rêûresmekê rûniştiye. Girtina kuran a ber destê mêrên xwedî ezmûn ji rêderketineke cinsî û nexweşiyekê wêdetir, girîng e ku mirov wê weke diyardeyeke civakî ya civaka desthilatdar û civaka çînî bi nav bike. Di civaka şareza de desthilatî û seksualîte nexweşiyên civakî ne. Hem jî nexweşiyên mîna kansêrê. Bêyî hevdu nikarin hebin û hevdu zêde dikin: mîna şaneyên kansêrî yên zêde dibin. Jixwe em ê têkiliya di navbera kansêra ferdî û kansêra civakî de di modernîteya kapîtalîst de bi berfirehî şîrove bikin.

Ez ji wir dixwazim bêm vir: di civakên şareza de zemînê desthilatiyê bi hezarên salan hûrûkûr û bi mîsala pîrekkirinê hatiye amadekirin. Hukmê rêûresma şaristaniyê ew e ku jin 'zeviyê mêr' e. Rêûresmên bi heman rengî di nava civakê de jî xwedî hukm in. Mêr divê weke jinê xwe pêşkêşî desthilatdariyê bike. Yê serî rake, isyan bike, li ber xwepêşkêşkirinê rabe, wê hewl bidin bi şer wî amade bikin, wî bînin wê astê.

Eger mirov pêvajoya desthilatdariyê weke çalakiyeke ji nişkê ve ya kesekî, zumreyekê, çîn yan jî neteweyekî bibîne ev yek ê me bixapîne. Belkî hukûmet ji nişkê ve bêne damezrandin, lê desthilatdarî û sîstemên siyasî di civakên şareza de berî her tiştî ji aliyê bi sedan împaratoriyên hov, klîk û her cure hêzên serwer weke çandeke serwertiyê, rêûresm yan jî zevî hatine amadekirin. Çawa ku pîrek mîna çarenûsa wê be li benda mêrê xwe dimîne û vê bendemayînê qebûl dike, civak jî wisa hewceyî desthilatdariyê hatine kirin an weke zeviyekî li benda xwediyê xwe ye, ji bo bê û bajo yan jî ew wisa hîn kirine. Desthilatdarî di civakê de weke çandeke serweriyê heye. Di vê çarçoveyê de gotina Bakunin[4] gotî gelekî manedar e ku weha dibêje; 'Demokratê herî ji xwe razî jî bîstûçar saetan bibe desthilatdar wê xira bibe.' Min demeke dirêj nikarîbû rave bikira, lê min hewl dida rave bikim ka ev xirabûn çima dibe. Di dawiya dawiyê de ya ez gihiştimê ew e ku zemînê desthilatdariyê vê xirabûnê çêdike. Kursiya desthilatdariyê ya bi hezarên salan e bi şer û mêtingeriyên bêsînor, bi îstîsmar û derya xwînê çêbûye bêguman wê yê li ser rûnê di nava bîstûçar saetan de xira bike. Tenê bi şertekî xira nake: eger ê li ser rûnê mîna îbadet bike xwe biparêze! Desthilatdariya di nava mêtingerî, şer, fen û fûtên bêsînor de hatiye avakirin weke rêûresm, çand û sîstem

gelekî bi hêz e, û hema bêjin ji sedî sed mirovan xira dike. Ji bo vê yekê mînaka herî balkêş serhatiya 'sosyalîzma pêkhatî' ye.

Bi civaka xwezayî re beşekî wenda dike jin in. Mîtolojiya Sumer mîna lawikên şînê yên jina wenda kiriye. Di kulta Înanna de hem şopên berê yên serdema civaka jin-dayikê hene, hem jî têkoşîneke mezin li dijî civaka serweriya wê mêr dike, heye. Sîteyên destpêkê bi giranî ji aliyê jinan ve têne avakirin, lê paşê hemû cihê xwe ji mêran re dihêlin. Di serê saziyan de ya ku jin xistiye, dîsa perestgeh tên. Di destpêkê de perestgehên di bin rêveberiya jinan de yên li ser navê xwedawend-dayik Înannayê, yek bi yek têne dagîrkirin û dikin kerxane. Nîzama malbatî ya li dora jin-dayikê ya civaka xwezayî, saziyeke cuda ye. Xwediyê jinê tineye, di heman demê de jin bi xwe, kîjan mêr û zarokî bixwaze dikare rê ve bibe. Bi awayekî klasîk saziya pîrekî û zilamtiyê pêş neketiye. Li ser hîmê saziya dewletê, piştî ku civaka mêrê serwer pêk hat, malbata bavikanî ya bi rêveberiya mêr, belav bû. Saziya malbatê naveroka wê diguhere, rengê xwe yê destpêkê digire û heta îro dewam dike. Xwediyê jinê mêr e, her weha zarok jî yê wî ne. Jin her ku diçe ji hêzê tê xistin û dikeve pozîsyona mal û milk. Malbat di cewherê xwe de dibe qefesek.

Qasî malbata di bin rêveberiya mêr de ti koletiyeke daîmî û kûr nehatiye dîtin. Ev tespîtek e, hemû sosyologên navdar li ser hemfikir in. Ji bo mirov asta koletiyê ya civakê analîz bike, ji sedî sed divê mirov asta koletiyê ya jinê bi awayekî berfireh çareser bike. Jin ne tenê ji aliyê mejî û kiryaran ve hewce hatiye kirin, di heman demê de hemû hisên wê, tevgerên wê yên bedenî, nîzama dengê wê, lixwekirin û vexwarina wê jî bi koletiyê re têkildar hatiye kirin. Xelek bi poz, guh, zend û lingên wê ve hatine kirin. Ev sembolên zincîra koletiyê ne. Di serdema navîn de kembera bakîretiyê jî bi jinê ve tê kirin. Têgihîştineke yekalî ya namûs û exlaq tê pejirandin. Ji aliyê îdeolojîk ve jinê tine dikin. Hemû nirx û buha ji destên wê têne girtin û wê dixin rewşa mal û milk. Bi qelen û next tê wezinandin.

Koletiya jinê ku çavkaniya wê civaka Sumeran e, mijarek e, hê dest pê nehatiye kirin. Hewcebûna bi civaka hiyarerşîk dest pê kir, di perestgehên rahîban re hat derbaskirin û xistin holika mêr, bi vî awayî bi statuya herî giran bi dawî kirin. Ji wê demê û vir ve, statuya ku pêş de birine ev e. Mijara bingehîn a wêje, exlaq û perwerdeyê her jin bû û dianîn ziman ku jinek bi hemû his û tevgerên xwe çawa dikare ji mêrê xwe re xizmetê bike. Koleyê mêr bi berhemê zêde yê bi dest dixistî û hêza xwe ya milan, statuya xwe destnîşan dikir. Koletiyeke naveroka wê aborî bû zêdetir derdiket pêş. Lê jinê bi hemû beden, ruh û fikra wê dikin kole. Eger hûn mêrekî kole serbest bikin dikare bibe mirovekî azad, lê hûn jinekê serbest bikin, wê biçe koletiyeke hê xirabtir. Ev rastî bi xwe, koletiyeke kûr nîşan dide. Çavdêrekî baş dema li jinê temaşe bike, bi hêsanî dikare bibîne, jin çawa bi her awayî li gorî daxwazên mêr hatiye hûnandin û reng dayînê. Ji dengê wê heta meşa wê, ji nertina wê heta rûniştina wê, wek bibêje; "ez hatim qedandin" Li ser koletiya jinê analîz nehatine kirin, yek ji sedemên bingehîn ê vê rastiyê, çilekiya mêr û ruhê wî yê tatmînkar ê dîktator e. Prototîpa qral-xwedayên di civakê de, efendiyê jinê mêrê li malê ye. Ew ne tenê zilamek e, ew xweda-mêr e. Ev taybetiya

Em wexta ji nêz ve li koletiya jinê binêrin, wê zêdetir aliyê wê yê ji mirovatiyê dûr dixîne balê bikişîne. Girtina jinê li malê ne tenê girtineke mekanî ye, û heta girtîgeh jî nîne. Rewşa wê rewşeke destavêtinê ya dijwar e. Herçiqas bixwazin bi nîşan, bi merasîmên bûkaniyê ser rastiya vê meseleyê bigirin jî rojeke wê bi tenê jî ji bo kesa xwe dizane têkçûna rûmet û anora mirov e. Jin ji qîmeta xwe ya hezar salan a hilberandin, perwerde, rêveberî û azadiyê welê bi rêkûpêk û rêbazên şîddetê jê hatiye kirin, ji vê jî wêdetir bi îdeolojî û vegotinên eşqê wer hatiye hincirandin, encam ji teslîmiyetê jî wêdetir e. Nasnameya xwe ya 'jintiyê' ji dest dide, dikeve rewşeke din ku jêre 'pîrektî' tê gotin. Li cem mêrekî ji rêzê, li cem şivanekî serê çiyê 'jin' bi tenê dikare bibe 'pîrek'. Pîrektî jî heq dide ku li ser wê her cure tesaruf bibe. Di nava vê tesarufê de kuştin jî heye, kengî bixwaze dikare bike. Ew ne tenê milk e. Ew milkeke gelekî taybet e. Rê dide ku xwediyê wê li ser wê bibe împaratorekî piçûk, hema xwedî tenê zanibe bi kar bîne.

Yek ji şaxên bingehîn ê şaristanî amade kir ev rastî bû. Yek ji sedemên bingehîn, hişt ku çanda maddî sînor nas neke, têkiliya xwe bi vê rastiyê re hebû. Ezmûna li ser jinê bi awayekî serketî hat ceribandin xwestin li ser tevahiya civakê biceribînin. Bandora xeternak a duyemîn jî ev bû. Civak diviyabû ji bo efendiyên xwe weke pîrekan bi kêr hatibûna. Em ê hewl bidin rave bikin ku pîrektiya civakê bi sîstema kapîtalîst temam bûye. Lê hîmê vê çalakiyê di qonaxa pêşî ya şaristaniyê de hatiye danîn û bi çanda Greko-Romen xwestin weke mînakekî serketî yê civakê nîşan bidin. Lê kengî mêr bibûya pîrek mirov dikarîbû behsa pîrekbûna civakê bikira. Greko-Romen civakeke welê bûn, ev yek his kiribûn û tedbîrên xwe girtibûn. Yek ji wan xusûsan e ku baş tê zanîn, rewşa koleyan gelekî ji pîrektiyê xirabtir e. Lê pirsgirêk ew bû ku mêrê nebûbû pîrek bibûya kole. Em behsa têkiliyên ensest an jî têkiliyên ji rê derketî nakin. Em behsa nêrmêtiyê jî nakin. Hin aliyên mijarê yên derûnî û heta hin diyardeyên biyolojîk divê ji mijara behsa wê dikim cihê bêne nirxandin. Di civaka klasîk a Yewnan de mode ew bû ku her kurekî ciwan ê azad, divê ji sedî sed xwediyekî wî, partnerekî wî yê mêr hebe. Ciwanê kurik heta bibe xwedî tecrûbe û ezmûn divê partnerekî wî yê evîndariyê hebe. Weke min berê jî behskiribû ku Sokrates jî gotiye; di vê bûyerê de ya girîng ew nîne ku kurik pirr

were bikaranîn a girîng ew e ku kurik wî ruhî bijî. Zêhniyet eşkere ye: civaka kole têkiliya xwe bi prensîba anor û azadiyê re nîne, lewma diviyabû ev xislet ji civakê bihatana kirin. Ji ber ku gef li civakê dixwarin. Rast bû jî. Li deverekê anor û azadiya mirov hebe, koletî nikare li wir bijî. Sîstem li vê serwext bûbû û diviyabû çi hewce ye bikirana.

Wexta em bi vî çavê têgînan li meseleyê binêrin, em ê bibînin ku tevî Romayê çanda wê ya maddî ya gelekî mezin bûye ku ti têkiliya xwe bi jiyaneke manedar re nemaye, tevî çanda îdeolojîk hemû hilweşiyane. Jixwe weke mîmariya bajêr jî di serî de Misr ji mîmariyên beriya xwe yên çar hezar salî hemûyan şahînşahek e. Dîsa Panteona Romayê, ji zîggûratên beriya çar hezar salan ên Sumeran ji qatê dawî û yên dawî nava zîggûratê, rewşa herî bi heybet e. Ji bo min zehmet nîne ku ez van xusûsan tespît bikim. Çandên îdeolojîk û maddî yên ji vî alî ve hilweşiyane herî kêm çar hezar salî ne. Wexta hûn li sedemên hilweşîna wan û nasnameya yên ew hilweşandine binêrin hûn ê bibînin ku em ê karibin heman analîzan ji bo wan bikin. Ji êrîşên destpêkê yên Amorîtan heta yên Hûriyan û êrîşên dawî yên Gotan hemû yekpare ne. Dîroka êrîş û berxwedanên van jî herî kêm çar hezar salî ne. Berxwedana bi pêxember Nûh dest pê kir û heta Hz. Muhammed dewam kir mîna xelekên zincîrekê xwedî dîrokeke dirêj in. Ne tenê ji aliyê demê ve, ji aliyê mekan ve jî xwedî maneyên mezin in. Çolên Erebistanê û keviyên Toros-Zagrosan, çolên Asya Navîn û daristanên kûr ên Ewrûpayê, di çêbûna çanda maddî û manewî ya qebîleyan de şopên kûr dihêlin. Çîroka her pêxemberî nîşan dide ku cemaeta dewrûbera wî bi çiqas zehmetiyan çêbûye. Sosyolojiya navend Ewrûpa naxwaze van mijaran bigire rojeva xwe. Ji ber vê, mirov bibêje avahiyên zanînê yên navenda xwe Ewrûpa, wê ne şaş be. Mirov şîroveyeke manedar a dîroka şaristaniyê neke û dîrokeke rast a Romayê ava neke, nikare Romayê û çavkaniyên çanda maddî û îdeolojîk a Ewrûpayê bi nav bike.

Bêguman çanda Greko-Romen ev mîsyona xwe temam nekir. Di nava wê de bi dibistanên felsefî yên azad Xiristiyantiya pêşket, ji derve jî êrîşên etnîsîteyê yên dawî li wan nedihatin û serhildanên wan, civak bi rewşên din re rûbirû kir. Gelek îşaret hebûn ku nîşan didan çanda maddî her tiştî nîne û hêza wê ewqas nîne serî bi her tiştî re derxîne. Lê kapîtalîzmê wê hîç hewce nedîta civakê bike 'kurikê qûnde' û karibe wê bike pîrek.

**Bi talankirina aboriya malê ve destavêtina jinê ya her demî.**

Civaka dewletparêz a koledar di warê ekonomîk de rengê fabrîkeyeke mezin lê dixe. Ji fabrîkeyên hemdem, ji aliyê xwedî û teknîkê cuda dibe. Kole mîna keriyan têne xebitandin. Li nav zeviyan, li kanên keviran û di avakirina xaniyan de têne xebitandin. Ev yek ji berhemên serdema Arkaîk mane pir baş tê fêmkirin. Kole ji heywanan dijwartir têne rêvebirin. Kole heywaneke tê xebitandin. Milk tê dîtin. Tenê amûrekî hilberandinê ye. Kole li derveyî huqûqê ne. Mîna eşyayek ku hisê wê nebin. Di mijara koleyan de qonaxa mejiyê analîtîk ê mêran gihîştiyê pir zêde balkêş e.

Di civaka dewletparêz a koledar de saziya mulkiyetê jî gava destpêkê têkûz diavêje. Cewherê sîstemê ew e ku civaka jor, civaka jêr bi her awayî dike milk. Xweda-qral û alîkarên xwe xwediyê her tiştîne. Xwedîtî encameke xweza ya serdestiyê ye. Egoya mirov eger derfetên pêşketinê bibîne, taybetiyên wê yên sînor nenas hene. Di serdema avakirina sîstemê de ji ber ku bandorên bi sînor bikin nîne, rê li ber kulta xweda-qral vedibe. Nîzama mulkiyetê ya civaka xwezayî nas nedikir, ji mulkiyeta dewletê dest pê kir dawerivî malê û her saziyê. Di her kesî de hisa mulkiyetê afirand. Mulkiyet hîmê dewletê tê hesibandin û tê pîrozkirin. Ji vir û pêve ya were kirin ev e; wê hemû dunyayê bikin milk. Sînorên dewletan, zevî û erdên xanedanan, sînorên welatan, bi awayên cihêreng sînorên mulkiyetê heta îro wek dayîneke xwedê kirin fitreta mirov. Ya rastîn, mulkiyet wek çavkaniya kurtêlxuriyê dizekî ye. Saziya herî zêde piştgiriya kollektîf a civakê xira dike. Lê ji bo xwedîkirina civaka jor jî saziyeke bingehîn e, dest jê nabe.

Me hewl dabû, em destnîşan bikin ku civaka ekolojîk xweber civaka xwezayî ye. Piştî ku civaka dewletparêz bi berfirehî û kûrahî mezin dibe, civaka ekolojîk gav bi gav bi paş ve tê xistin û ev jî wek yek ji nakokiyeke bingehîn a civakî tê heta îro. Nakokiya civakê ya hundurîn çendîn mezin bû ye, nakokiya wê ya bi atmosfera der ve re jî ew çend zêde bûye. Tehekuma li mirov bi xwe re tehekuma li xwezayê tîne. Eşkere ye ku sîstemeke dilê wê bi mirov neşewite, dikare her cure xirabiyê bi xwezayê bike. Jixwe hakîmiyet û fetîh wek du rastiyên bijare di exlaqê çîna serdest de cih girtine. Hukumkirina li xwezayê, bi qasî hukumkirina li mirov wek heq û helwesteke bi şeref tê dîtin. Zindîtiya xweza û pîrozkirina wê ya civaka xwezayî tine hatiye hesibandin. Mîna dijminekî fetîhker. Wexta ev têgîn li ser zêhniyet û tevgera civaka dewletparêz serdest bûn, êdî ji felaketên mezin ên hawîrdorê re ku di roja me ya îro de bûne xetereke ciddî, rê heta dawiyê vebûye.

Şêweyê aboriyê yê bi pêvajoya şaristaniya bi pêkhatina çîn-bajar-dewletê dest pê kir û ev kulmoza hêzê ya em dikarin weke rahib-qral-fermandar muşexes bikin jêre dewlet tê gotin. Eskerî-siyaset-dîn weke sazî di zikhev de desthilatdariyê pêk tîne. Yek ji xisleta bingehîn a vê sîstema hêzê ew e ku aboriya xwe bi şêweyê kominîzma dewletê bi rêxistin kiriye. Min hînê nedîtibû Max Weber bi kar aniye, min jî ji vî şêwazê aboriyê re 'sosyalîzma firewn' digot. Aboriya dayiktiyê di nava aboriya eşîrî-feodal û baviktiyê de bi awayekî bermahî hebûna xwe dewam dike. Di sosyalîzma firewnan de mirov weke koleyên ji rêzê têne xebitandin. Mafekî wan heye ew jî tasek şorbe ye.

Li dora perestgeh, qesr û avahiyan hînê jî bi hezaran kûzikên tasên şorbê peyda dibin û ev, a em behsê dikin piştrast dike.

'Zilamê bihêz û xasûk' mîna dizekî ket ekonomiya malê ya jinê. Qîma xwe bi talanê jî neanî. Ya hînê xirabtir û tehlûketir jin xist rewşeke timî destavêtinê û malbata pîroz kir mîna nivîna Çil Heramiyan. Rewşa xayînekî dizane çi dike ti carî neterikand. Tovên danehevên sermaya pêşî li vî mekanî hatin çandin. Yekemîn, li nêzî ekonomiya malê, mal bi xwe hat dagirkirin; duyemîn, li dijî yekdestdariya fermî û rewa ya dewletê yekdestdariya taybet li baregehên navendî yên çil heramiyan an jî li nêzî wan mekan girtin. Ji ber ku ji çavdêriya civak û dewletê direve, pirr zû bi maske û hîle di nava mekanên wan de cih girt. Kemîn danî. Kengî keys dît weke şêrekî xwe çeng ser nêçîra xwe kir. Carnan bi xasûkiya rovî nêçîra xwe zevt kir. Mîna bûkalemûn li gorî rewşê reng girt. Di nuqteyên marjînal de xwe weke pisporê bazirganiyê îlan kir. Qadên gund û bajaran ên şaristaniyan nikarîbû xwe bigihînine wan bi dijwarî di bin çavdêriya wî de ne. Gelekî hoste ye ku xwe di qelş û terkên nav civakê de veşêre. Pirr baş dizane bi rola balansê rabe û herdu aliyan jî bişêlîne. Haya xwe jê heye ku ji bazirganiyên mesafe kin hindik, ji bazirganên rê dirêj gelekî karê bi dest bixe. Yek ji pîvanên bingehîn ê pîşeya wî ye ku mîna bi pozê xwe bêhn bike qadên jê karê bike nas dike, bi ser de diçe. Eger mirov çalakiya wî weke korsantiya stratejîk a van rêyan binirxîne wê zêdetir hînker be. Wexta ku tê gotin welatê sermayê tineye, ev rastî tê destnîşankirin.

Ji dema destpêkê ya avabûna civaka şareza yek ji berxwedanên bi rêkûpêk û bi serûber heta roja me ya îro hatiye jî rêûresma berxwedanê ya pêxemberan e. Çîroka wan bi Adem û Hawayê destpê dike, ango bi mirovê pêşî dest bi vegotinê dikin û mohra bi tevahî xisletên çanda îdeolojîk lê hene. Eger mirov Adem û Hawayê li hemberî civaka neolîtîk weke zêhniyeta şaristaniya dibe xweda rast fêhm bike, em ê nîşanên hûr ên pêşî yên şerê efendî-koleyan bibînin. Diyalogên Adem bi xwedê re û têkiliyên wî bi Hawayê re, em dikarin weke cihêbûna kole-efendî û sembola jin-dayika dikeve dereceya duyemîn şîrove bikin. Derketina Hz. Nûh mîna kesekî li ber efendiyan rabûye û dixwaze civaka neolîtîk li keştiyê bar bike û bibe cihekî bilind ê çiyayî û destê şaristaniyê negihîjê û ji nû ve ava bike, bi bîra mirovan dixe. Jixwe çîrok behsa civaka Sumeran û civaka neolîtîk a ji bo li ser piyan bimîne li ber xwe dide, dike. Rêûresma van herdu pêxemberan serê wan diçe heta destpêka avabûna civaka şareza û bi vê yekê ji destpêkê ve hebûna berxwedanê û herî kêm bi qasî domdariya şaristaniyê domdariya wan jî nîşan dide. Dîroka xanedaniyan çawa dîroka çîna jor e, dîroka pêxemberan jî zêdetir dîroka qebîle, qehremanî û çandên li ber xwe dane ye.

Ji aliyê teorîk ve em dikarin têderxin ku derbasbûna civaka şareza di heman demê de bi derbasbûna civaka demokratîk re di zikhev de pêk hatiye. Guftûgoyên dijwar ên pêşî li civatên rûsipi-yan reprepa hatina dengê piyê demokrasiyê ne. Li cem tevahiya civakan di heman qonaxan de em dualîteyên bi heman rengî dibînin: dualîteya civaka şareza û civaka demokratîk. Eger bi awayekî berçavtir em bînin ziman, em ê bibêjin dualîteya dewlet û demokrasiyê. Li her devera dewlet heye pirsgirêka demokrasi-yê heye. Li her devera demokrasî hebe jî rîskeke dewletbûnê he-ye. Demokrasî şêweyekî dewletê nîne, her weha weke demokrasî jî têgîna dewletê şaş e. Divê mirov baş bala xwe bide ser xisletên têkiliya di navbera herdu dualîteyan de.

Wezna di têkiliyên navbera jin-mêr de li dijî jinê xira bûn. Rewşa vê bûyerê di diyalogên navbera Înanan-Enkî de xuya dike. Ev diyalog weke ceribandineke destanê ya pêşî hatiye çêkirin. Destanek berî Destana Gilgamêş e. Şerê navbera nîzama komin a dayikê an jî civakê û civaka hiyerarşîk a bavik (civaka derbasî şaristaniyê dibe) de tîne ziman. Pirr eşkere ye ku pêvajo bi awayekî zêde neadil û bi têkoşîn dimeşe. Li gorî daneyên dîrokî civaka Sumerê di qonaxa pêşî de pêvajoyek e ku mirov dikare wê weke demokrasiya destpêkê bi nav bike dîtiye. Civata rûsipiyan hînê wernegeriyaye nîzameke bavikan. Guftûgoyên gelekî gurr û geş têne kirin îşaret bi şiklekî demokrasiyê dike. Têgînên mîna fermana Xwedê hînê çênebûne. Jixwe ev têgîn pîvaneke pergala eskerî despotîk a yekalî ye ku çavkaniya wê tîpekî bi maske ye yê ku zilamê bihêz û xasûk li xwe kiriye. Şêwazê hevpeyvînê di Des-tana Înanna de gelekî geş e, û di civakê de çi diqewime tîne zi-man; behsa bêedaletiyê, û ya bi ser jinê, danehevên wê û zarokên wê de hatiye, dike. Eger belge gelek hebûna, me yê karîbûya bidîtana yan jî haya me wê jê bibûna ku bi îhtimaleke mezin ji de-mokrasiya Atînayê ya çîna koledar gelekî wêdetir, gihiştine qo-naxeke demokrasiyê.

Mijareke ku her ez hewl didim ji bîr bînim. Çima hêzek wek jinê, ev qas bê hêz hatiye hiştin û belenqaz maye ketiye destê mêrê ku zêde ne kêrhatî û neafirîner, çima bûye mehkûmê wî? Persiv herwiha rola zorê ye. Heke ku aborî jî li dest were girtin, dîl girtinek mezin kes nikare pêşiyê bigire. Tu zarokekî xort bidî li ser serê wê, wek pîrektiya çil salî, bi qasî ku hunerekî pir xirab çêkirinê hatiye razî kirin ev qas ji xwe derketiye. Herwiha pirektiya zilamê bi hêz hê zêde xirabe.

Divê mirov desthilatdariyê weke rêûresmekê bifikire. Yek ji rêûresmên herî qedîm e. Bi tevahî yekparebûneke çalakiyan nî-ne ku rojane li ser civakê hukmê xwe yê hin tiştan biwelidîne hebe. Divê mirov baş fêhm bike ku desthilatdarî bi serê xwe dew-let nîne. Yek ji hîmê şaşiyên gelek caran tên kirin ew e ku dest-hilatdarî weke dewletê û şêweyên wê tê binavkirin. Jixwe hin ca-ran çalakiyên şeran ên zêde li ber çavan û beloq ku bi kirinên desthilatdariyê re dikin yek û pêşkêş dikin, ev yek ji şîroveyên herî oportunîst ên der barê desthilatdariyê de ne. Min

di vê xeba-ta xwe de têgîna ‘zilamê bihêz û xasûk’ weke formekê bi kar anî. Çawa ku di nava piyaseyan de behsa ‘destekî veşartî’ tê kirin, ev jî tiştekî wisa ye. Lê ji bo mirov bingehê desthilatdariyê fêhm bi-ke, ez yeqîn dikim ku di warê hînkirinê de qîmeteke xwe ya me-zin heye. Hin caran xwe eşkere didin der û bi piranî di bin rûyê eşkere yê civakê de têkiliyên desthilatdariyê datînin, yên van tê-kiliyan datînin û xwediyên van têkiliyan avakerên desthilatda-riyê ne.

**Têgîna ku li ser keda jinê teşe girtiye: deshilatî**

Desthilatdarî yek ji wan diyardeyê civakî ye ku her tim dom-dar e, û xwe zêde dike. Zilamê jin kedî kir, belkî jî yek ji wan ke-sên pêşî ye ku di vê de herî zêde xwedî par e. Şamanîstan li ser hêza maneyê yekdestdarî ava kir, bûn rahib û pêre nasnameya dînî bi dest xistin û di pîrozkirina hêza eşkere ya desthilatdariyê û dayîna wê ya xisleta esrarengî de bi tesîr bûn. Mirov dikare bi tevahî têgînên xwedabûnê û mîtolojiyên desthilatdariyê bi vê grûbê ve girê bide. Vegotina dînî û mîtolojîk bi piranî di avakirin û rewakirina desthilatdariyê de pirr bi tesîr e. Di rejîma bavan a hiyerarşîk de sêberiya rahib + rêveber + fermandar ew kom e ku ji bo di nava civakê de zemînê desthlatdariyê bi awayekî berfireh pêk bê, bi roleke girîng radibe. Di textdanîna pêşî ya desthilat-dariyê de ew afirînerên vê rêûresmê sembolîze dikin. Ji vê demê nîşaneyên bi hêz ên desthlatdariyê mane û bi têgînên weke xwe-dayetî, text, bilindbûn, jihevqutbûna mirov û xwedê, piçûkxistina xwedawendan û evdîtiyê têne îfadekirin.

Desthilatdariya dewletê, şêweyekî berçav û mayînde yê desthilatdariyê ye, li ser zemînê hiyerarşîk û kedîkirina jinê û ko-lekirina evdîtiyê pêk tê. Ev yek, birêkûpêkkirina têkiliyên dest-hilatdariyê yên li civakê berfirehbûyî, wan bike xwediyê asteke diyar a berpirsiyariyê û bi tesîrtir û ekonomîktir bikarînana wan, îfade dike. Desthilatdarî di nava xwe de dewletê dihewîne. Lê ya di nava xwe de dihewîne ji dewletê zêdetir e. Dewlet di dîrokê de ji wan saziyan e ku xwe herî zêde kirin têgîn û ji wan saziyên yekdestdar e ku dîrokê bi xwe dide destpêkirin. Di çarçoveya analîzên dawî de mirov dikare bibêje; hêza ekonomîk a civakê ya zêde dibe nahêle bikeve rojeva siyaseta demokratîk û weke hêza desthilatdariyê hewl dide yekdestdariya xwe ava bike û bi vî awayî hewl dide berhem û nirxên zêde desteser bike. Ji bilî vê her tiştê din ê bi dewletê re têkildar e, weke mîtolojî, felsefe, dîn, zanist, şer û siyaset têkiliya hemûyan bi vê armanca bingehîn re heye. Eger dewlet komînîst be jî encam naguhere. Dewlet û desthilatdarî di civakê de fermî dibin û rewabûna xwe pêşde dibin.

Ji bo mirov vê diyardeyê bi kurtî fêhm bike, divê mirov nîzama jin-dayikê û li rastiya malbatê serwext bibe: di dema jin-dayikê de mêr an diyar nîne, yan jî bintûte ye, gelekî li ber çav xuya nîne. Jin-dayik wexta zarokan tîne, wisa di wê rewşê de nîne ku bi mêrê jê hez dike eşqê bike. Eşq û civaka cinsiyetparêz hînê di rojevê de nîne. Jin bi ti ben û tayî ji bo pîrektiyê bi mêr girêdayî nîne. Mêr jî di wê rewşê de nîne ku li ser jinê serwer bibe û jêre bibêje ‘tu jina min î’. Nêçîrvanî karek e ku xwe pê mijûl dikin û ne berdar e, wexta nebe jî zêde qîmeta xwe nîne. Di nava civakê de hîn ew rewş nîne ku bibêje; ev zarokên min in. Zarok ên jin-dayikê ne. Jin-dayik li gorî xwezaya xwe di wê rewşê de nîne ku li pey şehweta xwe biçe û ji bo zewqê têkiliya cinsî deyne. Bi qasî her ruhber û zindiyî seksualîteyeke wê heye. Têkiliyeke cinsî ji bo zêdebûnê heye. Jin-dayik zarokan mezin dikin, ji ber ku zarok ji wan in. Ji ber ku ew zarokan tîne û xwedî dike, vî mafî jî bi dest dixe. Ji lewra di demekê de ku ti maneya diyarbûn û nediyarbûna bavbûnê di nava civakê de nîne, behsa mafê bavtiyê jî kirin kelevajiye û heta tiştekî dûrî aqilan e. Lê xuşk û birayên jin-dayikê girîng in. Ji ber ku bi wan re mezin bûye. Xal û xaltîk hêza xwe ji vê huqûqa kevin a jin-dayikê digirin. Malbata jin-dayikê wê wextê ji xal, xaltîk (eger hebe zarokên wan) û ji zarokên wê bi xwe pêk tê. Gotina ‘malbata dayikanî’ jî vê mijarê îfade dike. Jin-dayika li serê quncika neolîtîkê rûniştî û çanda civakî ya xwedawendiyê ya ji wê çêbûyî mirov dikare bi vî awayî şîrove bike. Ji bilî xalan mêr bintûte, hebûn û tinebûna wan zêde li ber çavan xuya nake. Mêrtî û bavtî hînê çênebûye.

Ev vedîtinên bingehîn ên îdeolojîk ên rahîbên Sumer û Misriyan ku tevahiya dîrokê û hê jî bandora xwe dewam dikin, di vê qonaxa dîrokê de derdikevin. Bi têgînên nû afirandin, şêwaza fikrê ya bi riya mîtolojiyê hûnandin û ev yek kirin hîmekî bingehîn ji bo meşrûiyeta sîstemê. Taybetiya bingehîn a van mîtolojiyan –mîtolojî, bi zimanê Yewnanî çîvanok û efsane - ew bû ku cîhana xwedayan a nû derxistibûn ser bûyerên xwezayê. Xwedayên destpêkê En, Enlîl û Ra, cîhana efendiyan – Reban – pir bi hostayî mezin dikin û vedişêrin. Hukumdariya çîna koledar a ava dibe bi xwedabûnê re di zikhev de mezin dibe. Efendiyên nû, çawa bêyî bixebitin bi hukumdariyeke bêhemta li ser text û di qesran de xwediyê jiyanê ne, her weha nîşaneyên wan ên xwedayî ku hatine hûnandin û biriqandin jî, di ser hemû hêzên xwezayê re ne. Hakîmiyeta civakî siya xwe daye ser hakîmiyeta xwezayî. Li ser dînê ruhberiyê yê xwezayê, dînê xwedayan ên ferman dikin, hatiye ferzkirin. Li cihê ku pêvajoyên xwezayî bi ruhan werin ravekirin, bi xwedayan tê ravekirin, ev yek di zêhniyetê de dibe guhertineke bingehîn. Bawer dikim tê fêmkirin, ka çima ji vê pêvajoyê re ne şoreş, dij-şoreş tê gotin. Ji ber ku di dîrokê de pêvajoya herî xeter û neyênî daye destpêkirin. Pir girîng e, em hinekî din, hûrûkûr li ser mijar û dabaşê rawestin. Têgihîştina xwezaya zindî, li derdorên ilmî yên îro,

yek ji mijarên sereke ye, herî zêde tê guftûgokirin. Wexta me fîzîka kûantûmê rave kiribû, em bi kurtî li ser vê yekê rawestiyabûn. Ya rastîn, mîna ku di civaka xwezayî de nebe jî, her hebûna xwezayî qanûnek xwe ya tevgerê û asta xwe ya manayê heye. Ev têgihîştin yek ji dîtinên herî şoreşger, tê qebûlkirin. Sûbjektîfa hebûna bûye maddî rê ve dibe enerjî ye. Enerjî maddeyeke rastî nîne; bi gotineke din ruhê maddeyê ye. Her roja diçe, bi cureyên cihêreng ên enerjiyê di xwezayê de pencereyên pir nû têne vekirin. Wexta tê gotin; wê paşerojê bibe ya fizîka kûantûm a “nanoteknolojî” ev pêşketin tê destnîşankirin. Di encamê de bi awayekî cuda be jî şêwazê civaka destpêkê bi herikîna xwezayî re lihevkirî, bi têgihîştineke rast, jiyana ekolojîk esas digire. Mirovatî ji ber ku ji vê prensîbê qut bû û dûr ket, îro pirsgirêka hawîrdorê gihîştiye asteke xeter û tehlûke. Di bingehê qutbûn û dûrketinê de jî zêhniyeta şaristaniya civaka çînî û şêwazê hilberandina wê, heye.

Çarçove û têgîna dewletê di malzaroka perestgehên rahîban de pêk hat, lê yên dewlet kirin sazî û xwediyê hêza desthilatiyê, şefê eskerî û meclîsa rûsipiyên civaka hiyarerşîk in. Desthilatdariya dewletê, di navbera van sê aliyan de piştî têkilî û nakokiyên dûrûdirêj diyar dibe. Di destpêkê de qral-rahîp serdest in, paşê her ku diçe ev sazî cihê xwe ji meclîsa rûsipiyan re – demokrasiya seretayî – dihêle, pişt re serdestiya şefê eskerî pêş dikeve ku ew xwediyê hêzê yê dawî û diyarker e. Ev pêvajo di destana Gilgamêş de bi zimanekî helbestî û mîtolojîkî hatiye îfadekirin. Gilgamêş bi xwe qehreman û şefê eskerî temsîl dike. Rahîb e û rabîhên berê yên xwediyê hêzê pir tepisokî bûne. Enkîdo wek mînaka yekemîn esker ji barbarên li derveyî etnîsîtê hatiye anîn, derdikeve pêşberî me. Rêxistiniyeke li derveyî xizmtiyê pêş de diçe.

Bandora hêzê ya efsûnkar, hem yekem car rê li ber stû tewandinê vedike, hem jî dibe sedem xwediyên berhemê zêde xwe wek qral-xwedayan nîşan bidin. Pêvajoya ku egoya mirov xwe herî mezin îlan bike, dest pê dike. Êdî xweza û civak wek berhemekî qral-xwedayan tê nîşandan. Hemû mîtolojî beriya her tiştî cih didin vê vegotinê. Ji van çavkaniyan paşê wê dawerive pirtûkên pîroz. Bi vî awayî wê desthilatiya dewletê bêserûbinî bibe. Têgihîştina dewletê ya hê jî wek slogan tê bi karanîn “Ebed-medet dewlet” ji vê derê tê. Eger dewlet pêş neketa, bi taybetî bi mîtolojiyê nehata xemilandin, wê ji sazî û rêxistineke basît a cerdevanan wêdetir negihîşta ti qonaxê. Ji ber ku îqtîdara dewletê ji bo wê demê gelek hatina wê ya karê hebû, xwe wek saziyeke awarte ya xwedayî li ser hemû mejiyan ferz kiriye. Bi vê maneyê dibe ku wek rêxistineke desteserkirinê jî bê fêmkirin. Di vê nuqteyê de hêza îdeolojiyê derdikeve pêşberî me. Îdeolojî dibe sedem ku ev rêxistina desteserker, wek saziyeke pîroz a fermana xwedê were naskirin. Eger îqtîdara dewletê çiqas were mezinkirin û xemilandin, divê em fêm bikin ku li wir şêlandineke mezin û berjewendiyên veşartî hene. Qral-xweda ku ji vê rastiyê hayedar in, xwe kirine sazî. Qesrên bi heybet, hebûneke eskerî ya ji kesên bi hêz pêk hatî, îstixbareteke baş, haremeke balkêş, xanedaniyeke navdar, şecereya nîşan dide ka ji koka kîjan xwedayî ne, wezîrên her tim pesnê wan didin û ebdên stûxwar ji bo vê sazîbûnê ji wan hêmana ne, bêyî wan nabe. Qebrên piramît bi xwe, ji bo dunyayeke mayînde qesr in. Kinc, hêzeran û mor ji aksesûwarên wan in, timî ji xwe kêm nedikirin. Ji hemû endamên civakê re ya dima jî ev bû; diviyabû ebd timî ji van saziyên xwedayên mezin re serî bitewînin û şikir bikin. Di pirtûkên pîroz de gelek sifatên xwedê hene, piraniya van têgînan sifatên qral-xwedayên destpêkê yên Sumer û Misriyan e. Beşek ji wan jî versiyonên dubare ne, yan hatine guhertin.

Bi mirina wan re – ya rastirîn çûna wan a dunya din – hemû berdestiyên wan bi awayekî zindî dihatin definkirin. Ji ber ku berdestiyên qral beşek ji bedena wî dihatin hesibandin. Ya rastîn tevî bedena qral definkirina wan, ji bo xizmetê li dunya din ji qral re bikin hewce bûn. Zurriyeta wan a li dunyayê jî dimîne wê hebûna wan dewam bike. Têgîna “bêmiriniyê” jî hinekî wisa derdikeve. Bi vê mînakê, bi awayekî balkêş xuya dike ku wexta mejiyê analîtîk ji rastiyê qut dibe, çawa civakê vediguherîne. Ji bo avakirina piramîdekê bi tenê, divê bi sed hezaran kole bi mirina xwe bixebitin. Desthilatiya dewletê ya tê avakirin, dibe erdhej û zordariyeke mayînde li ser serê mirov. Di ferhenga mirovatiyê de êdî têgînên zilm, mehşer û xelaskar hêdî hêdî bi cih dibin. Şexsiyeta peyxemberan wek şervanên azadiyê di van şert û mercan de reng digire. Peyxemberê wek xelaskarên vê felaketê derkevin pêş, çavkanî dîsa civaka Sumer e.

Ka em bi kurtî careke din çavekî li saziya dewletê bigerînin ku heta em digihîjin qonaxa dewletê ya feodal. Qral-xwedayên Sumer û Misriyan, wexta dimirin, xizmetkarên jin û mêr, ji bo li wê dunya din jî ji wan re xizmetê bikin, bi saxî tevî xwe defin dikirin. Ji bo avakirina her qebreke xwe bi sed hezaran kes di asta mirinê de xebitandin. Ji bo zumreyeke piçûk kesên li hawîrdora îqtîdarê quncikek ji cennetê ava kirin û bi kesên din re danûstendineke ji kerî û heywanan wêdetir kirin. Klan, qebîle û saziyên din ên civakî yên li dijî koletiyê derketin, li siyaseta îmhayê qewimandin. Ji serê mirovan qesir û birc ava kirin, û ev yek wek karekî bi şan û şeref dîtin. Di nav civaka mirov de yekem car kuştina sîstematîk wek hunerekî xwezayî vedîtin. Bi awayekî serketî karîbûn jinê bixin qefesê. Hemû xeyalên xwezayî yên zarokan berbend kirin. Li ser navê azadiyê, mirov neçar kirin, li çolan, çiyan û di kûrahiya daristanan de bijîn. Ne tenê keda koleyan, her weha hemû bedana wan kirin amûrekî hilberandinê. Ji mejiyê

analîtîk, li ser hîmê derewan mîtolojiyeke muhteşem pêk anîn. Wek mêtingerî û zordariya efendiyan têrê nekiribe, rahîban jî cîhana manewî ya xwedayan a zordestî û mêtingeriyê kirin îbadet û weke baweriyeke bingehîn di mejiyê mirovan de bi cih kirin. Ferz kirin ku exlaq û huner, timî pesnê wan bide û wan xweşik bide xuyakirin. Di şûna têgihîştina hawîrdora xweza û têgihîştina civaka mirov a gerdûna zindî de, têgihîştina mirov bi xwedayên li ezman û li bin erdê yên ceza û bêruh dikin, tijî kirin. Ji bo kulmeke efendiyan xela û tinebûn nebû, lê komên din timî di nav birçîbûn û nexweşiyê de digevizîn. Di şahiyên xwe de jî lîstikên tê de mirov dihatin kuştin esas digirtin

**Qûtbûyîna feraseta analîtîk ji feraseta hêstî**

Bi vê mijarê ve, nuqteya duyemîn a girîng, qutbûna têkiliya di navbera mejiyê hisî û mejiyê analîtîk de ye. Vê qutbûnê rê li ber xeter û cudahiyeke mezin vekiriye. Mejiyê hisî bi hemû ruhberan re heye. Bi gotineke din, di hemû pêvajoyên xwezayî de rewşa xweser a sûbjektê, rewşa mejî ye. Mejiyê hisî di pêvajoya xwezayî ya tekamulbûna ber bi cinsê mirov de hêdî hêdî ber bi mejiyê analîtîk ve diçe. Di mejiyê analîtîk de hilbijartin bi lez e, lewra qabîliyeta wê ya guhertinê xurt e. Lê di heman demê de aliyê wê yê ji rêderketinê jî ew çend xurt e. Mejiyê hisî, tevî ku basît e, bi xweseriyeke ajoyên hundurîn zelal e. Yanî tê maneya veguherîna refleksên bi şert, bi refleksên bêşert.

Ji bo hînbûnê ajo rêbazeke basît in, lê bi îstiqrar in. Berhemê tecrubeyên bi sed hezar salan e. Lewma bi hêsayî naxapin. Taybetiyek wan a din jî ew e ku bi jiyanê re têra xwe têkildar in. Li hemberî şertên der ve û hundur ên jiyanê eleqeder dikin an jî gef dikin, yekser reaksiyon nîşan didin. Lê ev aliyê wan, bi lez pêşî li rola wan a mejiyê analîtîk digire. Dîsa jî ji bo jiyanê mejiyê esas mejiyê hisî ye. Şîrove nake, dide jiyîn. Şîrove çiqas pêş dikeve, ji rêderketin jî ew çend zêde dibe. Mejiyê analîtîk bi şîroveyê, rêyên nû dide ber mejiyê hisî û şikil dide tevgera wî. Ev yek zêdetir ji bo cureyê mirov ê pêşketî wisa ye. Jixwe şêwazê jiyana civakî ya cureyê însan bi asta pêşketina mejiyê analîtîk re têkildar e. Yê bi awayekî lezgîn civakê pêş de dibe mejiyê analîtîk e. Lê ji ber ku ji hisan bêpar e, wexta serbest dimîne, xeter e. Bi taybetî, mejiyê analîtîk piştî ku hînî çanda şer û desthilatiyê dibe, pir xeternak dibe. Mejiyê analîtîk ê em qalê dikin di şerên îmhayê yên serdeman de bi awayekî balkêş xwe nîşan daye. Ji ber ku wek makîneyekê dixebite, ji hisên mîna êşê, tirsê û hezkirinê bêpar e. Bi sedema sempatî û empatiyê nas nake, taybetiya xwe ya îmhaker bi awayekî pir xeternak ferz dike. Berovajî vê yekê, dema bi mejiyê hisî re lihevkirî bixebite, ji bo pêkhatina civakên herî têkûz ên xwedî qabîliyeta analîzeke payeber, ro leke diyarker dilîze.

Di serdema civaka dewletparêz a koledar de ev her du mejî ji hevdu veqetiyane. Belkî jî di asta herî jor de, ji mejiyê hisî yê li ser civaka xwezayî serwer bû veqetîneke mezin dibe, û di şûnê de mejiyê çînek li ser hunerê mêtingerî û zordariyê diponije, yekem car derdikeve pêş me. Ev bûyerek e, wê bi xwe re encamên xeternak bîne. Berhemê pir zêde yê koledariyê ku li ser berhemê zêde yê civaka neolotîk pêk hat, ji bo avabûna vê çînê bû zemînê maddî. Tenê bi rêvebirina hilberandinê dest datîne ser piraniya berheman. Piştî vê yekê, dor tê avakirina zêhniyeta van berheman biparêze. Di encama lêgerînê de xwedayên mîtolojiya nû yên ferman dikin derdikevin ser dika dîrokê. Pêvajoyeke xurt a mejiyê analîtîk dest pê dike. Mijarên herî zêde ev mejî li ser sekiniye, dîtina rêzikan ji bo rêvebirina ebdan e. Di heman demê de ev rêzik wek fermana xwedayên namirin nîşan dane. Ji ber ku ev mijar di dîroka mirovatiyê de cihekî girîng digire, ev dibe sedema meznahiya rahîbên Sumer û Misrê. Mejiyên wan ên ji civak û jiyana xwezayî qut bûyî, sîstemeke mezin a mîtolojîk a hunandî afirandiye. Ji bo ebdan pê bidin bawerkirin, sîstema dibistanên efsûnkar, perestgeh û peyker ava kirine. Di şûna dînên ruhparêz ên civaka xwezayî de ku zirara wan nebûn, dînên xweda yên ferman dikin afirandin û stû tewandin daîmî kirin. Ketin cîhana tirsê, belovajîkirin û anîn ziman ka çima hewce ye ji xwedayan bitirsin û wexta guh bidin xwedayan wê çawa bêne xelatkirin. Ev xebat bi nazenînî û hostatî kirin. Yekem car utopyayên naveroka xwe cennet û cehennem vedîtin. Ya esas, ji çîna efendiyên nû re sîstema îdeolojîk tê avakirin ji bo bi wan re were lihevkirin. Şêwazê fikrê mîtolojîk e, ev yek li gorî demê li cih e. Ya rastîn, dînê zindîtiyê (anîmîzm) wekhevî û azadîxwaz e. Dînê nû yê bi giranî mîtolojîk e, dînê çînekê ye, wekhevî tê de nîne, dînê koletiyê ye. Ji sedî sed stûxwarkirinê ji xwedayan re – efendiyan – ferm an dike.

Ev zêhniyet di dîroka mirovatiyê de dij-şoreşek e, û pêngava herî mezin a mejiyê analîtîk e, ya pêşketina mejiyê çînekê ye. Êdî dîrok, wêje, huner, huqûq û polîtîka, ji nû ve bi mejiyê vê çînê tê hûnandin. Em vê rewşê bi awayekî herî xurt û orjîn di mîtolojiyên Sumer û Misriyan de dibînin. Îdeolojiya çîna mêtinger a serwer êdî ketiye ser rêya civaka jor û civaka dewletparêz. Gavên li ser vê rê, wê li ser navê hemû civakê werin avêtin. Îdeolojiya jin-dayikê ya ji civaka xwezayî mayî wê were mêtin, naveroka wê were pûçkirin, asîmîlekirin û wê bixînin xizmeta nîzama xweda-mêran. Mîna ku çawa jin xistin xizmeta – destpêka fahîşetiya taybet û giştî – mêran. Hemû endamên civaka xwezayî yên azad-wekhev, wê bibin endamê çîna ebdiyetê. Destaneke Sumeran dibêje; mirov ji "gûyê" xwedayan hatine afirandin. Dîsa yekem car destanên Sumeran dibêjin; jin ji parsûyê mêran hatiye afirandin. Bi rastî, mîtolojiya Sumeran serketineke wer awarte ye, bandoreke mezin dike li mîtolojiyên piştî xwe tên û heta dibe yekemîn çavkaniya dînên yek xwedayî, wêje û huqûqê. Di destanê de taybetiya Gilgamêş bi he man awayî dadiwerive nav hemû destanên cîhanê.

Ji ber ku bi awayekî berfireh analîzkirina zêhniyeta Sumeran mijara me nîne, bi kurtî em dikarin bibêjin; dîrok yanî şaristanî, ji bo dest pê bike, ne tenê zordarî, mejiyê analîtîk jî dibe çavkaniyeke bingehîn. Paşê divê em rehên fikra metafizîkê jî di vî mejiyî de bibînin. Kulmeke efendî netenê li jor li qesrên mîna cennetê rûniştîne û rojên xwe derbas dikin, her weha hîmê efsane û cîhana utopyayên timî serî li mirovatiyê bigerînin, datînin. Derewa mezin a civakî ku pêk tînin, di mejiyê hemû mirovatiyê de reh ber dide û saziyên wê têne avakirin. Ev yek bi her cure mîtolojî, destan, perestgeh û dibistanan tê kirin.

**Di Civaka Cînsiyet parêz de yekemîn û duyemîn şikênastina çandî.**

Di rewşa jinê ya qefesê de tenê di warê deng û xemlê de hin pêşketin hene. Di asteke dûrî aqilan de koletî kûr bûye, û veşartî ye. Jina serdema navîn, ji aliyê civaka cinsiyetparêz ve cara duyemîn di warê çandê de tê şikandin. Em şikestina yekemîn a jinê di warê çandî de, di qonaxa derketina dewleta koledar de, di rewşa xwedawend Înanna-Îştar, şikestina çandî ya sîstema stewiyayî di warê jinê de mînaka wê, xuşka Mûsa Mariam û di mînaka dayika Hz. Îsa Meryem, jina Hz. Mûhammed Eyşe de bi awayekî balkêş dibînin. Êdî ti şopên xwedawendiyê nemane, her weha cihê jinê yê tê fikirîn nêzî şeytên e. Nerazîbûneke wê ya herî piçûk dikare wê bike şeytan. Her kêlî dibe ku ruhê xwe bifiroşe şeytên. Dikare mêr ji rê derbixîne. Rewşa wê ya pîrasêr û sihêrbazî şewitandina wê ferz dike. Zarokên keçik bi saxî têne binaxkirin; bi awayekî cinsî mêran ji rê derdixîne; girseyeke mezin bi keviran jinê dikuje. Bi vî awayî çandeke kuştinê pêk tê. Di civakê de koletiya herî kûr a bi hezarê salan e daweriviye heta roja me ya îro. Êdî wer giran bûye ji binî derketin zehmet bûye. Eger em dixwazin asta koletiyê ya sîstemê fêm bikin, divê em mijara jinê analîz bikin. Qulp, xelek, qelen, xemil û xêzên bi jinê ve hatine kirin çanda koletiyê îfade dikin. Mîna ku zimanê wê hatibe jêkirin bêhiş û mejî hatiye kirin. Bûye dayikeke zûha ya mîna zeviyekî ku mêr kengî bixwazin dajon. Êdî ew di civakê de kirdar nîne, tenê eşyayek e. Ji xwedawendiya civaka xwezayî ti eser û nîşane nemaye. Ji jina rêveber a zana ya ciwan û zarokan, ji jina mêr li dorê dizîzikîn ti nîşane nemaye. Li dijî civaka xwezayî, sîstema civaka feodal jî veguherîna zêhnî kûrtir dike. Bi rêya mejiyê analîtîk gavên mezin diavêje. Şêwazê fikrê hem ê felsefî, hem jî yê dînî, zêhniyeta civaka serdest a nû pêk tîne. Her du awayên fikrê jî li ser hêmanên civaka berê yên vediguherin, serdestiyê bi dest dixin. Wek civaka Sumer çawa nirxên civaka neolotîk ji bo sîstema xwe ya nû sentez kir, civaka feodal jî hem ji hundurê sîstema berê û hem jî ji derveyî wê, nirxên çînên bindest û nirxên manewî yên etnîsîteya li ber xwe dida sentez kiriye. Di vê pêvajoyê de herikîna pratîkê diyarker e. Bi gotineke din, pratîk dibe hêzeke ku hebûnê dide demê. Dem êdî pratîk pêk hatiye.

Bîrûbawerî taybetmendiyên xwe yên mîtolojîk bi têgînên olî û felsefîk ve nû dike. Hêza împaratoriya ku bilind dibe li dewsa xwedayê lewaz û bê hêz, bi şêweya xwedayê herî mezin ê wek nûnerê hêzek gerdûnî dike tê teyîsandin. Tiştên ku jiyana maddî de tên kirin, di bîrûbaweriyê de jî hemberê xwe dibînin.

Di jiyana civakî de ebdiyet wek rewşek xwezayî ya xwedê dabe tê hesibandin. Gotina ebdiyetê kes dema ji dayika xwe dibe pê re heye, ne tiştekê ku pişt re digire. Mirov ebd tê dinê û dimire. Ji bilî ebdiyetê şêweyekî din ê jiyanê nayê fikirîn. Xwedayekî bi tenê heye û ebdên wî hene. Melek û peyxemberên di navberê de jî qasid in, fermanan tînin. Eger em van tespîtan bi zimanê sosyolojîk bibêjin; xwedê otorîteya mucered a dewletê ya bûyî sazî temsîl dike. Melek artêşa karmendan, peyxember û melekên sereke wezîran û burokrasiya jor sembolîze dikin. Civak bi sîstemeke sembolan a xeternak tê birêvebirin. Di navbera rêveberiya sembolan û rêveberiya xuya dike de, têkiliyeke xurt heye. Heta têkiliya di navbera rêveberiya sembol û rêveberiya berçav de ji hev neyê derxistin, em bi awayekî durust nikarin li civakê serwext bibin.

Eger em dixwazin li rêveberiya berçav a civakê serwext bibin, divê em perdeya li ser panteonê – sîstema xwedê – rakin. Wê demê, wê baş were dîtin ku bi hezar salan di bin navê qûtsiyetê de rûyê kirêt û zalim ên mêtinger û zordaran hatiye veşartin. Agahiyên em ji mîtolojiyê hîn dibin, em dikarin ji dînan jî, bi taybetî jî dînên yek xwedayî jî hîn bibin. Ya Mûsa li kevneşopiya Hz. Îbrahîm zêde dike ew e, ku jinê ji sedî sed digire bin zevtûreptê. Di dema Hz. Îbrahîm de jin hê tam nehatiye piçûk xistin. Têkiliya di navbera Îbrahîm û Sara de hema hema di weznekê de ye. Di mînaka Mûsa-Marîam de kesa bi navê Marîam ku xuşka wî ye, bi têkçûneke dilêş hatiye mehkûmkirin. Hêza xwe ya dawî jî wenda dike. Li cem Hz. Dawûd û Silêman jî jin amûrekî yekalî yê zewqê ye. Ti otorîteya wê xuya nake. Jin di nav qraliyetan de amûrê zewq-kêfê ye, amûrek e, pê nifş dewam dikin. Her çiqas carnan şexsiyetên mîna Ester, Dalîla derbikevin jî, ew jî nikarin xwe xilas bikin ji bo neyên bi karanîn. Em di mînaka Hz. Îsa û Meryem de tenê gotinekê ji devê Meryemê nabihîsin. Tu dibêjî qey zimanê wê hatiye jêkirin. Ber bi roja me ya îro Xirîstiyanî di warê pêşketina jinê de gaveke mezin e. Di mînaka Hz. Mûhammed û Eyşe de trajediyek heye. Li hemberî otorîteya Îslamî ya feodal, Eyşe gazin û giliyekî mezin e. Dîrokzan radigihînin ku wiha gazin kiriye; "Ya Rebî! Li şûna ku te ezê bianiyama, te kevir bianiya çêtir bû." Di lîstika îqtîdarê de eger tu evîndara herî xoşewîst a peyxember jî bî, encam naguhere û tê gotin; ev nifir lixwekirin jî bi vê sedemê h atiye kirin.

Em dikarin bibêjin di vê serdemê de civak bi tevahî ji aliyê rûhî û fikrî ve hatiye pûçkirin. Tenê dengê civaka jor a bi "Elllah, nal û şûran" dike gurîn û xumîn heye. Hemû destan li ser dramatîkeke zevtkirin û kuştinê hatine avakirin. Belkî ev tablo hinekî zêde hat mezinkirin, lê rastiya rûhî ya serdemê bi awayekî guncaw îfade dike. Di şûna koletiya arkaîk de sîstema koletiya klasîk rûniştiye. Civak û dewleta temsîl dike, di asta jor de serdema xwe ya stewiyayî dijî. Ji bo sîstemê hemû sazî û têgîn hatine avakirin. Mizgeft, dêr û hawra, her roj bi naqoz û azanan, pîrozbûna sîstemê îlan dikin. Ji vir û pêve dewleta pêş de bikeve dewleta kapîtalîst e. Her çend dewleta kapîtalîst bi hêz xuya bike jî, di cewherê xwe de wê qonaxa dawî ya civak dikeve krîza giştî îfade bike. Wek tê zanîn di serdemên herî bi heybet de pêvajo ya ji hevdeketinê bi krîzokan e. Ev qanûna giştî ya xwezayê ji bo pêvajoyên civakî jî têra xwe tê qebûlkirin.

Ebdiyeta civakî tenê rastiyeke çînî nîne. Ji bilî despotan – ku ew jî di destê sîstemê de dîl in – her kes, hemû tebeke û çînên civakî pê ve hatine girêdan. Ji sîstema koledariyê kûrtir, nîzamekî stûxwarkirinê ya veşartî heye. Çendîn nerm dike ew çend jî sîstem kûr dibe. Paradigmaya bingehîn a civakê, sîstemeke ebdiyetê ya pêşî û paşê wê nîne. Ev nîzamê ji ezel heta ebed – ev her du têgîn zêdetir ên serdema dewleta stewiyayî ne – wek heyî dewam bike. Cihê guherîn û îmtîhanê dunya din e. Lewra dijderketina sîstemê ne tenê emelî, her weha rûhî û fikrî jî gunekî herî mezin e. Ebdiyeta mezin, ji bo kesê bizanibe îtaet bike fazîlet û payeberziyeke mezin bû. Kesên afirîner ên di civaka xwezayî û serdema hiyarereşîk a erênî ya serdema qehremaniyê de ji civakê re baş xizmet dikirin, di serdema ebdiyetê de li hemberî xwedê – efendiyan – wek kesên herî xeter, gunehkar û wek kesayetên şeytanî yên divê werin cezakirin, têne lanetkirin. Têgîna şeytaniyê ji bo koma mirovên ebdiyetê red dikin hatiye bi kar anîn. Ev têgîna ku koka wê ji Rojhilata Navîn e, ji bo komên mirovan ên bi sîstemê re nabin yek, tê bi kar anîn. Ji ber vê yekê ye, ji komên Kurdan re yên ku ji kevneşopiya civaka xweza qut nebûne dibêjin; "şeytanperest". Ev beşê Kurdan ê şeytan dihebîne û pîroz dike watedar e.

Li gorî sîstema ebdiyetê ya di serdema xwe ya stewiyayî de dunya cihekî wisa ye her kêlî dibe ku guneh lê bibe. Lewra reveke mezin ji jiyanê heye. Çiqas xwesteka te ya jiyanê hebe, tu ew çend dikevî guneh. Jiyana herî baş ew e ku tu bi her tiştê xwe ji mirinê re xwe amade bikî. Xwediyê vê helwestê xwezayê wek miriyekî ku divê mirov nêzîk lê nebe dibîne û yekser afirandinê bêîmkan dike. Ji bo ebdan xwezaya zindî nayê fikirîn. Ya rastîn di derketina vê sîstematîkê de şopên zordarî û mêtingeriyeke xeter hene. Eger îro jî civaka Rojhilata Navîn nikare bi ser xwe ve were, sedemê bingehîn ê rûhî, ev helwest e, em behsa wê dikin. Li aliyê din, ji bo efendiyan, li ser rûyê zemîn, cîhaneke rengîn a ji cennetê ne kêm heye. Ew û xwedayên xwe – Reb – yên bi heman navî – têgînên rêveberiyê – gelekî xweşhal û razî, jiyana xwe mîna "çîrokên hezar şevan" dijîn. Çîrokên hezar û şevekî, sîstema dewleta stewiyayî ya serdema navîn, bi awayekî mîtolojîk îfade dike.

**Moderniteya Kapîtalîst: Dijminê jinê**

Di serdema navîn de herçend yekparebûna bi bazirganiyê re xira bibe jî dewam kir. Bandora çanda manewî ya giraniya xwe hebû mîmariya dînî derxist pêş. Hecm û şêniyên wan ti carî negihiştin wê astê ku gefan li jiyanê bixwin. Bi jiyana li derve û ya gundan re timî nêzî weznekê bûn. Bi giranî hevdu temam dikirin. Girîngiya cotkariyê, pîşekariya bajêr jî kir karekî pêşketî. Pîşekar hewcedarî gundiyan, gundî jî hewcedarî pîşekaran bûn. Ji nako-kiyê wêdetir di navbera wan de yekparebûneke organîk hebû. Rîska wan a bi tenê felaketên weke erdhej, hişkesalî û şer bûn. Nîzama wan a kele û bircan heybeta xwe dewam dikir. Bazirga-niya mezin hînê di wê astê de nebû ku pîşekar û gundan daqur-tîne. Bazirganî weke sektoreke ekonomiyê normal li ser rêya xwe bû. Di navbera sedsalên 13. û 16. de bajarên Îtalyayê bi bandora Ronesansê jî nûnerên dawî yê vê demê ne. Venedîk, Cenova û Floransa mîna ku di navbera şaristaniya klasîk û şaristaniya serdema nû de bi rola pirê radibin û digihînin hevdu.

Li gorî min, kapîtalîzmê ji destpêkê ve xwe weke eskerî, siyasî û çandî bi rêxistin kiriye, ji rêûresmeke kevin a rêxistinî tê ku bi xasûkî di serî de danehevên maddî nirxên civakî desteser kirine, ha vê rêxistiniyê ji sedsala 16'an û pêve li Rojavayê Ewrûpayê weke civakeke serdest şikil girtiye û bi gewde bûye. Zilamê bi hêz ê pêşî tevî koma xwe ya rêbirr û tolaz nirxên civakî yên li dora jin-dayikê desteser kirin û em dikarin kapîtalîzmê weke xeleka modern a vê rêûresmê bi nav bikin. Li Ingilistan û Hollandayê, berê jî li bajar-dewletên serkêş ên Îtalyayê Cenova, Floransa û Venedîkê, komên kapîtalîst ên pêşî bi dewletê re di zikhev de weke terîqetekê jiyana wan a taybet hebû, bi tiştên nû dikirin bi hostayî pere ji piyasê dimêtin, li bazarên li her devera dinyayê belav bûbûn, bi buhayê alavan dilîstin û bi vî awayî nirxeke mezin desteser dikirin û wexta hewce dikir bêfikar serî li darê zorê didan. Ango kapîtalîzm çalakiya wan komên xwediyê mejiyê analîtîk e. Li hin deveran mirov ji van kesan re dikare xanedan, arîstokrat û bûrjûwa jî bibêje. Ji dizek û heramiyên serdema navîn û destpêkê cudahiya wan a bi tenê û girîng ew e ku bi giranî li bajaran rûdiniştin, bi otorîteya dewletê re ketibûn zikhev û wexta hewce bikira bi awayekî sernuxumandî û di dereceya duyemîn de serî li darê zorê didan. Li gorî xuya dike, rê-zik û pîvanên ekonomiyê hene. Ew jî li gorî van rêzikan bi

mejî û pereyê xwe yê pêşî, karê dikin. Eger li dîroka kapîtalê baş hûrûkûr were kolan wê were dîtin ku nirxê vê helwestê bi temamî bi qasî çîrokekê ye.

Wek derketina her sîstema civakî ya mêtinger û zordar, derketina kapîtalîzmê jî bêdewlet nebû. Dogmatîzma sîstema feodal bi rengekî dînî bû. Ya koledariya arkaîk jî mîtolojîk bû. Di yekê de xwedê bi xwe di şexsê xanedan û qral de berçav bûbû, di ya din de jî xwedê di şexsê dewletê de hebûna veşartî bû û qral ew temsîl dikir. Serdemên zêhniyetê yên mirovatiyê wer hewce dikir.

Eger mirov taybetiyên civakî yên sîstemê di warê jinê de analîz bike, wê gelekî bi kêr û hînker be. Nuqteyeke divê ez ji serî ve bibêjim ev e; çi rastiyek civakî dibe bila bibe, bi tenê serê xwe nabe aliyê wê yê siyasî, civakî, ekonomîk, çandî û hwd. bi veqetîna ji mijarên din were lêkolînkirin, divê mirov ji hewldanên bi vî rengî dûr bisekine. Di nav yekparebûna dîrokê de civaka ku xwe her tim pêk tîne, sîstemên avahiyên wê yên jor û jêr mîna parçeyên saetekê bi hev re dixebitin. Zanyarên Rojavayî di warê veqetandina parçeyan de nexweş in, û bi sedema ji vê yekparebûnê dûr disekinin rastiyê wenda dikin. Ji bo bi awayekî ilmî rastî were fêmkirin, ev rêbaz hewce ye, û pir girîng e yekparebûn li ber çav were girtin

Divê jin wek kurtasiya sîstemê were dîtin û wisa were analîzkirin. Civaka kapîtalîst çawa lûtke û dewama civakên berê yên mêtinger e, jin jî bandora koletiyê ya van hemû sîsteman li asta herî jor dijî. Eger em heta jina di cendereya mêtingerî û zordestiya civaka dewletparêz û hiyarerşîk a herî kevin û dijwar de derbasbûye û şêweyek danê fêm nekin, em nikarin civakê rast rave û tarîf bikin. Ji bo koletiya etnîk, netew û çînî rast were fêmkirin, hewce ye jin rast were tarîfkirin. Tevî ku tîr di çuwal de hilnedihat jî, sosyolojiyê di dawiya çaryeka sedsala 20. de hindik be jî li ser mijara jinê hewlda hin lêkolînan bike. Tevgera Femînîst, karîbûye hawîrdorê, şer, texrîbên xeternak ên îqtîdarê, dîrok û karektera cinsiyetparêz a serdest, bide fikirandin. Ev nuqte bi xwe jî, di serî de ilmên civakî yên diviyabû objektîf bin, karektera cinsiyetparêz a hemû ilman nîşan dide. Ilim cinsiyetparêz e.

Ezê bi awayekî pozîtîf şîrovekirina jinê ji beşên pêş re bihêlim û niha em li koletiya kevneşop a kapîtalîzmê û çi bi xwe re aniye, binerin. Divê em di serî de bibêjin, li gorî cewherê sîstema kapîtalîzmê ters e, û nabe ku azadiyê bîne. Îddîaya dibêje; “bi sedema kapîtalîzmê kevneşopî têk birine, zincîrên dora jinê qetandine,” xapandin û belovajîkirineke mezin e.

Têkiliya sîstemên tehekumkar bi azadiyê re ev e; difikirin ka wê hê çawa bi awayekî çor û rêbazên qurnaz dewam bikin. Jina herî zêde li ser navê wê destanên evînê hatine hûnandin û jina koletiyeke çor li ser hatiye ferzkirin, heman tişt in. Jin mîna çivîka kanarya di qefesê de – mala di bin destê mêr de – tê girtin. Çawa çivîk wexta tê berdan li paş xwe nanere difire û diçe, eger jin hinek zana bibe û cihekî wê lê azad bibe nas bike, mal, qesir, dewlemendî, hêz û kesê nerevê nîne. Potansiyela wê heye ji hemûyan jî bireve. Bi qasî jinê ti hebûn bi girtinê – tinekirin û tepisandina şertên sûbjektîf û objektîf ên pêşketinê – nehatiye mehkûmkirin. Eger hemû analîzên civakî cihê xwe nabînin, plan û bernameyên wan nameşin û bûyerên li derveyî mirovatiyê diqewimin, ev hemû têkiliya wan bi asta koletiya jinê re hene. Ji lewra heta çareseriya jinê, azadî û wekheviya wê nebe, ti pirsgirêka civakê ji binî ve çareser nabe û wekhev-azadiya wê pêk nayê.

Bi sîstema kapîtalîzmê re rengê jinê yê derketiye holê, eger mirov mîna mal bibîne, dikare me hînê nêzî rastiyê bike. Em dizanin, di serdema koletiya klasîk de herî zêde jin li bazaran dihat kirrîn û firotin. Ev rewş di serdema koletiya feodal de jî bi navê cariyetiyê dewam kiriye. Ya li vir tê firotin bi tevahî jin e. Qelen û kara siyasî ya ji vê meseleyê, aliyekî din ê mijarê ye, xwe dawerivandiye heta nava malê. Di kapîtalîzmê de mîna qesabekî (goştfiroş) gewdeyê wê parçe parçe ji hev tê veqetandin û ji bo her parçeyekî buhayek hatiye destnîşankirin. Ji porê wê heta paniya wê, ji sînga wê heta qorika wê, ji navika wê heta berzika wê, ji nav milên wê heta çongên wê, ji nava wê heta çîpên wê, ji çavên wê heta lêvên wê, ji hinarokên rûyê wê û heta parçeyên stûyê wê, ti cih û parçeyê wê nemaye buha lê nehatibe birrîn. Pir mixabin nehatiye pirsîn, gelo ruhê wê heye yan na, eger heye, nehatiye hişê wan bibêjin ew çiqasî dike. Jixwe ji aliyê mejî ve ji berê de “kêm” aqil” e. Li malên taybet û kerxaneyan amûrek e ku zewqê dide. Makîneya zarok anînê ye. Karê herî zehmet zarokanîn ji kedê nayê hesibandin. Dîsa yek ji karê herî zehmet zarok mezinkirin, heqdesta wê nîne. Li hemû saziyên girîng ên wek ekonomî, civakî, siyasî û saziyên eskerî cihê wê ji bo bibe numûne heye. Amûrekî reklaman e jê nayê gerîn. Di nav afirîneran de ya herî zêde wek malekî cinsî li pazaran tê firotin e. Ya herî zêde jê re dijûn têne dayîn û tê lêdan e. Di çîroka evînê de ya herî zêde tê xapandin ew e. Li her tiştê wê dest tê werdan. Nasnameyeke ji bo bi jintî bipeyive ya herî zêde bi deng û rengê wê hatiye lîstin. Mirovek e, bi mirovatî hevaltî pê re nayê kirin. Jin ew kes e ku li ba mêrê herî ji xwe re bibêje ez mêrim, ji hisa êrîşê xilas nabe. Jin êdî malek e, her mêr xwe li ser wek împarator dibîne.

Em hê jî dikarin tarîfa xwe dewlemendtir bikin. Lê aliyê seyr ê meselê, mêrê civaka serdest çawa yeqîn dike ku wê bi nasnameyeke ev çend bi taybetiyên neyênî hatibe xemilandin re bi awayekî asayî bijî. Xuya ye, mîna koleyeke pir hêmin û milahîm tê hesibandin. Ya rastîn ji bo mêrekî bi şeref, jiyaneke hevpar bi nasnameyekê re ku ev çend taybetiyên neyînî hatiye xemilandin pir zehmet e, û piçûk ketin e. Her çend Eflatûn bi sedema xwestiye jin li derveyî

dewletê û civakê bimîne, hatibe rexnekirin jî, di helwesta wî de van taybetiyên neyînî yên jinê bi tesîr in. Ev helwest li cem gelek fîlozofan heye û divê mirov rast bixwîne. Mînak, Nietzche jî destnîşan dike ku jiyan bi van taybetiyan re wê ji sedî sed mirov xira bike. Baş e, tevî vê yekê çima di civakê de mêr ew çend bi ser jinê de miriye? Ji ber ku ev civak hatine xistin. Ji ber ku ev mêr hatine xistin. Ev ji taybetiya koletiyê ye, ya dikare derbasî yên din bibe. Koleyeke ev çend bi kêr û miroveke hînî koletiyê bûye, bêguman wê hevpar û şîrekek be, her kesê lê bigere. Jina piçûk hatiye xistin, civaka piçûk hatiye xistin bi xwe ye, mêrê piçûk hatiye xistin. Serê por pê ve nîne, wê şehê wî jî wisa be. Bi kurtî, heta rastiya jinê baş neyê zelalkirin, jinîtiya zana ya azad a şaristaniya çînî û dayik-jinîtiya azad a civaka xwezayî xwe negihînin hevdu, wê hevala jiyana hevpar a di weznekê de neyê afirandin. Her weha heta mêrtî ji nû ve neyê pêkanîn wê bihevrebûnê nebe.

Em di warê civakî de dikarin pêkanîn û şêwazê rêvebirina kapîtalîzmê di gelek rastiyan de bibînin, bi taybetî di warê mêr, malbat, kar, karmendî, perwerde, tendurustî, huqûq û gelek qadan de çav bidêrên. Eger em malbatê bi kurtî tarîf bikin, em dikarin wiha bibêjin; saziya bingehîn a civaka dewletparêz û hiyarerşîk, hucre û molekula herî piçûk a sîstemê ye. Împaratorê herî jor siya wî ya di nav malê de “împaratorê piçûk” e. Malbat dezgehek e ku koletiya civakê xwe lê nîşan dide. Koletiya di nav malbatê de bingehê koletiya civakî misoger dike. Weke ku sîstem her roj, her saet di nav malbatê de ji nû ve tê afirandin. Lewra barê herî giran jî malbat radike. Malbat kerê hêmin û milahîm ê civaka dewletparêz û hîyarerşîk e. Timî dikarî lê suwar bibî û xwe pê bibî her devera dixwazî. Sîstema kapîtalîzmê ya li gelemperiyê belav dibe, bi awayekî balkêş xwe di malbatê de îrtîsam dike û ev yek ji têkiliya xurt a di navbera her du rastiyan de tê.

Ez wexta li ser têkoşîna li dijî kapîtalîzmê diponijim, timî têkiliya pîrek û zilamî tê bîra min. Eger zilam li gorî atmosfera têde, jiyaneke nor-mal pêşkêş kiribe, zehmet e, mirov vê jinê bixe pozîsyona ku li dijî zilam têbikoşe, ha di vê çarçoveyê de eger karker jî heqdes-tekî baş bistîne, zehmet e, mirov karibe wî bixe pozîsyona têko-şînê li dijî efendiyê wî yê kapîtalîst ê heqdestekî baş dayê. Karke-rê ku di berdêla heqdestekî gelekî kêm de li ber efendiyê xwe yê kapîtalîst xwe qulupanî dike, bihêlin azadbûna wî, wê li dijî pir-raniyên civakê jî xulamtiya sîstematîka efendiyê xwe bike. Jixwe di demekê de ku artêşa bê karan ref bi ref zêde dibe, karkerekî rewşa xwe misoger kiribe bi qasî karmendekî dewletê belkî jî ji wî wêdetir rewşa xwe ewle û misoger dihesibîne. Jixwe burokra-tê dewletê çiqasî dibe proleter, di nav refên proleteran de jî ewqasî burokratbûyîn çêdibe. Çawa ku li jor bûrjûwazade û feodalzade têkel dibin, şiklekî mîna wan li jêr jî di nava karker û karmendan de pêk tê.

Civaka bajêr a weke miqnatîzê ez ji civaka gund kişandim, bi rewşa hatiye analîzkirin ji bo min mekanê bingehîn ê pirsgirêkê ye. Gunehkarê sereke yê ji rizîna civakê di nava xwe de û veqetî-na ji wê, bajar e, û civakbûna bajêr rê li ber vekirî ye. Ya rastî, ci-vaka bajar a şaristaniya dewletdar a çînî ye. Civaka klan a herî destpêkê jî bi qasî şaristaniya bajêr li hemberî jiyanê cahil nîne. Berevajî, eger civaka bajêr a şaristaniyê di qonaxa aleta sîstematîk a bunyeya wê ye. Kapîtalîzmê de bi temamî bûbe kujerekî hawîrdorê, herhal ev xuya ye ji ceh Duygusal zekâdan kopmuş, akıl ve anlamını çoktan yitirmiş cinsellik, kapitalizmin kanserojen gerçekliğinin temel göstergeleridir. İktidar için nükleer dehşete bel bağlamaktan tutalım, ucuz işçilik için dünyaya sığmayacak nüfuslar sistemin özüyle ilgilidir. Onun özellikle iktidar biçimlenişiyle. Dünya savaşları, sömürge savaşları ve tüm topluma karşı her düzeyde kılcal damarlara kadar etkileyen iktidar savaşımla rı sistemin iflâsından başka anlama gelmez

Di gihiştina vê qonaxê de weke îndustrî pêşkêşkirina seksê rola xwe diyarker e. Mirov xistine rewşekê ku serketinê di hêza seksualîteyê de dibînin. Lê têkiliya cinsî di jiyana tevahiya zindiyan de weke fonksiyeneke hayjixwehebûnê û bêserûbinî-kirina wê de roleke mirov jê hîn bibe bi cih tîne. Ji zindiyên yek şaneyî bigirin heta cinsê mirov fonksiyona seksualîteyê mirov dikare bi vî awayî rave bike. Ji lewra manedar û heta pîroz e. Komên mirovan jî di tevahiya dîrokê de şêweyekî bi vî rengî yê şîroveyê esas girtine. Bi tevahî lêkolînên antropolojîk jî vê şîroveyê piştrast dikin. Eger têkiliyek an jî têkiliyên divê nebin meta ango îndustrî hebin, pêwîst e ku di serî de têkiliyên cinsî bên. Ji ber ku têkiliya cinsî têkiliya xwe bi pîrozbûna jiyanê, bi bilindî û mezinahiya wê, û domdariya wê re heye. Têkiliyên cinsî divê zêdetir ji rê neyên derxistin, ji ber ku berpirsiyariya wê heye ku jiyanên din nexe tehlûkeyê.

Bikaranîna seksualîteyê, mirov dikare bibêje yek ji amûrên hegemonîk ê bingehîn ê sîstemê ye. Ne tenê kiriye meta û wergerandiye îndustriyeke mezin; di civakê de xwedatiya fallûs a Hindî hem rizandiye hem jî çilcarî jê bihurandiye û dînekî mêran ê cinsparêz û serwer pêk aniye. Nexasim her mêr vî dînê nû weke nîşaneyekê, di serî de wêje li serê quncika hunerê datîne û bi temamî dike fena amûrekî narkotîkê. Li ber vî dînê seksualîteyê narkotîkên kîmyewî jî nabin tiştek û heta mirov dikare bibêje hîç in. Bi tevahî ferdên civakê bi reklamên medyatîk, ne bi tenê bi reklamên ji rêzê, bi kampanyayan kirine kesên di warê seksualî-teyê de ji rê derketî. Ciwan, pîr û kal û heta zarok ferq nake; her kes tê bikaranîn. Jixwe jin kirine weke amûrekî herî pêşketî yê seksualîteyê. Ew bi zêhniyeteke wer mehkûm kirine ku bi qasî serê derziyê beşekî wê bi awayekî cinsî xîtab neke, mîna pênc quriş qîmeta wê nîne, difikire. Malbata pîroz kirine dergeheke seksualîteyê. Ji dayika pîroz û xwedawendiyê ‘pîrejineke’ bêkêr li dawiyê

maye. Rewşeke gelekî xemgîn û xembar e. Bi rêya sûnî ya avishiştinê jin bi temamî kirine amûrekî seksualîteyê û ev yek gihandine asta herî jor.

ji bo her zilamî çalakiya cinsî veguherandine çalakiyeke desthilatdariyê. Çalakiya cinsî ji fonksiyona wê ya biyolojîk a ji bo dewamkirina cins dûr xistine yan jî berevajî kirine û di qada civakî û siyasî de veguhe-randine fonksiyona belavbûn û zêdebûna bêsînor a serweriya desthilatdariya mêr. Çalakiya cinsî veguherandine çalakiya dest-hilatdariyê. Di tevahiya şêweyên têkiliyên cinsî yên homo û hete-ro û hwd. de têkiliya desthilatdariyê bi roleke diyarker radibe. Tevî ku bi awayekî berfireh bingehê xwe yê dîrokî heye jî di ti şêweyê dewlet û civakan de bi qasî dewleta netewe û civaka wê bi awayekî sîstematîzekirî, pirrbelav û bi armanca desthilatdari-yê (ango bi armanca kolekirinê) bi kûrahî û berfireh zêde nehati-ye bicihanîn.

Dewleta netewe bi polîtîkayên seksualîteyê yên hem li hun-dir û hem jî li derveyî malbatê bi temamî dibe sedema jirêderke-tineke desthilatdariyê. Jin xwe weke metayeke seksê, mêr jî xwe dike amûrekî desthilatdariya cinsî û bi vî awayî hem xwe û hem jî civakê dixin nava buhraneke exlaqî û dikin qurbanê şerê desthilatdariyê.

Li gorî civakê, jinek bi mêrê xwe ve girêdayî be û li malekê bi awayekî tê gotin bi namûs bijî, tê qebûlkirin. Eger jin ji vê rewşê derkeve ango gelek mêran bîne mala xwe, yan jî berevajiyê wê zilam gelek jinan bîne malê, gelo rewş ê çawa be? Herhal bi gotineke herî ji rêzê mirov dikare bibêje, rewş ê tevlîhev bibe. Di meseleya pere de rewş hinekî din tevlîhevtir e. Em bi mînaka xwe dewam bikin. Ji ber ku jin der-dikeve derveyî pîvanên giştî yên têne qebûlkirin, bi avêtina wê ya derve dikarin çareseriyekê bibînin. Lê di meseleya pereyan de dibe ku rewş evçend hêsan nebe. Yê pere di destê xwe de digire, eger bi namûs nebe, çiqas pere bikeve ser pereyê wî dikare bibêje; min qebûl e. Mîna di meseleya jinê de, herçî civak e, di vê qebûlkirinê de pere nekiriye amûr. Bi îhtîmaleke xurt karîbûye bibêje; dayîna ser hev a pereyan bênamûsiya herî mezin e.

Jin ji damezrîna hiyarerşiyê vir ve, bi sedema çavbirçîtî û xemsariya mêr ku di bin hêza wî ya çor de nalenala wê ye, bi sîstema kapîtalîst qatekî din bi zincîran tê girêdan. Hebûna herî zêde mêr li ser derewan dike jin e. Tê gotin; li ser mijara cinsî yek ji kesê herî zêde ku xebatên berfireh kirine Freud li ber mirinê gotiye; “jin yanî çi?” Ev rewşeke asayî nîne. Ev rewşeke xeternak e, îdeolojiya serwer a mêr ew afirandiye. Mêrê serwer ê naxwaze jinê nas bike, ji bo ser li vê rewşa xwe bigire, serî li yek ji sîlehên xwe yên girîng wêjeya eşqê dide. Ji bo mêrê serwer eşq yanî veşartina derewê, bêhurmetiya nuxumandî, korfêmî, ajoyên hundurîn ên kor ku timî dibin xwediyê meydanê. Jinê jî tîne wê astê ku bi hêsayî bi vê rewşê bixape. Bêguman ev bi tepisandina jinê ya di dawiyê de neçar ketiye eleqeder e. Jin, ew çend ji şertên maddî û manewî yên jiyanê hatiye qutkirin, her gotinên mêr ên rezîlane û êrîşên wî, bi belengaziyekê mîna mafê wî yê herî xweza qebûl dike

Min bi xwe wek şexs ti car fêm nekiriye û mat bûme ku jin di bin vê “statuyê” de çawa li xwe datîne bijî. Lê divê ez li xwe mikur werim ku pê hesiyame, wexta heywan ji bo serjêkirinê dibin ber qesab, heywan ferq dikin ku wê werin serjêkirin, lewra jî dilerizin û diricifin. Rewşa jinê ya li hemberî mêr her tim vê lerzînê bi bîra min dixîne. Heta jin li ber nelerize, mêr rehet nake. Yek ji hoyê serweriyê ev e. Qesab carekê serjê dike, ew tevahiya temenê wê serjê dike. Rastiya divê were eşkerekirin ev e. Veşartina vê rastiyê bi stranên evînê helwesteke rezîlane ye. Li ser navê şaristaniyê têgîn û hebûnên herî bênirx derbarê evînê de ne. Mêr ti carî nekarî, nexwest bikaribe bi awayekî xwezayî û asayî nêzî jinê bibe. Ez bi xwe mêrekî xwediyê vê helwestê bibînim ezê wî wek qehremanan binirxînim. Pirsgirêk nefsekiyên piçûk û cudahiya cinsî nîne. Ji ber ku hiyarerşiya dewletdar di dema tebeqebûnê de jin di tebeqa herî jêr de bi cih kir. Jin ji ber van taybetiyên statuya xwe yek ji pirsgirêka kûr a civakî ye. Sosyolojî bi sînor be û dereng be jî bi sedema kapîtalîzm ketiye pêvajoya krîzê, eleqe nîşanî pirsgirêkê dide.

Di pêvajoyê de ku her tişt eşkere dibe, mumkîn e mijara jinê xwe bi her alî ve bide der. Zordestî û mijokeriya sîstema kapîtalîst li mijara jinê zêde kir, divê bi awayekî berfireh were fêmkirin. Jin wekî ku goya metayeke herî bi nirx e. Ti sîstemê ewqas hewl nedaye ku jinê bike meta. Di serdemên navîn û seretayî de cariyetiya jinê, koletiya wê wek beşek ji koletiya giştî ya wê demê ye û ev yek ji aliyê sîstemê ve pir girîng nîne. Di wê demê de koletiyeke tenê xweser ji bo jinê nîne. Harem hene mêr tê de ne. Mêrên hatine xesandin jî hene. Kurên bi wan re bidin û bistînin jî hene. Cudahiya herî mezin a di têgihîştina cinsî ya sîstemê de kapîtalîzm dike. Kapîtalîzm wer dike ku organekî wê nahêle neke meta. Vê yekê jî bi gotina wan li ser navê wêje, roman û bi hunerê dikin. Lê belê fonksiyona vî karî ev e; ji bo di rakirina barê sîstemê de ku mirov nikarin xwe lê rabigirin, para jinê zêde bike. Ji bo her xebatekê heqdestek heye, lê ji karê herî zehmet zarokanînê re, ji zarok mezinkirinê re, ji her cure xebatên malê re heqdestek nîne. Koletiya seksê ya ji bo mêr jî bê heqdest e. Jin bi qasî heqdesta li kerxanê, li xaneya taybet nirx û qîmetê nabîne.

Tiştên wek namûsa zewacê û şerefê têne bi navkirin ku hemû qehra “împaratorê piçûk e” divê jin bikişîne. Çawa împaratorê mezin mulkê dewletê wek şerefa xwe dizane, tiştek pê were sedema şer qebûl dike, împaratorê piçûk jî jinê wek malê xwe dibîne; wexta tiştek pê were, dike meseleya namûsê û heta sedema şer qebûl dike. Ya herî balkêş, ruhê jinê bi tevahî hatiye pûçkirin, tenê şiklê wê yê jintiyê hatiye hîştin û kirine “çivîka qefesê” ya bi xemil û

xêz. Bi nîzama deng û makyajê, jin ji nasnameya wê, ji jina xwezayî dûr hatiye xistin, bi giranî pê hatiye înkarkirin û kiriye ku şexsiyeta wê bikuje. Bi awayekî taybet, jin bi rêya jintiyê tê bêşexsiyetkirin. Ev yek vedîtina mêr e û li ser jinê ferz dike. Wek mîna wî be, divê jin li gorî dilê wî rawest e. Wexta wisa nebe jî pir bi hêsanî jinê gunehbar dike. Jin mîna amûrê reklam û teşhîrê tê bi karanîn û sîstem bi xwe ji vê yekê berpirsiyar e. Ev yek jî wek cewher û xwezaya jinê tê hesibandin. Bi kapîtalîzmê re şerefa jinê ketiye nuqteya herî jêr. Ya bi nasnameya jinê re ketiye nuqteya jêr, di heman demê de nirxên civaka komîn in. Mentiqê sîstemê hem hewceyî vê yekê ye, hem jî di vî warî de gelek bi qabîliyet e.

Cinsê jinê ku bi pornoyê ji her cure pîrozbûnê hatiye kirin, kapîtalîzmê ew daxistiye asta prîmatên destpêkê. Di tevahiya dîroka şaristaniyê de jin di civakê de hat tinekirin. Di vê yekê de bi qasî para pêşketinên çînî û hiyarereşîk, ewqas jî para civaka mêrên serwer a mêr ew mezin kiriye heye. Dîsa jinê bandora xwe çiqas di civakê de wenda kiriye, ew çend jî ji nirxên komîn dûr ketiye. Xwezaya jinê hê nêzî nirxên civaka komîn in. Ji ber ku mejiyê wê li hemberî bûyerên xwezayê hişyar in û rast tevdigerin. Mejiyê hisî li cem jinê li pêş e. Mejiyê analîtîk ji ber ku bûyeran li hev dihûne, bi jiyanê re têkiliyên wê kêm in. Pêşketina mejiyê analîtîk ê mêr, di nav civakê de karektera wî ya hîlekar û zordest jî destnîşan dike.

Giraniya sîstemê ya li ser cîhana zarokan rewşa giştî nîşan dide. Zarokên di cîhana xeyalan de dijîn, ji binî ve berovajî hesabên sar ên sîstemê ne. Zarok û kapîtalîzm bi hev nakin. Yextiyar mîna zarokên pîrbûyî ne. Rûsipî û zanayê berê yê hurmet didît, ji bo kapîtalîzma hildibere, barekî giran e, hebûneke bê kêr e. Zarok mumkîne bêne mezinkirin û bi kêr werin. Lê yextiyar wê ji ber ku bimirin ti qîmeta wan nîne. Di şexsê yextiyar û pîr de civak ji pîrozbûn û mezinahiyê tê kirin. Wexta yextiyar li mala pîran tê danîn, bi qasî zalimtiya sîstemê, bêmanebûna wê û rûyê wê yê kirêt bi hemû aliyê xwe ve eşkere dibe. Pirsgirêka yextiyaran bi xwe jî pir bi hêsanî dikare ispat bike ku ev sîstem ji bo civakê hewce nake. Di vî warî de têra xwe îşaretên pirsê hene.

Rewşa berovajî jî, li gorî sîstemê, gihiştiye wê astê ku mirov nikaribin xwe lê ragirin. Anîna pirr zarokan di cewherê xwe de rêûresmeke civaka bavikan e, lê bi teknîkên bijîşkî jinên tebe-qeya jêrîn kirine mîna makîneya zarokanînê. Bi vî awayî, karekî zehmet ango gihandina zarokan jî dixin stûyê xizanan û bi vê riyê hewcedariya bi karkerên ciwan jî tê tedarikkirin, û li aliyê din jî malbateke riziyayî tê afirandin. Ango bi kevirekî çend nîşanan bi hev re radikin. Mêr û jinên tebeqeya jor bi zarokên sûnî, kurê hewiyê û xwedîkirina heywanan têgîna zarok dirizînin qaşo pê kêmasiya ewlad tedarik dikin û bi vî awayî hewl didin heta dawiyê seksî bimînin, û bi awayekî ji xwe biçin dînê nû yê sek-sualîteyê rîtualîze dikin. Encam; şêniyên zêde yên bêmane ku mirovatî nikare di binî de rabe, bê kariyeke di dîrokê de hîç neha-tiye dîtin û pêsîrtengiya hawîrdorê, kiriye ku mirov nikare be vî barî rake. Mirovatî wê çawa ji heqê vê pirsgirêkê derkeve?

Çînayetî û bajar zêdetir bi sîstema kapîtalîst re dibin têgîn. Lê hînê girîngtir ew e ku mirov reh û rîşên wan rave bike. Mirov nikare ti têkiliya civakî ya ku derketin an jî kokên wê baş nehati-be ravekirin, bi awayekî temam û têrûtijî nayê bi navkirin. Pêk-hatina bajar hînê bi temamî ji hev nehatiye derxistin. Bi kêmanî bi qasî derketina kapîtalîzmê girîng e, û divê were ravekirin. Ez bi xwe yeqîn dikim ku mirov ji bajar re bibêje, proto-kapîtalîsta pêş, wê ne şaş be. Çawa ku bazar meydanek e ku kapîtalîzm xwe li ser xwedî dike, pê bi gewde dibe û têkiliyan datîne, mirov dikare bajar jî weke mekanê bazarê yê pêşketî û mayînde bi nav bike. Têkiliya wê bi mijara me re ew e ku mekanê pêşketî yê mejiyê bûyeran dihûne, xwe dispêre hebûna bazarê. Bajar bi xwe ji bo avabûna civakeke mezin amûr û navgînek e. Ji ber bazarê, hewcedariyê xwe bi mejiyekî analîtîk û muccered heye. Cihekî welê yê têkiliyan e ku dinya mîtolojîk û dînî ya hînê zêdetir bi aqil rabûn, bi zanistî tevgeriyan û ewqasî jî berevajî kirin, pêre rê li ber pêşketina felsefeyê vekirin û di encamê de bûyerên dîrokî bi lez kirin. Zêdetir bi mejiyê analîtîk kar û xebatê dike.

Kapîtalîzm dijminê jinê ye ku jin hêza sereke û afirînera ekonomiyê ye. Me di tevahiya analîza xwe de hewl da ku ispat bikin; cihê jinê di jiyana civakî û nirxê ekonomîk de li asta bilind û yekemîn e. Çawa di tevahiya dîroka şaristaniyê de jî wisa bû, di qonaxa şaristaniya kapîtalîst de rastiya, 'jina ji ekonomiyê hatî kirin' dema herî bê rehm dibîne. Ev yek veguheriye nakokiya civakî ya herî kûr û balkêş. Pirraniya jinan bê kar hatine hiştin. Tevî ku karên malê, karên herî zehmet in, pênc quriş nirxê karê malê tineye. Dîsa zarokanîn û mezinkirin karên herî zehmet in, ne tenê qîmeta xwe nînin, her wisa weke bela têne dîtin. Hem erzan e, bêkar e, makîne ye zarokan tîne û bi hezar zehmetiyî wan mezin dike, hem jî heqdest nagire û bi ser de jî gunehkar e! Di tevahiya dîroka şaristaniyê de jin li zemînê herî jêr hatiye bicihkirin. Lê ti sîstemê bi qasî civaka kapîtalîzmê nikarîbû bi awayekî sîstematîk hêza îstîsmarê pêşde bibe. Vê carê jin ne bi tenê di zemînê jêr de li tevahiya qatan objeya newekhevî, neazadî û nedemokrasiyê ye! Ya hînê xeternak ew e ku bi awayekî bi ti dema dîrokê re qiyasa wê nebe, bi dijwarî û şîddeteke nedîtî desthilatdariya civaka cinsiyetparêz, heta bi organên mahrem ên mirov daxistiye, zêde kiriye, jin kiriye îndustriyeke seksê, êşkence li tevahiya tebeqeyên civakê belav kiriye û 'civaka ser-wer a mêr' di dema şaristaniya kapîtalîst de mezin kiriye, mîna ku ji 'ekonomostanê' ji kirdara afirîner a ekonomiyê tolê hilîne, dijmintiya xwe ya jin û ekonomiyê li her dever û mekanî ispat dike!

Pir hewce nîne mirov bibêje ekonomiya kapîtalîzmê, ji ber ku kapîtalîzm bi xwe cewherê aboriyê ye. Lewra sîstemek e, ji bo bi kar anîn, hevrikiyeke hov û kara zêde her tiştî li ber çav digire. Tiştekî civakê nehîştiye nekiribe mal û meta. Civaka bibe mal, maneya wê ew e ku wê ji dest jî were derxistin. Civakek ku bi vî rengî temenê xwe tijî kiriye nîzamek e, hewce tê dîtin dawî lê were anîn.

Di bingehê xetayan an jî çewtiyan de cihêkirina kapîtalîst-karker heye. Cihêkirina kapîtalîst-karker, di cewherê xwe de ji cihêbûna kole-efendî ya li xanên Romayê cuda nîne. Mirov dikare bişibîne têkiliya navbera serf-axa jî. Wexta mirov di nava malbatekê – bavikanî – de şêweyê rêxistiniya mêr û hêmanên xwe dispêrê li ber çav bigire û şêweyê rêxistiniya jina pêve girêdayî li ber çavan bigire, ji serî ve diyar e wê di encama şer de kê bi ser bikeve. Eger em rewşên îstîsnayî bidin aliyekî, di encama şerekî serketiyê wê eşkere de bêguman wê li hemberî jina di encama şer de perîşanbûyî, mêrê hê bi hêztir bibe. Jin hê zêdetir bûye ya mêr. Nakokî dîsa heye. Lê bi qasî veguheriye, di nav sîstema mêr-serwer de gaveke din heliyaye. Em mînakê dikarin ji bo gelemperiya civakê bi kar bînin. Di civaka şaristaniya çînî de û heta beriya wê di civaka hiyarerşîk de ku jin bi hezar ta û benî ve bi serweriya mêr ve hatiye girêdan. Eger bi teorî û pratîkekê ji jinê xilasî û rizgarî hêvîkirin ji xeyalê wêdetir, ji "lêdan û girêdanê" zêdetir tiştekî din nîne. Ji kêliya ku jinê pîrekbûn qebûl kir û pêve êdî neçarî wendakirinê bûye. Berxika li bin kêra qesab çiqasî xwe bitengijîne dikare xilas bibe? Şensê jiyanê yê berxê girêdayî însaf û berjewendiyên qesab e. Dikare ji bo şîr û hîriyê jî xwedî bike û dikare serjê jî bike.

Piştî şerê cîhanê yê duyemîn hewaya serketinê ya "antîfaşîstan" zêde dewam nekir. Tevgerên ciwanan û perspektîfên şoreşger ên 1968an di paradigmayê de rê li ber guhertinên girîng vekirin. Li dijî sîstemê bi tevahî nefret çêbû. Hatibû fêmkirin ku wê sosyalîzma reel, rizgariyên netewî û sosyal demokrasiyê bersiv nedin bendewarî û hêviyan. Dunya ku soza wê hatibû dayîn, ji ya berê baştir nebû. Mirov dikare bibêje; gelek ekolên entelektuel ên ji salên 1970 û şoreşa 1848 bi Marksîzmê ve girêdayî piştî ku hêza xwe wenda kirin, di serî de çepîtiya nû, ekolojî, tevgera jinê pêvajoya hevdu naskirinê ya bi gelek ekolan re destpêkir. Piştî ku baweriya bi Kapîtalîzmê û ewqas jî bi sosyalîzma reel şikiya, di salên 1950 de bi duyemîn şoreşa mezin a zanistê û pêşketinên di warê çandê de, femînîzm, ekolojî û etnolojiyê gavên mezin avêtin.

Civakên li aliyê din ên qutba dijber a sîstemê jî di heman rewşa tevlîhev û jihevdeketî de ne. Di serî de malbat, di dîroka xwe de pêvajoya herî dijwar a ji hev belavbûnê dijî. Zewacên heyî, nêzî nêviyê wan xira dibin û têkiliyên cinsî yên bê kontrol ên ne exlaqî jî pir zêde dibin. Hema hema tê qebûlkirin ku "zewaca pîroz" bi dawî bûye. Zarok, pîr, têkiliyên bav û dayikan, wek encamên vê ji hev belavbûnê qurban têne hesibandin û ji aliyê civakî ve dikevin rewşeke bê mane û xirab. Zordestî û îstîsmara herî kevin a li ser jinê jî her ku derdikeve holê, pirsgirêka jinê dibe tam krîzeke mezin. Jin her ku xwe nas dike, bi sedema piçûk hatiye xistin bi hêrs radibe û dibe yek ji hebûna bi tesîr a kaosê gurr dike. Ji hev vebûn û verşîna pirsgirêka jinê, wê ji hev vebûna civakê û ji hevbûna civakê jî wê ji hevbûn û verşîna sîstemê bi xwe re bîne.

Eger em gotinên xwe bidin serhevdu; heye ku di dema li pêşiya me de dawî li pêvajoya yekalî ya îradeya kapîtalîzmê were; netewparêziya gelan a bi şer û şovenîzmê barkirî li dawiyê bimîne, aştî xwe ferz bike, gel xwe bigihînin çand û rastiya xwe ya herêmî. Dîsa di çarçoveya vê îhtîmalê de, heye ku ev tena serê xwe nebe, bi sîstema serdest a dewleta navendî, lê bi avahiyên hatine piçûkkirin bi prensîban bi awayekî hevpar were meşandin. Şaristaniya me, di şûna serdestiya çand, etnîk, cins û çîn de, dikare ber bi "şaristaniya demokratîk a global" ve biçe; ku pêre gelê nirxên xwe yên komîn ên demokratîk nas bikin, deriyê li azadiya cins vebin; zordariya etnîk-netewî li dawiyê bimîne û piştgiriya çandan esas be.

**Netewa Mêtîngeri Ya Herî Kevin Û Ya Herî Nû- Jin**

Jinê weke cinsekî mirov ê cudatiya xwe ya biyolojîk heye fêhm dike û di mijara rastiya civakî de ev di serê hêmanên bingehîn ê korbûnê de tê. Cudahiya cinsî nabe ku bi serê bibe sedema ti pirsgirêka civakî. Li gerdûnê dualîteya di her zerreyê de çawa ku di ti hebûnê de weke sedema pirsgirêkê nayê dîtin, dualîteya di hebûna mirov de jî nabe ku weke pirsgirêk were bi karanîn. "Gelo hebûn çima dualî ye?" bersiva em bidin vê pirsê divê felsefî be. Analîza ontolojîk (zanista hebûnê) dikare li bersiva vê pirsê (pirsgirêk ne) bigere. Bersiva min ev e: hebûn ji bilî dualîteyê nikare hebûna xwe pêk bîne. Dualîte, şêwazê mumkînbûna hebûnê ye. Jin û mêr bi rewşa xwe ya heyî nebin jî ango ne hev-alî bin jî dîsa nikarin ji dualîteyê xwe xilas bikin. Bûyera jêre ducinsî jî tê gotin ev e. Divê mirov matmayî nemîne. Lê dualîte her tim ji bo pêkhatina cuda meyldar in. Bingehê mirov dikare ji bo mejiyê gerdûnî (Geist) li delîl bigere jî di vê meyla dualîteyê de dikare bigere. Yek ji aliyên dualîteyê ne xirab ne jî baş e, bi tenê divê cuda be. Eger dualîte bibin wekhev wê wextê hebûn pêk nayê. Mînak du jin an jî du mêr nikarin pirsgirêka zêdebûnê ya hebûna civakî çareser bikin. Ji lewra bersiva pirsa "Çima jin an jî mêr?" qîmeta xwe nîne yan jî eger divê bersiva vê pirsê bê dayîn wê wextê divê bersiveke felsefî bê dayîn û bê gotin, ji ber ku gerdûn divê (neçar e, di

wê meylê de ye, bi wî aqlî radibe, bi wê xwestekê) welê pêk bê. Eger mirov jinê weke têkiliyên zêde yên civakî bigire dest, wê ev bi tenê manedar nebe, ji bo bihurîna (çareserkirin) ji girêkên kor ên civakî jî gelekî girîng e. Ji ber ku her kes hînî nêrtina mêrê serwer bûye, şikandina çavkoriya di warê jinê de bi awayekî mîna parçekirina atomê ye. Ji bo şikandina vê çavkoriya di warê jinê de hewldaneke mezin a entelektuel û hilweşandina mêrtiya serwer divê. Ji alî û bereyê jinê ve em li mijarê binêrin, hema hema ev şêwe kiriye hebûna xwe û ya rastî jina bi awayekî civakî hatiye avakirin divê ewqasî jî bê hilweşandin. Em dema li tevahiya têkoşînên azadî û wekheviyê, têkoşînên demokratîk, exlaqî, polîtîk û çînî dinêrin, em dibînin di serketin an jî serneketina wan de li ser hêviyên wan ên şikestî (pîvan, bername û utopyayên bi cih nehatin anîn) şopên şêweyê têkiliyên (di navbera jin-mêr de) serwer (desthilatdarî) ên naşkên hene. Bi tevahî têkiliyên newekhevî, koletî, despotî, faşîzm û mîlîtarîzmê xwedî dikin, çavkaniya xwe bingehîn ji şêweyê van têkiliyan digire. Eger em dixwazin maneyên hêviyên me neşkînin li gotinên wekhevî, azadî, demokrasî û sosyalîzmê bar bikin divê em têkiliyên li dora jinê hatine deribandin û tevna têkiliyên bi qasî têkiliyên xweza û civakê kevin çareser û parçe bikin. Ji bilî vê rêyeke din nîne ku biçe azadî, wekhevî (li gorî cudahiyan) û demokrasiya rastî û exlaqê nedurû ye.

Ji dema derketina hiyarerşiyê îdeolojiya desthilatdariyê mane li cinsiyetparêziyê bar kiriye. Ji nêz ve têkiliya xwe bi desthilatdarbûn û çînîbûnê re heye. Bi tevahî çavdêrî û lêkolînên rojane û yên arkeolojîk, antropolojîk nîşan didin ku demên jin bûye çavkaniya otorîteyê hene û demên behsa wan têne kirin demeke dirêj qudandine. Otorîteya jinê ya navbihurî li ser otorîteya desthilatdarî û berhemê zêde nehatiye avakirin, berevajî çavkaniya xwe ji berhemdarî û zayînê digire. Ji lewra otorîteyek e ku hebûna civakî bi hêz dike. Mejiyê hisî yê li cem jinê bandora xwe zêde ye, bi vê hebûnê re têkiliyên xwe gelekî bi hêz hene. Di şerên desthilatdariyê yên li ser desteserkirina berhemê zêde de hatine kirin jin zêde diyar nîne û ev jî rewşa wê bi şêwazê wê yê hebûna civakî re pêwendîdar e.

Di pêşketina desthilatdariya girêdayî nîzamê dewlet û hiyarerşiyê de mêr bi rola pêşeng rabûye, çavdêriyên rojane û daneyên dîrokî vê yekê eşkere nîşan didin. Ji bo vê jî otorîteya jinê ya heta qonaxa dawî ya civaka neolîtîkê jî pêşketîbû diviyabû bihata şikandin û li dawiyê bihata hiştin. Dîsa çavdêriyên rojane û daneyên dîrokî der barê vê de têkoşînên mezin ên cûrbicûr û yên dema wan dirêj piştrast dikin. Nexasim mîtolojiya Sumer hema hema weke hafiza xwezaya civakî û dîrokê têra xwe mirov rohnî dike.

### Jin Wek Mêtîngeha Yekemîn û Dawiyê Gava Dîrokê Ya Herîk Krîtîk Jiyan Dike

Dîroka şaristaniyê di heman demê de dîroka têkçûn û wendakirina jinê ye. Ev dîrok bi xweda û evdên xwe, bi hukimdar û tebaên xwe, bi ekonomî, zanist û hunerê xwe, kesayeta mêrê serwer bi hêz kiriye. Ji lewra têkçûn û wendabûna jinê, li ser navê civakê ketin û wendakirineke mezin e. Civaka cinsiyetparêz encama vê ketin û wendakirinê ye. Mêrê cinsiyetparêz, dema ku li ser jinê hakimiyeta xwe ya civakî ava dike ewçend dilbijok û bi mehd e, her cure destdan û têkiliya xwezayî vediguherîne xwenîşandaneke serweriyê. Li diyardeyeke biyolojîk a mîna têkiliya cinsî timê têkiliya desthilatdariyê bar kiriye. Mêr ti car ji bîr nake ku mîna serketin bi det xistibe têkiliya cinsî bi jinê re datîne. Di vî warî de gelekî zêde hîn bûyî ye. Di vî warî de jî gelek gotin çêkirine: “Min ew temam kir”, “Min karê wê qedand”, “dêlik”, “Divê tu ço ji ser serê wê, daşik ji zikê wê kêm neke!” (Lê bixin bi tîran aş bikin bi qîran), “fahîşe, orûsipî”, “kurikê mîna keçikan”, “Eger tu qîza xwe serbest berde yan wê biçe daholvan an jî zirnevan” (Serê keçan bernedin), “Divê mirov wê zû bi mêrekî ve girê bide”. Gelek çîrok û gotinên pêşiyan ên bi vî rengî têne gotin. Gelekî eşkere ye ku têkiliya cinsî û desthilatdarî di nava civakê de çiqasî bi bandor e. Di roja me ya îro de jî her mêr ‘mafê kuştina’ jinê jî di navê de xwedî gelek heq û mafan e, û ev jî rastiyeke sosyolojîk e. Ev ‘heq’ her roj têne bi cih anîn. Bi giranî karektera têkiliyan bi awayê tacîz û tecawizê ye.

Di çarçoveya vê civakbûnê de malbat weke dewleta piçûk a mêr hatiye avakirin. Di dîroka şaristaniyê de saziya jêre malbat tê gotin bi şêwazê xwe yê heyî her çûye bi bandor bûye û ev jî bi sedema hêza mezin a daye amûrên desthilatdarî û dewletê ye. Yekemîn, malbatê li dora mêr desthilatdar dikin û bi vî awayî wê dikin şaneya civaka dewletê. Duyemîn, xebata jinê ya bêberdêl û bê sînor tê misogerkirin. Sêyemîn, zarokan mezin dike û bi vî awayî pêdiviya bi şêniyan tedarik dike. Çaremîn, weke modela rolê koletî û çilektiya cinsî li tevahiya civakê belav dike. Bi awayekî bingehîn malbat bi vê naveroka xwe îdeolojiyek e. Ew sazî ye ku têde îdeolojiya xanedaniyê fonksiyonel dibe. Her mêr di nava malbatê de xwe weke xwediyê xanekê his dike. Mirov weke rastiyeke gelekî girîng bi malbatê dihise û ev jî ji îdeolojiya xanedaniyê ye ku gelekî bi bandor di binê wê de heye. Malbat çiqasî zarok û jinên xwe hebin, mêr jî ewqasî ewlehî û anorê bi dest dixe. Gelekî girîng e ku mirov malbatê bi rewşa wê ya heyî jî weke saziyeke îdeolojîk binirxîne. Eger hûn jin û malbatê bi rewşa wan a heyî jî ji bin sîstema şaristaniyê, desthilatdarî û dewletê bikişînin, li dawiyê zêde tiştek bi navê nîzamê namîne. Lê berdêla vê şêwazê, rewşa jinê ya di nava şerekî

dewam yê asta navîn de ye ku ev şêwazê hebûneke têkçûyî, piçûkketî, feqîr û bi êş e. Mîna ku yekdestdariyên sermayeyê tevahiya dîroka şaristaniyê çawa ya li ser civakê dewam kirin, mîna wê bi awayekî parelel duyemîn yekdestdariyeke zincîrwarî li ser dinya jinê weke 'yekdestdariya mêr' ava kirine. Hem jî weke yekdestdariya herî kevin a berê. Eger mirov hebûna jinê weke cîhana mêtingeh a herî kevin bigire dest, dibe ku me bibe encamên rastî. Belkî jî mirov ji bo jinan bibêje, gelê mêtingeha herî kevin a nebûye millet, rastir e.

Modernîteya kapîtalîst tevî hemû xeml û xêzên xwe yên lîberal, statuya ji berê mayî azad û wekhev nake, berevajî li vê statuyê wezîfeyên nû zêde dike û bi vî awayî jinê ji berê zêdetir dixe nava rewşeke girantir. Gotinên weke karkera erzan, karkera malê, karkera bê heqdest, karkera nerm û xizmetkar rewşa jinê ya nû û girankirî nîşan dide. Di ser de jî weke hebûneke magazînî û amûrê reklamê bi karanîna wê jî hûrûkûr tê kirin. Bedena wê bi xwe jî weke amûrekî îstîstmarê di asta metayê de sermaye jê nagere. Di karê reklamê de timî amûrê tehrîk û sorkirinê ye. Bi kurtî, nûnera herî berdar a koletiya modern e. Ma ji amûrekî bê sînor zewqê bide û ji koleya herî zêde karê bîne zêdetir metayeke bi nirx heye?

Pirsgirêka nufûs û şêniyan ji nêz ve bi cinsiyetparêzî, malbat û jinê ve têkildar e. Çiqas şênî zêde bibin ewqasî jî sermaye zêde dibe. 'Jina malê' fabrîkeya nufûsê ye. Em dikarin jêre bibêjin, fabrîkeya meta û 'dolên' sîstem herî zêde hewcedarî wan e. Mixabin malbata di bin serweriya yekdestdariyê de xistine vê rewşê. Tevî ku zehmetî hemû para jinê dikevin, nirxê mal jî ji bo sîstemê diyariya herî hêja ye. Şêniyên zêde dibin herî zêde jinê dihilhilînin. Di îdeolojiya xanedaniyê de ev welê ye. Malbatgirî weke îdeolojiya herî nadîde ya modernîteyê, qonaxa dawî ya xanedantî gihiştiyê ye. Ev xusûs hem bi zêdeyî bi îdeolojiya dewletdariya netewe re dibin yek. Ji dewleta neteweyî re timî zarok mezin dike, ma ji vê hêjatir çi heye? Şêniyên dewleta netewe çiqasî zêde bibin, ewqasî jî hêza wan zêde dibe. Em bi vî awayî dikarin bibêjin, di vê zêdebûna şêniyan de ku sînorên xwe derbaskiriye, berjewendiyên heyatî yên yekdestdariya mêr û sermayeyê yên hişk rêxistinbûyî hene. Zor, zehmetî, qehr, êş, gunehbarkirin, feqîrî, birçîtî, cewr û cefa ji jinê re; bi destxistina kara kêfî ji 'begê' wê û sermayedarê wê re. Di dîrokê de ti serdem weke vê serdemê nebû xwedî hêz û ceribandinê ji bo jinê ji pirraliyan ve weke amûrekî îstîsmarê bi kar bîne. Jin weke mêtingeha destpêk û dawiyê di kêliya herî krîtîk a dîroka xwe de ye.

Felsefeyeke bi azadî, wekhevî û demokratiya bi kok barkirî, bi jinê re jiyaneke hevpar a were bi rêkûpêkkirin, jê tê ku di asteke bêqusûr de bedewî, qencî û rastiyê pêk bîne. Ez bi xwe di nava statuyên heyî de jiyana bi jinê re, bi qasî ku bi pirsgirêk dibînim ewqasî jî kirêt, xirab û şaş dibînim. Di nava statuya heyî de jiyana bi jinê re ji zarokatiya min yek ji wan mijaran e ku têde cesareta min kêm e. Ji ber ku jiyaneke welê ye, xerîzeyek mîna xerîzeya cinsî bi hêz dixe ber lêpirsînê. Xerîzeya cinsî ji bo xatirê dewamkirina jiyanê ye. Harîqayeke xwezayî ye, divê pîrozbûna xwe hebe. Lê yekdestdariya sermaye û mêr jin ewqasî qirêj kirine ku ev qabîliyeta harîqa ya xwezayê weke 'fabrîkeyeke dolan' a herî piçûkxistî veguherandine saziya hilberandina metayê. Bi van metayan civak serûbinî hev tê kirin û hawîrdor jî di bin giraniya şêniyan de (niha şeş mîlyar e, em hawîrdora bi deh û pêncî mîlyon şêniyî bifikirin) kêlî bi kêlî hildiweş e.

Ya bi destê mirov tê avakirin, bi destê mirov dikare were hilweşandin. Di vir de ne qanûneke xwezayê heye, ne jî çarenûsek mewzûbehs e. Li vir a em behsa wê dikin, nîzamên desthilatdariyê ne, ew destên jiyanê yên bi hormon û bi kansêr ên zilamê bi hêz û xasûk ên şebekeyê ne. Min her tim hûrûkûr manedarkirina jiyanê ya du cotên herî harîqa yên di gerdûnê de his kir. Min cesaret kir ku berê bi jinê re bifikirim û li pêşiya hemû têkiliyên xwe, li ku, kengî û çiqas xirabî hebin pêre guftûgo bikim û ji holê rakim. Bi tenê jina bi hêz, difikire, qenc, bedew û rast biryarê dide, bi vî awayî jî wexta ji min dibihure min heyranî xwe dike û dikare bibe muxatebê min, bêguman di gera min a felsefî de kevira çarqozî ye ango ya serê quncikê ye. Min timî bawer kir ku sirrên jiyanê yên di vê gerdûnê de diherikin herî baş, bedew û rast wê bi vê jinê re manedar bibin. Lê bi qasî ku ti mêr ê nikaribin bi ser bixin exlaqê min ê min jê bawerkirî heye; ez ê bi malê 'mêr û sermaye' yê li pêşiya min, şêwazê hebûna xwe ti carî bi Hurmuza nod hezar mêrî re parve nekim. Hingê ji femînîzmê jî wêdetir têgîna 'jineolojî' (zanista jinê) dikare bi awayekî baş bersiva armancê bide.

Hiyarerşiya ji rêûresmê serweriya zilam a li ser jinê pêşde bir di tevahiya dîroka şaristaniyê de timî ew bi tesîr û bandor kirine. Desthilatdariya di forma dewleta netewe de hatiye mezinkirin hêza xwe bi giranî ji vê cinsiyetparêziya zêde û belav dike digire. Cinsiyetparêzî fonsiyoneke normal a biyolojîk nîne; îdeolojiyek e ku herî kêm bi qasî milletgiriyê rê li desthilatdarî û dewleta netewe vedike. Ji bo zilamê serwer cinsiyeta jinê objeyek e ku her cure îhtîras û çavbirçîtiya xwe li ser têr dike. Gotina di Pirtûkên Pîroz de ya dibêje 'Jin erdên we ne, hûn çawa dixwazin dikarin wisa biajon' û gotina modernîteyê ya dibêje 'Jin mîna sazekê ye, dilê we çawa dixwaze hûn wisa dikarin lê bidin' vê rastiyê tînin ziman. Dîsa gotina 'Ço ji ser serê wê, zarok jî ji malzaroka wê kêm nekin' karektera faşîst a serweriyê nîşan dide.

Ez divê eşkere diyar bikim ku ez analîzên cinsparêz ên civakî pozitîvîst dibînim. Ez yeqîn nakim ku em karibin bi nêzîkatiyên objektîv ên serereser û çor jinê analîz û çareser bikin. Nexasim em şîfreyên koletiyê yên dawerivandine

hinavên jinê nizanin. Ez yeqîn dikim ku pirr zêde bi zêhniyeta fallus-vajînayê hatiye kirin û ev zêhniyet qabîliyetên din ên mirovî kotrimî dike. Di vê babetê de nuqteya balê dikişîne ew e, di cîhana nebat û heywanan hemûyan de diyardeya têkiliya cinsî ya şêwe, dem û fonksiyona xwe ya diyar heye, li cem cinsê mirov ev şêwe, dem û fonksiyon ketiye rewşekê zêde hatiye dejenerekirin. Ji sedî sed diyare ku ev dejenere çavkaniyê xwe civakî ye. Ya rastî, mirov dikare bibêje; bi derketin û giştîbûna pirsgirêka civakî (zordestî û mêtinkarî) pêş ketiye. Ji ber ku civaka dayikê ji her alî ve ji hev hatiye xistin pirsgirêka jinê pirsgirêka sereke ya civakê ye. Ji bo terîfeke rast bi vî awayî destnîşankirina pirsgirêkê hewce ye.

Cinsiyetparêziya civakî herî kêm bi qasî kapîtalîzmê cinawirekî civakî yê bi tehlûke ye. Lê mixabin, serweriya mêrê xasûk û bêrehm ji bo heqîqeta vê diyardeyê dernekeve holê û asteng bike xwedî helwesteke çavkorî ye. Tevî ku bi qasî kapîtalîzmê hewcedariya xwe bi lêkolînê heye, yek ji qadên civakî ye ku di tariyê de hatiye hiştin. Bi tevahî îdeolojiyên dewlet û desthilatdariyê çavkaniya xwe ya pêşî ji helwest û tevgerên cinsiyetparêz digirin. Qada civakî ya herî zêde û bi kûrahî mêtinkarî û zordestî,  her cure koletî û sernuxumandin lê pêk hatiye, koletiya jinê ye. Objeyeke civakî ye ku bi tevahî şêweyên desthilatdarî û dewletê xwe li ser ceribandine û li ser bûne xwedî kan û jêder.

Pirsa bingehîn a divê bê kirin ev e, zilam çima di mijara jinê de evqasî hesûd, çavnebar, tehekumkar û kujer e, çima tevahiya bîstûçar saetê rojê ji rewşa xwe ya destavêtinê nagere. Bêguman destavêtin û tehekum têgînên îstîsmarê yên civakî ne. Rengê civakî ya diqewime îfade dike, zêdetir hiyarerşî, bavikparêziyê û desthilatdariyê bi bîr dixin. Maneyeke wê ya din a hê kûr diçe, xiyaneta li hemberî jiyanê îfade dike. Girêdana pirralî ya jinê bi jiyanê re dikare helwesta cinsiyetparêziya civakî ya zilam zelal bike. Bi bandora cinsiyetparêziya diqedîne û kor dike dewlemendiya jiyanê ji dest tê dayîn û ji ber vê helwesta bi hêrs, tecawizkar û hakim a derdikeve cinsiyetparêziya civakî îfade dike. Têkiliya xerîze û ajoya cinsî bi domdariya jiyanê re eşkere ye. Lê mirov nikare bibîne ku ti zindî û ruhber bîstûçar saetan ji aliyê cinsî ve dewamî birçîye û xwediyê vê zêhniyetê ye. Eşkere ye ku jiyan bi tenê ji têkiliya cinsî pêk nayê. Berevajî mirov dikare bibêje têkiliya cinsî bi awayekî kêliya mirinê ye, ya rastî li dijî mirinê pêngaveke kujer a jiyanê ye. Ji lewra mirov dikare bibêje; çiqasî zêde çalakiyên cinsî, ewqasî ji dest dayîna jiyanê ye.

Ez nabêjim çalakiya cinsî bi tevahî kujer e. Îdeala bêserûbinî ya jiyanê jî di nava xwe de hildigire. Lê ev îdeal jiyan bi xwe nîne. Berevajî, li dijî tirsa mirinê tevdîrek e ku mirov dikare bibêje zêde qîmeta xwe ya heqîqetê nîne. Mirov dikare vegotinê welê zelal bike: dubareyên xelekên jiyanê girîng in, yan jî weke tek xelek bi xwe girîng e? Piştî ku heqîqeta ya tek tam hat îfadekirin, dubarebûna bêserûbinî ya xelekê zêde maneyê di nava xwe de nahewîne. Eger bihewîne jî ev ji hewcedariya xwe gihandina ‘agahî-zanîna muqleq’ e. Di vê rewşê de xelek çiqasî xwe baş nas bikin wê pêdiviya bi agahiya mutleq jî tedarik hatibe kirin ku xelek ango zêdebûna cinsî zêde qîmet û maneya xwe namîne.

Dewleta netewe û kapîtalîzm a bi serwextbûneke hûrûkûr a van xisletên koletiya jinê tevdigerin, bi îhtîmameke mezin jinê weke amûrê desthilatdarî û sermaye herî pêşketî bi kar tînin. Divê mirov baş zanibe ku koletiya jinê nebe ti şêweyê koletiyê şensê xwe yê pêşketin û jiyanê nîne. Dewleta netewe û kapîtalîzm, mêrê serwer ê herî bi sazî bûyî îfade dike. Ji vê jî eşkeretir mirov bibêje; dewleta netewe û kapîtalîzm, yekdestdariya mêrê zordest û mêtinkar e. Parçekirina vê yekdestdariyê belkî jî ji parçekirina atomê zortir û zehmetir e.

Modernîteya kapîtalîst ev nîzam hê zêdetir pêşde biriye. Di qada huqûqî de nîzamname û sererastkirinên qanûnî yên ji bo başiya jinê hatin kirin ji bi cihanîna wekheviyê dûr in. Serwertiya zilam di bin mohra şaristaniyê de zewac pêşde bir, ji lewra mirov dikare wê weke saziyeke civaka cinsiyetparêz rewa dike terîf bike. Hiyarerşî, desthilatdarî û yekdestdariya dewletê xwe di komika xwedî rengê şaneya civakî û herî zêde de nîşan dane. Di navbera wê bi xwe, bi awayê xuya dike û rewakirina wê de nakokiyeke sergirtî heye. Di şexsê jinê de saziya herî baş koletiya giştî ya civakê kamûfle û şapinêz dike saziya zewacê ye. Pêvajoya pîrekkirina jinê (piçûkxistin, rezîlkirin, dûvikê zilam) dikin bingeh û civakê jî gav bi gav dikin pîrek. Koletiya zilam piştî pîrekkirina jinê û bi wê re di zikhev de hatiye meşandin. Koletî û pîrektiya li ser jinê hatî ceribandin û encamgirtî paşê bi zilam û çînên bindest dan qebûlkirin. Ev pêvajoya bi şaristaniyê re pêşket bi modernîteya kapîtalîst re derket asta herî jor û bilind. Faşîzm di pêvajoya pîrekkirina civakê de xwedî maneyeke taybet e. Civaka teslîmgirtî îfade dike. Modernîte civaka giştî ya pîrekbûyî îfade dike; ango her kes hatiye xesandin, qabîliyeta xwe ya parastin û bergiriyê ji dest dane, her kes êdî zilam û pîreka hev e. Komkirina sermayeyê ya dewamî bûyî wê êdî bi awayekî din bi qasî keys û firsendê nede civakê êrîşkar û hov bibe. Ew qad e ku destavêtin û koletî bi navê namûsê hem tê rewakirin hem jî hûrûkûr tê bi cihanîn.  Ya maskeya rûyê modernîteyê tîne xwarê dîsa rewşa îflasê ya malbatê ye. Di şaristaniya Rojava de îflasa malbatê bi tenê qelsbûna têkiliyên civakî nîşan nade; nakokiya bi civakê re, rewşa kaotîk û krîzê jî bi kûrahî nîşan dide. Çawa ku koletiya jinê asta koletiya civakî diyar dike, rewşa kaotîk a di têkiliyên mêr-jinê de jî rewşa kaotîk û nakokiya modernîteya kapîtalîst a roja me ya îro nîşan dide.

Cinsiyetparêziya civakî têgîneke bi desthilatdariya di têkiliyên mêr-jinan de bi sînor nîne. Desthilatdariyek e ku di her astê de li civakê belavbûyî îfade dike. Desthilatdariya dewletê ya bi modernîteyê herî mezinbûyî nîşan dide. Ti

obje bi qasî jinê tehrîk nade kirin û ji bo desthilatdariyê nabe mijar. Jin weke hebûneke kirine obje xwedî wan xisletan e ku desthilatdariyê herî zêde bike. Timî di rewşa tehrîkkirin û pirrkirina desthilatdariyê de tê hiştin. Di vê çarçoveyê de têkiliya jinê bi desthilatdariyê re analîzkirin ji bo eşkerekirina heqîqeta wê girîng e. Her zilam bi zêdeyî xwedî wê zêhniyetê ye ku hêrsa xwe ya desthilatdariyê li ser jinê pêk bîne. Heman zêhniyet cinsê jinê li ser hev û zarokan weke hêrsa desthilatdariyê pirrtir dibe û tê bi cihanîn. Vê carê jin dibe gurê jinê. Bûyera jêre reaksiyona zincîrwarî tê gotin ev e. Rola jinê di sîstema kapîtalîst a mêtinkariyê de hê dest dide û eşkere ye. Ji bo sîstemê bi tenê zarokan bê heq nayne û mezin nake, bi heqdesteke herî kêm baz dide her kar û suxreyî. Li ser artêşa bêkaran di pozîsyona zextê û timî kêmkirina sîstema heqdestan de tê ragirtin. Cihê xemê ye, tevî ku xwediya keda bi cewr û cefayê ye, Marksîst jî di navê de, ti doktrînê hewce nedîtine behsa ked û mafê jinan bikin. Ji bo vê analîzên hewce û helwesta polîtîk pêşde nabe. Nîşaneyeke din a berfirehiya cinsiyetparêziya civakî ya serweriya zilam piştrast dike der barê keda jinê de ye.

Demografya, pirsgirêka şêniyan, ji pirsigrêka çînî qat bi qat zêdetir gefan li dinya û civakê dixwin. Pirrbûna şêniyan ji nêz ve bi civaka cinsiyetparêz û modernîteya kapîtalîst re têkildar e. Bîstûçar saetê rojê xwesteka cinsî ya natemire, çanda xanedanî û malbatê, polîtîka kapîtalîzm û dewleta netewe ya ji bo kara herî zêde û hêzê bi xwe re bend û sukurên li pêşiya pirrbûna şêniyan diteqîne, radike. Wexta ku alîkariya teknîk û tibbê li vê bê zêdekirin rastiya derdikeve holê, ji aliyê dewamkirina civak û hawîrdorê rewşa herî bi tehlûke îfade dike. Kaosa demokrafîk bi vê rastiyê ve girêdayî ye. Dinya me û hawîrdor ji mêj ve hecmê wê yê heyî (eger zêdebûna şêniyên 6,5 mîlyar bi vî awayî  dewam bike) gihiştiye sînorê nikare rake. Ji vî alî ve jî nirxandina îflasa sîstemê girîng e. Divê mirov baş zanibe ku jin weke amûreke zarokanînê xistine bin barekî xeternak û xwe lê ragirtina wî gelek zehmet. Pirsgirêk ji bûyîna xwediyê zarokan wêdetir çavkaniya xwe ji sîstemeke nanozikê û suxrekar a girankirî digire. Herweha divê mirov baş zanibe ku zarokanîn biyolojîk ne, diyardeyeke sîstemwarî û çandî ye. Her zarok ji aliyê çanda heyî ve carekê ne, gelek caran tê maneya mirina jinê. Çandeke zarokanînê hewce ye ku qîma xwe bi hindikî bîne, bi tevahî tevdîrên tenduristiyê bigire û beriya her tiştî divê ji aliyê zêhnî ve ji bo zarokanînê hatibe amadekirin. Fikra hêzê û bêserûbinîbûnê bi rêya zarok ne, divê mirov bispêre agahî-zanîna mutleq û bedewiyê, gihiştina civaka exlaqî û polîtîk, eger mirov bi van xusûsên pêşî tên gihandina zarokan bi awayekî yekpare analîz bike wê hê manedartir û baştir bibe. Xulase, divê mirov mezinkirin û gihandina zarokan li gorî pêdiviyên civaka ekonomîk û ekolojîk û li ser bingehê felsefeya azadiyê analîz û çareser bike.

Demografî (zanista nufûs-şêniyan) weke milekî alîkar ê cinsiyetparêziya civakî, bi modernîteyê re artêşa eskerî, artêşa bêkaran, ji bo civaka netewe ya standart jî statîstîkê jî bi kar tîne û zarokanîna jinan bi pîvanên îdeal ve girê dide. Îdeolojiya jêre Malthusparêzî tê gotin vê yekê îfade dike. Şênbûn û şêniyên mirovan ên li civak û ekolojiyê gefan dixwin di cewherê xwe de pirsgirêkeke biyolojîk nîne, ji ber ku kapîtalîzm û dewleta netewe îdeolojiya cinsiyet bi kar tînin encamek bi vî rengî derdikeve. Malbatgiriya modern jî di navê de, kapîtalîzm, îdeolojiya cinsiyetparêz a dewleta netewe û kirinên wê ji bo civak û hawîrdorê belkî jî çavkaniya herî mezin a pirsgirêkan e. Ji lewra divê mirov cinsiyetparêziya civakî di çarçoveya dewleta netewe de weke pêncemîn çavkaniya herî mezin a pirsgirêkên civakî bibîne û binirxîne.

Di serdema îndustriya kapîtalîzmê de piştî civaka gund-cotkariyê duyemîn saziya girîng a civakî ya belav bû malbat û jin e. Mijareke girîng a sosyolojiya Rojava ser wê girtiye jî malbat û jin e. Ev sosyolojî naxwaze xwe nêzî ravekirina pirsên çima û çawa malbat hilweşiyaye bike. Di serdema destpêkê de mafê koleyan ê malbatê tinebû û mirov jî dikare vê rastiyê bi vê ve girêdayî rave bike. Ji ber bêkarî û xizaniya zêde dibe, di civaka şaristaniyê de şert û mercên maddî yê malbata ji rêûresmê bi pirranî ji holê radibe. Maneya civakî ya malbatê namîne. Wexta ku ferd ji civakê tê qutkirin di vê mijarê de ya para jinê dikeve ew e, zilamê serwer şertên li gorî xwezaya jinê nînin li ser wê bi awayekî zalimane ferz dike û di encamê de jin radestî wî dibe û jinê diavêje kolanê. Koletiya jinê weke ku reklama wê tê kirin di vê serdemê de azadî bi dest nexistiye. Koletiya jinê ya kapîtalîzmê koletiyeke piyaseyê ye, ewçend hûrûkûr e ku şaneyeke wê bi tenê ya nekiribin meta nehiştine. Di serdema îndustriyalîzmê de ji krîzên pêk tên li ser hêmanê herî girîng li ser jin û malbatê diqewimin. Bi tenê zêde hevdu berdan û zarokên kolanan ne, mêtinkarî û desthilatdariya sînornenas a cinsiyetparêziya civakî, kûrahiya vê krîz û hilweşînê nîşan dide. Pirsgirêka jin û malbatê ya civakê û çareseriya wan weke hêmanên bingehîn ên jiyana azad, di asta teorîk û pratîk de hewceyî bi hewldanên mezin heye.

Ji ber civaka kapîtalîzmê li ser bingehê piçûkxistina exlaq hatiye avakirin, dema ku civaka demokratîk, zayenda azadîxwez û ekolojîk were avakirin, wek teorîk- etîk û pratîk- exlakî tevgerandin rêgez û helwesteke girîng e. Dîrokê de cinsiyetparêzî herî zêde di serdema lîberalîzmê de weke hêmaneke îdeolojîk hat pêşdebirin û bi karanîn. Lîberalîzma civaka cinsiyetparêz dewr girt, qîma xwe neanî bi tenê jinê weke karkera bêheqdest di malê de bixebitîne. Hê zêdegavî kir, ew weke objeyeke cinsî kir meta û ew pêşkêşî piyaseyê kir. Bi vî awayî hê zêdetir bi dest xist. Li cem mêr bi tenê ked tê metakirin, lê jin hem tevahiya bedena wê û hem jî ruhê wê tê metakirin. Ya rastî, bi vî

awayî şêweyê koletiyê yê herî bi tehlûke hat avakirin. ‘Pîreka zilam’ ev herçiqasî sifetekî baş nebe jî mijareke bi sînor îstîsmarê teşkîl dike. Lê mirov bi tevahî kesayeta xwe bibe meta, ev tê wê maneyê ku mirov ji koletiya dema firewnan xirabtir dibe kole. Li şûna mirov bibe koleyê kesek an jî dewletekê, mirov bibe koleyê her kesî qatbiqat bi tehlûketir e. Xefika moderníteyê li pêşiya jinê daniye ev e. Bi awayê xuya dike jin li azadiyê vedibe, lê bi vî awayî jin dikeve statuya amûrê herî rezîl ê îstîsmarê. Ji amûrbûna reklamê bigirin heta bi seks û pornoyê jin amûrê herî bingehîn ê îstîsmarê ye. Ez bi hêsanî dikarim bibêjim, di hilgirtina kapîtalîzmê de herî zêde jin xistine bin barê giran.

Ji bo sîstemê di warê pirrkirina mêtinkarî û desthilatdariyê de jin bi roleke statejîk radibe. Di nava malbatê de nûnerê dewletê zilam, li ser jinê hem di warê mêtinkariyê de û hem jî di warê pêşdebirina desthilatdariyê de xwe berpirsiyar û xwedî erk dibîne. Zordestiya ji rêûresmê ya li ser jinê li her çaviyê belav dike û bi vî awayî zilam jî dike parçeyek ji desthilatdariyê. Bi vê rê, civak di asta herî jor de dikeve sendroma desthilatdarîbûnê. Statuya jinê fikir û hisa bê sînor a desthilatdariyê dide civaka zilam a serwer. Li aliyê din, ji pêkhatina karkertiya tawizkar heta bi bêkariyê, ji karkertiya bêheqdest heta bi heqdestiya herî kêm di her neyêniyê de ya berdêl pê didin jinên kedkar in; jin bi xwe ye. Îdeolojiya cinsiyetparêz a pevkirî ya lîberalîzmê ev mijar bi tenê ji rê dernexist û cuda nîşan neda; wekî din jî ji bo jinan bi ehemiyet veguherand varyeteyên îdeolojîk ên hatin pêşdebirin. Mîna tiştekî mirov bi destê xwe k oletiya xwe qebûl bike.

Mirov dikare bibêje, sîstem bi îstîsmarkirina jinê ji aliyê maddî û îdeolojîk ve bi tenê ji krîzên giran nabihure, hebûna xwe pêk tîne û misoger dike. Jin neteweya mêtingeh a herî kevin a dîroka şaristaniyê bi giştî û neteweya mêtingeh a herî nû ya taybet a moderníteya kapîtalîst e. Eger ji her alî ve rewşa krîzê di asta domne kirinê de be, di vê de para mêtingehkirina jinê di serî de tê.

Tevgerên çandî, ekolojî û femînîzmê li dijî têkoşîna çînî weke asteng hatiye dîtin. Jin bi tenê bi keda xwe ne, bi tevahî beden û ruhê xwe kirine mêtingeheke giran û ev rewşa jinê bi awayekî berfireh nehatiye analîzkirin. Nekarîne ji pîvanên wekheviyê yê huqûqê bûrjûvayê bibihurin. Di dîrokê de ev kedkara herî kevin û nû, bi pirranî bêheqdest û carnan jî bi heqdesta herî kêm, li gorî dîroka serwer a zilam ji objebûnê wêdetir ti mane îfade nekiriye. Eşkere ye ku çîna hatiye analîzkrin a zilam e. Bi heman awayî nêzî ekolojiyê jî bûne. Tevî ku pêşbîniya van pirsgirêkan nehatiye kirin, herweha hatiye îddîa kirin ku wê bi awayekî neyênî bandorê li yekparetiya têkoşîna çînî bike. Tevgerên çandî jî weke hêmanekî din ê têkoşîna çînî xira dike hatiye qebûlkirin, bi sedema ku kevinbûnê zindî dikin. Di encamê de çînîparêziyeke mucered bi ekonomîzmê xeniqiye û ji hevgirtiyên xwe yên muhtemel qutbûyî derketiye holê. Lêkolînên biyolojîk di nava cinsê mirov de rola jinê ya kokbûnê rohnî dikin. Yê ji gewdê rastî veqetiyayî jin ne, zilam e. Ji ber ku jin ji diyalektîka pêkhatina gerdûnê dernakeve hestyar e. Nemaze di dema şaristaniyê de tim li qatê herî jêr hat hiştin, vê kir ku ev avahiya xwe heta roja me ya îro bîne. Aqlê zilam timî dixwaze aqlê jinê yê hisbarkirî timî weke ‘kêmaqiliyê’ û vê jî weke karketera wê bi xwe nîşan bide. Aqlê zilam, li ser jinê çend operasyonên mezin meşandine, dimeşîne:

Yekemîn, ew kiriye koleya pêşî ya malê. Ev pêvajo bi tepisandin, zordestî, destavêtin, heqaret û tevkujiyên xeternak barkirî ye. Rola ji bo tê naskirin ew e, ji nîzama milk re bi qasî ku tê xwestin ‘dolan’ bîne. Îdeolojiya xanedaniyê bi vê dolê ve gelekî girêdayî ye. Di nava vê statuyê de jin ji sedî sed milk e. Bi qasî ku nikaribe rûyê xwe nîşanî kesekî din bide, namûs û malê xwediyê xwe ye.

Duyemîn, amûrekî seksê ye. Di tevahiya xwezayê de têkiliya cinsî ji bo zêdebûnê ye. Bi armanca dewama jiyanê ye. Li cem mêrê mirov, nexasim bi êsîrkirina jinê re, bi giranî jî di pêvajoya şaristaniyê de rola bingehîn ji seksê, xwesteka têkiliya cinsî ya sînornenas û belovajî pêşketina wê re tê dayîn. Li cem heywanan demên cotbûnê gelekî bi sînor in (bi giranî salê carekê), lê li cem mirovê mêr hema hema dixwazin têkiliya cinsî derxin rojê bîstûçar saetan. Jin ber bi roja me ya îro ve kirine amûrek timî her cure seks, xwesteka cinsî û desthilatdariyê li ser tê ceribandin. Cihêkirina ji hev a malên taybet û giştî êdî ti maneya xwe nemaye. Ji ber ku her cih û her jin êdî jina mala giştî û taybet tê hesêb.

Sêyemîn, kedkara bêheqdest û bêberdêl e. Karûbarên herî zehmet bi wê têne kirin. Berdêla wê, hinekî din wê neçarî ‘kêmbûnê’ dikin. Ewqas piçûk hatiye xistin, bi rastî xwe li gorî mêr ‘kêm’ mayî qebûl dike, û ji lewra jî bi her çar lep û lingan xwe bi dest û serdestiya mêr ve girê dide.

Çaremîn, ew kirine metayê herî tenik. Marks ji bo pere dibêje ‘qralîçeya metayan.’ Ya rastî, ev rol zêdetir a mêr e. Qralîçeya rastî ya metayan jin e. Têkiliyek nîne ku jin jêre neyê pêşkêşkirin. Ti qad jî nîne jin têde neyê bi karanîn. Bi cudahiyekê, herçiqas her meta berdêlekî xwe yê hatiye qebûlkirin hebe jî ji bo jinê ev berdêl ji bêşermiyeke mezin a bi navê ‘eşqê’ bigirin heta zirta “Heqê keda dayikan nayê dayîn” bêhurmetiyeke mezin e.

**Di Rojhilata Navîn de Pirskirêka jin, Xanedanî, Malbat û Nifûs**

Di dema şeveqavêtina dîrokê de bi nasnameya xwe ya civakî ya bi heybet jina rola dayik-xwedawendiyê bi xwe ve danî, mixabin di Rojhilata Navîn a roja me ya îro de daxistin rewşa metayekî herî bêqîmet û bênirx. Ev dîroka ku diviyabû bi serê xwe çîrokeke wê ya trajîk hebûye em zêde nikarin wê bînin ziman û ji derfetên vê yekê mehrûm in. Lê em dikarin encamên wê rexne bikin. Ewrên ji mijê yên bi destê mirov li dora jinê hatine çêkirin divê bêne belavkirin û bi vî awayî keşifkirina rastiya wê yek ji erk û wezîfeya pêşî ya lezgîn a civakî ye.

Civaka Rojhilata Navîn di dîrokê de civaka herî zû pirsgirêkên çîn, hiyarerşî û desthilatdariyê naskirî ye. Em dizanin, berî desthilatdariyê pergala hiyarerşiya pêşî li ser ciwan û jinan hatiye sazkirin. Hevgirtina ji zilamê xasûk û zordar + rahib û şaman + pîremêrên bi tecrûbe pêk hatî, ji tevahiya hiyarerşiyan, desthilatdarî û dewleta piştre pêş bikeve, prototîpek e. Malzaroka tevahiya pirsgirêkên civakî ye. Li Mezopotamya Jêr berî hegemondariya bajarê Ûrûkê em şahidiyê li dema Hiyarerşîk a El Ubeyd (5000-3500 B.Z.) dikin. Hiyarerşiyeke li tevahiya Mezopotamyayê belavbûyî heye. Pergalek e ku li dora malbat û xaniyekî mezin xwe hûnandî ye. Destpêka pergala xanedaniyê ye. Li derveyî jin, ciwan û tebeqeya jor a hiyarerşîk ên din bi awayekî sîstemîk têne kolekirin, ango pratîk û awayê dinyayeke welê tê çêkirin cara pêşî lê hîmê pirsgirêka civakî tê danîn. Wekî din jî rastiyeke din heye ku Mezopotamya pêşengê vê sîstema global e. Koka îdeolojiya malbat û xanedaniyê ye. Li Rojhilata Navîn ev herdu sazî hê jî gelekî bi hêz in, û ev yek ji nêz ve bi vê rastiya dîrokî re têkildar e. Ev saziyên herî kevin ên civakê yên bi pêşengiya mêr tevahiya dîrokê timî pêş ketiye. Xanedanî vediguhere nêrega bingehîn a desthilatdariyê û şêweyê dewletê, malbat jî bi temamî vediguhere şaneya bingehîn a fermî ya civakan. Di tevahiya dîrokê de ji bo damezrandin û hilweşandina xanedan û malbatan şerên desthilatdariyê yên hatine kirin hed û hesabê wan tineye. Bi van şeran ne tenê civakan vedugerînin çavkaniya pirsgirêkan, di heman demê de bêhnê lê diçikînin.

Di civakê de mîna kevneşopiyekê her sazî xwe bi şîdetê xwedî dike. Li qatê herî jêr ê civakê malbat jixwe nikare hilmê û nefesê bistîne. Nemaze şîdet li ser jinê rewşa şer îfade dike. Hucreyeke jinê nîne ku ji ber şîdetê nelerize. Rewşa zarokan jî heman tişt e. Rêbaza bingehîn a perwerdeyê şîdet e. Zarokê bi şîdetê hatibe terbiyekirin, bêguman wexta mezin bibe mirov dikare ji wî jî li benda heman tiştî be. Bi serweriya ku xwe dispêre şîdetê serbilind e, jê zewq digire û pê xweş e. Hisa bi hêzbûnê ya xwe dispêre îqtîdar û şîdetê diviyabû wek nexweşiyeke herî xeter a civakî bihata nirxandin, lê wek hisa herî mezin û bi kêf tê îlankirin. Rastiyek e, diviyabû lanet lê bihata kirin, lê wek fazîlet û mezinbûnekê tê destnîşankirin.

Trajediya civakî ya bi bêrehmiya siyasî û neçariyê diyar dibe, herî zêde em dikarin di rastiya jinê de bibînin. Wek êsîra kevneşopiya hiyarerşî û dewleta pênc hezar salî, di roja me ya îro de ji jinbûnê zehmetir mirov nikare jiyanekê bifikire. Zehmetî ne tenê ji kevneşopiyê ye. Nirxên jinê yên şaristaniya Ewrûpayê afirandine herî kêm bi qasî kenveşopiyên dogmatîk texrîbkar in. Jin di navbera çanda ku gihîştiye pornoyê û çanda çarşefa reş de, matmayî sekinîye.

**Di civaka Rojhilata Navîn de hêmanên çanda xwecihî û herêmî zêde û di zikhev de dijîn**

Xanedantî weke îdeolojî û pratîk di encama berepaşkirina vê nîzamê de pêş dikeve. Di vê nîzamê de ku weke nîzama 'bavikanî' jî tê bi navkirin tecrubeya 'kalemêr', 'hêza eskerî ya di bin destê zilamê xurt de' û bi hevgirtina şaman ê şiklekî rahibê berî pîroziyê, rêveberiya bavikanî şax û kokên xwe ber didin.

Divê mirov xisleteke xanedaniyê baş fêhm bike. Ji ber ku ev xislet roja me ya îro jî ji nêz eleqedar dike. Ew jî ev e: divê malbat bibe xwediyê gelek kuran, ev hîmê bingehîn ê îdeolojiya xanedaniyê ye. Daxwaza sereke ya îdeolojiya xanedaniyê zewaca bi pirr jinan û çêkirina gelek kuran e. Sedema vê yekê ya divê mirov fêhm bike hêza polîtîk e. Rahib bi hêza 'maneyê' pêşengtî dikir, kesê bi hêz ê xanedaniyê jî bi hêza 'polîtîk' rola pêşengtiyê bi cih tîne. Di guhnedana têgîna hêza polîtîk de dibe ku zor derkeve holê. Di guhnedana hêza rahib de jî hêzeke manewî ya weke 'xezeba xwedê' bandoreke bi tehlûke ya hişyar dike, pêk bê. Serçavkaniya hêza polîtîk jî hêza eskerî ya di bin destê zilamê xurt de ye. Di dema berê ya nêçîrvaniyê de, nexasim di dema jin-dayik bi bandor de, hema bibêjin; mêr bêgav û cih lê teng bûye.

Xanedanî, wek îdeolojî û nerit wê di encamê vê pergalê berevajî bike pêş bikeve.

Di nava jiyana civakî de xerîbketina herî mezin a pêşî bi otorîteya van kesên neqane destpêkir. Pêkhatinên weke malbatên neqane û xanedanî jî çavkaniyên xwe hiyarerşî ye. Xanedanî ji aliyekî ve weke dewletê bi gewde dibe, ji aliyê din ve jî weke malbatgiriyê jiyana civakî ber bi form û manedariyeke cihê ve bir. Veguherîneke bi kok pêk tê.

Di çanda civakî ya Rojhilata Navîn de bi belge û delîlên xurt piştrast bûye ku nîzama dayikê pêk hatiye. Piştî vê nîzama bavikanî (ji salên 5000 B.Z. ve her pêş ketiye) ceribandina sîstema îstîsmar û zordestiya pêşî îfade dike. Şoreşeke bi kok a li dijî jinê ye. Mal û zarok dikevin bin serweriya mêr ango saziya bavtiyê. Ji ber ku rê li nîzama muhafezekarî, zordestî û îstîsmarkariyê vedike zêdetir dijşoreş e. Wer xuya ye ku bûyîna xwediyê gelek zarokan nîzama pêşî ya mal e. Çiqasî zarok zêde bibin hêz, mal û milkiyet jî ewqasî zêde dibin. Têkiliya bavikantî û xanedantiyê bi milkiyetê re eşkere ye. Xanedantî saziya malbatê ya herî berfireh e; ji klanê mezintir e, hay ji xwe

çêbûye û milk nas kiriye. Şêweyê pêşî yê baviktiyê ye. Bi paşveketina xwedantiya jinê li ser mal û zarokan re parelel dimeşe. Çanda dayik-xwedawendê şûna xwe ji çanda qral-xwedayên zilam re dihêle. Di çanda Sumeran de mirov van bûyeran bi awayekî balkêş dikare bibîne. Tevahiya dîroka şaristaniyê zewac û saziya malbatê di bin bandora modela xanedantiyê de pêş dikeve. Ji ber ku xanedantî weke yekdestdariya desthilatdariyê û îdeolojiya mêrê serwer hat qebûlkirin an jî dan qebûlkirin, zewacên serdest neçar otorîteya bav nas bikin. Bi kurtî yên hatine avakirin xwezayî ne, nîzamên mîkro yên otorîter û îstîsmarkar in. Ji beriya dewletê bi hezarsalan hiyarerşiyê civak bi rê ve bir. Hêza baviktiyê li ti devera cîhanê qasî li Rojhilata Navîn xwe ba nedaye û nefes li jiyanê neçikandiye. Hê jî li ser nirxên dijîn, wek kesayeta mêr û jin, çanda etnîk, malbat û têgihîştina namûsê hêza baviktiyê diyarker e. Bajarên diviyabû çanda dijber biafiranda, şopên kûr ên jiyana çolter yanî baviktiyê hê jî li ser xwe hildigire. Di nav okyanûsa çolter û reşahiyê de mîna giravokan dimînin.

Min ji niqaş û çalakiyan re eleqederbênek mezin da nîşandan. Jiyanê her di her rojên ku derbasdibên de nîşan min dida ku çareserkirina pirkirêkên civakî di virde derbas dibin.

Dîsa berevajî yeqînan, dewlet û desthilatdarî ji çîniyateyî dernakeve. Berevajî dewlet û desthilatdariyên li ser xanedanî û malbatgiriyê (saziyên hiyarerşîk) avabûyî rê li çînîbûnê vedikin. Pêşekî ya pratîk û îdeolojiya dewletgir û hiyarerşîk e. Mumkîne ku mirov tespît bike ev pêvajo di dîroka şaristaniya Rojhilata Navîn de gelekî meşiyaye. Meylên çînîbûnê ne ku ji jêr ber bi jor zêdetir meylên ji jor ber bi jêr ve xurt in. Ji vê jî girîngtir, ji têkiliyeke çînî û dewletê ya li derveyî wan zêdetir weke îdeolojîk û pratîk fenomeneke çîn-desthilatdarî û dewletê ya ketiye zikhevdu tê dîtin. Ev pêvajo têra xwe sergirtî û nuxumandî dimeşe. Lê wer kirine ku ji ber formên îdeolojîk ên qebîleyî, malbatî, xanedanî û dewletî, kirine ku hema çîn neyê dîtin. Bi vî awayî hewl didin pêşî li serwextbûna çînî bigirin. Wexta ku mirov analîzên çînî dike, girîng e ku mirov analîzên berçav bike. Di dîrokê de çawa çêbûye divê mirov wilo nêzîk bibe. Li Rojhilata Navîn wexta ku civak bi çîn dibe, bi malbata fermî, xanedanî, desthilatdarî û dewletdariyê re di zikhev de pêk tê. Koletî bi tenê li ser keda maddî çênabe. Berê pêşî li ser zêhniyet, his û bedenan tê avakirin. Koletiya îdeolojîk heta pêk neyê, koletiya kedê ya maddî pêk nayê. Ji bo mirov pirsgirêkên çavkaniya xwe xisletên çînî ne, û gelekî zêde hene bibîne, divê mirov helwestên bi vî rengî yên temamker nîşan bide ku wê bêtir hînker bin.

Eger mirov pêşî bibêje pirsgirêka dewletê, paşê jî ya malbatê, ev helwesteke rast nîne. Pêwîst e, mirov van her du rastiyan bi tayekî diyalektîkî bi hev re bigire destê xwe û analîz bike. Sosyalîzma reel jî digot; em berê dewletê çareser bikin, paşê dorê were civakê, lê niha encam li ber çavan e. Pirsgirêkên bingehîn ên civakê nabe ku yek li pêşiya ya din were girtin û bi vî awayî were çareserkirin. Divê di nav hevdu de bi awayekî yekpare, têkiliya yekê bi ya din re were danîn. Ya rast ew e ku wexta ber bi çareseriyê ve jî gav were avêtin heman rêbaz were şopandin. Çawa ku bêyî çareseriya zêhniyetê dewlet, bêyî dewletê malbat, bêyî jinê çareserkirina mêr kêm dimîne, bêyî ku berovajiyê wê were kirin, rêbazên çareseriyê kêm dimînin.

Pirsgirêkeke din a herî hindik bi qasî dewletê giran bûye, zêhniyet û tevgera civakî ya ku li dora jin û malbatê pêk hatiye. Li jor dewlet, li jêr malbat, mîna dualîteyeke diyalektîk a cennet û cehennemê pêk tînin. Dewlet modela xwe ya mîkro di nav malbatê de pêk tîne, daxwazên malbata mezin jî dibe xwe wek makro dewletê bihûnin. Her malbata îdeal çareseriyê di dewletbûnê de dibîne. Siya despotê dewletê di nava malbatê de "despotê piçûk" "sermiyanê malê" mêr e. Despotê dewleta mezin, çiqas bi erk û wezîfe ye, dikare hewl bide bi awayekî kêfî rê bide ber cîhanê, sermiyanê piçûk jî di nava malbatê de li ser serê jin û çend zarokan bi heman karên nîzamiyeta mutleq tevdigere.

Di mijara jinê de mirov dikare li egoîstî û çavkoriya zilam weke diyardeyeke rojane her saetê çav bidêre. Di vê babetê de zilamê ji her tebeqeya civakî, bêyî ku rêzikeke huquqî û exlaqî nas bike çavê xwe namiçîne dikuje, qetil dike. Ma kesê xwedî wijdan dikare vê rastiyê ji nedîtî ve bê. Helwestên bi vî rengî jî pirranî li ser navê eşqê têne nîşandan. Ji ber ku têkiliya eşqê bi heqîqetê re kêm zêde hatiye şîrovekirin, yekser wê bê fêhmkirin ku vegotineke bi vî rengî dereweke herî rezîl e. Çi di cîhana heywanan çi jî di ya nebatan de û heta di cîhana fizikî ya em weke 'bêcan' bi nav dikin de ti kirdareke dibe mijara eşqê nakeve nava hewldaneke bi vî rengî. Herçiqasî hin jirêderketinên hê nehatine analîzkirin bêne dîtin jî eşkere ye ku li cem cinsê mirov sedem û maneyên kuştin û cinayetiyên bi vî rengî gelekî cuda ne. Berê pêşî divê mirov têkiliya van kuştin û cinayetiyan bi serwerî û mêtinkariyê re weke yek ji xusûsên sereke tê destnîşan bike.

Em heta di şaristaniya Rojhilata Navîn de malbatê wek modeleke mîkro ya dewletê analîz nekin, wê tehlîleke civakî ya baş kêm bimîne. Eger îro li Rojhilata Navîn pirsgirêka jinê bi qasî ya dewletê giran bûbe, dîsa di binê vê de bi qasî dîrokeke dirêj a dewletê, koletiyeke jinê ya tevlîhev û dirêj radizê. Eger di nexşeyê de sêgoşeya Bermûda jin-malbat-mêr baş neyê destnîşankirin, her keştiya çareseriya civakî ya di ber re biçe wê daqurtîne. Di okyanûsa civakî ya sêgoşeya Bermûda de li Rojhilata Navîn dewleta mîkro malbat e. Wexta hiyarerşî û dewlet mezin dibin, ji sedî sed projeksiyonên xwe di nav malbatê de nîşan didin. Dewlet û hiyarerşiya di nava malbatê de xwe nebîne, şensê wê yê jiyanê xurt nîne û nikare hebûna xwe dewam bike. Di şaristaniya Rojhilata Navîn de ev dualîte pir bi hostayî tê hûnandin û ti car nayê îhmalkirin.

Dewlet li ser çanda hezar salan a bavikanî mezin dibe. Di pêkhatina wê de ji hêmanên çînî zêdetir, komên bavikanî yên xurtbûyî roleke bingehîn dilîzin. Di nav van koman de jî herî zêde fîgurê rûsipiyê zana derdikeve pêş. Pîrê xwedî tecrûbe yê qebîleyê belkî jî wek zanayekî otorîteya herî kevin e. Bi îhtimaleke pir mezin, piştî dayika zana û aqilmend a di şoreşa cotkariyê de rol lîst, rûsipiyê zana yê xwedî tecrûbe gav bi gav pêşket mîna şêx-şaman-peyxember statuyeke civakî bi dest xist. Di civakê de bi pêşketina çînayetiyê re ji bavikanî ber bi saziya dewletê ve pêşketin dibe û zana wê wextê tevî muttefîkên pê re xwe digihîne xanedaniyê û qraliyeta xwe dispêrê.

Xanedanî, malbat û bi awayê di nav hinavên xwe de dewletê de mezin dibin, rastiyeke pir balkêş e, di xusûsiyetên etnîk û mîtolojîk dînî dihewîne. Di mezinbûn û hilweşîna dewlet û malbatekê de xanedaniyekê her tim roleke girîng lîstiye. Dewletên bêyî xanedan pir kêm in. Di roja me ya îro de jî ev pîvan hînê hukmê wan dewam dike. Wek sedem, mirov dikare hêza malbata bavikanî nîşan bide. Dewlet genê bavikanî ye. Ji lewra malbata herî xurt a bavikanî dibe xanedaniya dewletê. Xanedan bi xwe dibe dewlet. Xanedanî saziyeke welê ye, mirov dikare berî hezarsalan wê bibîne. Di nav dewlet û civakê de şopên wê yên mezin hene. Mîna ku ji çîna serdest, komên etnîk û baweriyên dînî pêk hatibe. Aliyekî din ê xanedaniyê ew e ku bi rêya sulaleyê bandorê li demên dirêj dike. Dîsa bi zewacên di nava xanedaniyan de dikare li ser cografyayeke berfireh belav bibe. Ev taybetî nîşan didin ka çima xanedan beriya her tiştî di nav dewletê de hatine damezrandin. Ji ber ku xanedanî bi qasî ku di pêşketina civakê de rolek wan heye di pêşketina dewletê de jî xwedî rol e, lewma divê ji nedîtî ve neyê. Şaristaniya Rojhilata Navîn hinekî jî bi xanedaniyan diherike heta îro. Nemaze xanedaniyên dewletan di dîrokê de şopên girîng hîştine. Di şaristaniya Rojava de zêdetir xanedaniyên li derveyî dewletê giraniya xwe hene, lê li Rojhilat xanedaniyên bi ser dewletê ve li pêş in. Xanedanî di heman demê de dibistan in; modelekî civakî ne. Bûyerên girîng berê li xanedan û modelên wê pêk tên, paşê derbasî nava civakê dibin. Komên etnîk û heta netew tim û tim bi navên xanedanan têne naskirin. Bûyerên nadîde nîn in, ku xanedaniyan bi qasî netew û komên etnîk rol lîstine. Netew û etnîsîteyên herî xurt bi xanedaniyên ku di nava xwe de mezin kirine, navê wan tên hildan. Xanedaniyên Emewî, Ebbasî, Eyûbî, Selçûkî, Osmanî û Barmekî di heman demê de têne maneya netewên Ereb, Kurd û Fars.

Dayikek, proleterekî neh mehan di malzaroka xwe de hil-digire û bi hezar zehmetiyan wî tîne dinyayê, baş e, em ê berdêla keda vê dayikê çawa bi nav bikin? Amûrên hilberînê yên bi daneheva hezaran salan çêbûne û sermayedaran ew dizîne, em ê çawa xwedîtiya wan û para wan diyar bikin? Em ji bîr nekin ku ti malê li bazarê tê firotin nirxa wî ya firotinê ya rastî nîne. Vedîtina teknîkî ya karxaneyekê berhema afirîner a bi hezaran kaşifî ye. Em ê nirxê van çawa diyar bikin û bidin kê? Eger mirov bi tevahî bê exlaq nebe ma mumkine para van a civakî ji nedîtî ve bê? Ma mirov van nirxên civakî û dîrokî di nava du kesan de par ve bike çiqasî bi têgihiştina li dadê re li hev dike? Jixwe malbat û derdorên van herdu kesan jî hene. Îcar malbat û civaka ev herdu kes parastine, ma hîç heqê van li ser wan nîne? Em hînê jî dikarin pirsên no zêde bikin. Lê evqas bi xwe jî têrê dike ku nîşan bide dualîteya kar-heqdestê çiqasî pirsgirêk e.

Pir hewce nîne mirov bibêje ekonomiya kapîtalîzmê, ji ber ku kapîtalîzm bi xwe cewherê aboriyê ye. Lewra sîstemek e, ji bo bi kar anîn, hevrikiyeke hov û kara zêde her tiştî li ber çav digire. Tiştekî civakê nehîştiye nekiribe mal û meta. Civaka bibe mal, maneya wê ew e ku wê ji dest jî were derxistin. Civakek ku bi vî rengî temenê xwe tijî kiriye nîzamek e, hewce tê dîtin dawî lê were anîn.

Di bingehê xetayan an jî çewtiyan de cihêkirina kapîtalîst-karker heye. Cihêkirina kapîtalîst-karker, di cewherê xwe de ji cihêbûna kole-efendî ya li xanên Romayê cuda nîne. Mirov dikare bişibîne têkiliya navbera serf-axa jî. Wexta mirov di nava malbatekê – bavikanî – de şêweyê rêxistiniya mêr û hêmanên xwe dispêrê li ber çav bigire û şêweyê rêxistiniya jina pêve girêdayî li ber çavan bigire, ji serî ve diyar e wê di encama şer de kê bi ser bikeve. Eger em rewşên îstîsnayî bidin aliyekî, di encama şerekî serketiyê wê eşkere de bêguman wê li hemberî jina di encama şer de perîşanbûyî, mêrê hê bi hêztir bibe. Jin hê zêdetir bûye ya mêr. Nakokî dîsa heye. Lê bi qasî veguheriye, di nav sîstema mêr-serwer de gaveke din heliyaye. Em mînakê dikarin ji bo gelemperiya civakê bi kar bînin. Di civaka şaristaniya çînî de û heta beriya wê di civaka hiyarerşîk de ku jin bi hezar ta û benî ve bi serweriya mêr ve hatiye girêdan. Eger bi teorî û pratîkekê ji jinê xilasî û rizgarî hêvîkirin ji xeyalê wêdetir, ji “lêdan û girêdanê” zêdetir tiştekî din nîne. Ji kêliya ku jinê pîrekbûn qebûl kir û pêve êdî neçarî wendakirinê bûye. Berxika li bin kêra qesab çiqasî xwe bitengijîne dikare xilas bibe? Şensê jiyanê yê berxê girêdayî însaf û berjewendiyên qesab e. Dikare ji bo şîr û hîriyê jî xwedî bike û dikare serjê jî bike.

Her ku diçe zehmet dibe, ji bo cihê jinê yê di bin tehekum û nîzama mulkiyetê de were tarîfkirin. Di roja me ya îro de jin wek encameke hezarê salan, mîna berateyekê dijî. Ji rê derxistina sîstema kapîtalîzmê hînê baş nehatiye dîtin. Jin li civaka Rojhilata Navîn objeyeke di navenda paşverûtiyê de cih digire. Mêrê Rojhilata Navîn ê têkçûyî hemû heyfa xwe ji jinê hiltîne. Li der ve çiqas heqaret lê werin kirin, bi zanebûn an jî xweber berdêla vê yekê hemûyî ji jinê distîne. Mêrê ku nikare civaka xwe biparêze û rêya çareseriyê nabîne, hemû hêrs û şîdeta xwe mîna dînekî di

nav malê de li ser serê jinê û zarokan ditemirîne. Di bingehê bûyer û kuştinên “namûsê” de ev rastiya balkêş heye. Ya rastî, mêrê namûsa xwe di warê civakî de binpê kiriye, berovajî dizîvire û hêrsa xwe li ser serê jinê ditemirîne. Bi awayekî pir sivik, sembolîk, neçar û xwepêşadaneke namûsparêz doza xwe qaşo çareser dike. Mîna psîkoterapî bike tevdigere. Di binê pirsgirêkê de dozeke civakî û dîrokî ya wendakirî radizê. Yek ji pirsgirêkên bingehîn ew e ku ji vî “mirî” re divê were gotin; ew heta bi vê doza dîrokî û civakî re rûbirû nebe û wezîfeyên dikevin ser milê wê bi cih neyne, wê ti car nikaribe xwe ji vê qirêja namûsê xilas bike. Namûsa rastîn bi bakîretiya azayê cinsî yê jinê nîne, bi parastina bakîretiya civakî û dîrokî dibe. Divê mirov vê rastiyê bide hînkirin û bi cih bîne.

Li Rojhilata Navîn hemû hucreyên civakê di nav krîzeke dijwar de ne. Malbat, eşîr, bajar, gundî, bêkar, cemaetên dînî, rewşenbîr, tendurustî û di serî de perwerdeya girseyê saziyên civakî dema xwe ya herî nîhîlîst û bi krîz dijîn. Gewdeyê civakî yê bi îdeolojiya jor a serdest û îqtîdarê dor lê hatiye girtin û bi aboriyeke hîç têrê nake hatiye tengavkirin mîna nexweşê qelew-obez e. Jixwe ev obeztî ya rastîn mîna li DYE û YE nîne. Ev obeztî dişibe zarokê Efrîkî yê zikê wî bi pêş ve nepixiye. Di van hucre û saziyên civakî de mirovan fonksiyona xwe wenda kirine. Roleke watedar a saziyan nemaye.

Ez yeqîn dikim, bi vê vegotina me ya kurt a dîrokî hat fêmkirin ku li Rojhilata Navîn mezinbûna pirsgirêkên malbata îro, bi qasî pirsgirêkên di nava dewletê de girîng in. Zordestiya ji du milan ve tê, pirsgirêkê dijwartir dike. Şêwazê civaka dewletê û bavikanî ku ji mêj ve tên, û qalibên hemdem ên şaristaniya Rojava nabin sentezek, berovajî mijarê dikin girêkeke kor. Pirsgirêkên ku di nav dewletê de hatine afirandin û li hev hatine gerandin, di nav malbatê de hînê zêdetir germole bûne. Malbatên pirzewac û pirzarok ji aliyê aborî ve nikarin debara xwe bikin. Zarokên mezin dibin û şêniyên ciwanan ên zêde dibin, bê kar in û ev jî malbatê bê kêr dike. Malbata ku li gorî dewlet û aboriyê hatiye eyarkirin, ji her du aliyan ve jî nikare bimeşe û di heriyê de bist bûye; çikiyaye. Ne malbata şêwazê wê Rojavayî, ne jî malbata şêwazê wê Rojhilatî dikare bijî. Di van şert û mercan de malbat dejenere dibe. Tevî ku hemû benên civakî vedirşin jî malbat hînê jî li ber xwe dide. Ji ber ku di warê civakî de malbat sitara bi tenê ye. Ji sedî sed divê mirov malbatê piçûk nebîne. Rexneyên em dikin, malbatê ji kokê ve red nakin, em hewl didin ji nû ve mane bidinê û destnîşan dikin ku hewce ye ji nû ve bi awayekî têkûz were avakirin.

Ji pirsgirêka jinê girantir, divê mirov pirsgirêka mêr bixîne rojevê. Çareserkirina têgîna îqtîdar û serweriya mêr, ji koletiya jinê kêm girîngtir nîne. Belkî jî hinekî zehmet e. Yê xwe nêzî veguherînê nake, ne jin, zêdetir mêr e. Wexta dest ji fîgurê serwertiya mêrtiyê ber dide, dibe xwediyê hisa hukumdarekî mîna dewleta xwe wendakirî û wek têk çûbe li ser totikên xwe rûdinê. Ya rastîn, divê mirov nîşanî wî bide ku ev serweriya hundurê wê piçûk, wî ji azadiyê dike û wî dike muhafezekarekî temam.

Divê mirov jinê wek cins, nifş û çîneke ku ji mêj ve hatiye dîlkirin bigire dest û hindik be jî di warê sosyolîk de analîz bike. Ji lewra bi kurtî be jî divê em kurtedîroka koletiya jinê bihûnin û li ser rawestin. Naxwe emê nikaribin baş li malbat û mêr yanî ji aliyekî din ve li dewlet û civakê serwext bibin. Ji ber ku me di beşê berê de hewl dabû jinê tarîf bikin, ezê dubare nekim. Lê dîsa jî em ji bîr nekin ku di hin nirxandinan de jin di nava civakê de ji aliyê biyolojîk ve wek cinseke kêm û bi qusûr tê dîtin, ev bi temamî îdeolojîk e, – hûnandineke fikrî ya mêrê serwere - divê ev nirxandin ji nedîtî ve neyê. Ji ber ku bi awayekî ilmî jî îspat bûye ku jin wek hebûneke biyolojîk û civakî hînê bi qabîliyet e.

Tevî ku rastiyek e ku bêyî jinê jiyan nabe, lê eşkere ye ku bi jineke evçend hatiye xistin jî jiyaneke manedar û rûmetdar nayê parvekirin. Jiyana bi jina heyî re her kes û giştî heta bi qirika xwe ketine nava koletiya herî rezîlane; bi vê zanîn û têgihiştinê divê mirov çareser û çalak be, wê ev bibe rêya rast a rizgariya jiyanê. Divê mirov ti carî ji bîr neke ku bi jinê re jiyaneke bi mane û bi anor bi zanyartî û hozantiyeke mezin dibe. Yên îdeaya xwe ya eşqê hene, divê kêliyekê jî ji bîr nekin ku bi cihanîna vê eşqê bi çûyîna di rêya vê zanyartî û meznahiyê de ye. Naxwe bi awayekî din meş û çûyîn bi eşqê re xiyanet e, û ji koletiyê re xizmet e. Mirov heta xwe negihîne heqîqeta civakî nikare bigihîne eşqê.

Ji van nirxandinên kurt encama mirov dikare derxe ew e, ji dema dayikî vir ve jin bi awayekî sîstemîk û sazî bi mêtinkarî û zordestiyeke civakî re rûbirû bûye. Koletiya jinê bi qasî ku bi ti şêweyê koletiyê re mirov nikaribe bide berhev tevlîhev û heyatî ye. Di nava dîroka şaristaniyê de bazarên koleyan ên jinê, cariyetî û saziyên hareman belkî hinekî diyardeyê nîşan bidin. Lê kirinên moderniteya kapîtalîst li ser jinê ewqas zêdebûne hed û hesabê xwe nînin. Ti şaristaniyê bi qasî kapîtalîzmê bi jinê ne lîstiye û îstîsmara xwe li ser bi sazî nekiriye. Diyarde ewçend hatiye îstîsmarkirin, pirraniya jinan kirinên ew xistine rewşên herî rezîlane weke xisletên bingehîn ên nasnameya jinê nîşan didin. Ne tenê ev, dekûdolab li ser serê wê tê gerandin û ew xwe weke parçeyekî destê vê dekûdolabê digerîne qebûl dike û ew wer ketiye dest ji gerandina vê dekûdolabê ti fikarê nake. Em bi tenê behsa mêtinkarî û zordestiyeke diyardeyî nakin. Koletiyeke dawerivandine her şaneyên jiyanê xwe weke şêweyên deng, reng, beden û zêhniyetê bê xem û fikar xwe bilê xwe pêşkêş dike. Hay ji xwe nîne têkiliya xwe ya bi heqîqeta civakî re ji dest daye

û kirine ku bi tenê jiyaneke li ser dikê tê lîstin. Ya rastî, vê îmkanê jî nabîne. Ji bo bedestxistina heqîqet û rûmeta jiyanê, belavkirina mija li dora jinê bi tevahî girîngiya xwe diparêze.

**Azadkirina zayenparaziya civakê**

Tevî ku cewherê demokratîkbûyînê ye, yek ji rastiya ku divê em bi serê xwe li ser rawestin mijara jinê ye û nîzama nakokî û têkiliyên li hawîrdorê ye. Ilmên civakî çiqas kêm û dereng li ser mijarên komîn û demokratîk rawestiyane, ew çend jî û heta jê zêdetir dûrî mijara jinê mane. Mîna ku bûyerên li dora jinê û serhatiyên wê pir pêdiviyên xwezayî be û ev têgihîştin xwe di hemû zanistan de nîşan dide û di helwestên siyasî û exlaqî de wek pêşferaziyeyekê tê qebûlkirin. Ya herî mirov xemgîn dike, jin bi xwe jî hîn bûye vê paradigmayê xwezayî bibîne. Çewa ku statuyên bi hezarê salan li ser gelan hatine ferzkirin û pîrozkirin xwezayî têne dîtin, çend qat zêdetir li hemû zêhniyet û tevgera jinê jî mîna hatibe kolan û niqirandin. Çendîn gelan dikin jin, jin jî dibin gel. Wexta Hîtler dibêje; “Gel mîna jinê ne” vê rastiyê destnîşan dike. Em dema hûrûkûr nêzî mijara jinê bibin, emê bibînin ji cinsekî biyolojîk wêdetir wek nijad, çîn û netewekî pê re hatiye danûstendin. Lê wek nijad, nifş û yan jî netewê herî zêde hatiye pelixandin. Divê mirov baş zanibe, ti nifş, çîn, an jî netew mîna jinê li koletiyeke sîstematîk nehatiye qewimandin.

Dîroka koletiya jinê hînê nehatiye nivîsandin. Dîroka wê ya azadiyê jî li benda nivîsînê ye. Dîroka jinê ya di tariyê de hatiye hîştin, bi qasî koletiya jinê ya kûr, ji nêz ve têkiliya wê bi îqtîdara dewletparêz û hiyarerşiya di civakê de bilind bû, heye. Piştî ku jin hînî koletiyê hat kirin, di civakê de hiyarerşî hat damezrandin û di nav beşên din ên civakê de rê li ber koletiyê hat vekirin. Kolebûna mêran piştî koletiya jinê tê. Koletiya cins cudahiyên wê ji koletiya çîn û netewan heye. Koletiya cins tevî zordestiyeke hişk û nermik bi derewên hisbarkirî tê rewakirin. Cudahiya biyolojîk wek sedemek ji bo koletiya wê tê bi karanîn. Hemû karên dike bi gotina “karên pîrekî” sivik têne dîtin. Ketina jinê ya nav gelemperiya civakê ji aliyê dînî û exlaqî ve wek şerm tê qebûlkirin. Her ku diçe ji çalakiyên girîng ên civakî dûr tê xistin. Xebatên siyasî, civakî û aborî çendîn ketin destê hêza serdest mêran, qelsî û lawaziya jinê mîna saziyekê cih digire. “Cinsê qels” mîna baweriyekê tê parvekirin.

Piştî ku hemû derfetên maddî û manewî ketin destê mêr, êdî jin dibe ku li destê wî binere; carnan lavahiyan dike li ber digere; carnan hemû şerefa xwe binpê dike serî li ber çarenûsa xwe ditewîne û pirî caran jî dixeyide û xwe bi bêdengiyeke mezin dinixumîne. Bi gotineke din mirov jê re dikare bibêje miriya dijî. Em bi çend teşbîhan dikarin rastiyê hê berçav bikin. Teşbîha me ya yekemîn, çivîka di qefesê de ye. Çivîk carnan mîna kanaryayê bi xemil û xêz tê kirin, carnan mîna bilbil deng xweş tê kirin. Her kes li gorî xwe dişibîne çivîkekê. Pirî caran jê re çivîka serçe tê gotin. Teşbîheke din, mîna pisîkek ku timî dike miyaw miyaw û li binê bîreke bêbinî hatibe hîştin. Bi kurtêlan xwe xwedî dike û li ber destê xwediyê xwe baş kedî dibe. Dibe ku teşbîhên me hinekî çor bin, lê ji bo em bi awayekî ilmî kûrbûna vê koletiyê bibînin, hewceyî bi hewldanên wêjeyî û piralî hene. Civakeke mezin cinsparêz hatiye afirandin. Helwesta rastîn a çor û hişk di vir de ye; mêr bi awayekî yekalî dest diavêje jinê û ev yek mîna qehremaniyekê tê pêşkêşkirin. Mêr heta dawiyê bi vê kêfxweş dibe û serbilind e, jin jî bi kevirkuştinê heta hepiskirina di kerxanê de û heta careke din nikaribe derkeve nava civakê bi gelek helwestên bêrehim re rûbirû dimîne. Dîsa eger bi awayekî çor rave bikim, mêr bi penîsê xwe heta dawiyê serbilind e, lê jin ji ber yê xwe fedî dike. Cudahiyên pir basît ên bedenî li dijî jinê hatine bi karanîn. Jintî bi xwe bûye hebûnek jê were fedîkirin. Hisa evînê goya pîroz e, mêr bi awayekî yekalî û çavsor li ser jinê ferz dike. Zarokên keçik her tim bêqîmet û heqîr hatine dîtin.

Pirsa divê were kirin ev e; gelo çima ev çend koletiyeke kûr? Bersiva wê ji sedî sed bi rastiya îqtîdarê ve girêdayî ye. Îqtîdar bi awayekî xwezayî koletiyê dixwaze. Eger sîstema îqtîdarê di destê mêr de be, ne tenê beşek ji cureyê mirov, divê tevahiya cins li gorî îqtîdarê reng bigire. Xwediyên îqtîdarê çawa sînorên dewletê mîna yê xaneyê dibînin û her kirinê di navê de ji xwe re heq û rewa dibînin, îqtîdara mêr a di nav sînorên malê de ku mîkro modela dewletê ye, ji bo xwe her kirinê – hewce bibîne mirin jî di navê de – heq û rewa dibîne. Jina malê jî ew çend milk û malekî kevin û kûr e, bi hiseke bê sînor a mulkiyetê dibêje; “pîreka min e.” Jin – li ser navê zewacê jî – nikare îdîayeke piçûk a heq jî li ser mêr bike. Lê mêr bê sînor dikare li ser jinê û zarokan doza heq bike. Divê mirov dîsa li çavkaniya mulkiyetê di nava malê de bigere û di tasarufa li ser jinê de bibîne. Di çavkaniya mulkiyetê de jina kolekirî heye. Koletî û mulkiyeta li ser jinê hatiye danîn pêl bi pêl li tevahiya civakê tê belavkirin. Bi vî awayî her his û ramana koledar û mulkparêz di tevger û zêhniyeta ferd û civakê de tê bi cihkirin. Di vê çarçoveyê de civak tê wê astê ku li gorî avahiyên dewletparêz û her cure hiyarerşîk, amade bibe. Ev jî tê wê maneyê ku her cure avahiyên ji wan re şaristaniya çînî tê gotin bi awayekî hêsa û rewa dikarin hebûna xwe dewam bikin. Ji lewra ya tenê wenda dike jin nîne. Ji bilî kulm û misteke dewletparêz û hiyarerşîk, hemû civak wenda dike.

Ji bo jinê demên krîzê yên taybet pir girîng nînin. Jixwe jin timî di nav krîzê de ye. Wexta jin were gotin, yanî nasnameya bi krîz tê îfadekirin. Roja me ya îro di kaosa sîstema kapîtalîst de jina tenê hêvî dide, hindik be jî rastiya

wê hatiye rohnîkirin. Femînîzm kêm be jî rastiya jinê di dawiya çaryeka sedsalê de eşkere kiriye. Di kaosê de, bi rohnîkirinê şensê guhertinê yê her rastiyê heye, lewma her gava ber bi azadiyê ve were avêtin dikare rê li ber pêşketinên hêja veke. Ji krîza roja me ya îro, azadiya jinê dikare bi serketinê derkeve.

Azadiya jinê, divê li gorî tarîfa xwe, çarçoveyeke rast bibîne. Azadî û wekheviya giştî ya civakî dibe ku yekser ji bo jinê nebe azadî û wekhevî. Hewldan û rêxistiniyeke xweser şert e. Tevgera giştî ya demokratîkbûyînê dikare ji bo jinê derfet û îmkanan bide, lê xweber demokrasiyê nayne. Divê jin bi xwe, ji bo armancên demokratîk û rêxistiniyê hewl bide. Beriya her tiştî hewceyî bi tarîfeke azadiyê heye ji bo bersivê bide koletiya bi jinê hatiye daqurtandin. Sîstema kapîtalîst ew çend vîzyoneke mezin û cîhaneke faraziyan xistiye şûna rastiyê, çalakiyeke herî zêde jinê piçûk bixîne (mînak pornografî) bi azadiyê re heman tişt û wekhev dibîne.

Her çend di hewldan û xebatên femînîstan de nuqteyên girîng hebin jî, hê nikarin ji mejiyê demokrasiyên ku navenda wan Rojava ne, derbas bikin. Şêweyê jiyanê yê di bingeh de kapîtalîzm heye baş fêm nekirine. Lewra nikarin li dawiyê jî bihêlin. Rewş, têgihîştina şoreşa sosyalîzmê ya Lenîn bi bîr dixîne. Tevî ew çend hewldan û gelek destketiyan, Lenînîzmê nekarî xwe xilas bike ji bo li baskê çepê nebe alîkarekî baş ê kapîtalîzmê. Heman tişt dibe ku bi serê femînîzmê de jî were. Ji ber ku bingehekî xurt ê rêxistinî nîne, felsefeya xwe pêş de nebiriye û zehmetiyên mîlîtaniya jinê, îdîaya wê qels û lawaz dike. Dibe ku nikaribe “sosyalîzma reel” a jinê jî pêk bîne. Lê ji bo balê bikişîne ser pirsgirêka jinê gavavêtineke ciddî ye.

Bêguman, wek her cureyekî cins xwezayek jinê jî heye. Ji civakîbûyînê jî wêdetir her roja diçe biyolojî îspat dike ku jin wek cinsekî biyolojîk jî hebûneke navendî û çavkanî ye. Bi kurtî bedena jinê ya mêr jî di hundurê xwe de dihewîne, lê ya mêr a jinê di hundurê xwe de nahewîne. Berovajî pirtûkên pîroz, ne ku jin ji mêr, mêr ji jinê zêde bûye. Kromozonên jinê ji yên mêr pirtir in. Xwînbûyîna jinê ya serê mehan ku jê re wek kêmasî û şermekê tê hesibandin, têkiliyeke wê ya nazik bi xwezayê re heye. Xwîn herikîna ji malzarokê, divê wek herikîneke jiyana xwezayî ya hê neqediyaye were fêmkirin. Damara sereke ya jiyanê hînê neqediyaye û dewama wê, divê wek îradeya jinê were fêmkirin. Mijarên mîna nexweşiyên jinê têne bi navkirin, ya rastîn nîşaneyên jiyanê ne. Ji ber ku jin navenda jiyanê temsîl dike. Pirsgirêkên tevlîhev ên jiyanê di malzaroka jinê, zikê wê de diqewin. Zarokê ji wê dibe û navika pê ve mîna xeleka dawî ya jiyanê be. Li hemberî vê rastiyê mêr wek parçeyek an jî laqekî jinê xuya dike. Yek ji îspatên vê rastiyê, hisa hesûdî û çavnebariya zêde ya mêran e. Jin zêde ji xwe piştrast disekine, lê mêr di cihê xwe de ranaweste, nahewe. Mîna belayekê li dora jinê digere, natebite. Ev hemû çavdêrî nîşan didin ku bedena jinê hêlîna qelsiyan nîne, berovajî navenda hebûnê ye. Ji lewra divê jin xwe ji navlêkirinên çanda mêrên serdest ên mîna “nexweş, kêm” tavilê xilas bike û red bike. Pêwîst e berovajiyê wê nîşanî mêr bide. Jixwe em wexta dibêjin; divê jin ji bedena xwe piştrast be, em vê rastiyê destnîşan dikin.

Di encamê de ev pêkhatina fizîkî ya jinê mejiyê hisî li cem xurtir dike. Mejiyê hisî ew mejiye ji jiyanê qut nabe. Empatî û sempatiyê bi awayekî xurt di xwe de dihewîne. Wexta li cem jinê mejiyê analîtîk pêş bikeve jî bi hebûna mejiyê xwe yê hisî bi jiyanê ve hê girêdayî ye, giran e, xwedî wê qabîliyetê ye, texrîbkar nîne. Mêr qasî jinê ji jiyanê fêm nake. Jin bi xwe jiyan e (Di zimanê Kurdî de ku ji koma zimanê Aryen e, jîn bi maneya jiyanê ye), qabîliyetek e; di her warê jiyanê de ji durûtiyê dûr e, nişmî ye û zelal e. Ev qabîliyeta jinê xurt e. Em vê yekê ji jiyana xwe ya şexsî jî baş dizanin.

Azadiya Jinê, wexta bikeve qada polîtîk, divê baş bizanibe wê bi şerekî çetîn û dijwar re rûbirû bimîne. Heta di qada polîtîk de hînî bi destxistin û qezencê nebe, ti destketî mayînde nabin. Serketina di warê polîtîk de nayê wê maneyê ku jin dibe dewlet. Berovajî, têkoşîna li dijî avahiyên dewletparêz û hiyarerşîk, hewce dike ku avahiyên siyasî yên hedefa wan civaka okolojîk azadiya cins, demokrasî ne pêk bîne. Hiyarerşî û dewletparêztî herî zêde bi xwezaya jinê re li hev nakin. Ji lewra, tevgera azadiya jinê divê ji pêkhatiyên antî-hiyarerşîk û avahiyên li derveyî dewletê re rola pêşeng bilîze. Eger bizanibe di qada polîtîk de bi ser bikeve, wê di heman qadê de koletiyê jî hilweşîne. Ji bo têkoşîna di vê qadê de divê rêxistinên jinê yên demokratîk û têkoşîna wê berfireh be. Her cure civaka sivîl, mafê mirovan, rêveberiyên herêmî yên demokratîk ji bo xwebirêxistinkirinê qadên têkoşînê ne. Mîna di sosyalîzmê de, rêya diçe wekhevî û azadiya jinê di têkoşîneke serketî ya demokratîk û berfireh re derbas dibe. Tevgera jinê ya demokrasiyê bi dest nexîne, nikare azadî û wekheviyê bi dest bixe.

Malbat di nava klanê de saziya pêşî ye ku cuda dibe. Demeke dirêj weke malbata dayikê jiya, piştî şoreşa gund û cotkariyê (texmînî di salên 5000'î B.Z. de) bi pêşketina otorîteya hiyarerşîk a di bin serweriya zilam de dema malbata bavik destpê dike. Sermiyantî û zarok di bin destê zilamê mezin ê malê de hatin hiştin. Xwe xwediyê jinê dîtin bingehê fikra pêşî ya milkiyetê pêkanî. Piştre jî dor hat kolekirina zilam. Di dema şaristaniyê de em li şêweyên malbatê yên dem dirêj û berfireh rast tên. Malbatên gundiyên ji rêzê û zenaetkaran her hebûn. Desthilatdar û dewletan zilam-bavê di nava malê de weke kopyayekî otorîteya xwe bi erk û rol kirine. Bi vî awayî malbat kirin rewşekê ku bû amûrê herî girîng ê rewakirina yekdestdariyan. Ji şebekeyên sermaye û serweriyê re her tim kole, serf û karker, kedkar, esker û ji bo xizmetên din rola çavkanîbûnê girt ser xwe. Ji ber vê yekê girîngî bi malbatê dan û

ew pîrozkirin. Şebekeyên kapîtalîst çavkaniya herî girîng a karê ji nava malbatê bi mêtina keda jinê pêkanîn û ev yek bi awayekî sergirtî kirin, lewma ji malbatê re ev bû barekî zêde yê veşartî û neyekser lê barkirî. Malbat kirine mîna sîgortaya nîzamê û bi vî awayî ew mehkûmî dema wê ya herî muhafezekar kirine.

Di warê civakî de ji aliyê azadiyê ve pirsgirêka herî girîng rastiya malbat û zewacê ye. Ev mijar mîna bîreke bêbinî ye. Ev saziyên em behsa wan dikin, ji bo jinê bi zêhniyeta civaka heyî ji qefesekê derbasî qefeseke din dibe, hem jî ciwantiya xwe ya xama jî neçar radestî zêhniyeteke serjêker û qesab dike. Divê mirov malbatê wek siya civaka jor – civaka îqtîdarê – a di nav gel de bibîne û wek saziya sîxur û ajan binirxîne. Nûneriya îqtîdara di nav civakê de mêr di nav malbatê de dike. Ya rastîn wexta jin dizewice dibe kole. Mirov saziyeke din nikare bifikire ku bi qasî zewacê jinê dike kole. Koletiyên herî dijwar bi vê saziyê dest pê dikin û di nava malbatê de rehên xwe berdidin. Em bi giştî behsa bihevrebûnên hevaltî û jiyana hevpar nakin. Ev mijarek e, li gorî têgihîştina wekhevî û azadiya her kesî dikare bibe xwediyê maneyekê. Em behsa malbat û zewaca klasîk a bi cihbûyî dikin. Ev rewşa em behs dikin, ji sedî sed jinê dike mulk, di warê siyasî, zîhnî, civakî û aborî de paş ve dixîne û dike ku careke din jin bi hêsanî bi ser xwe ve neyê. Eger hîmên jiyana hevpar a li ser wekheviya cins, azadî û demokrasiyê di lêpirsîneke radîkal re neyên derbaskirin, ji ber tengasiyên ajoyî, ferdî û têgihîştinên kevneşopî yên malbatê zewac û têkilî bibin, dibe ku li ser rêya jiyana azad weke ji rêderketinê roleke xeter bilîzin. Hewceyî bi van têkiliyan nîne, ya girîng divê mirov qadên polîtîk, zêhnî û demokratîk çareser bike, azadiya cinsiyetê tam pêk bîne û li gorî vê yekê îradeya jiyana hevpar bi cih bîne.

Rexnekirina malbatê girîng e. Eger were rexnekirin dibe ku bibe hêmanê sereke yê civaka demokratîk. Bi tenê jin ne, bi tevahî malbat weke şaneya desthilatdariyê neyê analîzkirin, îdeala şaristaniya demokratîk û bi cihanîna wê, dibe ku ji hêmana xwe ya herî girîng mehrûm bimîne. Malbat saziyeke welê nîne mirov jê bibihure û wê li dawiyê bihêle, lê mirov dikare wê veguherîne. Îddîaya milkiyetê ya li ser jinê û zarokan a ji hiyarerşiyê mayî divê were terikandin û di têkiliyên hevaltiya hevjînan de her cure têkiliyên sermaye û desthilatdariyê cih negirin. Divê nêzîkatiyên xerîzeyî yên ji bo dewamkirina cins li dawiyê bêne hiştin. Di bihevrebûna jin û mêran de nêzîkatiya herî îdeal ew e, felsefeya azadiyê ya bi civaka exlaqî û polîtîk ve girêdayî esas bê girtin. Malbata ku di vê çarçoveyê de veguhere, wê garantiya herî têkûz a civaka demokratîk be, û wê yek ji têkiliyên bingehîn ên şaristaniya demokratîk be. Ji hevaltiya (hevjîntî) fermî wêdetir hevaltiya xwezayî girîng e. Divê herdu hev-alî timî ji mafê jiyana bi tenê re mayînê amade bin. Di têkiliyan de tevgera bi koletî û bi çavkorî nabe. Eşkere ye, wê malbatê di bin şaristaniya demokratîk de veguherîna herî manedar pêk bîne. Jina bi hezarê salan ji rêz û hurmeta xwe gelek tişt ji dest dane heta bi rêz û hêz nebe, yekîtiyên malbatan ên manedar pêk nayên. Malbatên li ser cehaletê avabûyî rêz û hurmeta wan nabe. Di jinûve avakirina şaristaniya demokratîk de par û rola ji malbatê re dikeve girîng e.

Di roja me ya îro de mijara herî zêde mîna benîştan tê cûtin eşq e û ew jî di dîroka xwe de ti car evqas rezîl nebûbû û ji cewher û naveroka xwe dûr neketibû. Di ti serdema dîrokê de eşq evqas neket ber pê û lingan. Ji eşqên kêliyekê bigirin ji têkiliyên herî xeter û bê xwê re eşq tê gotin. Jixwe ti têkilî ji van çêtir nikare têgihîştina jiyana kapîtalîzmê nîşan bide. Ya rastîn, eşqên serdema me, mikurhatinên pir eşkere ne, û nîşan didin; zêhniyeta ku sîstema serdest li ser civak û mirov ferz dike li qadên herî pîroz ketiye çi rewşê. Yek ji wezîfeyên zehmet ên şoreşgeriyê ji nû ve geşkirina eşqê ye. Eşq kedeke mezin, rohnîbûna zêhniyetê û hezkirina mirovatiyê dixwaze. Yek ji şertên girîng ên eşqê; divê tu li sînorê zanyariya serdemê bî. Şertê duyemîn; divê tu li dijî çavsoriya sîstemê xwedî helwesteke mezin bî. Ya sêyemîn; divê tu xwedî exlaqekî wisa bî bizanibî bêyî azadiyê mirov nikare li rûyê hevdu binerin. Ya çaremîn; divê ajoyên cinsî li gorî pêdiviyên sê nuqteyên me destnîşankirî xwe rabigire. Yanî ku tu negihîjî zanyariya ajoyên cinsî, exlaqê azadiyê û bi pêdiviyên têkoşîna eskerî-polîtîk ve girê nedî, her gava were avêtin înkara eşqê ye. Kesên bi qasî çivîkekê azad derfetên wan ên hêlîn danînê nebin, nikarin behsa evînê, têkiliyê û zewacê bikin. Ya rastîn, eger behs bikin, wê wextê xwe radestî koletiya nîzama civakî ya serdest kirine û diyare qîmeta nirxên serberziyê yên têkoşîna azadiyê nizanin.

Eger wexta behsa rastiya eşqa serdema me were kirin, ji eşqa Leyla û Mecnûn zêdetir, ji gelek ehlên tesawifê jî wêdetir, bi nazikiya zanyaran, kesên ji bo derketina ji kaosa civakî ya îro û rê li ber vekirina azadiyê, bi egîdî, fedekarî û serketinê xwe îspat bikin hene û bi qezenckirina van kesayetan eşq dibe.

Pirsgirêkên jinê yên aboriyê, wekheviya civakî, beriya her tiştî bi çareserkirina îqtîdara polîtîk û bi serketina demokratîkbûnê dikarin bersivên xwe bibînin. Pir eşkere ye, heta siyaset bi awayekî demokratîk neyê meşandin, di azadiyê de pêşketin nebe, wekheviyeke hişk a huqûqî zêde maneya wê nîne.

Ya rast, divê mirov helwest û nêzîkbûna ji bo jinê wek şoreşa çandî bigire dest û li ser rawest e. Niyet çiqas baş dibe bila bibe, hewldan û xebat çiqas werin kirin bila werin kirin, bi sedema çanda heyî û ji ber nakokiyên di nava rastiyê bi xwe de çareseriyeke azadiyane nabe. Nasnameya azadiyane ya herî radîkal, bi helwesta ji bo jinê, yan jî bi awayekî giştî bi serwextbûna li nîzamê têkiliyên jin-mêr û li dawî hîştina wan mumkîn dibe. Divê her kes baş bizanbe, li ser navê kevneşopiyan, sergirtin û nuxumandina jinê, li ser navê hemdemiyê jî bi pornografîkirina jinê, bi

qasî serê derziyê pêşketin nabe. Bi qasî têgihîştina li koletiyê, hewceyî bi têgihîştina li azadiyê jî heye. Bi vê serwextbûnê re divê mirov xwe bigihîne îradeyê. Kesên di azadiya jinê de, yanî di xwe azadkirinê de qonaxan derbas nekin, nikarin di ti warê azadiya civakî û siyasî de rê li ber veguherîn û çareseriyê vekin. Çi hewldana azadiyê ya dualîteya mêrê serwer-kole jin, li dawiyê nehêle, nikare nasnameyeke rastîn a azadiyê bi dest bixîne û divê mirov vê yekê jî wek pîvaneke bingehîn a azadiyê binirxîne. Heta têkiliya mulkiyet û îqtîdarê ya li ser jinê neyê hilweşandin, kes nikare têkiliya azad a mêr-jinan pêk bîne.

Di vê sedsala me de wê îradeya jinê ya azad xurt bibe. Şaş nîne mirov vê nirxandinê bike. Belkî jî pêwîst e mirov li ser saziyên mayînde yên sedsalan dewam bikin ji bo jinê bifikirin. Dibe ku hewceyî bi Partiyên Jina Azad hebin. Destnîşankirina pîvanên polîtîk û meşandina îdeolojiya bingehîn a azadiyê, her weha pratîk û kontrol hem sedema hebûn, hem jî wezîfeya bingehîn a van partiya ne.

Kadın kitleleri için özellikle kentlerde düşünülen sığınma evleri değil özgürlük alanları oluşturmak gerekir. En uygun bir biçim de Özgür Kadın Kültür Parkları olabilir. Ailelerin kız çocuklarını eğitemedikleri, düzen okullarının da bilinen yapıları nedeniyle Özgür Kadın Kültür Parkları ihtiyaç duyulan, uygun kız çocuklar ve kadınlar için temelinde eğitim, üretim ve hizmet birimlerini kapsayacak alanlar olarak çağdaş kadın tapınakları rolünü de oynayabilir.

Tê gotin bêyî jinê jiyan nabe, lê bi jina heyî re jî jiyan nabe. Têkiliyeke jin-mêran a heta qirikê di koletiyê de çûbe xwarê, xuya ye wê kes pir zêde bixîne û bist bike. Ji lewra di kaosa dawîn a sîstema kapîtalîst de hêza mezin a ji eşqê tê hêvîkirin divê li dora jinê were afirandin û pê gav were avêtin. Bawer dikim, divê ev yek ji karên pîroz û bi şeref ên qehremanên rastîn be ku dilê xwe dane eşqê û serê xwe danînê ser vê rê!

Yekparebûna bi xwezaya hawîrdorê re ne tenê di warê aborî û civakî de ye. Ji aliyê felsefîk ve jî xweza hewes û arzûyek e, divê mirov lê serwext bibe. Ya rastîn ev danûstendineke beramberî hevdu ye. Xweza her dibe mirov, meraqa xwe ya mezin û hêza xwe ya afirandinê ispat dike. Mirov jî her ku li xwezayê – balkêş e, Sumerî azadiyê (amargî) wek vegera li dayikê (xwezayê) fêm dikin – serwext dibe li xwe hayil dibe. Di navbera herduyan de têkiliya aşiq û maşûq heye. Ev macerayeke mezin a eşqê ye. Xirakirin, veqetandin bi gotineke dînî belkî jî gunehê herî mezin e. Ji lewra, ji wê hêjatir hêzeke maneyê nayê afirandin. Ji ber ku bi mijarê ve ye, dabaşa xwîndîtina jinê xwe careke din di vir de dide hiskirin. Xwîn herikîna ji malzaroka jinê hem dûrketina wê ya ji xwezayê û hem jî hatina wê ya ji xwezayê îşaret dike. Bi vî awayî aliyê balkêş ê şîroveya me ya di vî warî de xwe li vir dide hiskirin. Xwezabûna jinê bi hatina wê ya ji xwezayê re têkildar e. Balkêşiya wê ya esrarengîn jî bi vê rastiyê manîdar dibe.

Ekonomî di çarçoveya naveroka xwe ya bingehîn de çalakiyeke dîrokî ya civakê ye. Ti ferd (weke efendî, beg, patron, kole, serf û karker) û dewlet nikare bibe aktorê çalakiya ekonomiyê. Mînak weke saziyeke herî civakî û dîrokî berdêla karê dayikê ti ferd ê patron, beg, efendî, karker, gundî û bajarî nikare bide. Ji ber ku dayiktî çalakiya herî zor û hewce ya civakê û domdarkirina jiyanê diyar dike. Ez bi tenê naxwazim behsa zarokanîna wê bikim; ez di çarçoveyeke berfireh de weke çandekê, weke diyardeyeke misêwa bi dilê xwe serî radike û weke xwediya çalakiya bi mejî barkirî li dayiktiyê dinêrim. Ya rastî jî ev e. Baş e, çi têkiliya xwe bi wijdan û aqil re heye, mirov jina xwediyê çalakiya evqas mecbûrî, zor, bi dil û aqil barkirî, timî radibe serhildanê weke kedkara bê heqdest bibîne? Weke îdeolojiya herî zêde alîgirê kedkaran Marksîzm jî çalakgera civakî dayiktî û yên weke wê nefikiriye û ew bêheqdest hiştine, û zanisteke ekonomiyê û çareseriya wê ya wan weke xulamên patron datîne serê quncikê çawa weke civakî pêşkêş dike? Ekonomiya Marksîst bi awayekî pirr xirab ekonomiyeke bûrjûvaziyê ye. Gelekî hewcedariya wê bi xwerexnekirinê heye. Eger bi wêrekî xwerexne neke, li qada berjewendiyên bûrjûvaziyê gera li sosyalîzmê, ji têkçûna tevgera sedûpêncî salî (sosyalîzma pêkhatî) û jihevdeketina wê (hem jî ji ber xwe ve) wêdetir tiştekî nayne û wê bibe xizmeteke herî hêja ji kapîtalîzmê re hem jî xizmeteke bêberdêl. Dema ku Lenîn digot, “Rêya cehennemê bi kevirên niyeta baş hatiye deribandin” çiqasî rast gotiye! Gelo ew difikirî ku wê ev hevokê di çalakiya wî de jî rastiya xwe nîşan bide? Ez hêvî dikim ku di beşên pêş de van analîzên xwe berfireh bikim.

**Çiqas xwezeya jinê di tariyê de bimîne,**
**hemû xwezaya civakê jî wê neronîkirinê de bimîne**

Têgîna femînîzmê bi Tirkiya xwe tê maneya ‘tevgera jinîtiyê’. Ji lewra bi temamî rengê pirsgirêka jinê nade û dijberê wê jî weke mêrîtiyê were tesewirkirin wê hê bêtir meseleyê sêr bike. Mîna ku maneya bi tenê ‘jina bindest a mêrê serwer’ nîşan dide. Lê rastiya jinê hê berfirehtir e. Ji cinsiyetê wêdetir şaxên wê yên berfireh ên ekonomîk, civakî û siyasî hene. Eger em têgîna mêtingeriyê ji çarçoveya welat û neteweyan derxin û daxin asta komên mirovan, mirov bi hêsanî dikare statuya jinê weke mêtingeha herî kevin terîf bike. Bi rastî, ti diyardeyê weke ruh û beden bi qasê jinê mêtingerî nas nekiriye. Divê baş were fêhmkirin ku sînorên jinê di statuyeke mêtingehê de tê hiştin ku bi hêsanî mirov nikare diyar bike.

Zanist li perestgehê navendî dibe û ev jî tê wê maneyê ku bi desthilatdariyê re bûye yek. Gelek mînak hene ku piştrast dikin, zanista di dema şaristaniya Sumer û Misrê de wer bi desthilatdariyê re bûye yek jê nabe. Rahibtiya zanistê bi rêkûpêk dike jixwe yek ji hevparê girîng ê desthilatdariyê ye. Lê di dema neolîtîkê de avahiya zanistê cuda bû. Zanîna jinê der barê nebatan de belkî jî bingehê biyolojî û bijîşkiyê bû. Herweha çavdêriyên wê yên meh û demsalan hesabkarî derdixist holê. Bi hêsanî mirov dikare pratîka jiyanê ya hezarê salan a komên gund û cotkariyê weke xizneke mezin a zanînê şîrove bike. Di dema şaristaniyê de ev agahî hatin bi rêkûpêkkirin û kirin parçeyek ji desthilatdariyê. Li vir bi awayekî neyênî ji aliyê naverokê ve veguherînek pêk hatiye.

Di civakên beriya şaristaniyê û civakên dijber ên dema wê de zanist û agahî, parçeyên civaka exlaqî û polîtîk in. Berjewendiyên heyatî yên civakê heta pêdiviya wan nebe, gengaz nîne ku zanist bi awayekî din were bi karanîn. Armanca bi tenê ya zanîn û zanistê dikarîbû dewamkirina hebûn, parastin û debara civakê bûya, wekî din armanceke din nedihat fikirîn. Şaristaniyê ev rewş ji binî ve guhert. Li ser zanîn û zanistê yekdestdariya xwe danî û ew ji civakê qut kirin. Civak ji zanist û zanînê hat mehrûmkirin, hêzên dewlet û desthilatdariyê bi zanîn û zanistê têra xwe bi hêz bûn. Afirînerên zanînê û barhilgirên wê bi xanedanî û qesran ve girêdan û bi vî awayî yekdestdariyên xwe qehîm û têkûz kirin. Bi vî awayî, ev dihat wê maneyê ku zanist ji binî ve ji civakê, nexasim jî ji jinê dihat qutkirin ango ji jiyan û hawîrdorê dihat qutkirin. Di heman demê de têkiliya mejiyê analîtîk ji mejiyê hisî dihat qutkirin û vê yekê jî dikir ku misêwa ji hev dûr bikevin.

Şerên hilweşîna exlaq bandora her î girîng a destpêkê ye. Qutbûna têkiliya zanist û exlaqê bingehê vedîtina her cure amûrên hilweşîner in. Ne pêkan bû ku ev têkiliya di navbera zanist, desthilatdarî û civakê de xwe di rêbaz û paradîgmaya bingehîn de nîşan nedaya. Ji dewreyê derxistina civakê dihat wê maneyê ku civakê dikin obje. Çawa ku berê jin û kole kirin obje. Piştre cihêkirina ojbe û sûbje ya bi Bacon û Descartes destpêkir derbasî nava zanistan hemûyan bû. Di zanistê de pesnê objebûnê gelekî tê dayîn. Lê ya rastî, kengî navbera objetî û sûbjetiyê gelekî vebû, derî jî li felaketa herî mezin vebû. Piştre ev navber vebûn bi ez û yê din zêdetir mezin bû. Paşê ev veguherî seriyên diyalektîk ên hevdu tine dikin. Ev dualîte ji sedî sed navbervebûna civaka exlaqî û polîtîk û sermaye û desthilatdariyê nîşan dide. Kolekirina xwezayê, piştre ya jin û koleyan, herî dawî jî kirina obje ya tevahiya civakê, di zanistê de weke ‘pîvana objektîviyê’ ya navdar a hê jî tê bi karanîn derket pêşiya me. Têkiliya berê ya xweda û evd, vê carê vugerî têkiliya obje û sûbje. Şûna têgihiştina gelekî berê ya xwezaya zindî têgihiştina objeya mirî xwezayê û li ser wê sûbjeya xwedayî mirov cih girt.

Çawa ku di tevahiya zanistan de heye, di zanista civakî de jî vegotina mêrtiyê mohra xwe lê xistiye û rêzên vi zanistê de behsa jinan dikin bi nêzîkatiyên propagandîf ên hîç behsa rastiyê nakin tijî ne. Statuya rastî ya jinê bi van vegotinan mîna dîrokên şaristaniyê yên çînî, mêtinkarî, zordestî û êşkenceyê dinixumînin belkî jî çil qat ji wan zêdetir dinixumîne. Li şûna femînîzmê têgîna jineolojiyê (zanista jinê) belkî çêtir bersiva armancê bide. Diyardeyên jineolojiyê derxe holê bi herhalî wê der barê gelek beşên teolojî, eskatalojî, polîtîkolojî, pedagojî û welhasil heta sosyolojiyê de ji loji’yên wan kêmtir xwedî pareke rastiyê nebe. Hem ji aliyê fizîkî ve hem jî ji aliyê maneyê ve jin beşê herî berfireh ê xwezaya civakî pêk tîne û ev ne ya guftûgoyê ye. Hingê çima ev parçeyê herî girîng ê xwezaya civakî nebe mijara zanistê? Sosyolojî gelek beşên xwe hene û heta pedagojî jî beşek ji wê ye, û der barê perwerde û hînkirina zarokan de ye. Zanisteke evqas hatiye dabeşkirin çima jineolijiyê pêk nayne û gelo ev xusûs ji vegotina wê ya bi serweriya mêr û pêve bi tiştekî din tê ravekirin.

Heta xwezaya jinê di tariyê de bimîne, wê tevahiya xwezaya civakê rohnî nebe. Xwezaya civakî bi awayekî rastî û berfireh were rohnîkirin, hingê rohnîkirineke rastî û berfireh a xwezaya jinê mumkîn dibe. Ji dîroka mêtingehkirina jinê heta bi mêtingehkirina wê ya ekonomîk, civakî, siyasî û zêhnî statuya wê were zelalkirin, wê ev yekê bibe alîkariyeke mezin ji bo zelalkrina tevahî mijarên din ên dîrokê û civaka îroyîn.

Bêguman zelalkirina statuya jinê şaxekî meseleyê ye. Şaxê wê yê girîngtir der barê pirsgirêka rizgariyê de ye. Bi gotineke din çareserkirina pirsgirêkê hê zêdetir girîng e. Gelek caran tê gotin, asta azadiya giştî bi asta azadiya jinê re di weznekê de ye. Ev gotin rast e, lê ya girîng ew e, wê nava wê çawa were tijîkirin. Azadî û wekheviya civakî bi tenê wekhevî û azadiya jinê diyar nakin. Ji bo vê hewcedarî bi teorî, bername, rêxistin û mekanîzmayên çalakiyê heye. Ji vê jî girîngtir, xuya dike ku siyaseta demokratîk a bê jin nikare bibe, heta polîtîkvaniya çînî jî wê kêm bimîne, aştî û hawîrdorê jî neyê parastin.

Divê mirov jinê ji statuya ‘dayika pîroz, namûsa esasî, ya dest jê nabe, hevaleke bêyî wê nabe’ derxe û weke tevahiya obje-sûbje bixe ber lêkolînê. Bêguman beriya her tiştî divê mirov van lêkolînan ji keşmertiyên bi navê eşqê biparêze. Heta şaxê herî girîng ê lêkolînê divê rezîliyên mezin ên di bin navê eşqê de (di serî de destavêtin, kuştin, lêdan, dijûnên yek ji ya din sosretir) hatine veşartin pêşkêş bike. Gotineke Heredot heye dibêje “Tevahiya şerên Rojhilat-Rojava ji rûyê jinê de derketine.” Ev gotin bi tenê dikare rastiyekê rave bike. Ew jî ev e, weke mêtingeh bi nirx bûye, ji lewra jî dibe sedema şerên girîng. Jixwe dîroka şaristaniyê welê bû, lê modernîteya kapîtalîst hezar qat ji wê girantir û bi awayekî pirralîbûyî mêtingehkirineke jinê temsîl dike. Li nasnameya wê kola ye. Dayika tevahiya

kedan, xwediya keda bêheqdest, karkera xwedî heqdesta herî kêm, ya herî bê kar, çavkaniya bê sînor a arezû û zordestiya mêr, makîneya zarokanînê ya nîzamê, pîrika mezinkirina zarokan, amûra reklamê, amûra seks û pornoyê, bi vî awayî mêtingehkirin dûvdirêj diçe. Kapîtalîzmê bi qasî ku di ti mêtinkariyê de mekanîzme pêşde nebiriye di mêtinkariya jinê de mekanîzma pêşxistiye. Herçiqasî bi dilê me nebe jî dubare dubare em li statuya jinê vedigerin û ev êşê dide me. Lê ji bo yên mêtinkarî li ser wan dimeşe zimanê rastiyan bi awayekî din nabe.

Tevgera femînîst li ber rohniya van rastiyan bêguman divê tevgera herî radîkal a dijberê sîstemê be. Tevgera jinê bi rewşa wê ya modern em dikarin reh û kokên wê bibin bispêrin Şoreşa Franseyê û piştî çend qonaxan karîbûye heta roja me ya îro bê. Di qonaxa pêşî de li pey wekheviya huqûqî beziyaye. Ev wekheviya tê maneyê îfade nake di roja me ya îro de bi awayekî berfireh pêk hatiye. Lê divê mirov baş bizanibe ku naveroka wê vala û pûç e. Mîna mafê mirovan, ekonomîk, civakî û mafên siyasî di mafên din de jî pêşketineke şeklî heye. Bi awayê xuya dike jin jî bi qasî mêran xwedî azadî û wekheviyê ye. Lê ya rastî, xapandina herî girîng jî di vî şêwazê azadî û wekheviyê de veşartiye. Bi tenê di dema modernîteyê de ne, di tevahiya demên hiyarerşîk û şaristaniyan de jin di hemû çaviyên civakî de ji aliyê zêhnî û bedenî ve dîl hat girtin û bi koletiyeke pirr kûr hat xebitandin. Ji bo azadî, wekhevî û demokrasiya vê jinê hewcedarî bi xebatên teorîk ên berfireh, têkoşîna îdeolojîk, xebatên proramatîk û rêxistinî, ji van jî girîngtir pêdivî bi çalakiyên bi hêz heye. Bêyî van, xebatên jinê û femînîzmê wê ji xebatên jinê yên lîberal ên ber dilê sîstemê xweş dikin wêdetir ti maneyê îfade nekin.

Muhtemel zanista jinê pêş bikeve, mirov çareserkirina pirsgirêkan bi mînakekê rave bike wê têra xwe me hîn bike: Divê mirov bizanibe ku xerîzeya hundir a cinsîtiyê yek ji şêweyên herî kevin a hînbûnê ye. Bersivê dide pêdiviya cinsê mirov ji bo zurriyeta xwe dewam bike. Ji ber ku derfet û îmkanên ferd ê jiyana bêserûbinî bijî nîne, xwe neçar dibîne weke potansiyela zêdebûnê xwe dubare di yeka din de  pêk bîne. Ya jêre xerîzeya cinsî tê gotin ev e. Kengî ev potansiyel şert û mercên di cih de dibîne xwe zêde dike û jiyanê dewam dike. Bi awayekî li beramberî tehlûkeya qirbûn û mirinê dibe çare. Mîna dabeşbûna pêşî ya şaneyê ye. Şaneya yek e, xwe pirr dike û bi vî awayî xwe bê mirin dike. Eger em hê bi awayekî giştî bibêjin bûyer ev e, gerdûn li dijî valatî û tinebûna dixwaze wê daqurtîne xwe timî bi cûrbicûrkirinê zêde dike û bi vî awayî meyla xwe ya bêserûbinîbûnê di jiyana zindî de dewam dike.

Fer an jî ferda ev bûyera gerdûnî ya bi cinsê mirov dewam dike zêdetir jin e. Zêdebûn û pirrbûn di bedena jinê de pêk tê. Rola mêr di vê bûyerê de têra xwe talî ye. Ji lewra di dewamkirina zurriyetê de bi tevahî berpirsiyarî ya jinê ye û ev ji aliyê zanistî ve jî xusûseke tê fêhmkirin. Jixwe jin bi tenê cenînê di zikê xwe de hilnagire, mezin nake û nazê. Hema hema heta bi mirina xwe jî li zarokên xwe miqate dibe û bi awayekî xwezayî bi vê berpirsiyariya xwe radibe. Hingê encama pêşî ya divê em ji vê bûyerê derxin ew e, divê di tevahiya mijarên têkiliyên cinsî de ji sedî sed jin xwediyê gotinê be. Ji ber ku her têkiliya cinsî ji bo jinê bi awayekî potansiyel rê li pirsgirêkên giran ên nikaribe ji binî rabe vedike. Divê mirov baş fêhm bike ku jineke deh zarokan bîne ji aliyê fizîkî ve heta ji aliyê rûhî ve dikeve rewşekê heft xwezî bi mirinê.

Nêrtina zilam li seksualîteyê hê zêdetir berevajî û bêberpirsiyarî ye. Di vê de korkirina desthilatdariyê û cehalet di dereceya yekê de diyarker in. Herweha bi hiyarerşî û dewleta xanedaniyê re bûyîna xwediyê pirr zarokan ji bo mêr tê maneya bi hêzbûneke dest jê nabe. Pirrzarok bi tenê ji bo dewamkirina zurriyetê ne, mayîna weke desthilatdarî û  dewletê misoger dike. Bi awayekî ji bo dewleta tê maneya yekdestdariya milk ji dest neçe, divê xanedanî mezin be. Bi vî awayî, hem ji bo hebûna biyolojîk, hem jî ji bo hebûna desthilatdarî û dewletê, jinê dikin amûrê anîna pirr zarokan. Ji bo jinê bingehê xeternak ên mêtingehkirinê bi yekemîn û duyemîn xwezayê ve girêdayî bi vî awayî tê amadekirin. Mirov hilweşîna jinê bi van herdu xwezayan ve girêdayî analîz bike gelekî girîng e. Hewce nake ku mirov zêde rave bike, di bin statuya vê xwezaya duber de mumkîn nîne ku jin ji aliyê rûhî û bedenî ve demeke dirêj zindî û nehilhilî li ser piyan bimîne. Hilweşîna rûhî û bedenî di zikhev de pêk tên û ev jî dihêle ku jin ji bo jiyana yên din dewam û têkûz bike, di berdêlê de jiyaneke bi qehr, kin û bi cefa jiyana xwe bi dawî dike. Gelekî girîng e ku mirov dîroka şaristanî û modernîteyê li ser bingehê vê rastiyê analîz bike û bixwîne.

Wê wextê ji bo çareserkrina pirsgirêka jinê ya ji niha ve bi qasî çiyan mezin bûye û pêşîgirtina li hilweşîna ekolojiyê berê pêşî divê pirsgirêka demokrafiyê were çareserkirin i di vê de berpirsiyariya bingehîn divê ya jinê be. Ji bo vê jî şertê pêşî divê jin tam azad û wekhev be; mafê wê yê tam ê siyasetkirina demokratîk hebe; di tevahiya têkiliyên bi cinsiyetê re pêwendîdar de gotin û îradeyeke tam heqê wê ye. Ji bilî van rastiyan, bi temamî wekhevî, azadî û rizgariya jinê, civakê û hawîrdorê pêkan nîne. Bi heman awayî bi şêwebûna siyaseta konfederatîf û siyaseta demokratîk jî mumkîn nîne.

Jin herweha weke hêmana bingehîn a civaka exlaqî û polîtîk, li ber rohniya azadî, wekhevî û demokratîkbûyînê ji aliyê etîk û estetîka jiyanê ve bi roleke heyatî radibe. Zanista etîk û estetîkê parçeyekî zanista jinê ye ku jê nabe. Ji ber berpirsiyariyên wê yên giran ên di jiyanê de jin ê di tevahiya mijarên etîk û estetîkê de hem weke hêza fikir û hem jî weke hêza bi cihanînê rê li pêşketin û gavavêtinan veke û ev jî ne ya guftûgokirinê ye. Têkiliya jinê bi jiyanê re li gorî mêr hê bêtir berfireh e. Asta pêşketina mejiyê hisî têkiliya xwe bi vê re heye. Ji lewra estetîk weke

bedewkirina jiyanê ji aliyê jinê ve mijareke hebûnî ye. Ji aliyê etîkî ve jî (Teoriya exlaq, estetîk = teoriya bedewiyê) berpirsiyariya jinê berfirehtir e. Aliyên çê û xirab ên perwerdeya mirov, girîngiya jina û aştiyê, xeternakî û xirabiya şer, nirxandina pîvanên mafdarî û dadê, diyarkirin û gihiştina biryarê, ji aliyê civaka exlaqî û polîtîk ve jinê hê bi awayekî rastî û berpirsiyarî tevbigere. Ji ber ku ev li gorî xwezaya wê ye. Bêguman ez behsa jina qûqla û siya mêr nakim. Li vir ez a behsa wê dikim, jina azadî, wekhevî û demokratîkbûyîn dawerivandiye hinavê xwe û qebûl kiriye.

Zanista ekonomiyê weke parçeyekî zanista jinê were pêşdebirin wê hê zêdetir rast be. Ekonomî hê ji destpêkê ve şêweyekî xebata civakî ye ku jin ê bi awayekî bingehîn têde rol girtiye. Ji ber ku xwedîkirina zarokan li ser pişta jinê ye, ekonomî ji bo jinê maneyeke heyatî îfade dike. Jixwe maneya peyva ekonomiyê “qanûnên malê, pîvanên debara malê” ye. Ev jî eşkere ye ku karê bingehîn ê jinê ye. Ekonomî ji destê jinê hatiye stendin û ketiye destê tefekar, bazirgan, pere, sermayedar, desthilatdar-dewlet û rayedarên mîna axayan tevdigerin. Ev bûye derbeke mezin li jiyana ekonomiyê ketiye. Ekonomiya ket destê hêzên dijberê ekonomiyê, bi lez bû hedefa bingehîn a desthilatdarî û mîlîtarîzmê û tevahiya dîroka şaristanî û modernîteyê bû sedema sereke ya şer, pevçûn, pêxîrtengî û bihevketinên bê sînor. Di roja me ya îro de ekonomî, ji aliyê kesên têkiliya xwe bi ekonomiyê re nînin bi lîstikên kaxizan ji rêbazên qumarê xirabtir kirine qadeke lîstikê bi awayekî bê sînor nirxên civakî desteser dikin. Pîşeyê pîroz ê jinê ku ew bi xwe bi temamî li derveyî vê qadê hiştine, veguherandine pîşeyê makîneyên şer, amûrên trafîkê yên hawîrdor kirine jiyan lê nebe, îmalatxaneyên berhemên bêkêr ên ji bo karê û ti têkiliya xwe bi pêdiviyên bingehîn ên mirovan re nînin, lîstikên borsa, buha û faîzê.

Tevgera azadî, wekhevî û demokratîk a jinê ya dispêre zanista jinê û femînîzmê jî digire nava xwe, eşkere ye ku wê di çareserkirina pirsgirêkên civakî de bi rola sereke rabe. Divê mirov qîma xwe bi rexnekirina tevgerên jinan ên rabihuriya nêz neyne, zêdetir giraniya xwe bide ser dîroka şaristanî û modernîteya jinê zêdetir têkbirin. Eger di zanistên civakî de mijara jinê, pirsgirêka wê û tevgerên wê hema hema bêje tine be, berpirsê vê yê bingehîn avahiyên çandî yên maddî û zêhnî yên hegemonîk ên modernîte û şaristaniyê ne. Bi nêzîkatiyên teng ên wekheviyê yên huqûqî û siyasî belkî alîkariya lîberalîzmê were kirin; lê bi nêzîkatiyên bi vî rengî çareserkirina pirsgirêkê bidin aliyekî, weke diyarde jî çareseriya wê nabe. Mirov îddîa bike ku tevgerên femînîst ên heyî ji lîberalîzmê qut in, û bûne hêzên dijberê sîstemê, wê ev ê bibe xwe xapandin. Yek ji pirsgirêka bingehîn a femînîzmê ew e, eger weke tê gotin radîkal e, wê wextê divê beriya her tiştî xwe ji binî ve ji hînbûnên lîberal, ji jiyan û şêwazên fikir û hisên wê qut bike, şaristanî û modernîteya dijminê jinê ya li pişt xwe analîz bike û li ser vî bingehî giraniya xwe bide rêyên çareseriyê yên manedar.

Modernîteya demokratîk divê xwezaya jinê û tevgera wê ya azadiyê weke yek ji hêzên xwe yên bingehîn bizanibe û di vê çarçoveyê de hem pêşdebirina wê û hem jî weke hevgirtiyê xwe di serê erkên xwe de bihesibîne û di xebatên jinûveavakirinê de wê binirxîne.

Mekanên lêgerînê yên bingehîn di serî de zanîngeh, nabe ku saziyên fermî yên şaristanî û modernîteyê bin. Di dema bihurî û roja me ya îro de desthilatdarkirina zanistê û li saziyên fermî yên dewletê çêkirina wê, kir ku têkiliya wê bi heqîqetê re qut bibe. Eger têkiliya zanistê bi civaka exlaqî û polîtîk re were qutkirin û bikin ku bi kêra civakê neyê, berevajî wê ev were wê maneyê ku di pêşdebirina yekdestdariya mêtinkarî û zordestiya li ser civakê de alîkariyê bike. Çawa ku jin li mala taybet an jî giştî (kerxane) tê girtin rastiya xwe ya azadiyê, heqîqeta xwe ji dest dide, zanist û entelekteulên li saziyên fermî têne girtin ewqas azadiya xwe, nasnameya xwe ya rastî ji dest didin. Ya divê were fêhmkirin, zanist û entelektueliya dibe desthilatdar ji armanca xwe ya vedîtin û lêgerîna rastiyên civakî qut dibe. Kêm berhemên di asta zanistî û entelektuelî de derdikevin holê, lê ev rewşên îstîsnayî rastiya sereke nikarin biguherin.

Akademiyên çand û siyaseta demokratîk dikarin ji bo vê wezîfeyê sazîbûnên di cih de bin. Ji bo pêdiviya ji nû ve avakirina yekeyên civaka exlaqî û polîtîk desteka zanistî û entelektuel a hewcedarî pê heye, ev akademî dikarin pêk bînin. Li şûna ku saziyên yekdestdar ên fermî û taybet mînak bigirin, gelek di cih de ye ku xwe bi awayekî orjîn ava bikin. Eger saziyên modernîteyê teqlîd bikin, ev dikare bi xwe re binketina wan jî bi xwe re bîne. Dikarin xwe bi awayekî xweser û demokratîk ava bikin, bername û kadroyên xwe bi xwe pêk bînin, dikarin mamostetî û xwendekariya bi dilê xwe esas bigirin, gelek caran mamosteyê karibe bibe xwendekar, xwendekarê jî bibe mamoste, ji şivanê li serê çiyê heta bi profesorî her kesê bi qasî îdea û armanca xwe karibe beşdar bibe û li gorî destpêkê mirov dikare bi vî awayî qebûl bike.

Akademiyên bi giranî jin bin tevî ku bi heman naverokê bin dikarin aliyên wan ên xweser bi awayekî zanistî pêk bînin û dibe ku bi vî awayî di cih de be. Ji bo bi tenê teorîk nemînin divê ji gelek aliyan ve tevlî pratîkê bibin û ev jî yek ji xisletên têne xwestin e. Akademî li gorî zeman û mekan pêdivî li ber çavan têne girtin û têne avakirin û xebitandin. Çawa ku di dîrokê de mînakên van saziyan gelek têne dîtin (ateşgedeyên Zerdeşt ên li ser çiyan, baxçeyên Eflatûn û Arîsto, peyarêyên Sokrates û Stoagiran, keşîşxane û tekkeyên serdema navîn û hwd.), saziyên sade û bi dilê xwe xebatê dikin. Ji serê çiyan bigirin heta bi quncikên kolanan her mekan dikare were hilbijartin.

Bêguman mirov çavê xwe li avahiyên bi heybet ên meznahiya desthilatdariyan tîne mirov nagerîne. Çawa ku ji keşîşxane û medreseyan jî tê zanîn dema perwerdeyê li gorî rewşa beşdaran û kêm-zêde hatina wan were diyarkirin. Mîna saziyên fermî hewcedarî bi sînorên hişk ên demê nîne. Bi tevahî jî divê ji şikil û pîvanna mehrûm nebin. Ji sedî sed divê pîvanên xwe yên etîk û estetîkê hebin.

Mirovên weke ferd ên bi qasî ku neyên jimartin, ji Bûda heta Sokrates, ji Zerdeşt heta Konfuçyûs û heta pêxemberan hemûyan ku ji Hz. Adem destpê dikin heta Nûh û Eyûb û ji Brahîm heta Mûsa, Îsa û Muhammed bi xelekên sereke dewam dikin hejmara wan di Pirtûka Pîroz de ji 120 hezarî zêdetir tê dayîn; herwisa ji Xwedawend Înannayê heta Hz. Eyşeyê, ji Zennûbeyê heya Hypatîayê, ji Kîbeleyê heta Meryem û ji jinên Cadû heta Zeyneb û Rosa, dîsa ji Brûno heta Erasmûs, karîbûne di berdêla mirinê de li ber xwe bidin ji bo karibin azad, birûmet û anor bimînin. Civak eger di roja me ya îro de hê jî bi awayekî exlaqî û polîtîk dewam dike, bi herhalî gelek nirxan deyndarê van ferd û kesan e. Naxwe wê cudahiya civakê ji keriyên koleyan nemana.

Di Rojhilata Navîn de Şoreşa Jinê

Pirr girîng e ku mirov pirsgirêkên jinê yên di nava civakê de berê pêşî ji aliyê civakî-dîrokî ve bigire dest û li ser bisekine. Pirsgirêka jinê pirsgirêkek e ku di çavkaniya tevahiya pirsgirêkan de ye. Em dibînin ku mirovatiyê hê gav neavêtiye civaka dewletdar a çînî li ser jinê hiyarerşiyeke hişk a mêrê serwer (bavikan) bi sazî bûye. Ji bo sedemên pêkhatina serweriya mêr serî li gelek vegotinên dînî û mîtolojîk dane. Destana Xwedawenda Ûrûkê Înannayê vê pêvajoyê nîşan dide. Di vê destanê de mirov ji bo xwezayê, xwedawenda dayik û pîroz a berê hesreteke mezin dibîne. Di nava pergala dewlet û hiyarerşiya bavikan de hatiye asêkirin û ji ber hîlekarî, xasûkî û zordariya mêrê serwer nalenala wê ye. Di Destana Babîl de ev rastî hê zêdetir eşkere û bi tesîr tê ziman. Ango pevçûna Mardûk û Xwedawend Tîamatê. Di mîtolojiya Sumeran de tê gotin jin ji parsûyê mêr hatiye afirandin. Ev îfadeyeke sembolîk e. Dînên yek xwedayî jî vê helwestê dewam dikin. Jina weke xwedawend diket zîggûratên Sumeran weke orûsipiyekê ji perestgehê derdiket. Kerxaneya pêşî li bajarên Sumeran tê vekirin. Payeya jinê ji orûsipîtiya perestgehê ber bi carîyetiya qesrê ve tê bilindkirin. Li bazarên bazirganiyê objeyeke kole ye ku destê jê nabe. Di şaristaniya Greko-Romen de bi tenê koleya karên nava malê ye. Di nava polîtîkayê de cihê wê nîne. Di şaristaniya Ewrûpayê de objeyeke cinsî ye ku bi peymanekê bi mêr ve hatiye girêdan. Di şaristaniya kapîtalîst de orûsipiyeke giştî ya gerdûnî ye. Dîrok bi mêrê serwer re bi temamî bûye xwediyê avahî û maneyeke cinsiyetparêz. Dîrok êdî weke mêr dimeşe.

Pîrekkirina jinê (tê maneya kolekirina jinê), piştre di civaka zordestî û mêtinkar de li ser objeyên mêr jî tê meşandin. Klîka jor a civakê rahib, eskerî û siyasî dikevin pozîsyona cinsên serwer û beşên jêr ên têne rêvebirin jî her diçe dibin pîrek. Di civaka Greko-Romen de mêr ji ciwaniyê ve bi helwesteke cinsiyetparêz zêde tê perwerdekirin. Di tevahiya serdemên şaristaniyan de helwestên belovajî yên cinsî weke encama helwestên cinsiyetparêz ên ji jinê re, pirr têne dîtin. Êdî jin çiqasî kole be, mêrê kole jî ewqasî jin an jî pîrek e.

Di civaka Rojhilata Navîn de li van pirsgirêkên koka xwe dîrokî wexta pirsgirêkên îro yên çavkaniya xwe amûrên kapîtalîst ên mêtinkarî û zordestiyê jî zêde dibin, ya rastî ji bo jinê jiyaneke kabûswarî bivê nevê pêk tê. Belkî jî jinbûn tê maneya mirova herî zêde di zor û zehmetiyê de ye. Mêtinkarî û zordestiya çor a li ser civakê qatbiqat li ser ked û bedena jinê pêk tê. Hê nû hay jê dibe ku jin jî mirov e. Helwesta bêrûmet a cinsiyetparêz a hişk hatiye wê astê ku şûna xwe ji lêgerîna hewcedariya bi dostek û hevrêyekê re bihêle. Herî kêm êdî guftûgoya vê tê kirin. Divê baş bê zanîn ku di civakê de jiyaneke rast bi jinê re pêk neyê, wê jiyaneke manedar jî neyê jiyîn. Em divê zanibin ku jiyana herî xweşik û manedar bi jineke azad a bi temamî bûye xwedî rûmet re pêk tê û bi vê zanînê divê em vegotin û çalakiyên xwe pêşde bibin.

Rastiya jinê bi giranî rastiya civakî destnîşan dike. Ev tespîteke rast e. Di civaka Rojhilata Navîn de jintî û mêrtiya zêde dualîteyeke diyalektîk e. Di şêwazê vê têkiliyê de taybetiyên li zilam vedigerin mêrtiyeke hundurê wê pûç e. Serweriya îqtîdar li ser mêr dike, mêr jî li ser jinê û ew jî li ser zarokan dike. Bi vî awayî serwerî ji jor heta jêr tê dawerivandin. Di vê mekanîzmayê de asta koletiya jinê rê li ber rewşeke neyînî vedike. Ji ber pozîsyona jinê ya di nav civakê de jin timî asta koletiyê ya civakê pêş de dibe. Bi vî awayî, civaka dibe mîna pîrekê, îqtîdara jor gem û qayişên wê dişidîne û bi hêsayî rêve dibe. Tevî ku jin li derveyî îradeya xwe zilma herî mezin dibîne, ji bo zilmeke hînê zêdetir li ser civakê tê bi kar anîn. Bi qasî têkiliyên ji der ve teslîmiyetê li ser Rojhilata Navîn ferz dikin, têkiliyên ji hundur ve jî jinê tengav dikin. Ji lewra tevgera xwe nespêre çalakiya azadiyê ya jinê şensê wê pir bi sînore ji bo karibe azadiyeke mayînde û cewherî bigihîne civakê. Bi vê sedemê, di serî de îqtîdarê, sosyalîzm, rizgariyên netewî û hwd. nekarîn bersivê bidin hesret û hêviyên her kes li bendê bû. Xebata azadiyê ya jinê, ji wekheviya cinsan jî wêdetir, cewherê xebateke giştî ya demokratîk, mafê mirovan, hawîrdor û wekheviya civakê îfade dike.

Gava yekemîn a divê di warê azadiya jinê de were avêtin ew e ku jin bibe xwediyê hêza çalakiya xwe û ji helwesta mulkiyetê ya li ser, dûr bisekine. Eşqên moda yên bi hisên mulkiyetê tijî di himbêza xwe de gelek xeteran dihewînin. Di civaka kevneşop a dewlet û hiyarerşiyê de eşq xapandina herî mezin e. Gunehê tê kirin bi eşqê tê nuxumandin û veşartin. Destek ji bo azadiya jinê û hurmeta ji bo wê, beriya her tiştî bi mikur hatina li rastiyê û paşê

jî ji bo ew rastî li dawiyê were hîştin, bi tevgereke ji dil û samîmî dibe. Kesê serweriya xwe ya mêrtiyê – navê wê çi dibe bila bibe – li ser jinê bijî ji wî nirxekî têkûz ê azadiyê nabe. Hewldanên ji bo xurtkirina jinê ji aliyê bedenî, derûnî û zêhnî ve, bawer dikim ji hewldanên herî hêja yên şoreşgerî ne. Jina ku di çanda Rojhilata Navîn de çaxekê ji çanda xwedawendên dayik re bû navend, hewceyî pê heye ji nû ve, bi nirxên civakî yên pêşketî re karibe biryarên serbixwe bide, bigihîje hêza tercîh û hilbijartinê. Alîkariya wê ya di vî warî de qehremaniyeke

Sîstemê ji mêj ve şensê xwe yê sererastbûnê bi reforman ji dest daye. Ya pêdivî pê heye 'şoreşeke jinê ye' li tevahiya qadên civakî were meşandin. Çawa ku koletiya jinê koletiya herî kûr e, divê şoreşa jinê jî bibe şoreşa herî kûr a wekhevî û azadiyê. Şoreşa jinê divê hem di teorî û hem jî di çalakiyê de gavên bi kok biavêje. Beriya her tiştî li dijî îdeolojiya cinsiyetparêz şerekî dewamî û dijber hewce dike. Şoreşa jinê divê li dijî zêhniyeta tecawizkar a bîstûçar saetê rojê li ser kar e, xurtkirina helwesta exlaqî û polîtîk weke şerekî ferz dike. Ji bo mehkûmkirina diyardeya zarokanînê ya bi armanca mêtinkarî û desthilatdariyê, redê wê hewce dike. Divê mirov îradeya zarokanînê bi temamî ji jina azadbûyî re bihêle. Divê di îdeolojiya xanedantî û malbatê de şoreş pêk bê. Herçî ya herî girîngtir jî divê mirov ji felsefeya heyî ya jiyana bi jinê re, belkî jî ji vê rastir ji vê bê felsefetiyê bibihure. Divê mirov hêza jiyanê bi jinê re di têgihiştina zarokanîn û amûra têrkirina xwestekên cinsî de ne, weke tayê herî xurt ê dostaniyê, hevaltiyê û civakbûnê di afirandina bedewî, sedaqet, aştî û esaletê de ji bo parvekirina bi awayekî azad û wekhev bibîne.

Civaka Rojhilata Navîn bi qasî ku hewcedariya xwe bi duyemîn şoreşeke gund-cotkariyê heye, herweha hewcedariya xwe bi duyemîn şoreşeke jinê heye. Şoreşa jinê dayiktiya neolîtîkê ye. Ya rastî, şoreşa neolîtîk a muhteşem şoreşeke jinê bû. Şoreşa neolîtîkê şoreşek e ku hê jî mirovatî bi mîrateya wê debar xwe dike. Baviktiyê civaka xwezayî li ser bingehê li dijî şoreşa şaristanî û modernîteyê ye paşve xist û ev dijşoreşa mezin koletiya herî kûr a jinê û mêtinkariya li ser wê derxist holê û li tevahiya civakê belav kir di roja me ya îro de rewşa xwe ya kaotîk û krîza sîstematîk li qadên civakî hemûyan dijî û ji hev de dikeve. Mirov fêhm dike ku ya li ser jinê tê ferzkirin xiyaneta bi jiyanê re ye. Eger jiyan tê xwestin, divê berê pêşî di tewazuna hêzê ya zanyartiya beramberî de ji nû ve bi jinê re di çêkirina hisên bedewî û meznahiyê û parvekirina wan de bi ser bikeve. Divê mirov vê rastiyê ava bike û xwe bigihîne heqîqeta wê. Di vê mijarê de divê tek û gerdûnî, ango jin û mêrê berbiçav, mêr û jintiya mucered a îdeal di zikhev de pêk bên. Ji bo pêkhatina vê jî divê îrade û têgihiştina wê bê pêkanîn. Weke milk û weke xwedî divê mirov hevdu ji binî ve biterikîne. Li şûna namûsa rêûresm û kevneşopiyê divê mirov balkêşbûna kesayeta esîl û bedew pêk bîne.

Ji bo şoreşeke jinê ya bi kok, ango di jiyan û zêhniyeta mêr de guhertin nebin rizgariya jinê mumkîn nîne. Ji ber ku heta jina bi xwe sereka jiyanê ye rizgar nebe, jiyan timî wê weke leylan û serabekê pêk bê. Heta mêr bi jiyanê re jiyan jî bi jinê re li hev neyên anîn, şadûmanî û bextewarî jî wê tim xeyaleke tewş bin. Ji bo jinê û jiyana azad rastiyên civakî bê sînor in. Civaka Rojhilata Navîn û jina wê bi şaristaniya jiya û bi modernîteya li fetha wê rast hat bi qasî ku bê xistin hat xistin, ew bi xwe êdî ew nîne, ew xistin rewşa objeyekê. Pirsgirêka civakî bi diyardeya jinê analîzkirin û bi heman diyardeyê gera li çareseriyê rêbazeke rast e. Eger mirov çareseriya dayikan şoreşa jinê li ser dayika pirsgirêkan ferz bike dikare bi gavan bigihîje heqîqetê.

Çareseriya modernîteya demokratîk di pirsgirêka jinê û şoreşê de bi îdeal û bi çalakî ye. Neteweyên modernîteya demokratîk bêyî jinê bi proje nabin û projeyên pêkanînê nînin. Berevajî, şoreşên welê ne ku di her gava xwe de bi parvekirina zanyartî û çalaktiya bi jinê re pêk tên. Tevî ku ji bo avakirina civaka ekonomîk hewcedarî bi pêşengiya jinê heye, ji nû ve avakirina wê jî hewcedariya xwe bi hêza jinê ya kominî heye. Ekonomî pîşeyê civakî yê jinê bi xwe ye, çalakiya wê ye. Ekolojî zanistek e ku bi tenê bi hestyariya jinê dikare bigihîje civakê. Jin weke nasname hawîrdorparêz e. Civaka demokratîk civakeke welê ye ku hewcedariya xwe bi îrade û zêhnê azad ê jinê heye. Eşkere ye ku modernîteya demokratîk serdema şoreşa jinê û şaristaniya wê ye.

**Divê Mirov Çawa Bijî, Çi Bike û ji ku Dest pê Bike?**

Di çanda Rojhilata Navîn de heqîqet û di rêya wê de mirin û jiyîn têgînên girîng in. Di çanda Ewrûpayê de ev têgîn weke dualîteya teorîk-pratîk tê nîşandan naverok û cewherê wê hatiye pûçkirin, parçekirin û yekparebûna xwe ji dest daye. Di modernîteya dereng de ev xusûs hê bêtir diyar e. Heqîqet mehkûmê ekonomîzmê hatiye kirin.

Gera li heqîqetê herî zêde wexta pirsgirêkên civakî serî rakirine ketiye rojevê. Di van deman de vegotinek û çalakiyekê ji sedî sed hewl daye xwe weke heqîqetê pêşkêş bike. Analîza sosyolojîk a heqîqetê têkiliya wê bi neheqiyan re eşkere deyne holê. Desteserkirina ked û nirxa civakî weke neheqiyê hatiye terîfkirin, ji lêkolînkirin û bi cihanîna pêdiviyên wê re jî xebatên heqîqetê hatiye gotin û tim hatine mezinkirin, bilindkirin. Neheqiyê heq, heqê jî bi xwedê re wekhevkirin têkiliya civakî ya van herdu têgînan nîşan dide. Têgîna xwedê ji bilî muceredkirina metafizîkê bi vî awayî têkiliya wî bi wijdanê civakî re careke din tê piştrastkirin.

Ketina ser rêya heqîqetê bi xwe re hesabpirsîna ji neheqiyê jî tîne. Nasnameya civakî ya xwe weke hebûna xwedayê herî mezin pêşkêş kiriye bi vî awayî bersiv daye neheqiyên li hemberî xwe û weke cezayê xwedê mehkûm kiriye. Ji hundirê civakê û ji xwezaya derveyî wê gef û neheqî çiqasî li ser nasnameya civakî zêde dibin destnîşankirina nasnameyê jî ewçend zêde dibe, ji bo wê nazarî (nêrîna xwedayî = teorî) û çalakiyên mezin (karên xwedayî) hatine pêşxistin. Ji ber van sedeman gelekî girîng e ku mirov serwext bibe, di çavkaniya dîn û felsefeyê de nasnameya civakî heye. Ji lewra li devereke din gera li çavkaniya dîn û felsefeyê hewldaneke tewş û badilhewa ye.

Di hegemondariya îdeolojîk a modernîteya kapîtalîst de yek ji armancên sereke ew e, rastiyên civakî dîrokî yên der barê têgîna heqîqetê û çalakiya wê de tarî bike û bitepisîne. Dîn û felsefe veguherandine milliyetgiriyê û xwedakirina dewleta netewe. Teorî û pratîk di têgîn û kirinên dewleta netewe yên tên mezinkirin û bêmirinkirin de têne dorgirtin. Zanist di bin ferman û rêveberiya felsefeya pozîtîvîst de xistine rewşekê pirsgirêkên ji sêlingên modernîteyê çêdibin analîz û çareser dike. Şervaniya heqîqetê ya bi qasî dîroka mirovatiyê kevn berê wê dane peydakirina berjewendiyên besît û sivik. Pirsgirêka bingehîn ew e, gefên li nasnameya civakî têne xwarin mijara heqîqetê ne, lê ev yek ji mijara wê derxistine û hewl dane li şûna wê ferdparêziyê bi cih bikin. Di vê çarçoveyê de mafê mirovan hatiye îstîsmarkirin. Fikrên dijberê sîstemê yên xwe weke îdeolojiyên rastparêz pêşkêş dikin jî newêrin ji paradîgmaya modernîteyê bibihurin û xwe nêzî vê yekê nakin. Lîberalîzm weke îdeolojiya fermî ya sîstemê li ser rastgir û çepgiran yekdestdariya xwe heta roja me ya îro karîbû dewam bike.

Lîberalîzm weke yekdestdariya îdeolojîk a modernîteyê ji aliyekî ve enflasyona fikrê diafirîne, ji aliyê din ve jî tevî ku şêlandina herî mezin di enflasyonê de dike, di enflasyona fikrê de ya herî bi kêra wê bê bi kar tîne û bi rêya medya xwe zêhnan bombebaran dike û hewl dide encama herî zêde bi dest bixe. Têkûzkirina yekdestdariya fikrê armanca dawî ya şerê wê yê îdeolojîk e. Sîlehên wê yên bingehîn dîndartî, milliyetgirî, cinsiyetparêzî û weke dînê pozîtîvîst zanistîperestî ye. Bêyî hegemondariya îdeolojîk, bi tenê bi zordestiya siyasî û eskerî meşandina modernîteyê mumkîn nîne. Lîberalîzm bi rêya dîndartiyê hewl dide wijdanê civaka beriya kapîtalîzmê kontrol bike, bi rêya milliyetgiriyê welatîbûna dewleta netewe û çînparêziya li dora kapîtalîzmê pêş dikeve kontrol dike û di bin destê xwe de digire. Hedefa cinsiyetparêziyê ew e, nehêle jin bêhna xwe bide. Fonksiyona bi bandor a îdeolojiya cinsiyetparêziyê ew e, hem mêr bike nexweşiyê desthilatdariyê, hem jî jinê di bin hisa destavêtinê de bihêle. Bi zanistîperestiya pozîtîvîst cîhana akademîk û ciwanan bê tesîr dike û nîşanî wan dide ku ji bilî yekbûna wan bi sîstemê re ti alternatîfa wan nîne û di berdêla tawîzan de yekbûna wan bi sîstemê re misoger dike.

Li hemberî êrîşên îdeolojîk ên lîberalîzmê divê bi lez bersiv bê dayîn pirsên; divê mirov çawa bijî, çi bike û ji ku destpê bike. Bersivên dijberên sîstemê dane van pirsan herî kêm heta roja me ya îro bê tesîr hatine kirin. Bersivên modernîteyê dane ev hersê pirsên girîng bi tesîr bûne. Şêwazê jiyanê yê modernîte pêncsed salên dawiyê pêk tîne bi giranî mohra xwe li pirsa 'divê mirov çawa bijî' daye. Di serdema modernîteyê de bi qasî ku di ti serdema dîrokê de nehatibe dîtin şêwazên jiyanê welê dane qebûlkirin û dawerivandine hinavên mirovan, ew homojen kirine. Qalibên jiyanê yên herkesî di bin navê rêzik û pîvanên gerdûnî de tek tîp kirine. Cudahî û cihêrengî li hemberî tektîpkirinê zelûl in. Serîrakirina li ber şêwazê jiyanê yê jêre jiyana modern tê gotin yekser mohra dînîtiyê tê lêxistin û bi surgûnkirina derveyî sîstemê tê mehkûmkirin. Kêm kes diwêrin serîrakirina li hemberî vê surgûnê û gefxwarina wê dewam bikin. Pirsa 'divê mirov çi bike' jî ji mêj ve, pêncsed sal e ku kitebikite bersivên wê hatine dayîn: Tu yê ferdî bijî, timî xwe bifikire, "rêya bi tenê rêya modernîteyê ye' tu yê bibêjî û ya dikeve ser milê xwe bi cih bînî. Rê diyare, usûl diyare: herkes çi dike tu yê jî weke wan bikî. Eger tu patronî divê tu karê bikî. Eger tu kedkarî divê tu li pey heqdestekê bazdî, bibezî. Wekî din li pey tiştên din ên divê bêne kirin bazdan û bezîn ehmeqî ye. Eger israr û serhişkê bê kirin encam avêtina derveyî sîstemê ye, bêkar hiştine, bêçarekirin e, rizandin e. Jiyan kirine bezîneke bi tehlûke ya hesp û bergîran. Bihêlin bersivdayîna pirsa divê mirov çi bike, ji bo bersiva pirsa divê mirov ji ku destpê bike sîstem weha dibêje "Ji cihê ku tu yê xwe baş perwerde bikî destpê bike." Ji bo serketina di nava sîstemê de dibistan û zanîngeh mekanên destpêkirinê ne ku dest ji wan nabe.

Li hemberî sîstemê gera li heqîqetê ya modernîteya demokratîk, helwesta wê ya îdeolojîk û bersivên wê yên dide sê pirsên bingehîn di buhaya sîstemeke alternatîf de ye. Ji hemû aliyan ve gera li nasnameya civakî, ji hev derxistina wê û pêşkêşkirina çareseriyên wê, şerê heqîqetê bi xwe ye, cewherê wê ye. Parêznameya min bi xetên stûr be jî encamên vê lêgerîn û vî şerî pêşkêş kiriye. Hewce bi dubarekirinê nîne. Sekna îdeolojîk bi rexnekirineke berfireh ji hegemondariya îdeolojîk a modernîteya serdest bihurînê îfade dike. Xwedîderketina heqîqetên civakî yên di dest de sekna îdeolojîk e. Nîşandana mehrûmbûna modernîteya kapîtalîst ji heqîqetê (ferdparêziyê tercîhî civakê dike, nasnameya civakî dike hedefa êrîşan), nîşandaan heqîqeta civaka ekonomîk, ekolojîk û demokratîk, nîşandana heqîqeta netewe û nîşandana hêza heqîqetê bi vê seknê re têkildar in.

Bersiva hevpar û pêşî ya ji bo pirsên divê mirov çawa bijî, çi bike û ji ku destpê bike ji nava sîstemê û li ser bingehê dijberiya wê bê destpê bike. Lê ji nava sîstemê dijberbûna wê, di asta zanînên kevn de şerekî heqîqetê yê her kêlî mirin têde hebe divê. Pirsên divê mirov çawa bijî û ji ku destpê bike di zikhev de bersiva wan bide. Ji bo vê jî

divê tu ji vê jiyana moderniteyê weke kirasekî dînan ê fena zirxekî li te kirî biçirîne, nefret bike û jê bigere. Wexta hewce kir, tu yê her kêlî verşe dil (mîde), mejî û bedena xwe ji vê jiyanê bimale, paqij bike. Eger ew xwe weke bedewa cîhanê pêşkêşî te bike jî divê tu bi verşandina ya hundir û hinavên xwe bersivê bidiyê. Eger mirov bersiva pirsa 'divê mirov çi bike' bi du pirsên din re di zikhev de bide divê mirov bibêje; ez ê li dijî sîstemê timî di nava çalakiyê de bim. Bersiva pirsa divê mirov çi bike, pratîka bi serwextî û rêxistinî ye.

Ji aliyê sîstema modernîteya demokratîk ve bersiva hersê pirsan xwegihandina hêmanên îdeolojîk û çalakî yên sîstemê îfade dike. Berê têgîna partiya pêşeng weke mîsyona pêşengiya teorîk û çalakî ya modernîteya demokratîk hê bi tesîr hatiye kirin. Mîsyona bingehîn a pêşengiya nû ye ku pêdiviya îradî û zêhnî ya sêlingên bingehîn ên sîstemê civaka ekonomîk, ekolojîk û demokratîk (rêveberiya bajar, xwecihî, herêmî, neteweyî û ji netewe wêdetir demokratîk konfederalîst) tedarik bike. Ji bo vê jî divê hejmareke têr û naveroktijî avahiyên akademîk bêne lêkirin. Divê komikên akademîk ên nû bi tenê qîma xwe bi rexnekirina cîhana akademîk a modernîteyê neynin, tevî vê alternatîfa wê jî pêşde bibin û li gorî naverokên wan bi navên cûrbicûr akademiyan ava bikin. Di serî de ekonomîk-teknîk, ekolojîk-cotkarî, demokratîk siyaset, ewlekarî-parastin, jin-azadî, çand-nasname, ziman-dîrok, zanist-felsefe, dîn-huner, li gorî girîngî û pêdiviya civakê li her qadê avakirina akademiyan erk û wezîfe ye. Kadroyên akademîk ên bi hêz nebin hêmanên modernîteya demokratîk ava nabin. Çawa ku bêyî hêmanên modernîteya demokratîk ti maneya kadroyê akademîk nebe, hêmanên modernîteya demokratîk jî bêyî kadroyên akademîk wê ti maneyê îfade nekin û wê bi ser nekevin. Yekparebûna di zikhev de ji bo mane û serketinê şert e.

Fikir, zikir, çalakî û têgihiştina cuda ya modernîteya kapîtalîst ku weke kincekî bi lanet li ser pişta mirovî disekine, divê ji sedî sed bêne terikandin û li dawiyê bêne hiştin. Fikir-zikir-çalakî nîşaneyên meznahiyê ne, ti car yek ji ya din cihê nabe, divê mirov wan yekpare li xwe bike û bijî, heqîqetê timî li ser pişta xwe bigire. Kesa-ê hersêyan bi hev re bi bersiva pirsên divê mirov çawa bijî, çi bike û ji ku destpê bike nikaribe temsîl bike divê dernekeve şerê heqîqetê. Şerê heqîqetê berevajîkirin û belovajîkirina modernîteya kapîtalîst qebûl nake. Bi wê re nikare bijî. Bi kurtî, kadroyê akademîk mejî ye, rêxistin e, û a di mûrehk û demarên zîro yê beden (civak) de belav dibe. Rastî yekpare ye. Heqîqet rastiya yekpare ye ku tê îfadekirin. Kadro heqîqeta rêxistinkirî û çalakkirî ye

Ferdê şaristaniya demokratîk bi qasî ku li dijî sê suwarên mehşerî yên modernîteya kapîtalîst (kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe) timî têkoşîneke bi hev re ya fikir-zikir-çalakiyê bimeşîne, divê timî bi sê melekên rizgariyê yên modernîteya demokratîk (civaka ekonomîk, civaka ekolojîk û civaka demokratîk) timî têkoşîneke jiyanê ya bi hev re ya fikir-zikir-çalakiyê di kesayeta xwe de bide, naxwe nikare xwe pêk bîne, nikare xwe weke pêşengê heqîqetê ava bike. Bi qasî komika akademiyayê, di yekîneyên komin ên civakî de jiyan û têkoşînê bi hev re nemeşîne nikare bibe pêşengê (murşîdê) bi cihanîna cîhana dad, azadî û demokrasiyê. Rexnekirina Pirtûkên Pîroz û hozanên xwedawend giranbuha ye (wexta ku weke amûrên şaristaniya serwer û modernîteyê hatin bi kar anîn). Jixwe yên ji ber mayî mîrateya me ya jiyanê ne, nasnameya me ya civakî ne. Milîtanê heqîqetê yê serdema demokratîk ew kes e, vê nasnameyê li şexsiyeta xwe diniqirîne, dikole, mîrateya jiyanê bi awayekî azad dijî û dide jiyîn.